Amed Tîgrîs
Cemal Batun
Xorto



Roj bi roj

# ŞERÊ KENDAVÊ Û KURD

# Ror bi roj
# Şerê Kendavê (Xelîcê) û Kurd

Amed Tîgrîs
Cemal Batun
Xorto

APEC

# Roj bi roj
# ŞERÊ KENDAVÊ Û KURD

***Weşan no: 20***

Utgivare/Weşanxane
APEC-TRYCK & FÖRLAG
ÇAP Û WEŞANXANA APEC

Författare/Nivîskar:
**Amed Tîgrîs**
**Cemal Batun**
**Xorto**

Adres/Navnîşan:
Box: 3318, 163 03 Spånga/SWEDEN
Telefon: 08-761 81 18 • Telefax: 08/761 24 90
Tîrmeh 1992

**ISBN: 91-87730-25-1**

## Naverok

Pêşgotin .......... 5
Berî dagîrkirina Kuweytê rewşa Îraqê .......... 7
Di çapemeniya Swêdê de bi kurtasî pirsa Kendavê .......... 25
Şer destpêkir .......... 44
Kuweyt rizgar bû .......... 94
Kurdan serîhilda .......... 105
Trajediya Kurdan .......... 134
Pirsa Kurd di Koma Neteweyan de .......... 145
Pirsa Kurd di rojeva cîhanê de .......... 171
Heyeta Kurd çû Bexdayê .......... 177
Peymana 11'ê Adarê ya 1970'yî .......... 182
Pêşnîyara Bereyê Kurdistanê ji bo Otonomiyê .......... 189
Pêkhatina herêma Ewlekar .......... 210
Bi Bexdayê re pêwendî .......... 214
Guftûgoh têkçûn .......... 288
Rewşa piştî têkçûna guftûgoyan .......... 293

*Dîyarî*

* Em, vê pirtûkê ji bo bîranîna ew zarokên Kurd ên ku di bin gulebarana helîkopter û scudên rejîma Iraqê de şehît ketin;

* Yên ku dayikên wan yên ducanî ji ber gulebaranên rejîmê derbeder û tengezar bûn;

* Yên ku li ser çiyayên Kurdistanê, di nav berf, serma û qeşayê de ji dayikên xwe re bûn re, dîyarî dikin!

## *Pêşgotin*

*Wek ku xwendevanên Berbangê pê dizanin, em hersê nivîskarên vê pirtûkê di redaksîyona Berbangê de kar dikin. Ji xwe, me ji hinek nivîsarên vê pirtûkê jî, di çend hejmarên Berbangê de weşandi bûn. Di vê mijarê de, xebatên me hersê hevalan jî cuda cuda hebûn. Heval Xorto di destpêka şerê Kendavê (Xalîcê) de roj bi roj not girtibû. Heval Cemal Batun li ser şerê Kendavê û pirsa Kurdan gelek nivîsar nivîsan dibû û bi gelek berpirsiyarên tevgerên Kurd re hevpeyvîn çêkiribûn. Heval Amed Tîgrîs jî, ji roja destpêka şerê Kurd û Îraqê bi navê "Roj bi roj" nivîsarên peryodîk nivîsan dibû û beşek jê di Berbangê de weşan dibû. Me hersê hevalan biryar da, ku xebatên xwe bikin yek û bi wan re, ew dokumentên ku li ser vê pirsê hene û derketine berhev bikin û di yek çavkaniyeke de çap bikin. Ji ber vê yekê me bûyeran li gor dîrokê bi rêz kir û dokumentan jî li navê bi cih kir.*

*Ji derê gotaran me nexwest her bûyereke bi dûr û dirêj şirove (komentar, yorum) bikin. Me vê mafê fîkirandin û şirovê ji xwendevanên xwe yên hêja re hişt.*

*Ev beşek ji dîroka cîhanê û ya Kurdan a çend mehan an jî çend rojan e. Ji bo rojên pêş Kurd dikarin li ser van bûyeran bifikirin û bigihêne bîrûbaweriyekê. Ji aliyê din ve, bûyera şerê Kendavê û bi taybetî trajediya Kurd ku li ber çavê cîhanê pêk hat, bila wek dîroka me ya berê ji bîr û wenda nebe. Wek dîroka me ya kevin bi gotinên vala û yekalî nemîne. Ji ber ku ev çend meh di dîroka Kurdis-*

*tanê de gelekî girîng in. Bila di rojên dahatû de gelê Kurd, kirin û bûyerên ku li ser axa Kurdistanê pêk hatin, bê şirove bizanibe. Bila gelê Kurd, çerxa cîhanê, rola rêxistin û pêşewayên xwe bê şirove nas bike. Bi xwe biryar bide.*

*Heger xwendevan di hêla ziman de, hinek zehmetiyan bibînin, bila li me biborin. Ji ber ku pirtûk ji sê pênûsên cuda derketiye.*

*Kovara Berbangê û rojnamevanê Swêdî Stefan Hagberg ji bo fotografan arşîvên xwe ji me re vekirin. Em ji wan re gelek spasdar in!*

*Nivîskar*
*1992 Stockholm*

## Berî dagîrkirina Kuweytê rewşa Iraqê

Iraqê, 8 sal bi Iranê re şer kir û di dawî de jî, bi serket. Piştî vê şerê han Iraq di nav Ereban de bû xwedî peyv û rêzgirtineke mezin û giran. Bi rastî, eger mirov bi çavekî realîst li encamê şerê Iran û Iraqê temaşe bike, dê bigêhe vê baweriyê, ku Iraq ji şer, wekî aliyê serfîraz derket. Piraniya dewletan û bi taybetî yên Rojava û Sovyetê piştgiriya Saddam kirin. Niha baş tê zanîn û di rojname û kovarên mezin û navdar de hate dîyar kirin, ku di destê CIA gelek wêneyên ku li ser cîh ên leşkerî yên stratejîk yên Iranê, hebûne, ew dane Iraqê.

Herweha bi awakî berdewamî, pisporên leşkerî yên Sovyetê, di xizmeta artêşa Iraqê de bûn. Alîkarî ji welatên Rojava û Rojhilat her dihatin kirin. Bi komkirina van tiştên jorîn, Iraq di dawiya 1980 -an de sîstemeke leşkerî û çekdarî ya herî nûjen û bilind pêk anî.

Hêzên Kurdên çekdar û merkezên wan, ji ber êrîşên kîmyewî û çekên giran hema hema li nav axa Kurdistana Başûr neman. Partî û hêzên Kurd, merkez û pêşmêrgeyên xwe ji Kurdistana Başûr kişandin herêma Kurdistana Iranê. Saddamê faşîst, piştî serketina şerê li dij Iranê Kurdistanê carekê din çol û wêran kir.

Lê, şer bi xwe re barekî gelek giran anî ser aboriya Iraqê. Deynê Bexdayê, nêzî 100 milyar dolar bû. Bêkarî gelekî zêde bû. Ew bû pirsek ji yên herî girîng. Gelek kargeh nedikarîbûn kar bikin an jî berhemên wan kêm bûn. Iraq, di krîzeke bê ser û ber û kûr de bû. Ji serxweşiya serketina şerê Iranê, divê Saddam planên êrîş û dagîrkirineke nû bidîta û wê pêk bihaniya.


## Hêzên Saddam Kuweytê dagîr kir.

Di roja 2'ê Tebax a 1990 'î de, ajansên dinyayê, ev nûçe ya sensasyonel belav dikirin :
" *Hêzên leşkerî yên Iraqê, cîranê xwe Kuweytê dagîrkirin !* "
Çend roj berê jî, nûçeyek belav bû, ku Iraq dixwaze êrîşeke leşkerî bibe ser Kuweytê. Lê, Amerîka bi xwe derewbûna nûçeyê dîyar kir. Di roja 2'ê Tebaxê de ,derew û xeyal bûn rastiyeke berbiçav û Kuweyt ji aliyê Saddam ve hat dagîrkirin.

## Çima Kuweyt ?

Kuweyt, ne bi tenê li Rojhilata Navîn û nav dewletên Ereb de welatekî dewlemend e. Herweha ew di cîhanê de dewleteke herî dewlementir e. Di belavkirina xezîna dewletê ( butçe ) de, ji her Kuweytî re 15 hezar dolarê Amerikayê dikeve. Herweha ev dewlemandiya Kuweytê bûye sedema pêwendiyên xurt ku di navbera Kuweytê û dewletên din ên cîhanê de pêk tên. Ji sala azadbûna xwe ( 1961 - an ) ve heta niha, bi taybetî jî nêzîkahiya Kuweytê bi welatên Rojava û DYA bihêztir bûye.

Di şerê Iraq û Iranê de, welatên Kendavê (Xelîcê), 30 milyar dolar alîkariya Iraqê kirin. Ji wan 14 - milyar dolar ji alî Kuweytê ve hatibû dan. Piştî rawestana şer, gava peyv hat ser vegerandina van peran, di navbera Iraq û Kuweytê de dijîtiyên mezin dest pê kirin. Iraqê ji dervê vê destpêkir daxuyanîyên weha belav bike - " Kuweyt beşek ji axa Iraqê ye, ku sazbûna vê dewletê meşrû nebûye ( ! ). Tebîî ye, her kesî ev pirs dida - baş e, piştî dewletek




serbixwe bi dîrokek 30 - salan, gelo çawa îro Iraq pirseke weha têne holê." Lê, dihat jibîrkirin, ku li aliyê din ê medalyonê Saddam Huseyn û BAAS hebûn. Heta di destpêka rojên van dijîtiyan de, piştî pêwendî li gel nûnerên rejîma Bexda û yên Kuweytê, Serokkomarê Misrê Husnî Mubarek û Qralê Urdinê Huseyn, dîyar kirin, ku " *Iraq êrîşê Kuweyt nake !* " Piştî du rojan, leşkerên Iraqê ji telewîzyon û radyoya Kuweytê bangkirin, ku " *ji bo piştgiriya gelê Kuweyt, da ji serokatiya gemar ya Şeyh Sabah xelas bikin, ketiye axa Kuweytê û dest daniye ser mekanîzma dewleta Kuweytê.* "

Bi vî awayî, dê nêzîkî ji sedî 10, petrol a dinyayê di bin hîzmeta Saddam û rejîmê wî bibûya. Çawa jî bûhayê " *zerê reş* " zêde kiribana, pêwist dibû her kes gûhdariya wî bike. Bi kurtî dinya dê mecbûrê Iraqê bibûye ( ! ) Wî bi ke-

virekî du çûkan bikûje ! Saddam dibû xwedî dewlemendiya zêrê reş û her weha pirsa demokrasî û pirsa neteweyî ya Kurd li Iraqê dê bihata veşartin.

## Eniya fireh li dij İraqê

Ji roja wergirtina Kuweytê ve li hember Iraqê, di destpêkê de ji bal DYA, welatên xwedî granî li Ewropa Rojava - wekî Brîtanya, Fransa, İtalya û hwd. ji dervî Yemen, Sudan, Lîbya ve hemû welatên Ereb reaksîyonek dane diyarkirin. Paşê ji Rêxistina Yekîtiya Neteweyan (RYN ) di dîroka xwe de biryarên herî tûj li dij Iraqê girt.

Suudî Erebistan, Qatar û Bahreyn ji ber îhtîmala êrîşên Saddam daxwaz kirin ku leşkerên DYA (Amerîka), Ewropa Rojava, Misir û Suriye, bên nav axa wan. Wan welatan dest bi şandina leşker kir.

Iraq bi hezaran insanên biyanî yên ku li Kuweyt û Iraqê kar dikin û bi taybetî welatiyên Amerîka, Fransa, Brîtanya û yên welatên din ên Rojava girtin. Li gor daxuyaniya Partiya Demokrat a Kurdistanê, ew niha wekî mertalên parastinê di kargehên çekên kîmyewî, çekên din û cîgehên eskerî de, hatina bicîhkirin.

Serokkomarê Amerîkayê Bush, Saddam wekî Hîtlerê nû bi nav kir. Yekîtiya Sovyet xwest, ku Iraq bê qeyd û şert ji Kuweytê derkeve. Wezîrê Derve Shevardnadze got, *"ku Iraq çekên Sovyetê yên ku ji bo parastinê hatine firotin, ji armancên xwe yên êrîşkarî re bikar aniye."* Brîtanya, Fransa, Almanya peyvên wekî *zordar, qatil, dizê Bexdayê* û hwd. hemberî Saddam gotin. Gelo ev hemû ne encama wekî di gotina pêşiyan a Kurdan de tê gotin *" Xwedîbike bi nanê xwe û berde canê xwe " ye... ?*

Bi van hemû tiştên jorîn ve, gelekî baş dîyar bû, ku dinya li pêşberî hemû zilm, zordarî û jenosîdên Saddam li hemberî neteweyekî ji deh salan ve bêdeng mabû. Gava

pirs dihat ser berjewendiyên wan ên aborî û neteweyî, bi xurtî dengên xwe bilind dikirin. Saddam û BAAS ên ku fêr bûbûn çi bikin ji bo wan bimîne, vê carê gavên xwe şaş avêti bûn. Bersiva xwe jî gelekî zû girtin : Saddam pêwist bû cezayê şaşîtiya xwe bide ! Saddam dîktator bû, faşîst bû ! Nimûne jî gelek bûn: Tiştên ku pêşberî Helepçe û Badînan kiri bû, her roj di telewîzyonan de dihatin nîşandan. Gava Saddam bi zarokên Brîtanî re, di telewîzyona Iraqê de xwe nîşan dida, wekî mirovekî " zarokperwer ", telewîzyonên dinyayê paşî zarokên Kurd ên ku bi çekên kîmyewî hati - bûn şehîd kirin, di programên xwe de diweşandin. Her kesî niha baştir didît, ku Saddam li dij Kurdan çi kiri bû...

## Helwesta Tirkiye, İran û Suriyê

Welatekî ku beşek Kurdistanê dagîrkiri bû ji aliyê hemû dinyayê ve dihat rûreş kirin. Gelo eger şer derkeve, pirsa Kurd dê bi tevayiya giraniya xwe neyê rojevê ji bo çareserkirinê ? Ev bû pirsa herî girîng di pêşiya jiyana siyasî ya Ankarayê de. Li gor dîtina aqilmend û şêwirmendên Tirkiyê, pêwist bû, ku dewlet bi awakî aktîv di krîz a Kendavê de cîh bigre, ji bo ku bikaribe bibe asteng di pêşiya aktuelkirina pirsa neteweyî ya Kurd de.

Ankarayê, piştî biryara embargo ya aborî ya Rêxistina Yekîtiya Neteweyan, xeta petrolê di navbera Kerkûk - Yumurtalikê de girt. Parlamentoya Ankarayê biryar girt, ku hukimet dikare di şerê Kendavê de biryara şer bide û leşkerên bîyanî li Tirkiyê bicîh bike. Gihişte vê encamê, ku Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal dîyar kir : *" Eger Amerîka li bakûrê Iraqê dewletek Kurd çêbike, em ê bi ordiya xwe bikevin wir û wê xerab bikin "*. Ev nîşaneke din bû, ku dîsa av ji devê Tirkan tê ji bo bidestxistina petrola Kerkûk û Musilê.

Jî îzolekirina lraqê ji bal welatên cîhanê ve, belkî Îranê feydeya herî mezin dît. Bexdayê daxuyanî da ku, peymana Cezayirê ya 1975 - an qebûl dike, dîl ên şerê Iraq û Îranê dê bêne guhertin, ji axa Îranê jî ya ku di dest de ye dê derbikeve. Daxwaza aştiyê û başcîraniyê jî, ji Tehranê kir. Wezîrê derve yê Iraqê çû Îranê, ku pêwendiyan deyne. Lê, Îranê piştî van hemû tiştan jî, nîşan da ku piştgiriya biryarên RYN dike. Piştî çareserkirina pirsa Kuweytê Tehranê dîyar kir, ku divê leşkerên dewletên din ji herema Rojhilata Navîn derbikevin.

Suriyê reaksiyoneke xurt li dij Iraqê nîşan da û 4 hezar leşker şand Suudî Erebistanê. Şam dixwaze vê hejmarê zêdetir bike.

## Ma ji derê çareserkirina pirsa Kurdan aştî dibe?

Wekî hate dîyar kirin, piştî wergirtina Kuweytê ji aliyê Iraqê ve, bi taybetî Kurd ên dervî başûrê Kurdistanê baş dibînin, ku birayên wan li hember çi mekanîzmek leşkerî bihêz, ev 30 sal in bê rawestan şer dikin. Di dîtinek me, bi endamek ji Polît Buro yê Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê re, li ser rewşa Iraqê wî weha digot :

- *Me 54 rojan bi berdewamî sîng bi sîng, bi 30 hezar leşkerên Iraqê re, yên ku bi çekên giran, helîkopter û balafiran ve dihatin parastin di 1988 - an şerek bideng da. Pêşmergeyên qehreman 8 hezar leşkerên Iraqê kuştin û 25 şehîd dan. Leşkerên Iraqê yek gav nedikarîbûn pêş bikevin, her paş jî ketin. Lê, dewletek wekî Kuweyt bi mekanîzma ya leşkerî, tank, balafir û rakêtan ve, di çend saetan, ket !*

Baş tê dîtin û ev rastiya herî mezin e, ku bê çareserkirina pirsa Kurd li Rojhilata Navîn dê aştiyeke berdewamî nabe. Berî her tiştî jî, îro li ber çavan e, ku welatên

dagîrker ên Kurdistanê ne tenê astengên pêşiya tekoşîna neteweyî ya Kurd in, ew astengê pêşiya ewletî ya heremê û cîhanê ne jî.

**Cemal Batun**

**1'è Çileyê Paşîn:**

Do li paytextê Swîsre, Cenewreyê hevdîtina di navbera Wezîrê Derve yê Iraqê Tariq Azîz û yê Amerîkayê James Baker de 6-saetan dom kir. Herdu wezîran bi hevdu nekirin û civîn bê encam belav bû. Her du wezîran jî di presskonferansên xwe de dîyar kirin, ku ji bo dîtinên xwe paş ve gav avêtinê re ne amade ne. James Baker got, ku :

- *Ez ne tenê ji bo hevdîtinê hatim vê derê. Ez hatim, ku eger Iraq ji Kuweytê dernekeve, dê çi bê serê wan! Min xwest ez vê tiştî bi wan bidim fam kirin.*

Tariq Azîz ji aliyê din dida diyarkirin:

- *Em bi her tiştî dizanin û em amadeyê her tiştî ne.*

Berî ku rojnamevanan nûçeyên xwe birêbikin, nûçeya dijwar ji Bexdayê dihat, Saddam ji wir qîrîna xwe digihand:

- *Em ê, Amerîkiyan di xwina wan de bifetsînin!*

Ji daxuyaniyên, hatin belavkirinê diyar e rewş ber bi şer de diçe, lê hin komikên siyasî, daxwazin kar û barek dawîn ji bo aştiyê bikin. Dibêjin, ku siyasiyeke bê alî bi berpirsiyariyek rabe, dibe ku aliyek ji bo çareserkirina pirsê xwe nerm bike. Ji ber vê yekê tê gotin, ku Serokê Yekîtiya Netewan Perez de Cuèllar, dê dawiya heftê biçe Bexdayê.

Bê guman, aliyekî ku herî zêde li bûyeran temaşe dike, em Kurd tên. Kurdên başurê Kurdistanê û Kurdên li perçeyên din, ji roja dagirkirina Kuweytê ku ji aliyê Iraqê ve hate kirin heta îro, tû pêngaveke nêzîkayiyê ber bi hev ve havêtine tune ye. Bi ser vê jî Partiya Sosyalîst a Tirkiyê,

di bin serokatiya Ferit İlsever de û kovara " 2000'e doğru" ( Ber bi 2000-an), dixwazin bi taybetî bidin nîşandan, ku Kurdên başûrê Kurdistanê li gel siyaseta Amerîka cî digrin. Dibêjin, ku Kurd bi hêviya şerekî ne û ji wî şerî feydan ji bo xwe derbixin. Ev a " avêtina gazê, ser agir e" û ji derketina şer re alîkarî dike, dinivîsin xwediyê gotinên jorîn. Herweha daxwaza van kesan, cî girtina Kurdan û Tirkiyê li gel Iraqê ye. Bersiva Kurdan ji van kesan re, hişk û kurt bû - " Bere kes daxwaza cîgirtina me li gel qatilê me Saddam ne ke!" Tirkiyê ji xwe li gel Hêzên Hevkar ciyê xwe standibû. Lê, şertê xwe jî anîbû zimên, divê yekîtiya sînorê Iraqê bihatibane parastin. Li Iraqê Kurd hebûn, di rewşa şer de an di dawiyê de dibû, ku Kurdan guhartin di sînoran de pêk anîbane. Rewşeke wusa berî her tiştî, wî tesîra xwe li Kurdên bakurê Kurdistanê bikira. Tirkiye ya,ku ji tiştekî wusa ditirsiya, ji Hêzên Hevkar soz a ewletiya sînoran dixwest. Di nûçeyên, hatin belavkirin ji bal danezanên ragihandinê ve, ev soz hatibû standin. Nûnerekî Amerîka, yê ku hatibû Tirkiyê ev daxuyanî dida :

" Siyaseta Amerîka le ser pirsa Kurd, çareserkirina dê bi riyên aştî û li gor mafên mirovatî, di navbera sînorên, dewletên ku Kurd lê dijin e. Dewletên Yekbûyî yên Amerîka bi karên hundurî yên welatan mijul nabe."

Krîza Kuweytê, tirsek xiste dilê Ankarê, ku li ser gelek buha bibe. Pêngavin pêwist-bû bêne avêtin, da rê li ber ên meztir bê girtin. Wusa jî kirin.

Welatên Ewropa-Rojhilat, ji girîngiya xwe di rojeva si yaseta cîhanê de, gelekî dûr ketibûn. Tirsa Sovyetê yan çirokên, ku bi navê welatên bakûr ên ji " perda hasinî " qediyabûn. Hevdîtinên ji bo kêmkirina çekên nukleer û yên din bi carekê, bi peymanan hatin imzakirin. Lê, Tirkiyê dixwest, Rojhilat û Bakûrê Rojhilat ( bakûrê Kurdistanê ) dervî van peymanan bihêle, lê çawa ? Vê carê jî

babeta - Başur, Ankarê destpêkir bikar bêne. Li gor wê, tirs ji dewletên Ereban, Suriye û Iraqê dikari bû werê Tirkiyê. Wekî her carî di danezanên ragihandinê de şîretvanên " navdar " destpêkirin, ku diyar bikin - çawa ji ber pirsa avê, dibe ku li Rojhilata Navîn şerek li dijê Tirkan bibe.

Di rewşeke wusa de, gava Krîza Kuweytê dest pê kir, Tirkiyê tiştê ku li ezmanan digera li erdê peyde kir. Di Konferansa Hevkarî û Ewletiya Ewropa de, ya ku di rojên 19-21'ê çiriya paşîn de li paytexta Fransayê Parîsê civiya, biryara " Di navde Mersîn, Rojhilat û Bakûrê Rojhilat a Tirkiyê ( bakûrê Kurdistanê ) derveyî peymana kêmkirirna çekan dima. Bi vî awayî ji paralela 39 -an ve tevayiya bakurê Kurdistanê, bi xeta Muradiye, Karayazi, Tekınen, Kemaliye û Gozne ve, ber bi deryayê, derveyî kêmkirina çekên klasîk û çavdêriyê di man." ( Kurdistan Press )

Bê guman ev peyman ne bi tenê, bi daxwaza Tirkiyê bû, ew bi daxwaza Ewropayê jî bû. Di Rojhilata Navîn de, di bin siya Tirkiyê de xwedîbûna serbazekî ( asker, jandarma ) tiştek xerab nebû. Kurd ? Di rastiya roja me de, heya kesî ji yê din ne bû. Her kesî li belaya serê xwe re diva wî çare dîtibane. Di rewşa, ku sosyalîstên-romantîk mîna Fîdel Castro çepik ji Saddamê Tekrîtî re lêdixistin, wêrankirina Kurdistanê, bicîkirirna çekan li ser erdên Kurdan xema kesî nebû.

Rojhilata Navîn ber bi şerekî mezin ve diçe, lê di nava vê rewşa xeter de li bajarekî wekî Diyarbekrê, ya ku hejmara rûniştvanên wê digêhe nîvmilyonekê, xelk nizanê çawa xwe ji êrîşeke kimyewî biparêze. Bi milyonan Kurd bi nezanîbûna , ku çi dê di van rojan de bi qewime xwe spartine xwedê.

Serneketina hevdîtina Cenewreyê di navbera Bajker û Azîz de, rengekî tarîtir da bûyera Krîza Kuweytê. Pirsa dem di rêza yekem a rojeva siyaseta cîhanê de rûnişt.

Wekî ku tê zanîn, biryara Yekîtiya Netewan, girêdayî rewşê ye, ku Iraq heta 15'ê Çileyê Paşîn xwe ji Kuweytê nekşîne, bi çareserkirina pirsê bi metoda şer heye. Niha di kulîsên siyasî de behsa şer ê berê 15-ê mehê jî tê kirin. Civîna do germbûneke zêdetir dan van qisan.

Hê berî destpêka şer, dîyar e, ku dê Kurdistan bibe qada şer. Hemwelatî ji niha ve, li ezmanên xwe benda balafirên şerê ne. Tirs û tatêlê wan girtine.

**11'ê Çilêyê Paşîn**

Tirsa şer ji do ve bi ferehî xwe xista jiyanê. Konsolos û dîplomatên dewletên Rojava yek bi yek ji Bexdayê bardikin. Hêzên NATO yên leşkerî ji bo bihêzkirina eniya şer li dijê Iraqê neqlî heremê dibin. Komîta Parastina Netewî ya Tirkiyê li ser vê rewşa "nazik" civînan dike. Ji aliyekî ve qala metodên parastina sivîlî û ji aliyên din ve jî qala " li hember sabotajên Iraqê yên ku dibê bibin, wezîfekirina Hêzên taybetî "- di rojnameyên Tirkan de, tên kirin.

Gava, bala dinyayê hemû xwe daye ser Krîza Kuweytê û Rojhilata Navîn, Gorbaçov jî xwe dide ser welatên Baltiqê. Serbazên Sor, ên ku dezgehên resmî yên Lîtvanya dagîrkirin, bi netewiyên Lîtvanî re sîngên hev dikşînin.

Li ser pirsa Tengava Îranê, nederketina tû encamên bi dilê Amerîka ji hevdîtina li Cenevreyê, rê da ku welatên din jî bikevin dorê. Serokkomarê Fransayê F. Miterrand di vê derdorê de diyar e dê bi xwaze rolekê bileyze.

Her çend welatê Kurdan di nav vî agirî de, pirseke herî girînge, kes nayêne rojevê. Di kulîsên sîyasî de dibe, ku pirsa Kurd bê axaftin, lê di danezanên ragihandinê de tiştekî xwiya nîne. Belê dîyar e dê li ser pirsa Filistîniyan guftûgo çêbibin. Îraq merca ji derketina Kuweytê, bi " çareserkirina" pirsa Filistîn ve girêdide. Bi vî awayî , çareserkirina Krîza Kuweytê ji xwe re riyên cuda di

deyne. Di riyekî ji wan de Kuweyt, di yekê de İraq û di yan dî de jî İsraîl dîyar dibe. Wekî, ku tê dîtin di tû riyê ji wan de Kurd tune ne.

**12'ê Çileyê Paşîn**

Ji bo qedandina dema derketina Iraqê, ji Kuweytê, li gor biryara YN sê roj man. Serokê YN, Perez de Cuèllar îro li Bexdayê Saddam dibîne. Tê gotin, ku Cuèllar dê planeke aştiyê pêşkeşî Saddam bike, yê ku ji 5 xalan pêk tê.

- İraq divê di 15'ê Çileyê Paşîn de, ji Kuweyt vekişe.
- Bi vî awayî garantî tê dan, ku tû êrîş dê neçin ser İraqê.
- Leşkerên hêzên Hevkar jî yên ku di bin pêşengiya Amerîka de li heremê ne, dê ji heremê derkevin.
- Derketina hêzên leşkerî ji Kuweytê, di bin çavdêriya hêzên YN de dê pêk bê.
- Ji bo bidarxistina Konferenseke navnetewî li ser Rojhilata Navîn, ku di demek herî nêzîk de kom bibe, dê bang bê kirin.

Niha her kes li hêviyê ye, dê Saddam bi çi awayî li ser van xalan dîtina xwe diyar bike.

Li aliyê din, li Yekîtiya Sovyet bûyerên li Lîtvanya her û her germtir dibin. Netewevanên Lîtvanî beşdariya xwe ji bo rewşên dijwartir dikin. Serbazên Sor hemû dezgehên resmî û avayiya televizyonê xistine bin çav. Li Rojhilata Navîn û li welatên Baltik, qêrînên duruşmeyên ( slogan ) şer tên. "Ku şer derbikeve hûn ê êrîşê bibin ser İsraîl ?" Ji vê pirsê re, bersiva Tariq Azîz, wezîrê derve yê İraqê, kurt hate dan:

- ji sedî sed !

Li aliyê din, di çolên Suudî Erebîstan, Wezîrê Derve yê Amerîka James Baker wusa ji leşkerên Amerîkayiyan re digot :

- *Di 15'ê çilêya paşîn de, em derbasî êrîşê dibin.*



**13'ê Çileyê Paşîn**

Kongra Amerîkayê, mafê biryara şer da Bush. Heta îro tû agahdarî li ser hevdîtina di navbera Perez de Cuèllar û Saddam de, çawa derbasbûye nehatiye belavkirin.

Herweha xwepêşandanên li dij şer li Ewropayê zêde dibin. Lê, diyare ev a, dê nikaribe rê li ber bûyeran bigre.

Li "Rojhilat û Bakûrê Rojhilata Tirkiyê " xelkê ku nêzîkî sînor dijî, mal, gund û bajarên xwe berdidin û barî rojavayê Tirkiye dikin. Maskeyên li dij çekên kîmyewî hîn jî li gel nehatine belavkirin.

Pêngavên dewleta Tirk careki din didin xuya kirin, ku çekên kîmyewî li dij Kurdan bêne bikaranîn, dê tenê kêfxweşiya wan be. Ji dervî wê, siyaseta dewleta Tirk, heta niha ew bû, ku Kurd dev ji welat û axa xwe berdin û

barkin rojava Tirkiyê. Armanca vê siyasetê jî, " bê av hiş - tina masî bû ". Bi vî awayî pêwendiyên pêşmergeyên Kurd û gel dê bêne birîn. Ji bo gihiştina vê daxwaziyê jî du rê hene. Yek : yan pêwist e mirov bêne paqijkirin, an rayên wan ê bi axa wan re bêne birîn. " Wekî welatekî Ewropa " Tirkiye nikare jenosîdên wekî yên Saddam, mîna li Helepçeyê pêk bêne. Ji ber wê jî riya din tê bikaranîn. İnsan ji welatên wan, an bi darê zorê, yan jî bi si - yasetê tên derxistin. Tirkan ji berê jî ev kar kirine û niha jî dom dikin.

Perez de Cuèllar ji Bexdayê vegeriya. Xuya ye, ku Sekreterê Giştî yê YN, ji Bexdayê bi encamekî bidestketî nedaye rê. Ji bo, bi Saddam re hevdu bibîne, Cuèllar ê ku 2 - 3 seatan li bendî ma, li ballafirgehê bi tenê ji aliyê Yaser Arafat ve hate birêkirin. Tariq Azîz jî, ji bo birêkirina Sekreterê Giştî yê YN neçû balafirgehê. Di daxuyaniya xwe ji bo hevdîtina Bexdayê û ji bo pirsa derketina şer, Cuèllar wusa bersiv da : " Xwedê dizane ! "
Li paytextê Lîtvanya Vîlnîus çek teqîn. Li gor nûçeyên hatin belavkirin, di şerên di navbera Serbazên Sor û neteweyiyên Lîtvanî de 14 kes hatine kuştin.

**14'ê Çileyê Paşîn**

Piştî saet 24.00 -an dema ku ji bo Iraqê, ji aliyê YN ve hatiye naskirin diqedê. Her kes di baweriya derketina şer de ye. Piştê, Cuèllar li ser babetê tiştek bidest nexist û her tişt ber bi xwedê ve hişt, tirsa şer dilê milyonan mirov girtiye. Ku îro yan beyanî tû tiştekî "nedîtî " pêk neyê, tê mana şer di navbera Iraqê û Hêzên Hevkar de. Em meyzênin, gelo Serokê Fransa F. Mitterand dê çi bikaribe bike ?

Pisporên leşkerî dîtina xwe didin diyar kirin, ku şer dê gelekî kurt dombike. Dinya gava van bûyerên mezin dije,

Kurdan dîsa xwe naniye rojeva siyasî. Ne di warê leşkerî, ne di warê siyasî û ne di warê dîplomasî de Kurdan heta niha tû gotin nekirine. Xuya ye, ku ji kirinên wusa dûr in jî. Di vê demê de agahdariya, pêşniyara Bereyê (Eniya) Kurdistana Iraqê, ji bo pêkanîna Konferansa Netewî hat. Lê, ev pêşnîyar heta bikeve jiyanê, dîyar e dê ji bin kayê ve gelek av derbas bibe.

**15'ê Çileyê Paşîn**

Derketina şer girêdayî saetan e. Ew dema ku YN ji bo Iraqê dabû dîyar kirin, îro 07.00 de diqede. Tê gotin, ku hêzên Hevkar di bin serokatiya DYA de, bi qedandina kathejmarê re dê dest bi êrîşê bikin.

Wekî tê xuya kirin balafirên êrîşan di şer de dê rola herî giring bileyzin. Li her du eniyan rewşa hebûna balafirên leşkerî bi vî awayiye : Hêzên Hevkar xwedî 1851 hejmar balafiranin, ên ku li basên Suudî Erebistanê bi cî kirine. Iraq xwedî 550 balafiran e. Gava mirov li van hejmaran mêze dike, dibîne ku Hêzên Hevkar bi giranî xurtbûnê di destê xwede digrin.

Dîyar e, ku Iraqê wekî gava yekem a parastinê, li hemberê êrîşek ji erdê ya hêzên Hevkar ji Bassenên xwe li Suudî Erebistanê, gelek tişt pêkanîn e. Ji aliyê sînorê Kuweytê ve pêşberê Suudî Erebistanê, şeş xet hatine kolandin. Di xeta yekem de petrol hatiye dagirtin. Gava êrîş were dê ev petrol bê pêxistin. Bi vî awayî durdîtina leşkerên hêzên Hevkar ji ber dû yê petrolê, di şerê erdê de bibe astengek mezin. Di xeta duwem de mayin hatine bicîkirin. Di xeta sêyem de têlên tûj hatine rêzkirin. Di xeta çarem de leşkerên taybetî û tank hene. Di ya pêncem de topên giran hatine danîn. Di xeta şeşem de jî fuze dê pêşberê leşkerên Hevkar hebin. Ji bo ku hêzên Hevkar bikevin Kuweytê pêwist e, van hemû astengên li pêş xwe

rakin. Ji ber vê çendê jî wekî destpêk êrîşek ji erdê jialiyê leşkerên Hevkar kêm tê dîtin. Tebîî ye ku rakirina wan jî dê demekî dirêj bigre. Hêzên Hevkar ji vê dema dirêj dipelkînin.

Şer dê şerê balafiran be. Wusa dîyar dibe. Bi êrîşên dijwar ji ezman ve, bass û ciyên stratejîk ên leşkerî yên ku xwîn didin rayên hêza şer a Saddam dê bên hilweşandin. Dê li hember êrîşên ezman, parastina leşkerî ya Iraqê çend xurt be, em ê bibînin. Di şerên îroyîn de her çend girîngiya moralê hebe jî, lê peyva herî dawî ya teknolojiya bilind a leşkerî ye.

Di proseseke wusa dijwar de, Kurd û rewşa wan tê ber çavên mirov. Bi dehhezaran, sedhezaran xortên Kurd, ku niha di ordiya Iraqê de leşkeriyê dikin, dibe ku piraniya wan di eniya pêşîn a şer de bin. Ew ên ku çek berdin, dê bikujin û bên kuştin.

Ji bo çi ? Ji bo hatina xwe, rojên ronî yên zarokên xwe, ji bo welatê xwe, axa xwe, serbilindî û şerefa neteweyê xwe ? Na !

Ma tenê ew. Herweha di ordiyên welatên din ên dagîrkerên Kurdistanê jî. Di şerê 8 salan di navbera Iraqê û Îranê de, li her du aliyên eniya şer bi hezaran Kurd hebûn. Him ji bo Îran û him jî ji bo Iraqê şer dikirin. Gelek caran berên çekên wan, li laşê birayên wan ên Kurd diketin. Kurd bi çekê dagîrkerê welatê xwe, birayê xwe yê Kurd dikuştin. Ma gelo ev jî ne trajediyek herî bi şerm a sedsala me û rastiya roja me ye. Ev trajedî bi dehên, bi sedên salan û vir ve dom jî dike.

Dewletên dagîrker ên Kurdistanê ji dervî ku dest danîne ser dewlemendiya Axê (xakê), dest danîne ser mafê jîyana mirovê Kurd jî. Ji bo berjewendî û parastina xwe bi xwîna xortên Kurd jî dileyizin. Ji aliyekî axa Kurdan dimijin, ji aliyê din bi xwîna Kurd hebûna xwe diparêzin.

## Maskeyên Kurdan mirîşk in

Berî ku çekên kîmyewî yên Saddam bên bikaranîn, bi sedhezaran kes ji vê tirsê ji bakurê Kurdistanê bar dikin. Ber bi bajarên Tirkiyê yên rojava wek Stanbol, Izmîr, Bursa û Ankarê ve direvin. Yên belengaz û xizan ku nikarin ber bi bajarên Tirkiyê ve birevin, derî û pencereyên xwe bi naylonan digrin. Mirîşkek li ba pencera xwe girê didin û sibehê zû di pencera naylonkirî de temaşe dikin ka mirîşk mirîye an na. Heger mirîşk sax be, jahr û gaza Saddam bi top û balafiran îşev jî nehatîye avêtin û piştre derdikevin der. Maskeyên Kurdan mirîşk in. Li herêma Kurdistanê mirîşk neman, ku xelk bikire. Ji ber tirsa gaz û jehra Saddam bajarê Batman, Mêrdîn û Dîyarbekirê hema hema vala bûne.

Pêşniyara Fransa di YN de, ji bo nederketina şer û çareserkirina pirsê bi riyên aştiyê, ji bal Yekîtiya Sovyet ve jî piştgiriyê dibîne. DYA, Brîtanya û Israîl li dij vê pêşniyarê derdikevin. Ji bo derketina Iraqê ji Kuweytê, pêşniyara Fransayê, ku Konferansek Rojhilata Navîn a tê de pirsa Filistînê bigre desta ji aliyê DYA, Brîtanya û Israîl ve meqbûl naye dîtin.

Herweha li Tunisê, di êrîşeke pêşberê meqera navendî ya Rêxistina Rizgariya Filistînê ( RRF ) de, sê kes hatin kuştin. Weke tê gotin yek ji wan zilamê herî nêzîk ê Yaser Arafat e.

Li Enqerayê di daxuyaniya, ku ji danezanên ragihandinê re belavkir, Suleyman Demîrel ( Serokê Partiya Riya Rast ) nîşan da, ku li gor agahdariyên wî yên taybetî hene, îro di kathejmar 21.30 de Iraq dê hêzên xwe ji Kuweytê bikşîne. Ev daxuyanî di demek gelek kurt de hate weşandin û niha her kes li hêviyê ye, gelo ev agahdarî çend rastin.

Ji bal TV, radyo û rojnameyên cîhanê ve, li ser tê rawestan, ku eniya duwem a li dij Iraqê dibe li Başûr û başurê

Rojhilata Tirkiyê bê ( bakûrê Kurdistanê ). Ji niha ve jî, li wê de gelek çek hatiye bi cî kirin. Bassa Erhaç a li Melet yayê, ya Diyarbekir û Batmanê bi balafirên leşkerî û fîloyên hêzên leşkerî yên hewayê ve hatine dagirtin. Her weha spesialistên ( pisporên ) şer ên NATO yê û DYA yê di van ciyan de amade ne. Fuzeyên, ku hember armancên dûr in jî di van bassan de hatine danîn. Lê, yek peyv jî li ser rûniştvanên vê axê yên bi milyonan in nayê gotin. Ji bo şer dernekeve pêşniyarên bidarxistina konferansên li ser Rojhilata Navîn têne kirin. Naveroka van konferansan jî li derdora pirsa Filistînê tê dîtin. Cî ji bo pirsa Kurd nayê diyarkirin. Hebûna vê pirsa girîng kes naxwazê bibîne û ne jî li ser bipeyîve. Tenê gava qala zordariya Saddam tê kirin, di televizyonên cîhanê de resmên Helepçe. Çend gotin jî li ser Kurdan têne kirin. Hevqas !

Roj diqede, lê daxuyaniya Demîrel rast derneket. Hêzên Saddam ji Kuweytê nevekşiyan. Konseya Ewleyî ya YN piştî çend saet civînê li hevdu nekir û tû biryar a pêşniyareke nû jî derneket. Vê carê Perez de Cuèllar li ser navê xwe ji Saddam rica kir, ku ji Kuweyt hêzên xwe vekşîne. Lê Bexda diyar e, ku ne amadeye bersiva Serokê YN bi awakî pozîtîv bide. Her deqîqa diçe hêviyên riyên çareserkirina pirsê bê şer kêmtir dike.

**16'ê Çileyê Paşîn**

Dema, ku YN ji bo derketina Îraqê ji Kuweytê re naskiribû qediya. Niha bersiva dawî dê çek bidin. Bûyer çawa gihişte vê nuxteyê, bi kurtî wusa bû :

Di 2'yê Tebaxê de hêzên Leşkerî yên Îraqê sînorên Kuweytê derbaskirin û di navbera çend saetan de hêza parastinê ya dewleta Kuweytê perçiqandin. Kuweytê dagîrkirin. Piştî hefteyekê Kuweyt wekî herema 19 - an a Îraqê da xuyanî kirin.

Dagîrkirina Kuwetê, ji bo cîhanê bû şok. Lê wek tê zanîn dijîtiya di navbera Iraqê û Kuweytê de demeke dirêj dom kir. Bi hefteyan nûnerên her du dewletan, hevdu dîtin, ji bo çareseriyê ji dijîtiyan re bibînin. Her di navbera van hevdîtinan de Iraqê hêzên xwe yên leşkerî ber bi sînorê Kuweytê ve bicî kirin.

Dijîtiya di navbera her du dewletan, destpêka xwe hîn di şerê Iraq û İranê de dabûn diyarkirin. Welatên Xelîc pereyên ku bi deyn dabûn Iraqê di heşt salên şer de paşve dixwestin. Di nav wan de bi taybetî Kuweyt deyn dabûn û ji pereyên dayî derbas nedibû. Di hefteyên berî 2'ê Tebaxê de Ira -qê gelek tohme ji Kuweyt re nîşandidan. Li gor wan, Kuweytê ji pêwist zêdetir petrol dibir bazarê, vî tiştî jî bi xwe erzaniya petrolê di bazarên cîhanê de dianî. Ev pêngav a Kuweytê ji bal Iraqê ve wekî tehdîdek li dij Iraqê dihat dîtin. Herweha Iraqê digot, ku Kuweytê ji bîrên petrolê yên Rumalia, ya ku ji bal her du dewletan ve tê bikaranîn, petrol zêdetir derxistiye. Bi peyvên din - petrol ji Iraqê diziye ! Wekî din jî Bexdayê çavên xwe berdabûn axa Kuweytê, bi taybetî Warba û Bubiyan ê. Her du cî taybeti yek wan a giring ji bo Iraqê hebû. Ji ber ku bi van her du ciyan Umm Qasr, a ku ciyê derxustina tankêrên xwe yên deryayî ber bi cîhane ve bû, di bin kontrola Bubiyan û Warba de dima.

Çareserkirina dijîtiyan di navbera Kuweyt û Iraqê de, li bajarê Suudî Erebistanê Cîdde, bê encamek bidawî hatin. Di dema qutbûna pêwendiyan de, Iraqê 100 hezar leşker û 300 hejmar ji çekên xwe yên giran pêşberî sînorê Kuweytê bicî kiribû.

## Bi kurtasî pirsa Kendavê di çapemeniya Swêdê de

*2'ê Tebaxê*

*Ber bi sibehê ve, saet 02. 00 dan de hêzên leşkerî yên Iraqê ketin axa Kuweytê. Şêxê Kuweytê El - Sabah revî Suudî Erebistanê. YN civînek taybetî zû bidarxist û biryara 660 - an wergirt. Li gor wê, divê Iraq di zutirin dem de ji Kuweytê hêzên xwe vekşînê û pêwendî yên, ku rê ya çareseriyê ji dijîtiyan re peyda bike, destpêbikin. DYA, Fransa û Brîtanya pêwendiyên xwe bi Iraqê re rawestandin û hemû hebûna maddî ya Iraqê û Kuweytê li welatên xwe cemidandin.*

*3'ê Tebaxê*

*Lîga Ereban dagîrkirina Kuweytê protesto kir. Gelek welatên Rojava û Japonya hebûnên maddî yên Iraqê û Kuweytê cemidandin.*

*4'ê Tebaxê*

*Li Kuweytê bi destên Bexdayê hukimetek leşkerî hate damezrandin.*

*6'ê Tebaxê*

*YN biryara embargoya aborî û leşkerî li hemberê Iraqê girt. Alîkariya insanî, derman û xwarin dervî biryara 661 - an dimînin. Kuba û Yemen di Konseya Ewletî de li gel biryarê dengên xwe ne dan.*

*7'ê Tebaxê*

*Li ser daxwaza Qralê Suudî Erebistanê Fahd,*

*hêzên leşkerî yên DYA ji bo bicîbûnê tên Suudiyê, nêzîkî sînorên Kuweytê.*

**8'ê Tebaxê**

*Tevayiya Kuweytê di destê Îraqê de ye. Leşkerên Suudî Erebistanê nêzîkê sînorên Kuweytê tên bicîkirin. Di Xelîc de hêzên deryayî yên DYA, Fransa, Brîtanya û Yekîtiya Sovyetê hene.*

**9'ê Tebaxê**

*Dagîrkirina Kuweytê ji bal Iraqê ve bêqanûnî hate diyarkirin - ev biryara Konseya Ewleyî bi yekdengî hate qebûl kirin û hejmara 662 - an cîhgirt. Îraqê daxuyanî da,ku heger êrîş peşberê bên kirin, dê çekê kîmyewî bikar bîne. Îraqê derketina welatîyên rojava ji Bexdayê qedexe kir.*

**10'ê Tebaxê**

*Lîga Ereban a ku li Kahîreyê kombû, daxwaza derketina hêzên leşkerî yên Îraqê ji Kuweytê kir. Her weha biryar hate dan, ku hêzek leşkerî ya Ereban bê rekirinî Xelîc. Saddam şerekî ku di nav Îraqê û hêzên din de derkeve binav kir - cîhad !*

**12'ê Tebaxê**

*Saddam merc a derketina xwe ji Kuweytê diyarkir, dibêje, ku ew dikare ji Kuweytê derkeve, lê Îsraîl jî pêwiste ji axa dagîrkirî derkeve. DYA û Îsraîl ev pêşniyara Îraqê qebûl nekirin.*

**15'ê Tebaxê**

*Îraq û Îran, imzayên xwe avêtin ser peymana lihevhatinê, piştî şerê 8 - salan. Li gor wê, Îraqê*

*hemû daxwazên Îranê bi cîh anîn.*

***17'ê Tebaxê***

*Îraqê daxuyanî da, ku welatîyên rojava yên ku li hemberê Bexdayê negatîv û êrîşkar bin wên li Îraqê di bin çavan de bimînin. Her wekî dî, ewan dê li ciyên stratejîk ên leşkerî bên bicîkirin.*

***18'ê Tebaxê***

*YN, biryara 664 girt. Li gor wê, Bexda pêwist e izna derketina bîyaniyên li wir bide. Konseya Ewletîyê ev biryar bi yekdengî girt.*

***25' ê Tebaxê***

*YN, biryara 665 wergirt. Li gor wê, ji bo ku embargoya aborî hemberê Îraqê encamên xwe bide, dê tedbîrên hişk bêne girtin.*

***27'ê Tebaxê***

*Îraqê emir da hêzên xwe yên deryayî, ku biya biryarên YN nekin. DYA ji 3 / 2 karmendên sefareta Îraqê ji welatê xwe derxist. Danîmarkayê jî gemiyek xwe birêkir Kendava Îranê.*

***9'ê Îlonê***

*Li paytextê Fînlanda Helsînkî, Serokê DYA G. Bush û Serokê Yekîtiya Sovyet M. Gorbaçov hevdu dîtin. Naveroka cîvina wan krîza Kendavê bû. Di daxuyaniya hevdîtina xwe de, wan diyarkirin, ku pêwist e Îraq ji Kuweytê derkeve.*

*Çend hêzên Kurd ji Bush û Gorbaçov re vê nameya jêrîn birêkirin."*

## NAMEYA VEKIRİ
## Ji bo civîna bilind di navbera Serokê DYA G. BUSH Û Serokê DYYS M. GORBAÇOV de li Helsînkî

09 Ilon 1990

Serokên hêja !

Îro hûn ji bo çareyekê peyda bikin, ji bo krîza Rojhilata Navîn a ku bi wergirtina Kuweytê ji alî dîktatorîya Saddam û rejîma BAAS a Iraqê ve destpêkir, bi hêja ( Gorbaçov / Bush ) re hevdû dîbînin.

Ekselans, wekî hûn dizanin, neteweyê Kurd ê ku 25 milyon e, di nav sînorên çar dewletan de, ji hemû mafên xwe yên neteweyî, demokratî bêpar dijî. Kurd ên Iraqê yên ku beşek ji gelê me ne, li hember serkirdayetiyên dewleta Iraqê di proseseke dîrokî de her ji bo mafên xwe yên demokratî, neteweyî û mirovahî şer da ne. Dîsa her wekî hûn agahdar in, partiya BAAS a Iraqê û serkirdayetiya wê ya dîktator, pêşberê gelê Kurd şerek ne - mirovatî û dijwar dajo. Nimûneyên wan ên dawî, bikaranîna gazên kîmyewî di heremên Helepçe Adar 1988 û Badînan - Tebax 1988 - de ye.

Serkirdayetiya Iraqê ya îro, ne bi tenê di nav welat de, li hember Kurdan, di sala 1980'yî de li hember Îranê û di meha derbasbûyî de li hemberê Kuweytê bi êrîşên xwe, carek din nîşan da, ku hêzek astenge, ji bo aştî û ewletiya heremê.

Girêdayê van tiştên jorîn, biryargirtina embargoya aborî, ji bal Konseya Ewletî ya Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan, bi xwe Iraqê ji karakterê wê yê êrîşkar bi dûr nexist.

Serokatiya dîktator a Saddam, li hember mafên gelê Ereb ê Iraqê jî astengek e. Serkirdayetiya dîktator hemû mafên demokrat ên gelê Ereb bi dawî aniye.

Serokên hêja, di vê civîna we de, ya ku babet heye ji bo peydakirina aştîyeke berdewamî û ewletiya Rojhilata

Navîn, wekî nûnerên gelê Kurd em daxwazin, ku hûn ê ji bo aştîyeke rastane û berdewamî, wek alîyekî herî girîng pirsa neteweyî, demokrat û meşrû ya neteweyê Kurd jî bînin rojeva xwe.

Em wekî alî, ji we serokên hêja,

- Di hemû pêngavên navneteweyî de, ku wekî naverok pirsa Rojhilata Navîn heye, nûnerîtiya neteweyê Kurd jî wekî alîyekî girîng bînin ber çavan.

- Daxwazên meşrû yên Eniya Kurdistana Iraqê, ya ku berpirsîyariya neteweyê Kurd dike li Kurdistana Iraqê divê berçav bêne girtin û di sewiya navneteweyî de bêne parastin. Hêviya me ev e, ku hûn ji bo vê yekê dê pêngavên pêwist bavêjin.

Bi hêviya ku hûn di civîna xwe ya bilind de, li ser Rojhilata Navîn û mafê neteweyê me, bigihin biryarên hêja, em serfiraziya karê we dixwazin !

**Eniya Kurdistana Iraqê**
**Tevgera Rizgariya Kurdistan ( TEVGER )**
**Partiya Demokrat a Kurdistan ( PDK - T )**
**Partiya Rizgariya Kurdistan ( RIZGARİ )**
**Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê ( TSK )**
**Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê ( RNK )**
**Partiya Demokrat a Kurd li Suriyê ( El - Partî )**
**Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurdên li Suriyê**
**Partî Karkerî Kurdistan ( KİP )**

*13'ê Îlonê*

*YN, tenê ji bo birêkirina xwarin û pêwistiyên yekem ên ku dibe ji Îraqê re bêne rêkirin organîze bike, komîteyek çavdêr damezrand. Kuba û Yemen li dijê vê biryarê di Konseya Ewleyî de dengên xwe bi kar anîn.*

*16'ê Îlonê*

*YN, biryara 667 girt. Li gor vê biryarê, dan û standina Îraqê li hemberê sefaretên li Kuweytê hate protesto kirin. Wekî din jî hate nîşandan, ku divê Îraq rê bide bîyaniyan û li sefaretan ji Bexdayê derkevin.*

*24'ê Îlonê*

*YN, biryara 669 girt. Li gor wê, 18 welatên ku ji ber embargoya li hemberê Îraqê ketine krîza aborî, alîkariya aborî ji wan re bê kirin. Biryar bi tevayiya dengan di Konseya Ewleyî ya YN de hate qebûl kirin. Bermîleke petrolê derkete 38 dolaran.*

*25'ê Îlonê*

*YN, biryara 670 girt. Li gor dê embargo û kirinên li hemberê Îraqê divê bêne ferehkirin. Firîna balafiran ji Bexda û ji bo Bexdayê têne qedexekirin. Kuba li hemberê biryarê dengê xwe da.*

*9'ê Çiriya Pêşîn*

*Saddam Huseyn tehdîda, ku dikarin êrîşan*

*bibin ser İsraîl kir.*

***23'ê Çiriya Pêşîn***

*Ji bal Iraqê ve hate diyarkirin, ku 330 welatiyên Fransa dikarin ji İraqê derkevin. Ji dervî wê 33 welatiyên Brîtanya bi serokwezîrê kevn ê Brîtanya Edward Heath re ji Iraqê derketin.*

***25'ê Çiriya Pêşîn***

*Amerîka biryara birêkirina 100 hezar leşkerên din ji bo Suudî Erebistanê girt. Hejmara leşkerên Hêzên Hevkar li herêmê gihişt 350 hezaran.*

## Li ser krîza Kendavê çend dîtinên şexsî

Me di derxeka krîza Kendavê de li Stockholm û Uppsalayê ji çend kurdan " *li gor te divê rawêja ( tewrê ) Kurdan di derheqê krîza Kendavê de çawa be ?* " pirsî. Bersivên wan kesên Kurd em bi kurtayî li jêr pêşkeş dikin.

**Aram Bêwey ( 31 salî, ji Kurdistana başûr ) :**
Berî her tiştî divê Kurd xebata yekîtiyek fereh bikin. Ne bi tenê li perçeyekê Kurdistanê, lê li seranserê Kurdistanê. Eger em li bend û hêviya Ereban bin, wê çaxê encama mafê Kurd nîne. Divê xebata Kurdan ji bo Kurd û Kurdistanê bê.

**Rizgar Soranî ( 29 salî, ji Kurdistana başûr ) :**
Ji bo Kurdan îro firset e, Kurdan ji şerê di navbera Iraq ê Îranê de ku 8 salan domkir, tiştek bi dest nexist. Diyar e, ku bi daxwaz û xebata otonomiyê Kurd hîç nagehên mafên xwe yên neteweyî. Siyaseta rêxistinên Kurd divê di nav Kurd û serkirdayetiyê de rast û demokratîk be. Divê îro Kurd ji bo rûxandina Saddam hêzên xwe bikin yek.

**Perî Azadî ( 35 salî, ji Kurdistana başûr ) :**
Kurdên me ta îro pişt bi Îran û îmaman girêdabûn. Ji aliyekî din ve jî dixwestin guft û goyan li gel Saddam pêk bînin. Ew rawêj û siyaseteke çewt e. Pişt bi Ereb, Faris û Tirkan nayê girêdan. Divê Kurd bi hêz û destê xwe mafê xwe bigrin. Pêwiste, Kurd mafê xwe yê çarenûs diyar bike. Divê di nav Kurdan de wekhevî û demokratî hebe. Kara û karyera şexsî tune be; kolektîfî hebe. Divê Kurd yek deng û yek dest bin. Îro xebat ji bo rûxandina Saddam be.

**Xorto ( 36 salî, ji Kurdistana bakûr ) :**

Di mesela Kuweytê de hinek dibêjin Saddam û rejîma xwe li dij împeryalîzmê ne. Ne weha ye.
Saddam û rejîma xwe li dij împeryalîzmê nînin. Ji aliyê din ve, wek masmediya Rojava birê dide Amerîka ê hevalbendên wê jî ne demokratîxwaz in. Ev şerê wan ne li dij dîktatoran e. Leca kûçikan li ser laşê kerê ye. Ew jî petrol e. Ez wek kurdekî, ji bo xelkê Iraq û Kuweytê nikarim bêjim "li cem kûçikê xwe cîh bigrin". Ez dikarim bêjim, kûçikê xwe ji desthilatiyê bixînin. Li gor min çare şerê hundirîn e.

Leca me Kurdan ne leca laş e. Û cîhê me ne li cem kûçikê mezin û ne jî li cem ê biçûk e. Leca me do çi bû, îro jî ew e. Prensîbên me do çi bûn, divê îro jî ew bin. Armanca Kurdistaneke yekgirtî, serbixwe û demokratîk e. Ev prensîp ji bo vî şerê ha jî derbas dibe.

**Rêber ( 36 salî ) :**

Saddamê faşîst rûyê xwe yê reş hîn reştir kir. Ew dixwaze Helepçeyeke din pêk bîne. Lê, vê carê ez ne bawerim, ku ev bûyer bi hesanî wek olana ku Saddam amade kiribê pêk bê. Lê, ji bo me Kurdan du tiştên girîng hene. Yek ji wan ketina rejîma Iraq a Saddam e. Ya din jî, ji me Kurdan re, di roja îro de polîtîkayeke durust divê. Ku li gor armanc û daxwaza Kurdan ji vê bûyerê fêde bê dîtin.

**E. Cotkar :**

Îro Kurd belav in. Berî her tiştî pêwist e, ku Kurd yek bin. Kurd bi eqil û çavên xwe li doz û bûyerê binêrin. Qîr û cîr li ser petrolê ye. Ev dewletên ku îro li dij Saddam dertên, wan bi xwe Saddam kirin Saddam. Her kes ji bo kara xwe dike. Ji bi kara Kurdan jî çi pêwîst e û divê Kurd bikin.

**Merzîye Ferîqî - Razazî ( ji Kurdistana Rojhilat ) :**
Li gor baweriya min divê Kurd ne li alî Saddam û ne jî li alî Amerîka bin. Ji ber kirin û xebatên wan ji bo me vekirî û ronahî ye. Kurd îro ne xwedî bi hêz û qudreteke mezin in, ku bikaribin li heremê tesîr bikin û guhertinan pêk bînin. Îro hêz û qudret bi kar tê, ne qise. Ji bo hîç alîyekê divê Kurd xwe ne kin mertal û berpal.

**Zagros ( 28 salî, ji Kurdistana Rojava ) :**
Kurd wek rêxistin divê bi hev re bin. Niha kes alîkariya Kurdan nake, ne Sovyet û jî Amerîka û ne yên din. Kîjan dewlet alîkariya Kurdan bike baş e. Niha rewşa pêşmerge gelek qels e. Ku Saddam here û li Kurdistana Başûr dewleteke çê bikin, Sovyet û Amerîka wê dewletê qebûl bikin, wê demê rejîma Iraqê qels dibe. Bi kurtayî, ku Saddam bikeve, Kurd dê xurtir bibin.

**Bavê Azad ( 35 salî, ji Lubnanê ) :**
Li heremê çiqas xirabî çêbe, herem çiqas li hevdu bikeve û çiqas xirabî bibe, bi Saddam dibe, bi baweriya min dê hewqas jî ji Kurdan re baş bibe. Û çiqas Kurd ber bi hev bên, bîr û eniyan çêbikin, dê ji neteweyê me re baş bibe. Îro gelek îmkanên Bereyê ( Cephe ) Kurdistana Iraqê hene. Dimîne ew şerê di navbera Iraqê û yên din de. Ez bawer dikim, ku dê di nêzîk de tiştekî çêbibe, ne dûr e. Xwedê bi me re bê !

**Mustafa ( 35 salî, ji Kurdistana Bakûr ) :**
Bi rastî ez dixwazim şer derkeve. Dema ku qetlîama Helepçe tê bîra min, ez dixwazim li Iraqê kevir li ser kevir nemîne.

**Tîmûrê Xelîl ( 40 salî, rojnamevanê Riya Teze, ji Yekîtiya Sovyetê - Erîvanê ) :**

Dîtina min ev e, ku divê Kurd tevê vî şerî nebin. Çima ? Ji ber ku ew ne şerê me ye. Ne şerê neteweyê Kurd e. Şerê dewletan e. Divê pirsa şer bê safîkirin. Ji ber ku şerê ku çêbe, dê li ser erdê Kurdistanê be. Hem li Kurdistana Tirkiyê û hem jî li Kurdistana Iraqê. Lê tiştek heye ; kî gunehkar e, divê bê cezakirin. Saddam û dorberên wî gunehkar in, divê bên cezakirin. Yê ku avêtiye ser Kuweytê ne gelê Iraqê ye, rêjîma wê ye. Ew rejîm divê bê hilweşandin. Rejîmeke faşîst e. Mîlletê me ji zû ve bi vê yekê dizanîbû.

**Huseyîn Seîdî ( 41 salî, ji Kurdistana Rojhilat ) :**

Rewşa îro ji bo gelê Kurd rewşeke baş e. Divê hemû Kurd bê îhtîlafên siyasî beşdarê helwesteke (tewreke) weha bibin, ku tesîrê li ser Amerîka û dewletên din bikin û wan îqna bikin, ku ew qebûl bikin ji bo dabeşkirina Iraqê û pêkanîna Kurdistaneke serbixwe.

**29'ê Çiriya Pêşîn**

Biryara 674 a YN, bi awakî hişk Iraq protesto kir, ku hem welatiyên bîyanî nahêle ji Iraqê derkevin û wekî dîl wan di destên xwe de digre. Daxwazî hate kirin, da hemû welatiyên bîyanî bikaribin ji Iraqê derkevin. Kuba û Yemen li dij biryarê raya xwe dan.

**8'ê Çiriya Paşîn**

Serokdewlet ê DYA G. Bush ferman a birêkirina 150 hezar leşkerên din ji bo Suudî Erebistanê da.

## SELÎM CEWHER re hevpeyvînek

( Endamê Polît Buro ya Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê )

# "BEREY KURDISTANÊ JI BO ÇARESERKIRINA PIRSA KURD PROGRAMA XWE HEYE"

*Pirs : Li pey êrîşa Iraqê li dij Kuweytê hûn çi sedeman dibînin ?*

**Selîm Cewher :** Di destpêkê de, ez dixwazim spasîyên xwe bo we nîşan bidim, ku we îmkan dan me, ku em dîtina xwe bighînin raya giştî ya Kurd. Êrîşa Saddam li dij Kuweytê ne berhema pêgavake demî ye. Ew encama sîyaseta Saddam bi tevayî ye.

Şerê 8 salan bi Îranê re, Iraq xiste tengasiyeke mezin - di warê aborî, siyasî û dîplomasî de. Eger em li êrîşa Kuweyt temaşe bikin, pêwîst e em deh salên dawîn ên Iraqê jî bînin ber çavan.

1 - Li gor statîstîkên hatine belavkirin, piştî şerê bi Îranê re, dewleta Iraqê nêzîkî 100 - milyar dolar deyndar derket. Ev deynêkî felekî ye. Her berê şer jî, 24 milyar dolar deynê Iraqê hebû. Bi vî awayî mirov dikare bîne ber çavan, ku rewşa aborî ya Iraqê çawa bûye.

2 - Her di dema şerê 8 salan de, di rewşa hundirî ya Iraqê de - fîrma, kargeh û şîrketan xisarên bi milyaran dîtin. Di sala 1985 -an de aborîzanên aborî yên Ewropayê nîşan dan, ku 50 sal pêwîst e, ji bo ku Iraq li rewşa xwe ya aborî ya berê vegere. Ew di rewşeke weha tengasî de bû, ku alternatîv li pêşî yê nedihat dîtin. Ji welatên Ereb tenê Kuweyt 12 milyar dolar deyn dabû Iraqê. Herweha welatên Xelîç bi giştî 35 - milyar dolar deyn dabûn. Gava şer di navbera Iraq û Îranê de rawesta, rejîma Bexda nikarîbû tenê faîzên deynên xwe bide, yên ku di salê de digihiştin 11 - 12

milyar dolar. Petrola Iraqê bi xwe têrî vegerandina van faîzan nedikir.

3 - Wek tê zanîn, milyonek leşkerên Iraqê hene. Rewşa aborî jî wek hat gotin, weha xerab bû. Eger ev ordî hatibane belavkirin an jî kêmkirin, divabû ku ji wan kesan re kar bête dîtin an bêne xwedîkirin. Encamên şerê 8 salan jî li ber çavan in. 500 - hezar leşkerên Iraqê di vî şerî de hatin kuştin an brîndarkirin.

4 - Kurdistan çandinîyek gelek bi xêr hebû. Lê, Saddam 4000 gundên Kurdistanê wêran kirin. Her weha bi dehan bajarên Kurdan ên ku rûniştvanên wan digihan 50 - 60 hezarî ( wekî Pêcivîn, Çwarde, Qeredax, Mêrga Sor, Gelale, Şêrwan û hwd. ) wekî heremên qedexekirî îlan kirin. Nêzîkî yek mîlyon Kurd ji cîhên xwe hatin belavkirin û li jêriya Iraqê û li ordîgehan hatin bicîhkirin.

Jiyana insanan li gelek heremên welatê me hate bêîmkan kirin. Bi vî awayî, xêra ku ji van cîh an dihat, bi awakî " hesanî " hate birîn.

5 - Rewşa siyasî li Iraqê, piştî 8 salên şer dijwartir bû. Bi taybetî pirsa Kurd piştî van salan bi awakî girantir hate pêşberî rejîma Iraqê. Hate dîtin ku Saddam bi ti awayî ji bo anîna jiyanek demokrat amade nî ne. Problemên 22 salan ên ku BAAS bi xwe re anî, di encamê de dijwartir hatin rojevê.

Iraq ji jiyanek weha derbas dibû. Sedemek taybetî ya êrîşa Saddam li hemberî Kuweytê ev bû, ku gelê Iraqê bi problemên din bê mijûlkirin. Ji ber ku di berdewama şer de, rewşa xirab ku gel tê de bû, bikeve xalak dawî. Pirseke din a girîng ev e, ku daxwaza - stratejî ya Saddam bi serokatî ya mîllî ya Ereban ve girêdayî ye. Saddam vê yekê difikire, ku bi destekî du tan bileyzîne.

Berjewendiyên Ewropa Rojava, Amerîka û dinya ya mayî bi heremê ve gelekî girêdayne. Saddam hesabê van tiştan tenikî dike. Petrola Iraqê û Kuweytê bi hev re wekî

rezerv ( li gor Enstîtu ya Ereb li Londrayê - di sala 1985 - an de ) a Iraqê 101 sal û ya Kuweytê jî 207 sal e. Xwedîbûna dewlemendiyek weha yek ji sedemên temehiya Saddam bûye.

Aliyekî din jî yê girîng heye, her dîktator di pêvajokê de her çiqas di zilm û zordariya xwe de pêş bikeve, şaşîteyek a dîrokî ya mezin dike. Hîtler di nava Almanya de her çend pêş ketibû, gava êrîşê Polonya kir, dawiya xwe di wê rojê de bi destên xwe danî.

*Pirs : Hûn biryarên Rêxistina Yêkîtiya Neteweyan û hatina leşkeran bo heremê çawa dinînin, gelo ev kirin têr dikin ?*

**Selîm Cewher :** Di 22 salên ku rejîm di dest de ye , Saddam çi kiribe, jê re hatiye gotin - Aferîn ! Brîtanya û Amerîka bi plan ji '63 - an ve ev rejîm anî. Piştî 1968 - an ku Saddam ji pişt perdê ve serokatiya vê rejîmê girtiye dest xwe, her zilm û zordarî, ta'de û teror li gel serokatiya wî bi hevdu re meşîn e. Berî rewşa 1985 - an ( perestroyka ) Bexda gelek mecalên manewrayê hebûn. Tenê di navbera 1982 - 1987 - an Yekîtiya Sovyet bi bûhayê 10 milyar dolar çek firotine Iraqê ( Borîs Yonanov kovara " Sovyetîska Kultura ). Ji dervî wê Iraqê çek ji hemû dinyayê heye. Di dema şerê li dijî Îranê de, welatên Ewropa Rojava ji bo Bexdayê sîstemeke çekdarî ya bilind ava kirin. Van hemû tiştan Saddam bi hêz kir û niha dinya belayê vî tiştî dikşînê.

Hatine leşkeran, belê em bibêjin ên derve bi biryarên RYN çêbûye. Hebûna wan di heremê de, sedema wê ya herî mezin Saddam e. Biryarên RYN heye ku welatek bikeve xetarê de, dikare alîkariya leşkerî bixwaze. Em li gel biryarên RYN in û em dibêjin ew pêwîste bêne naskirin. Saddam dixwaze bide nîşankirin, ku şer di navbera Iraq û

Amerîkayê de ye. Ev propaganda bi awakî xurt di nav Iraqê de tê kirin. Ew dixwaze vê propagandayê bi taybetî di nav welatên Ereban de û her weha li dervî wan jî bike.

Daxwazeke din a Saddam ew e, ku krîz her berdewam be, di nav welatên Ewropa Rojava, Amerîka û welatên din de opozîsyonek bête sazkirin.

*Pirs : Li gor rewşa nû, dîtin û xebata we di çi qonaxî de ye ?*

**Selîm Cewher :** Xebata Partiya Demokrat a Kurdistan berî wergirtina Kuweytê jî diyar bû. Em wekî Partiyeke xelkekî bindest û dagîrkirî, her dem li ser bingeha peymana 11 Adar a 1970 - yî daxwazên xwe diyar kiriye. Ta ku mîlletê me negihije wan mafên xwe, xebat û têkoşîna me dê her berdewam be. Piştî rawestana şerê Iraq û Îranê, her wekî Kek Mesud Barzanî nîşan dabû - paşî bikaranîna çekên kîmyewî, pêwîst bû em metodên xwe yên leşkerî biguherin. Me dest bi çalakiyên partîzanî kir.

Pêşmergeyên me bi hêzeke giran di tevayiya Kurdistana Iraqê de mewcud e. Ji destpêka 1990 -î de wan çalakiyên leşkerî yên serkeftî pêk anîn. Îro piştî rewşa dagîrkirina Kuweytê, me ev çalakî hinekî kêm kirin. Baş tê zanîn di destê vî dijminê zordar de, çekên kîmyewî û bîyolojîk ên modern hene. Pêşmerge bi grubên biçûk ( 15 - 20 nefer ) digerin, ku karibin li dijî êrîşên kîmyewî xwe biparêzin.

*Pirs : Eger rejîma Saddam bête ruxandin, li gor we alternatîf çi ye ?*

**Selîm Cewher :** Saddam Huseyn şansê xwe yê dawîn jî hebû, ji bo çareserkirina krîzê, heta civîna Helsînkîyê bikar ne anî. Saddam guh neda û nade pêşniyarên RYN û welatên Ereban. Rê yên bi aştî çareserkirina krîzê gelekî

kêm bûn. Alternatîv a yekem piştî ruxandina Saddam, tebîî ye ku opozîsyona Iraqê ye. Ew ji girêdayê wê ye, bê krîz çawa dê çareser bibe. Problem îro ji opozîsyona Iraqê meztir e, lê dawiya wê jî ew e, kî were ser hukim pêwîst e opozîsyonê û bi taybetî jî Berey Kurdistanê bîne ber çavan. Berey Kurdistan programa xwe ji bo çareserkirina pirsa Kurd heye û ew bingeha dan û standina me bi her rejîmê re ye - pêkanîna Peyman a 11'ê Adara 1970 bi awakî rastane.

*Cemal Batun û A. Tîgrîs*

**28'ê Çiriya Paşîn**

YN biryara 677, a ku Iraqê bi guharandina şeklê runiştvanî ya Kuweytê sucdar dike, bi yekdengî girt.

**29' ê Çiriya Paşîn**

YN biryara 678 girt. Biryar bikaranîna hemû tedbîran pêşberê Iraqê, ji bo derxistina hêzên Iraqê ji Kuweytê serbest dike. Li gor biryarê, metodên leşkerî jî, ji bo vê armancê dibe, ku bêne bikaranîn. Heta 15'ê çileyê paşîn, ku Iraq axa Kuweytê neberdê û venegerê sînorên xwe, dê bi hêza leşkerî bê derxistin. Kuba û Yemen li dij biryarê dengê xwe dan û Çîn bêdeng ma.

**30'ê Çiriya Paşîn**

Iraqê bersiva ultîmatom a YN bi awakî hişk da. Hemwelatiyên Swêdê jî, dê bikaribin ji Iraqê derkevin. Serokdewletê DYA, Bush got, ku "amadeye Wezîrê Derve J. Baker birêbike Bexdayê û herweha wezîrê derve yê Iraqê T. Azîz dawetî Waşîngtonê dike."

**1'ê Çileyê Pêşîn**

Iraqê diyarkir, ku pêşniyara G. Bush qebûl dike. Lê, daxwaz a naveroka hevdîtinê ne tenê, li ser pirsa Kuweyt bê, herweha pirsa Filistîn jî bi giranî bigirtina destan.

**6'ê Çileyê Pêşîn**

Saddam Huseyn ferman da, ku hemû biyanî dikarin ji Îraqê derkevin.

**12'ê Çileyê Pêşîn**

DYA, Iraq protesto kir, ji ber nexwestina wan bi hêvdîtina wêzîrê derve yê Amerîka J. Baker re.

**15'ê Çileyê Pêşîn**

Iraqê daxuyanî da, ku wêzîrê derve T. Azîz dê nikaribe di 17 ' ê çilêya pêşîn de biçê Waşîngtonê.

**9'ê Çilêya Paşîn**

Wêzîrên derve yên DYA J. Baker û yê Îraqê T. Azîz li Cenewreyê hevdu dîtin. Hevdîtina, ku 6 saetan dom kir, tû encama çareserkirina pirsan bi riya aştî neda. T. Azîz hemû pêşnîyariyan red kir.

**13'ê Çilêya Paşîn**

Sekreterê giştî yê YN Perez De Cuèllar , li Bexdayê Saddam dît.

Tû encamek bidest ne ket.

**14'ê Çilêya Paşîn**

Parlamentoya Iraqê biryar da, ku tewrê Saddam bi ne tawîz dan li ser pirsa Kuweytê raste.

**17'ê Çileya Paşîn**

Axaftin, munaqeşe û spekulasyonên li ser dê şer derkevê yan na, qediyan. Di saet 00. 30 de şer destpêkir. Ji wî demî ve li ser Bexdayê bombe tên barandin. Balafirên êrîş ên hêzên Hevkar ji navendiya xwe li Suudî Erebistanê, yek li pey yekê difirin armancên xwe bi taybetî di nav Bexdayê de, di hilweşînin. Şer bi navê " Operasyona Bahoza Çolê " ji alî DYA ve hate binavkirin.

Heta niha hêzên Hevkar tenê bi balafiran şer dikin. Ji şerê erdê re dem nehatiye. Bi destpêkirina şer re, rewşa Rojhilata Navîn a piştî şer destpêkir werê rojevê. Di daxuyaniya xwe ji bo danezanên ragihandinê re, Serokê DYA G. Bush diyarkir, ku " dê li Rojhilata Navîn sîstemeke nû bikeve jîyanê ".

Heta niha, tû agahdarî li ser roja yekem a şer çawa derbas dibe, nehatiye belavkirin. Iraq bi çi awayî xwe li dij êrîşên balafirên ên hêzên Hevkar diparêze, tiştek nayê zanîn. Tê gotin, ku çend balafirên Fransayê birîn girtine. Agahdariyên herî fereh ji heremê, ji bal CNN ( Televizyoneke DYA, ya ku di sermaye şexsî de ye ) ve tên belavkirin. Nûçevanên CNN ji Bexdayê, çawa bombardiman li ser bajêr pêk tê, ji otêla " El - Reşîd " li Bexdayê didin.

Gava li ser Bexdayê bombardiman dom dikin, li DYA jî xwepêşandanên li dijî şer pêk tên.

Herweha tê diyarkirin, ku bassên leşkerî, hêzên hewa û kargehên kîmyewî yên Iraqê xesarek gelek mezin, ji êrîşên hêzên Hevkar dîtine. Qelsbûna xweparastina Iraqê jî, bi vî tiştî ve tê girêdan. Li gor agahdariyên ji DYA ve hatine belavkirin, ji % 80 êrîşan îsabetê armanca xwe kirin e. Dîsa li

gor van daxuyaniyan 1 - balafira DYA û 1 - balafira Brîtanî hatine xistin. Leşkerekî amerîkayî jî hatiye kuştin. Di hevpeyvineke bi pîlotekî amerîkayî re hate kirin, wî diyarkir, ku ji Bexdayê bersiva wan bi parastinek çekdar a fereh hatiye dan. Wî got, ku ji erdê ve gelek gule hatine berdan.

Radyoya Bexdayê di nûçeyên xwe de gotiye, ku 55 belafirên dijmin hatine xistin. Her çend gelek saet ji destpêka şer derbas jî bûne, heta niha ji her du aliyan ve jî, tû agahdariyên fereh û bi îspat nehatine belav kirin.

## ŞER DESTPÊKIR

Şeva ku 16'ê Çileya Paşîn bi 17 'an ve girêdide, di saet 00. 30 de, piştî li hêvîman a nêzîkî şeş mehan, ku Saddam hêzên xwe yên leşkerî ji Kuweytê vekşîne û negihandina ti encaman bi rêyên aştiyê, li gor destûr a RYN ji 29'ê Çiriya Paşînê ya sala 1990'î, hêzên Hevkar êrîş birin ser navendiyên leşkerî yên Iraqê. Her weha cîhên leşkerî yên girîng li Kuweytê, ku çekên nûjen li wan hatiye bicîhkirin jî bûn hedefa balafirên DYA û hêzên Hevkar.

Li gor nûçeyên, ku ji alî ajansên dinyayê ve hatin belavkirin, li hember sîstem û mekanîzma çekdarî û leşkerî ya Iraqê, êrîşên herî dijwar ên belafirên eskerî di tevayiya dîrokê de pêk hatin. Zêdetirî 2000 caran bi êrîşên belafiran, Hevkaran di roja yekem a şer de " Operasyona Çolê " dan destpêkirin. Rojnamevanên Amerîkayî yên ku di vê rojê de, ji otêl a " El - Reşîd " li Bexdayê nûçeyên xwe gihandin dinyayê, rewş weha dianîn zimên : " Bi sedan balafiran Bexda bombardiman dikirin. Me ji otêla xwe, gelek cîh ên hatin hilweşandin û dişewitîn, dîtin. Du posta yên nêzîkî otêla me bûn, bi tevayî hatin hilweşandin. Ti tişt ji wan nema ! " Pîlotên ku di êrîşên li ser Bexdayê de cîh girtibûn, bersivên rojnamevanan weha didan : "Bexda wekî çam ( dar ) a sersalê, me vêhist ".

Ji aliyê din ve, sansurek fereh li ser rewşa şer, ji aliyê Bexda û Waşîngtonê ve hate danîn. Rojnamevan û ajansên dinyayê vî tiştî wekî " tarîkirina agahdariyê " binav dikin. Girêdayî wê, ji Iraqê, Amerîkayê û welatên Hevkar nûçeyên resmî yên li ser şer bi awakî gelekî cuda û bi ferq tên belavkirin. Li gor daxuyaniya rejîma Iraqê, tenê di roja yekem a şer de 55 balafirên Amerîka, Brîtanya û hêzên din hatine xistin û di encamên êrîşan de 23 kesên siwîl jiyana xwe windakirin e, 66 kes jî brîndar bûn e. Li gor daxuyaniya Hêzên Hevkar - DYA û Brîtanya her yekî

belafirek windakirin e. Her weha hate diyarkirin, ku di roja yekem a şer de 100 roket li hember Iraqê hatine teqandin û ji sedî 80 êrîş biser ketin e û erkê xwe bi cîh anîn e. Bi kurtayî dawiya roja yekem a şer hate nîşandan, ku Operasyon a Hevkaran bi serketî tewa bûye. Heta dîtinek weha hate belavkirin, ku Iraq li ber Hêzên Hevkar nikare serê xwe hilde. Lê, wekî tê zanîn û Bexdayê ji zû ve dabû xuyakirin, ku Iraq xwediyê yek milyon leşker e, xwediyê çekên kîmyewî, bîyolojîk û roketên modern e. Ji bo, ku piştgiriya welatên Ereb û musilmanan bigre, Iraq ji destpêkê xwest, ku İsraîlê jî bikşîne nav şer. Ji ber vê armancê bi avêtina rokêtên SCUD ser İsraîlê Bexdayê diyarkir, ku tehdîda wê ne vala ye.

Weha, di roja duwem a şer de, Iraq berî ku bersiva hêzên Hevkar bide, roketên SCUD ber bi xaka İsraîlê ve teqandin. Bajarên Tel Avîv û Hayfa bûn hedefên 3 roketan. Di her du bajaran de tehrîbatên malî yên mezin pêkhatin û li gor agahdariya dewleta İsraîlê 12 kesên siwîl di van êrîşan de brîndar bûn. Iraqê her weha roketek avêt pêşberê navendiya leşkerî ya Hevkaran li bajarê Dehranê yê Siudî Erebistan. Lê, berî ku roket bikeve, ji aliyê roket a " Patriot " a Amerîkayê ve, li ezman hate îmhakirin. Êrîş a Iraqê li dijî İsraîl bû sedem, ku bi hezarên êrîşên belafiran li dij Iraqê pêk bên ji bo ku bikaribin roketên Iraqê yên heyî bi tevayî biruxênin. Her weha piştî êrîşa Iraqê hemberî İsraîlê hêviyên hêzên Hevkar, ku hêza Iraqê ya êrîşê ji dorê derxistiye vemirandin. Bi vî awayî wan destpêkirin, ku ne tenê qala serfiraziyên xwe bikin, lê lêkolînên ferehtir li ser hêza Iraqê bikin.

Ji aliyê din ve, paşî rêkirina rokêtan cara duwem ser xaka İsraîlê, baweriya Iraqê ku dê hêzên Hevkaran tevlîhev bike û welatên Ereb, bi taybetî jî Suriye û Misrê ji nav van dûr bixê, vala derketin. Hem Şamê û hem jî Qahîreyê êrîşên Iraqê hemberî İsraîlê protesto kirin. Wan

daxuyanî belavkir, ku " planên sextekar ên Saddam, ku wan ji hêzên Hevkar dûr bixe, dê bi ser nekevin!"
Rêberatiya hêzên Hevkar da nîşandan, ku êrîşên balafiran li hemberê Iraqê dê heta nîvê meha sibatê dom bikin. Ji roja duwem a şer, pirsek a ku Tevger a rizgarîxwaz a neteweyê Kurd herî zêde mijul dike jî hate rohnîkirin.

## TIRKİYE Jİ DIKEVE NAV ŞER

Parlamento yaTirkiyê bi erêkirina ji aliyê Meclîsa Wezîran jî, biryar a bikaranîna bassên ( üs ) NATO ji alî hêzên Hevkar ve qebûl kir. Li gor vê biryarê, balafirên welatên NATO ' yê dê bikaribin ji hemû bassên xwe li Tirkiyê û bakûrê Kurdistanê bi rêkevin û êrîşan bibin ser Iraqê. Hêzên leşkerî yên Tirkiyê zêdetirî 150. 000 esker, qomando û hêzên taybetî ( çevik kuvvet ) li ser sînorê Bakur û Başûrê Kurdistanê ji hev diqetîn e, bicîh kirin. Li gor nûçeyên belavbûyî, li wir her weha hêzên leşkerî yên NATO' yê jî hatine bi cîh kirin.

Tirsa bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê Iraqê ve li hemberê bakurê Kurdistanê, windabûnên pêşîn jî li gel xwe anîn. Li sê malan li Diyarbekrê ji malbatekê 3 kes, li Qurtalanê ji malbatekê 6 kes û li gundekî Nisêbînê ji malbatekê 3 - kes, piştî pêçana derî û penceran bi naylonê, ji ber bê hewa mayinê fetisîn. Wekî din, nûçeyên ji bakurê Kurdistanê tên, xuyadikin, ku ji niha ve xelk di nav telaşê de ye, ku şer li ser axa Kurdistanê jî belav bibe.

Her weha hate dîyar kirin, ku kargehên kîmyewî, bîyolojîk û nukleer yên Iraqê, yên ku li başûrê Kurdistan in xesarên mezin ji êrîşên belafirên Hêzên Hevkaran dîtin

e. Li vir cîhê wê ye, ku bête nîşandan, ku hêzên pêşmergeyên Bereyê Kurdistana Iraqê, heta niha, ji roja destpêkirina şer, bi hêzên leşkerî yên Iraqê re neketina tû şer an tû daxuyanî jî, ji aliyê Bereyê Kurdistana Iraqê ve, li ser bûyerên li Iraqê nehatine belav kirin.

## Çend rojên şer çi dan dîyar kirin?

Tiştê ku heta niha xuya ye ev e : Taktîk a Iraqê, ku dixwaze bi kişandina İsraîlê nav şer Suriye û Misrê ji hêzên Hevkar dûr bixe, bi ser neket. Ji çend fîşekan pê ve li ser erdê jî şer derneket. Diyar e daxwaz a Hevkaran berdewama şer di vê demê de êrîşên belafiran e û heta niha taktîka wan, ku şer hîn ji ezman dom bike bi ser dikeve.

Tirsa terorîzmê li hemû dinyayê, bi taybetî jî li DYA û welatên Rojava Ewropa, bi xwe re gelek amadebûnên parastinê anîn. Lê, nûçeya encamê êrîşek terorîstî, cara yekemîn ji Fîlîpînê hat. Du Iraqî yên ku xwestin e, bombeyekê deynin bîblîotek a Amerîkayê li Manîla hatin kifşkirin. Yek ji wan hate kuştin û yek jî, bi birîndarî hate girtin.

Ji bo aştiyê li hemû derên dinyayê xwepêşandan tên kirin. Lê, anketên li DYA hatine kirin, diyar dikin, ku piraniya gel ê Amerîka û Brîtanyayê piştgiriya serokên xwe Bush û Major dikin. Yekîtiya Sowyetê poşmaniya xwe ji firoştin a roketên SCUD ji bo Iraqê dîyar kir. 1000 kesên Bangladeşî xwestin li gel Saddam şerê Amerîkayê û hêzên Hevkaran bikin.

Di rojên pêşya me de, dê çi tişt bibin, niha ne diyar e... Em Kurd ji sedsalan ve li hêviya tiştan ma ne, em hinekî

din li hêviyê bimînin, dê çi çêbibe ? Her kes di van rojên dawîn de, vê baweriyê tîne zimên, ku li Rojhilata Navîn piştî şer dê dema aştiyê were... Di gotinek me Kurdan de dibêje : " Dawiya şer xêr e ! " Bi hêviyek weha...

**20'ê Çileyê Paşîn**

Êrîşên Hêzên Hevkar bi balafiran dijî Bexdayê û heremên din ên stratejîk, ên ku di wan ciyan de bassên leşkerî hene domdikin. Hemû ciyên, ku bassên Iraqê yên eskerî tê hene, dibin hedefa bombardimanan. Herweha, ji bo ku İsraîl jî bikeve nav şer, da şer biguhere, bike şerekî Erep û İsraîlî, İraq destpêkir raketên Scud ber bi erdên İsraîlê ve biteqînê. DYA û hêzên din ên Hevkar bi hemû awayî kar dikin, ku İsraîl bersiva van êrîşan ne de. Di danezanên ragihandinên cîhanî de hate diyarkirin, ku ji bassên NATO li başurê Tirkiyê ( bakurê Kurdistanê ) ji İncîrlîkê belafir bi rê dikevin û armancên leşkerî li bakûrê Iraqê ( başûrê Kurdistan ) bombardiman dikin. Bi peyvên din, ji Tirkiyê ve eniya duwem pêşberê Iraqê destpêbû, ku bê bikaranîn. Niha pirseke herî girîng jî ev e - gelo dê Saddam bersiva Tirkiyê bide ?

Heta niha hejmara êrîşên balafiran li hemberê Iraqê 4000 derbaskirin.

Dîtina, ku dê şer bi destpêkirina xwe re biqede, diyare şaş derket. Li gor daxuyaniya Pentagonê ya resmî hate belavkirin, heta niha tenê 11 belafirên Iraqê hatine texrîpkirin.

Li ser hemû êrîşên li dijî tê bikaranîn jî, teqandina raketan dijî Israîlê, diyar dike, ku hemû hêza Saddam nehatiye hilweşandin, gelek li ser piyan jî heye.

Şer hîn peyayî erdê nebûye. Hêzên Hevkar bi hemû hêzên xwe ji ezmanan ve lêdixin û Iraq jî dixwaze şer bikşêne erdê. Di dawiya şevê de ajansên Brîtanî agahdarî

belavkirin, ku heta niha tenê 11 belafirên Iraqê hatine îmhakirin. Li aliyê din, li gor daxuyaniyên resmî yên Brîtanya 50 belafirên Iraqî ji dewrê hatine derxistin. Her weha tê gotin, ku gelek alet û makîneyên şer Iraqê hi - landine bin erdê. Eger ev agahdarî rastbin, tê vê manê, ku Iraqê gelek tiştên xwe ji êrîşên Hevkaran parastin e. Bi peyveke din, şer dom dike.

Bi bombardimanên li ser axa Iraqê, Kurdên ku nêzîkê sînor dijin derbasî " sînorên " Tirkiyê dibin. Saddam bir yara êrîşê da hêzên xwe yên leşkerî, ku li hemberê van Kurdan şer bikin.

Konseya Wezaretan a Tirkiyê, ji bo ku meqerên li Rojava û Bakûrê Rojava Tirkiyê jî bikevin dewrê, mafê erêkirinê û bikaranînê da hukimetê. Muxalefeta Tirkiyê hemberê vê biryarê derdikeve. Herweha muxalefet li dije, ku NATO û Hêzên Hevkar bikaribin bassên, li ser "axa " Tirkiyê bikar bînin. Li hember ketina şer a Tirkiyê, muxalefet li gelek hereman xwepêşandanan pêk têne û nerazîbûna xwe bi biryarên hukimeta Ankarê re dîyar dike. Tê zanîn, ku sedem a qîr ên muxalefet û hukimeta Tirkiyê jî bi taybetî girêdayî pirsa Kurd e. Li gor muxalefetê bi derketina li hemberê şer û dûrman a ji şer ji bo berjewendiya yekîtiya Tirkiyê baştir e. Li gor hukimetê aktîv cî girtin bi Hevkaran re dikare, di rojên hatî de zêdetir berjewendiyan ji Tirkiyê re bêne. Bi vî awayî, eger piştî şer pirsa Kurd were masê jî em ê bibin aliyek li ser masê û em ê bikarin li pêşiyê bibin asteng - raman dike , hukimet a Tirkiyê. Her du alî jî, ji bo armancekê xwe nêzîkê bûyerên îro dikin. Armanca wan yek e, lê metodên hukimet û muxalefetê cuda ne.

Berî roj biqede, aktîvîtetên Iraqê di şer de fereh bûn. Fuzeyên Saddam vê carê ber bi Suudî Erebistanê ve hatin teqandin. Ku serê fuzeyên Scud li Riyad û Dehranê ketin, bi jehrê kîmyewî ve ne dagirtiye, heta niha nehatiye dîyar

kirin. Weke tê zanîn meqer a navendî ya Hêzên Hevkar li Dehranê ye.

Tanqên Hevkaran ber bi sînorên Kuweytê ve diçin. Diyar e, Hêzên Hevkar bi şerê balafiran ve dibe, ku êrîşên erdî jî destpê bikin bibin ser Iraqê. Çekên herî nûjen di şer de tên bikar anîn. Fuze yên Patrîot di van rojan de ji aliyê her kesî ve tên axaftin. Ev fuze berî ku fuzeyek hatî rêkirin bikeve, di ezmanan de wê diteqîne. Niha piştî çend raketên Scud li ser erda Israîl ketin, DYA çend fuzeyên Patrîot tevî spesialîstan rêkir Tel Awîv ê. Ev fuze dê İsraîlê ji êrîşên raketên Iraqî yan biparêzin.

Hate diyarkirin, ku raketên Iraqê yên ku hatibûn teqandin ber bi Suudî Erebistanê ve, berî bikevin ji alî raketên patrîot ve li ezmanan hatine îmhakirin.

**21'ê Çileyê Paşîn**

Tirkiye hewl dide, ku belafirgeha Batmanê jî bixe dewrê. Gelek runiştvanên bajêr li derdora balafirgehê di saetên dawî de tevgerek dijwar a leşkerî dîtine. Rojnamevanên, ku li ser van agahdariyan çûne heremê dibêjin, li dora belafirgehê fuze hatine bicî kirin.

Wezirê dervê yê kevn ê DYA, yê binav û deng Henry Kissinger dîyar kir, ku " armanca bingehîn a DYA şikandina hêza leşkerî ya Iraqê ye. DYA daxwaze, ku wekheviyek leşkerî di nav dewletên Erep ên dostên DYA de û Iraqê de pêk bêne. Divê Iraq ne jî bêhêz be. Hezek e , ku yek karê kontrol bike bê. Şaşîtî ya DYA ya herî mezin di şerê heşt salan a Iraq û İranê de, hêzkirina İraqê bû. Ji alî pisporên siyasî ve tê gotin, ku Serokdewletê DYA George Bush jî, vê armancê diparêze.

Di ekranên televizyonên dinyayê de Hêzên Hevkar daxwazên xwe yên avakirina demokrasiyek bingehîn a fereh tînin ziman. Dibêjin, ku "mafên mirovî pêwist e

bêne parastin, sîstemek a adaletê bê danîn." Lê, tiştên ku Kissinger dane diyarkirin, zêdetir nêzîkî aqil e.

Daxuyaniyên Saddam bi daxwazên olî ve tên neqşkirin. Di ekranan de her suretên Saddam ên ji televizyona Bexdayê ve tên belavkirin, tên nîşandan. Saddam her limêj dike, dua ji Xwedê dike. Hemû dinyayê ji dervî xwe û İraqê , bi şeytanî, bê îman û xwînxwar binav dike ( ! ) .

Durutiya her du aliyên di şer de bi awakî vekirî tê kirin. Ji bo ku wê bidin qebûlkirin jî, her du alî hemû îmkanên di destên xwe de dixin jiyanê. Danezanên ragihandinê bi hemû awayî ji Saddam an ji Hêzên Hevkar tên bi kar anîn.

Saddam dibêje, ku "ji bo adaletê, İslamê û Filistînê şer dikim."

Di şerê heşt salan de Saddam bi alîkariya van hêzên, ku îro bi şeytan û bê îman binav dike, şer kir. Bi çekên jehrî li hember welatekî islamî û bi şerîatê tê îdarekirin İran şer da û bi sedhezarên musilmanan bi van çekan hatin qetlkirin. İro Saddam dibêje, ez ji bo İslamê şer dikim.

Bi dehên salan e, dewleta İraqê a faşîst di bin serokatiya Saddam de, hemû neinsanetî û bêadaletî li hember netewê Kurd bikar anîn. İro dibêje - ez ji bo adaletê şer dikim.

Ne tenê İraq, hemû welatên din ên ereban ji bo berjewendiyên xwe pirsa Filistînê bikar tênin. Saddam, dewletek Ereban, Kuweyt dagirkir, gava Dinyayê ev tişt qebûl nekir, dibêje - ez ji bo Filistînê şer dikim.

Saddam dixwaze bi hîs û daxwaziyên dilan bileyze.

Li aliyê din Hêzên Hevkar, ji bo sîstemek nû şer dikin. Sîstemek demokrat û insanî. Lê, wekî di axaftinên Kissinger de jî xuya dike, armanc tiştekî din e. Parastina berjewendiyên xwe di heremê de ye. Lê, ew dibêjin "em ji bo mafên mirovî, demokrasî û rizgariya Kuweytê şer dikin."

Êrîşên bi balafiran ên hêzên Hevkar tevayiya rojê berde-

wam kirin. Li ser bersiva Iraqê agahdarî nîne. Lê, di warê psîkolojîk de Iraq derbasê êrîşekê bû. Pîlotên Hevkaran ên ku ji bal Iraqê ve hatine dîl kirin, ji televizyona Bexdayê ve hatin nîşandan. Wan " poşmaniya xwe " anîn zimên. Gotin, ku şaşîtiyeke mezin bûye, ku êrîş birin ser, welatê " aştîxwaz " ê Iraqê. Herweha Bexda da diyarkirin, ku dê van pîlotan li ciyên stratejîk ên eskerî, yên ku dibin hedefa êrîşan bên bicî kirin. Ev kirin a Iraqê xuya ye tesirek xurt li raya giştî ya Amerîkayê kir. Serokdewletê DYA Bush daxuyanî da, ku "ev kirina Iraqê li dij hemû peymanên navnetewî yên li ser şer re." Xwest, ku Iraq li gor peymana Cenewreyê li dîl an meyzêne. Ev kirin dê tû caran êrîşên me hemberê Iraqê narawestînin - diyarkir.

Hemû welatên di şer de ne û bi şer re pêwendiya wan hene, sansurek fereh danîne ser danezanên ragihandinê û enformasyonên ji herema Kendavê. Ev 4 rojên, ku derbasbûne û di dîroka mirovatiyê de, êrîşên herî dijwar ên balafiran e, çi dibe - baş nayê zanîn. Li ser hejmar a kuştiyan, brîndaran, tû hejmar nehatiye belavkirin. Balafirên ku hatine xistin çendin, ciyên hatine bombardimankirin li kudê ne, nayê zanîn, an agahdariyên gelek cuda tên belavkirin.

**22'ê Çileyê Paşîn**

Iraqê destpêkir petrolên Kuweytê bişewtîne. Hêzên Hevkar destpêkirin bajarê Basrayê bombardiman bikin. Wek tê zanîn navendiya leşkerî ya Iraqê li Basrayê hatibûye bicî kirin. Serokdewletê Suriyê Hafiz El - Esed got : " Bi derketina xwe ji Kuweytê, Saddam dikare Iraqê ji hilweşandinê xelas bike. " Şer bi hemû dijwariya xwe dom dike. Saddam dibêje Hevkaran " Şer bi biryara we destpêkir, lê bi biryara me dê biqede. " Hevkar diyare dixwazin şer rojek berî tewa bikin. Hemû kes di wê baweriyê

de ne, ku dirêjbûna şer dê xesarek mezin ji Hevkaran re bîne.

Rola danezanên ragihandinê di roj û jiyana insanan de, ciyek fereh digrin. Ew kesên bi siyasetê mijul jî nabin, heta derengê şevê li ber televîzyonê temaşeyî agahdariyên ji Xelîc dikin. Bi tesîra li ser psîkolojî û mêjiyan, di şer bi xwe de xwedî peyvek giran dibin - danezanên ragihandinê.

Saddam îro dîsa rakêtên xwe birêkirin ser Israîlê. Li gor agahdariya ji Israîl ve hatî belavkirin, ji rakêtên dawî yên ku ketine, 3 - kes hatine kuştin û 74 brîndar hene.

Her rakêteke Iraqê, ku tê teqandin heyecanek mezin li gel xwe tîne. Her kes dikeve tirsa, ku ew bi jehrên kîmyewî hatine avêtin, an na. Gava dîyar dibe, ku ne kîmyewî ne, rehetiyek belav dibe.

Rewşa me Kurdan çawa ye ? Parçebûn a welatê me û hebûn a beşek ji wan di bin dagîrkirina Iraqê de, zêdeyên Ereban jî dixe hesaban de. Gava mirov pêwendiyên welatên dagîrker ên Kurdistanê jî didê ber çavan, zîncîrek fereh derdikevê xolê. Bi kurtayî Kurd siyaseta xwe li gor vê rewşê divê bikin.

Ev şerê Kendavê bi xwe Kurd anîne ber riyekê, ku îmkanên tercihê li balê gelek kêm in. Bakur û başûrê welatê me meydan a şer e, lê em nikarin dengê xwe jî zêde derxin. Ne li gel şer û ne li dij şer, em dengê xwe nikarin belavbikin. Kurd ji bo bi awakî siyasetek serbixwe dajon bên dîtin, xîretek mezin didin. Carek din pirsa Kurd ji pira Siratê derbas dibe.

**23'ê Çileyê Paşîn**

Li Istanbolê li dijî sê dezgehên Amerîkayê êrîşên bomban pêkhatin. Rêxistina Dev - Sol ( Çepên şoreşger ) xwediyê van êrîşan derket.

Hukimeta Israîlê di civînê de ye. Hukimet dê biryara pozisyona Israîlê pêşberê êrîşên Iraqê yên rakêtan bide. Weke tê zanîn di encamê teqandina raketa Scud a dawî, ser axa Israîlê 3 - kes hatibûn kuştin û 74 kes jî brîndar bûbûn.

Li bakûrê Kurdistanê tevgerek fereh a eskerî tê jiyandin. Tê gotin, ku li heremên nêzîkê tixûbên Iraqê bi hezarên leşkeran hatine bicîh kirin.

Bêdengiya tevgera siyasî ya Kurd li başûrê Kurdistanê dom dike. Gelek insanên ji Kurdistana, ku ji alî Iraqê ve hatiye dagîrkirin, dibêjin ku sedema vî tiştî ew e, Ereb neyin eciz kirin ( ! )

Li başurê Kurdistanê, netewê Kurd bi salan in, şerekî çekdar ê xurt li hemberê Iraqê pêk têne. Her di vê pêvajokê de tevgera Kurd, bi çavek bratî li netewê Ereb temaşe kiriye. Di rewşa herî dijwar de jî ev dîtina xwe ne guherandiye. Wekî numune, bi çendê caran komunîstên Iraqê yên ku ji ber tehda BAAS ê reviyane li ser axa Kurdistanê qebûl kirine. Lê ev pirs jî tê mêjiyê mirov - gelo çend caran Ereban destê dostanî, bratî û hevalbendiyê direjî têkoşîna Kurd kirine ? Bersiv "na" ye ! Nekirine ! Di zêdeyên caran muxalefet a demokrat ( ! ) û çep a Iraqê, piştgiriya hukimeta BAAS li hemberê têkoşîna Kurd kiriye.

Li bajarekî ji yê herî mezin ê Tirkiyê, Edana do alarm hat dan. Tirsek mezin di nav xelkê de peyda bû. Dawî diyar bû, ku tû êrîş nehatine ser bajêr.

Di rapora BBC ya belavkirî de îro çend agahdariyên nû hatin xolê.

- Hêzên Hevkar heta niha zêdeyî 10 - hezar êrîş bi balafiran birine ser Iraqê.

- Ji 700 belafirên Iraqê, ku hene 30 hatine îmhakirin.

- Piraniya balafirgehên Iraqê, dikarin balafir li wan deynin û rabin.

- Di rewşa çekên kîmyewî de, Iraq dikare vî çekî di

kargehên xwe de hîn jî çêbike û di şer de jî bikar bîne.

- Rampayên, ku raketên Scud li ser wan in, gelek hîn ne hatine tesbît kirin.

- Pêwendiyên di navbera hezên leşkerî yên Iraqê di heremên cuda de hîn nehatiye birîn.

**24'ê Çileyê Paşîn**

Wezîrê derve yê Iraqê bi nameyek a ku birêkirî wezareta derve ya Tirkiyê, siyaseta Tirkiyê ya li hemberê Iraqê bi zimanek tuj protesto dike. Mafê, ku Tirkiyê dayî Hêzên Hevkar ku meqerê İncirlikê bikar bînin, T. Azîz bi peyva - şerm binav dike û bi awayî nama xwe ji wezîrê derve yê Tirkiyê, Kurtcebe Alptemoçîn re birêkiriye. Wekî tê bihîstin İranê jî, Tirkiye li ser babet a İncirlikê rexne kiriye. Berî çend rojan, nûneriyeka İranê li ser babetê nerazîbûna xwe bi siyaset a Tirkiyê re anî zimên.

Sefaretên ji Iraqê derketî û danezanên ragihandinê diyarkirin, ku tenêbûna Iraqê li hemberê hêzên xurt ê dinê, hêza berxwedanê ya Iraqiyan geştir dike. Her çend bombardiman li ser Iraqê berdewamin, Erebên Iraqê li gel Saddam cî digrin.

Siyaseta welatên Rojava ya dirû hemberê welatên Asyayê piştgiriya ji bo Saddam xurt dike. Xwepêşandanên ji bo piştgiriya Iraqê, ji Cezayirê heta Bengladêşê dibin.

BBC nûçeyek sansasyonel belavkir. Pîsporên leşkerî yên Sovyetê hîn jî alîkariyê ji bo parastina Iraqê dikin. Ev nûçeya han ji bal Sovyetê ve hate hat înkar kirin. Her weha dîsa BBC got ku, depoyên çekên giran û balafiran di bin erdê de yên Iraqê, ji bal welatên Rojava ve hatine avakirin. Li ser van depoyan weke hate xuyanîkirin, çiyayên ji qumê hatine danîn. Ji wan çiyayan 5 pîstên derke- tina ser erdê hene. Di derdora wan pîstan jî 45 depo hene. Ji bo ku, dijmin şaş bikin di nav wan de depoyên sehte hatine

avakirin. Wekî tê dîtin welatên Rojava niha tiştên ku bi destên xwe ji Iraqê re avakirine nikarin xerab bikin.

Li nêzîkê Batmanê du rakêtên Patrîot ketin. Wekî hate diyarkirin, ew bi şaşî ketine.

Di rojekê de, li Israîlê raketên Patrîot hatin danîn. Piştî dê êrîşên Iraqê yên bi raketên Scud hew hedefên xwe dibînin. Tenê Scudek xwe ji Patrîotan helaskir. Ji ketina wê li gor hinek nûçeyan 3 - kes hatine kuştin û 74 birîndar in. Li gor hinek nûçeyên din hejmara birîndaran 100 e. Danezanên ragihandinê bi suretên kuştî û brîndarên ji Tel Avîvê ve hatin dagirtin. Ewrupiyan destê alîkariyê yekser gihandin Israîlê. Serokwezîrê Elmanya Helmut Kohl milyarek dolar alîkarî gihand Tel Avîvê. Serokdewlet ê DYA G. Bush ev hejmar bilindkir û biryaradana alîkariyek ji 20 milyaran girt. Ev pere hin ji wan ji bo parastin a Israîlê, hin jî, ji bo bicîkirina cihuyên ku ji Sovyetê hatine Israîlê dê bên herc kirin.

**25'ê Çileyê Paşîn**

Gava ku dinyayê bala xwe da Rojhilata Navîn, Gorbaçov bawer dikir, ku dê pirsa Baltikum bê jibîr kirin, ev şaş derket. Problem û pirsgirêkên di vê heremê de rewşa Gorbaçov zêde xerabtir kir. DYA û welatên Rojava ne tenê bi protestoyê, lê bi gavên pratîk jî nerazîbuna xwe bi Sovyetê re anîn zimên. Biryarên ku ji bo pakêtên alîkariya Sovyetê hatibûn girtin, hatin cemidandin. Wezîrê Derve yê Amerîka J. Baker got, ku "hevdîtin a di navbera Bush - Gorbaçov de ku dê di sibatê de pêk bê dibê ku pêk neyê jî."

Nama Tariq Azîz, ku Tirkiye bi neşermbûnê binav dikir, ji aliyê Ankarê ve hîn nehatiye bersivdan. Herweha Tirkiyê nîşan da, ku di sê rewşan de dikare bikeve Iraqê.

- Iran an Suriye ku bikevin Iraqê
- Iraq ku bikeve Tirkiyê

- An ku Kurd dewleta xwe ya serbixwe deynin, dê Tirkiye bikeve erdên Iraqê.

Bi peyvên din Tirkiye hazir - nazir amade bê ji bo van xalên jorîn. Di nav wan de kîjan herî zêde serê Tirkiyê diêşêne ne hevceyê gotinê ye, Kurd baş dizanin.

Li gor danezanên ragihandinê yên Ewropa Rojava, heta niha Iraq tû berxwedan li hemberê Hêzên Hevkar nedaye nîşandan. Wekî tê dîtin Iraqê tû êrîşên berbiçav nebirine ser leşkerên Hevkar, nûçeyên ji heremê tên tû bûyereke weha nedaye dîyar kirin. Scudên Saddam berê xwe didin axa Israîl an Suudî Erebistanê. Îro jî Scudeke ku hatiye teqandin ber bi Israîlê kesek kuştiye û 40 kes jî brîndar bûne. Nûçeyên, ku ji heremê tên xuyanî kirin, raketek ku nayê zanîn ji çi derê ve hatiye teqandin li gundekî li ser çiyayê Cudî ketiye. Gundiyan gotiye, ku her çend wan agahdariya hukimetê tê gihandiye, kes bi vê bûyerê mijul nebûye.

Herweha Saddam dest bi rijandina petrola nav ava Kendavê kir. Bi vî awayî ew dixwaze pêşketina leşkerên Hêzên Hevkar dereng bixe.

Li Beyrutê piştî hevdîtin a muxalefet a Iraqê, biryarên ku li ser van gihiştine hev derketin ronahiyê. Hêzên li Beyrutê hevdîtine ji Kurdan, Şiiyan, Komunîstan û BAAS - baskê muxalif pêk tê.

- Iraq dewletek, ku ji Kurd û Ereban pêk tê be. Hemû mafên mînorîtêtan dê bêne naskirin.

- Dê hukimeteke muweqat, ku bikaribe berpirsiyariya hemû beşên civakê bike bê danîn. Piştî wê hilbejartinên demokratî dê pêk bên.

- Dê hemû mafên demokratî, di nav de serbestiya bawerî û danezanên ragihandinê jî dê bêne naskirin.

- Kesên ku di kampên nefîkirinê ( surgunê ) de tên girtin û hemû kesên reviyayî dervî Iraqê dê bikaribin vegerin. (1, 5 milyon Kurd di kampên nefikirinê de li bakurê Iraqê dijin. Zêdetirî nîv milyon Kurd û Şîî jî berê şerê Iraq û

Iranê yê 1980 - an Iraq terk kiribûn. )
- Di welatekî serbixwe yê Iraqê de mafên Kurdan ên otonomiyê dê bêne naskirin û di bin garantiyê de bin.

**26'ê Çileyê Paşîn**

Kurd, gava piştî jenosîda Helepçeyê navên kargeh û şirketên welatên Rojava belav kirin, ên ku di damezrandina kargehên çekên kîmyewî de alîkariya Iraqê kirine, kesî li wan guhdarî nekir. Celal Talabanî lîsteyek di destên wî de li paytextên welatên Ewropa yên Rojava digeriya û daxwaza rawestandina van şirketên ku alîkariya Sadddam kirine dikir. Di vê listê de navên çend pîsporên leşkerî yên ku alîkariyê vî karê qirêj kirine, welatiyên Sovyetê jî hebûn.

Wezîrê derve yê Elmanya Genscher, ê ku li ser ketina rakêtên Iraqê nav Tel Avîvê hate Israîlê, digot ku "ji alîkariya şirket û kargehên Elmanyayê yên ji bo çekên kimyewî dest dane Iraqê, şerm dike. Kes û şirketên ji bo pêşvebirina teknolojiya çek alîkariya Iraqê kirine em ê bidin dadgeh ê - jî" got Genscher.

Rojnamevanê CNN ê ku ji Bexdayê nûçeyên xwe rêdike, diyarkir ku bombayeke li nêzîkê Bexdayê ket 24 kesên siwîl kuşt. Baweriya ku ji şer gelek siwîlan jiyana xwe wundakirine fereh e, lê Bexda bi xwe agahdariyên weha belav nake.

Radyoya Bexdayê daxuyaniyek balavkir, ku Iraq hêza xwe di dema girîng de dê bikar bînê.

Pentagonê daxuyanî da, ku 24 belafirên Iraqê yên siwîl û leşkerî xwe spartine Iranê. Lê Serokdewlet ê Iranê Rafsancanî nîşan da - dê ev balafir heta dawiya şer li Iranê bêne girtin.

Gelê Iranê xwepêşandanên mezin li hemberî Amerîkayê dike. Xuya dike gelê Iranê ji tewrê hukimeta xwe ya

bêalîbûnê di şer de ne raziye. Îro Rafsancanî yê ku bi nûnerê Hindistan re hevdu dît, "ji bo rawestandina şer divê yek serê xwe bêşênê" got.

Îro li Elmanyayê li bajarê Bonnê 200 hezar kes xwepêşandanek li dij şer bi dar xistin. Herweha li Pakistanê bi hezaran ji bo piştgiriya Saddam meş kirin. Wekî hate belavkirin, yek kes ji aliyê polîs ve hatiye kuştin.

Li Fransayê rojnama Liberation hate bombekirin. Tê gotin, sedema bombekirina rojnamê nivîsên dijî Iraqê bûne.

Li Yunanistanê jî li hember dezgehên Amerîkayê, Brîtanya û Fransayê êrîş pêk hatin.

Tirsa terorîzmê polîsên hemû welatên Ewropayê derbasî alarmê kirin. Parastinek fereh li belafirgeh û cihên stratejîk tê kirin.

Raketên Scud ên Iraqê dom dikin li ser Tel Avîv û Riyadê dikevin. Li Kendavê jî rijandina petrolê dom dike. Qirêjiya deryayê tehdîdek mezin dide ekolojiya heremê. Pîspor dibêjin, ku di her sê saetan de 45 ton petrol diçe deryayê. Ev kirina Iraqê wekî terorîzma ekolojiyê tê binavkirin. Bexda xuyanî kir, ku ew petrolê narijîne, bombardimanên Hevkaran hemberê tankêran dibe sedema vê bûyerê. Qirêjiya petrolê di deryayê 15 km. fireh û 50 km. dirêjî belav bûye. Welatên Ereb ên li ser Kendavê di bin telaşê de ne.

**27'ê Çileyê Paşîn**

Şer ji niha ve "feydeyên" xwe ji gelek kesan re anî. Fanêleyên bi karîkaturên Saddam li Amerîkayê wekî nanê germ têne firotin. Swisreyiyan saetên li ser suret ê raketên Saddam, pêşkeşî bazarê kirin. Pirtûka du rojnamevanên Independent a ingilîzî bi navê " Şerê Saddam " derket, pirtûkxane bi hezaran vê pirtûkê difroşin. Kargeha Ray-

theon a ku raketên Patrîot çêdike, berhema xwe çend qat zêdekir. Gelek welat di nav wan de Suudî Erebistan divê di dorê de bimînin.

Kesên bawerî bi xesara welatên rojava di vî şerî de dikirin, divê baweriya xwe biguherin. Ji ber, ku dê cihên van peran zû bên dagirtin.

Di roja înê de, di civîna hukimeta Enqera de biryar a serbestkirina zimanê Kurdî li Tirkiyê ji bal wezîrê edaletê ve hat qebûl kirin. Wezîrê dewletê Mehmet Yazar ê ku li ser navê hukimetê axaft, dê pirsa weşan a telewizyonê jî bi kurdî hebe ? tû bersiv neda. Ev biryara hukimeta Enqera jiyana siyasî li Tirkiyê şoke kir. Gelo bi vê biryara xwe Tirkiye hesabê çi dike? Pirsa ku ne tenê Kurd, lê piraniya pîsporên siyasî jî dikin ev e. Tiştek, lê bê guman ji alî Enqera ve tê xwestin bê kirin, ew jî piştî şer, cihgirtina Tirkiyê di prosesa " aştiyê " li Rojhilata Navîn e. Pirsa Kurd a ku dibe werê ser masê, da tû serêşiya nedê Enqerayê, Tirkiye bi çend gavên "radîkal" dixwazê çareser bike.

İran di warê diplomasî de derbasî çalakiyên xurt bû. Tehran amadebûna pêşkeşkirina planekî aştiyê dike.

Li bakurê Kurdistanê di heremên nêzîkê başurê Kurdistanê bombabarînên meçhul domdikin bikevin. Li gor agahdariyên ANK ( Ajansa Nûçeyên Kurdistanê ) heta niha 11 bomba di van hereman de ketine.

Li gor nûçeyên di danezanên ragihandinê de, heta niha 200 hezar kesên ji şer reviyayî yên Iraqê ji ber nexweşiya iklîmê li Dîanayê 20 km. dûrê " sînorê " Tirkiyê man e. 346 kesên sînor derbaskirine 179 ji wan li Tatwanê, 32 kes jî li Çolemergê hatine bicih kirin. 20 hezar çadirên hatine danîn ji bal YN û Tirkiyê ve li hêviya "mêvanên " xwe yên Kurd û Ereb ji Iraqê ne. Li aliyê dinli kampên Kurdan ên ku ji jenosîdên Iraqê di sala 1988'an reviyabûn û hatibûn Tirkiyê, rewşa awerte ( orfî îdare) hatiye bi cîh kirin. Hemû ketin û derketinên ji kampan hatine qedexe-

kirin. Tenê nexweşên giran izna çûna nexweşxanê digrin.

Enqerayê daxuyanî da, ku li Iraqê Kurd dewletek serbi xwe deynin, dê leşkerên Tirkiyê bikevin Iraqê û rê li ber vî tiştî bigrin.

Di vê demê de jî, hukimet a Enqerayê pêşniyara qanunek nû ya ku dê zimanê kurdî serbest bike ji bo erêkirinê dide parlamentoya Tirkiyê.

Li Enqerayê îro du bomba li şirketa Air France û ya Riyên Hewayê ya Suudî Erebistan de hatin teqandin. Kes nehat kuştin an brîndar kirin.

Di rojnama " Hurriyet " de agahdariyek a ku, doktorên Tirk naxwazin li Kurdistanê karbikin hate belavkirin.

Dîsa îro, hukimet a Pakistanê 11 hezar leşker dane Hêzên Hevkar daxwaza rawestana bombardimanên giran li hemberê Iraqê kir. Diyar e, xwestina gel tesîra xwe hin û hin li hukimeta Pakistanê jî dike. Wek tê zanîn li Pakistanê bi hezarên insan her roj xwepêşandanên piştgiriyê ji bo Saddam dikin.

Bombardimanên Hêzên Hevkar hemberê leşkerên erdê yê Iraqê, ku Kuweytê di destê xwe de digrin hatin zêde kirin. Navendiya leşkerî ya Iraqê ku pêwendiya hemû hêzên Iraqê di şer de dike, li bajarê Basrayê şev û roj di bin bombardimanên Hevkaran de ye. Agahdariyên ji Amerîkayê tên xuyanî dikin, ku ji nêzîk ve şerê erdê jî dibê ku destpêbike, ji Brîtanya jî tê gotin, ku ew dê di sibatê de destpêbike. Planên şerê erdê tê gotin di navde Iraq jî ketiye destê hemû dewletên beşdar di şerê Xelîc de.

Heta îro çend insanên siwîl li Iraqê jiyana xwe windakirine nayê zanîn. Telewizyona Iraqê di weşanên xwe de her tahrîbatên ji bombardimanên Hevkaran hatine kirin nîşan dide. Lê, li ser kuştinên van bombardimanan tû hejmaran nade.

**28 'ê Çileyê Paşîn**

Nûçeya, ku zimanê kurdî li Tirkiyê dê bê serbestkirin, jiyana siyasî li Tirkiyê tevlîhev kir. Ji dîktatorê "berê" Kenan Ewren heta mirovê di sikakê de dîtina xwe li ser vê babetê tînin zimên. Serokkomarê Tirkiyê Turgut Ozal ê ku tê gotin - ji Komîteya Parastina Netewî ( Milli Güvenlik Kurulu ) soza rakirina qanuna 2932'an a axaftina kurdî qedexe dike girtiye, li ser vê babetê dîtinên xwe wusa têne zimên.

" İmzêyên me di bin peymanan de heye. Ji ber vê çendê em pewiste xwe amadeyî bûyerên piştî şerê Kendavê bikin. Gava pirsa Kurd hate rojevê, divê em bêhezirî neyin girtin." (Rojnama "Hürriyet" 27 ê çilêya paşîn )

Piştî rakirina qanuna 2932-an, dê ev maf bikevin destên Kurdan.

- Dê zimanê kurdî bê serbestkirin.

- Di civîn, xwepêşandan û meşan de pankart, lewha û afîş dê bi kurdî serbestbin.

- Çapkirina pirtûkan bi kurdî dê bê serbestkirin. Di weşandana kasêtan, sêlikan û di warê çapemenî de dê kurdî serbest be. ( Rojnama "Hürriyet" 24'ê Çilêya Paşîn )

Gava ku Dinya bi Rojhilata Navîn ve mijul dibe, li gelek cihên din têkoşîn û jiyana germ dom dike. Li Afrîka Başûr, li Yugoslavyayê, li welatên Baltik, li Somalyayê, ji bo daxwaz û berjewendiyên cuda şerên germ têne dan. Serokê Somalyayê Muhamed Siad Barre yê ku ji 21 salan ve ev welat îdare dikir, ji destên gerîllayên ku li hemberê wî şer dikin û payîtehta welat Mogadishu bidest xistin, bi zorê xwe xelas kir. Şerê navwelat ê ku ji sala nû ve dijwartir bû, bi reva Siad Bare ve derbasî rewşek nû bû.

Piştî Hindistan û Pakistanê, musilmanan li Tirkiyê de jî dengê xwe bilind kirin. Her wekî rojnama "Hürriyet" a ji 27'ê çilêya paşîn belav dike, piştî limêja înê, bi hezarên musilman derketina sikakan. Di encamên van

xwepêşandanan de 1-kes hatiye kuştin, 7-kes hatine brîndarkirin û 113- kes jî hatine girtin.

Musilmanên ku li Batmanê, Bîngolê û Tatwanê derketina sikakan duruşmeyên ( slogan ) "Bimre Amerîka" û "Bimre İsraîl" diqîrin. Di vê rojê bi xwe de li Istanbolê, Enqerayê û Kayseriyê jî bi hezarên musilman peyayî sikakan bûne û xwepêşandan pêk anîne. Musilmanên, ku gava bi hezarên zarokên Kurd ên musilman di bin bombayên kîmyewî yên Saddam de şehîd ketin, qet dengên xwe dernexistin, niha xuya ye, gelek aktîv û çalak bûne ( ! )

**29'ê Çileyê Paşîn**

Tevayiya weşanên welatên Rojava bombeya, ku do Saddam teqand diaxafin. Lê, ev bombe ne Scudeke ku kete ser axa Suudî Erebistan an İsraîlê ye. Ev bombe hevpeyvina Saddam bi rojnamevanê CNN li Bexdayê, Peter Arnold re ye. Pirsa ku tevayiya dinyayê meraq dikir, Arnold dipirsî :

P. Arnett - Gava dor hate şerê erdê hûn ê çekên kîmyewî bi kar bînin an na ?

Saddam - Çi çek li hember me bêne bikaranîn, em ê weke wan bersivê bidin.

P. Arnett - Hevkaran soz dan, ku çekên kîmyewî bikar neynin. Gelo hun dixwazin bibêjin ku hun jî bikar nayênin ?

Saddam - Min ne xwest ez wusa bêjim. Ez dibêjim, ku çi çek li hember me bêne bikaranîn, ên ku bi giraniyeke wekî wan bersivê bidin em ê bikar bînin.

Bi vî awayî Saddam vekirî digot ku, ew rakêtên hatine teqandinê hemberê İsraîlê û Suudî Erebistanê yên ku bi serikên kîmyewî dibe bêne lihevhatinê, dikarin xesarên gelek mezin bidin. Eger ew bikevin rewşek xetar de, dê bê ku zêde li ser bifikire van çekan bixê meydana şer . Sadam vî tiştî vekirî digot. Heta niha jî kirinên wî didin xuya

kirin, ku ew tiştên dibêje, dikê jî.

Saddam got, ez ji Kuweytê dernakevim, derneket ! Her çend li hemberê wî, şerê balafiran û rakêtan yê herî dijwar jî tê kirin, ew ji gotina xwe venegeriyaye. Got, ez ê İsraîlê bombe bikim û bombe kir ! Ez ê Suudî Erebistanê bombe bikim, got û dîsa ya xwe kir ! Gava ez bikevim rewşek dijwar ez ê petrolê bişewtînim - got Saddam û petrol jî şewitand ! Tiştên ku gotine, Saddam heta niha kiriye.

**30' ê Çileyê Paşîn**

Hevpeyvina Saddam ê ku tiştên dibêje dike, bi rojnamevanê CNN Peter Arnett re, di ya ku got, ez dikarim çekên kîmyewî jî di şer de bikar bînim, weke bombeyekê tesîra xwe li Amerîkayê û Hêzên Hevkar kir. Bi vî awayî qisakirinên, gelo dê Saddam di şer de dest bavêje çekên kîmyewî jî qediyan. Pîsporên şer jî, ji pirsên rojnamevanan li ber kamerayên telewizyonan - bê dê Saddam çekên kîmyewî bikar bîne an na ? xelasbûn.

Bi dehan belafirên şer ên Iraqê domdikin, ku li İranê deynin. Ev babet niha di rojeva hemû danezanên ragihandinê, navendiyên leşkerî û parastinan de babeta yekem e. CIA ya bi nav jî li bersiva vê bûyerê digere. Pentagon di mijûlbûna vê pirsê de wekî, ku şer bi xwe jibîr kiriye. Li gor gelekan peymanek bi dizî di nav Iraq û İranê de heye, li gor hineke din jî van balafiran ji şer reviyane. Tê gotin, Serokkomarê İranê Rafsancanî daxuyanî daye, ku heta dawiya şer ev belafir li İranê dê girtî û di bin destên İranê de bimînin. Lê, dîsa jî şik her berdewamin. Ev belafir ên ku hejmara wan ji 100'î zêdetire, ku dibe rojekê di şer de bêne bikaranîn, pirseke kûr xistiye serê Hevkaran.

Özal di warê "piştgiriya" Kurdan de gavak din avêt. Di rojnameyên Tirkan de bi tîpên mezin, mirov vê nûçeya

balkêş dixwêne - " Di bin garantoriya Tirkiyê, Îran û Iraqê de bere dewletek federal di navbera Ereb, Kurd û Tirkan de bê danîn." Wekî xwediyê "zarokek sêwî" derkeve, diyare Tirkiye dixwaze "xwediyê " me derkeve.

Li Qesra Spî ya Waşîngtonê, wezîrên derve yên Amerîkayê û Sovyetê daxuyanî dan, ku Iraq hêzên xwe ji Kuweytê vekşîne, ji bo çareserkirina Pirsa Filistînê çi ji destên wan were dê bikin.

Herweha li gelek civînan, polemîk û nivîsên di weşanan de, li ser guharandinên di herema Rojhilata Navîn de navên Kurdan jî destpêkir bê rojevê. Gelek pîsporên siyasî di axaftinên xwe de dîyar dikin, ku li Rojhilata Navîn ne tenê pirsa Filistîn herweha Pirsa Kurd jî heye û ew jî divê bê çareserkirin.

Çavkaniyên Kurd ji başûrê Kurdistan diyardikin, ku di nav Tevgera Kurd li ser rawestana koçkirinan û çareserkirina Pirsa Kurd de lihevdukirinek hatiye pêk anîn. Bê çareserkirina Pirsa Kurd li Rojhilata Navîn tû caran aştî nayê - daxuyaniyên wusa ji başurê Kurdistan ve digihên dinyayê.

Saddam dixwaze berê şer bide rewşek wusa, ku şer di navbera Musilman û Gawuran de ye. Ji bo rûyek " rastiyê " jî bide vê raman a xwe, dixwaze Îsraîlê bikşêne nav şer. Li ser jî dixwaze Îran a ku 8 salan şer pê re kir, di şerê Îslam û Gawuran de li gel xwe bibîne. Ji bo vê yekê jî gazî Îranê dike, ku piştgiriya Iraqê bike. Bexda qîr dide - bajarê şiîyan li Iraqê Necef û Kerbela ji alî Hevkaran ve hatin bombardiman kirin. Bi rastî jî ev her du bajar ên ku Hazretî Elî li wir hat qetlkirin, ji bal Hevkaran ve hatin bombekirin. Herweha di nav Filihtiyê û Islamê de ji berê ve dijminatiyek dom dike û di roja me de jî di rengên cuda de her berdewam e. Lê, ev şer çend şerê Îslam û Gawuran e, şikên mezin li ser hene. Berî her tiştî partiya BAAS a Saddam, dibêje ku programek sosyalîstî heye, ew

îdeolojî jî, ji bal "gawuran" ve hatiye danîn. Her çend BAAS ji wan dîtinan gelek dûre jî, lê dibêje ku ew parti yek sosyalîst e. Herweha vê partiyê bi taybetî di dema Brejnev de ji alî Sovyetê alîkariyek mezin dît. Piraniya çekên Iraqê ji Sovyetê ve dihatin. Raketên Scud bi xwe, yên ku niha herî zêde li ser wan tê axaftin û di destên Iraqê de ne, dîsa malên Sovyetî ne. Iraq wekî dewlet bixwe berhema gawuran e. Ne ew tenê jî gelek welatên heremê, dîsa berhema gawuran e, bi taybetî jî yên İngilîziyan. Tê zanîn di nav welatên Ereban bixwe de, yên ku rizgariya xwe bi riya têkoşîn û şerê rizgariyê girtine, gelek hindik in. Di nav wan de jî navê Iraqê nîne. Iraq jî wekî Kuweytê dewletek berhema İngilîzan e.

Fanatîzma olî (ya dîn) piştî numûneya İranê di destên welatên heremê de bû aletek girîng. Lê, diyar e ew ê nikaribe Iraqê xelas bike.

Çavkaniyên Fransî nîşan dikin, ku Tirkiye daxwaza heremek otonom a Kurdan li Iraqê û Tirkiyê bête danîn û ew girêdayê Ankarê be.

Serokkomarê DYA, George Bush do daxuyanî da, ku daxwaza wan "perçekirina Iraqê nîne. Wî got, piştî şer em dixwazin Iraqekê bibînin a ku ji dewlemendiyên wê, dê welatên heremê û yên cîranê Iraqê feydê jê bibînin.

Rojnamevanên Misirê, siyaseta dewleta xwe girêdayî şer protesto kirin. Ew an di ber avayiya rojnamevanên Qahîrê de di civîna xwe ya protestoyê de, rexneya hukimeta xwe li ser pirsa sansurê û serxwebûna weşanan anîn zimên. Serokên welatê me dixwazin tenê weşanên, ku zerarên Hevkaran ku dane xelkê siwîl ê Iraqê veşêrin, bibînin. Ew naxwazin weşanên rastiya şer binivîsin, bibînin. Wekî din niha di welatê me de li hember şer wî muxalefetek mezin hebane, lê hukimet naxwaze muxalefet li ser vê babetê hebe - gotin, rojnamevanên Misirî.

Vê şevê di navbera hêzên Iraqê yên ku sînorên Suudî

Erebîstanê derbaskirin û Hevkaran de şerê ku derket, 8 leşkerên Amerîkayê hatin kûştin. Vê bûyerê di navbera Hevkaran de tesîrek hişk kir.

**31'ê Çileyê Paşîn**

Di vê roja dawî ya mehê de, ji alî pîsporan ve tê gotin, ku di nêzîk de dê şerê erdê dest pê bike. Ketina hêzên Iraqiyan nav bajarê Kayfa, yê Suudî Erebistanê hemû kes şaş kiriye. Heta niha jî leşkerên DYA û yên Suudî nekarîbûne Iraqiyan ji Kayfa derxin.

Li Enqerayê, generalê teqawutê Hulusî Sayın, li ber mala xwe hate kuştin. Li cihê bûyerê belavokek a Rêxistina Rizgariya Kurdistan hate dîtin, lê rêxistina çep a Tirkan, Dev-Sol ev bûyer girt ser xwe.

Tê gotin, ku li bakûrê Kurdistanê tenê 8 hezar maskeyên gazê hatine belavkirin. Bi peyvên din, ku şerek kîmyewî dest pê bike, Kurd dîsa bê parastin in. Herweha ji bo gel, tû agahdarî jî li ser gazên kîmyewî nehatiye dan.

Li gor agahdariyên tên belavkirin, ji do ve Iraqê, rampayên fuzeyên xwe ber bi sînorê Tirkiyê ve jî rêkirin. Herweha Tirkiyê jî hejmara hêzên xwe yên leşkerî li ser sînora Iraqê zêdekir. Li gor çavkaniyên ji heremê her dû dewlet jî amadebûnan pêşberî hevudû ferehtir dikin.

Hejmara belafirên Iraqî yên ku li Îranê dideynin, ji 200 - an zêdetir bû. Lê, hîn jî ev pirsgirek nehatiye vekirin û şaşbûna Rojava dom dike. Weşan û rojnameyan Tirkan dibêjin, ku peymanek dizî di navbera her dû dewletan de heye. Li gor wê peymanê, piştî şer herem di navbera Iraq ê Îranê de dê bê par kirin. Îran dê dest deyne ser Bahreyn û Emîratên Yekbûyî yên Erebî, Iraq jî dê bibe xwediyê Kuweyt û Suudî Erebistanê.

Li ser sînorên Lubnan û Îsraîlê jî teqandina rakêtan her berdewame. Li hember raketên Katyuşa yên Filistîniyan,

raketên Israîliyan jî, li ser kampên Filistîniyan tên teqandin.

Li gor agahdariyên cuda, heta niha di navbera 4 û 12-an de gemiyên şerî yên Iraqê hatine îmhakirin.

Di aliyên din de, di navbera pisporên siyasî, felsefî, leşkerî û olî de munaqeşeyên fereh li ser şer tênê kirin. Hin ji wan şerê îroyîn bi Şerê Cîhanê yê Duwem re tênin ber hev. Di navbera Saddam û Hîtler de li ser tiştên wek hev radiwestin. Herweha Hevkaran bi yên wê demê re dîsa dideynin yek rêzê. Wek tê zanîn, Di Şerê Cihanê yê Duwem de Hevkaran demek dirêj wekî temaşekaran li êrîşên Hîtler li hemberê Yekîtiya Sovyet meyze kiribûn. Çawa tenê wekî temaşekaran li êrîşên Iraqê hemberê Iranê û şerê 8 - salî di navbera wan de meyze kirin. Komunistî dijminê Hevkaran bû û Hîtler li dij wan şer dikir. Lê piştî demekê derket ku daxwaza Hîtler ne tenê dijmintiya komunîzmê ye, wî xwest tevayiya Ewropayê bixe bin destên xwe. Erîşan dibe ser Fransayê, ser Ingilîstanê, ser Belçîkayê, ser hemû derên Ewropa...Çawa ku piştî şerê Iraq - Iranê, Bexdayê berê xwe da Kuweytê. Hîtler gava berê xwe da welatên Rojava, hingî eniyek di navbera Sovyetê û welatên Rojava de hate danîn û ku bi navê Hevkaran hate binavkirin. Hinek pispor ji vê dîtinê ve derdikevin rê û dibêjin li hember Iraqê cî girtina gelek dewletan, wekî Hevkaran gavek pêşverû ye. Yên li hember vê dîtinê jî dibêjin, na ! Sadam li hember împeryalîstan şer dike, ev şerekî dijî împeryalîzmê ye - divê mirov di gel Saddam de cî bigre.

Dîtinên cuda li ser şer ne tenê ev her dû dîtinên jorin jî. Kesên ku vî şerî - şerê Islam û Filehtiyê binav dikin, li Rojhilat û Rojava jî hene. Piraniya xwediyê vê dîtinê ji nav hêzên olî tên.

**1'ê Sibatê**

Konseya Wezîran a Tirkiyê, do piştî civînek a 4 - 5 saetan qanunên 141 û 142 yên ku li ser sucên ramanî bûn û herweha qanuna 163 - an a ku sucê li dij laîkiyetê bû, ji bo guharandinê biryar girt. Serberstkirina zimanê kurdî ji xwe, berê hatibû xuyanî kirin. Ev guharandinên, ku hatin pêşkeş kirin, piştî qebûlkirinê, dê li Tirkiyê mirov bikare serberst dîtinên xwe biparêze. Lê bê ku ji bo wê tehdayê bikar bîne, li ser navê hukimeta Tirkiyê Mehmet Yazar, daxuyanî da ku qanunên texdayê ceza dikin dê dom bikin bên bikaranîn.

Bi vî awayî dewlet darê tehdayê di deste xwe de her dihêle.

Bajarê biçûk ê Suudî Erebistanê Kayfa, yê ku do ji bal lraqê ve hate girtin, li gor agahdariyên ji Hevkaran ve hatin belavkirin, bi paş ve hate girtin. Lê radyoya Bexdayê dibêje, ku Kayfa hîn di destê hêzên lraqê de ye.

Li Cezayirê bi deh hezaran kes, duruşmayên ( slogan ) islamî avêtin û piştgiriya xwe ji bo Iraqê dan nîşandan. Wan xwest, ku şerê islamî li hemberê Rojava dest pê bike.

Herweha İran bi Cezayir, Yemen û Fransayê re planek aştiyê amade dikin. Alîkar serokwezîrê Iraqê Sadun Hammadî jî li İranê ye û bi planê aştiyê re mijûl dibe. Lê kes ne li hêviyê ye, ku niha di navbera Hevkaran û Iraqê de tû aştî pêk bê.

Wek di rojnameyên Tirkiyê de tê nivîsandin, 8 - hezar leşkerên Amerîkayê li İncirlikê hatin daxistin. Tê gotin, ku ew dê di şerê erdî hemberê Iraqê de bêne bikaranîn.

Bexdayê dîsa musaadeya ketina çend rojnamevanan nav Iraqê da. Wek tê zanîn di 20 - ê çileya paşîn de Iraqê xwestibû hemû rojnamevanên biyanî ji nav sînorê wê derkevin. Wek tê fikir kirin, daxwaza Iraqê nîşandana raya giştî, ku çawa xelkê siwîl ê Iraqê ji şer zerar dîtiye ye.

Bi ketina rojnamevanan nav Iraqê, êrîşên Hevkaran ên

bi balafiran jî tên ekranên telewizyonan. Bi taybetî jî wêneyên zarokan tên ekranên telewizyonan. Doktorek ê ku digot, ku li ser navê zarokan qisa dike, wusa qisa dikir : " Zarokên me natirsin. Gava Hevkar bomban davêjin, ew derdikevin derve. Dixwazin bibêjin, em ji bombayên we natirsin."

Bexdayê îro bi devê resmî daxuyanî da, ku hêzên wan ji Kayfayê paş vekşiyane.

Qralê Urdunê Husyn, ji bal Amerîkayê ve hate rexnekirin ku embargoya ticarî li hemberê Iraqê xera kiriye. Tê gotin, ku wî ji Iraqê petrol kiriye. Rewşa Huseyn ne baş diyar dibe. Ew ji aliyekî ve dixwaze dilê Iraqê û Filistîniyan xweş bigre, ji aliyê din ve jî peywendiyên wî bi welatên Rojava re xurt bimînin. Lê, di vê lîstoka xwe de, dibe ku ew bi xwe di bin kevir de bimîne.

**2'ê Sibatê**

İro ji aliyê Federasyona Komelayên Karkerên Tirk ve li Stockholmê panelek li ser şerê Kendavê hate bidarxistin. Ji partiyên siyasî yên Tirkan ve, ji Partiya Sosyal Demokrat a Gelerî ( SHP ) Rıza Yılmaz, ji Partiya Ked a Gelerî ( HEP ) İbrahîm Aksoy, ji Partiya Riya Rast ( DYP ) Köksal Toptan, ji Partiya Mîllî ya Refahê ( MRP ) Şevket Kazan û Sekreterê Giştî yê Komelaya Mafên Mirovî rojnamevan Hasan Uysal beşdarî kiribûn.

Ji Partiya Niştiman ( ANAP ) her çend dawetî jî ji bo wan çûye, kes nehatibû. Axaftinên beşdaran mirov dikare, bi yek peyvê binivîse : Ji şer re na ! Ev şer şerekî bêheqê û divê Tirkiyê nekeviyê. Di nav wan de Şevket Kazan got, ku ev şerekî di navbera dinya İslamî û ya Filehî de ye. Cihê her musilmanekî li gel Islamiyetê ye. Her çend şaşîtiyê wî hebin jî Saddam bûye serokê Islamê - got Kazan. Û ev serok îro li dij siyonîzmê şer dike.

Îro her wekî di rojnameya swêdî " Dagens Nyheter " de jî dinivîsine, Neo - Nazîstên Elmanyayê, bi hêzek ji 500 kesan dixwazin di " şerê rizgariyê " yên Ereban de hemberê hêzên super cihê xwe bigirin. Neo - nazîstek bi navê Michaek Kühnen, ê ku navên kesên dixwaze here şer li gel Saddam dinivîse, dibêje ku Saddam berhema (eser ) ku Hitler hiştiye dixwaze biqedîne.

Islamiyên fanatîk li Amerîkayê di bin serokatiya Louis Farrakhans de, daxuyanî dan, ku di gel Saddam in. Dîsa faşîstên Fransayê yê di Eniya Netewî de ne, li dij biryarên YN hemberê Iraqê protesto kirin.

Heta îro jî dihat zanîn faşîstên Ingilîztanê, pêwendiyên wan bi fanatîk Islamiyên Îranê û Libya re hebûn. Wekî numûne rêxistinek a Faşîst Eniya Netewî ya Fransayê ji Libyayê alîkariya aborî digirt. Di sala 1988 - an de di rojnameya xwe " Hevkariya Nu " de wekî wêneyê qepakê resmên Kaddafî, Xumeynî û fanatîk islamiyê ji Amerîkayê Louis Farrakhans û di paş wan de di siyê de sembola Neo - Nazîstên Ingilîstanê Heça Kelt cîh girti bû.

**3 'ê Sibatê**

Rojnamevanê Tirk Hasan Uysal, diyar kir ku di destên wî de îspat hene - bombayên ketine ser çiyayên Cudî yê ne bi şaşîtî ketine. Li Rojhilat û Bakûrê Rojhilata Tirkiyê de terorek fereh tê bikar anîn - got Uysal, lê çi dokumen di destê wî de hene, ne da dîyar kirin.

Iraq teqandina raketên Scud û Hevkar jî bombardimanên xwe dom dikin.

Gerîllayên Filistînî, li başûrê Lubnanê heremên ewletiyê yê di bin destê Îsraîlê de şer germ kirine. Israîl, Rêxistina Rizgariya Filistînê ( PLO ) suc dike, ku eniyek nû di şer de vekiriye. Ger wusa dombike jî got, ku dê bersiveke tûj û dijwar bide. Yaser Arafat ev tişt qebul nekirin.

Hevkar hêzên Iraqê li Kuweytê bombardiman dikin.

Rojnameya Teşrîn a ku di bin destê dewleta Suriye de, rexneyek mezin li welatên Rojava kir, ku di bin tehdîda Iraqê de alîkariyek fereh dide Israîlê.

Tirkiye ya ku sefareta xwe di Bexdayê vala kir, dixwaze Bexda jî dîplomatên xwe ji Enqerayê bikşîne.

Di şer de bi sedhezaran leşker li hemberî hev in. Bi milyonan mirov di heremên şer de dijin. Gelê Ereb ê Iraqê dibe şahidê bombardimanên herî fereh. Di weşanên Rojava de niha di manşetên rojnaman de li ser balafirên B - 52 tê nivîsandin. Wêneyên wan tên çapkirin.

Ev balafirên, ku di salên destpêka 50 - an de hatin çêkirin, bi 4 atom bombeyan û bi firandinek ji 1 100 mîlan re hatin amadekirin. Bi peyvên din wan bi bombeyên xwe yên atomî dikarîbûn bigihin Sovyetê. Ev belafir bi tenê di ordiya DYA de hene. Heta niha ne firotine tû dewleteke bîyanî. Modela dawî yê van balafiran B - 52 G ye. Ên di şer de jî tên bikaranîn evan in. Bomba di yek carî de tên berdan. Bombeyên tên avêtin di meydanek bi dirêjiya 1 an 1,5 km. de û di ferehiyek ji 800 metre de diteqin. Berpirsiyarek leşkerî yên DYA, ku ne xwestiye navê xwe diyar bike, nîşan da ku 50 belafirên B - 52'an di êrîşên li hemberê Iraqê de hatine bi kar anîn. B - 52 ji meqerên leşkerî li Ingilîstanê, Diego Garcia di Okyanusa Hind de û Ispanyayê bi rê dikevin. Tê gotin jî hin ji wan ji Suudî Erebistanê ve tên rakirin. Iro Pentagonê daxuyaniyek belavkir, ku yek B - 52 li ser Okyanusa Hind ketiye, 3 pîlot wenda ne û 3 - an jî xwe xelas kiriye. Ji dervî wê, piştî teqandinên şaş xuya bû, ku Hevkaran 7 leşkerên xwe yên Amerîkayî kuştine.

Serokleşkerê Hevkaran dîyarkir, ku di roja çarşemî ya çûyî de, 28 belafirên B - 52 di rojek de 470 ton bomba avêtine ser axa Iraqê û hêzên Iraqê di Kuweytê de.

Iran, Cezayir, Yemen, Fransa, Kuba, Swêd û 6 welatên Afrîkayê ji bo rawestandina şer çend pêşniyar amade

kirine. Nûnerê Yemenê di YN de xuyanî kir, ku Hevkaran armanca xwe ya rizgariya Kuweytê ji zû ve qedandine, ew dixwazin Iraqê xerab bikin. Çend welatên Afrîkayê jî dibêjin, bere Hevkar şer rawestênin, bi vî awayî îmkanan bidin Saddam da hêzên xwe ji Kuweytê vekşîne. Gava Hevkaran leşkerên xwe ji heremê derxistin, wekî hêza aştiyê Hêzek Ereban dikare bikeve cihên wan, wusa jî pêşniyara xwe formule dikin.

Yemen û Kuba dixwazin, li ser şer di YN de munaqeşek vekirî bibe.

Swêd û Îran daxwaza şerrawestanê kirin.

Lê heta niha pêşniyarên ji bo rawestana şer tên kirin, hîn berhemên xwe nedane, şer ji alî her du eniyan ve jî berdewam e.

**4'ê Sibatê**

Wezîrê Parastinê yê DYA, dîyar kir, ku Îsraîl bibe hedefa çekên kîmyewî yên Iraqê ew jî di şer de dê çekên nekonvencional bikar bîne, bi gotinê din bi bomba atomî dê bersiva Iraqê bide.

Herweha Ingilîstanê li gor rojnameya " Sunday Times " ji hêzên xwe xwest ku xwe amade bikin, çawa mirov dikare ji çekên kîmyewî xwe biparêze. Tê gotin, ku Saddam emrê bikaranîna çekên kîmyewî daye hêzên xwe.

Gava danezanên ragihandinê li ser pirsa gelo dê çekên atomî û kîmyewì bikar bên dirawestin, gazên sinîrê li ser Iraqê destpêkirin belavbibin. Li gor agahdariyên di rojnaman de cî digrin, ew jî berhema ji çekên kîmyewî yên Iraqê ye, ku niha ji alî Hevkaran ve tên bombakirin.

Li Fas'ê nêzîkî 300 - hezaran ji bo piştgiriya Saddam xwepêşandanek mezin bidar xistin.

Li Pakistanê 110 kesan ji Camîat Ulema - î Pakistan, ji bo li gel Iraqê di şer cîh bigirin, daxwazî nîşandan. Lê, sefîrê Îranê li Pakistanê dîyar kir, ku ew ê musaade ya der-

basbûna wan a ji axa Îranê nedin.

Rewşa Iraqê û ya heremê piştî şer ji gelek aliyan ve dixe heyecanê. Serokkomarê Tirkiyê T. Özal xwest ku li ser vê babetê Tirkiye amade ye, xwedîtiya malê ya konferansek wusa bike. Dê herweha diyarkir, ku Tirkiye pêwist e li ser masê xwedî giranî be. Got, ku divê pirsa Filistînê çareser be, pirsgirekên aborî yên heremê çareser bibin, çareseriyek ji pirsgireka av'ê re bê dîtîn. Lê, Özal ê ku xwest zimanê kurdî serbest bibe, li ser çareserkirina pirsa netewî ya Kurd tiştek negot.

**5'ê Sibatê**

Li Tirkiyê, berî çend rojan zimanê kurdî hate serbestkirin. Lê xuya ye vê babetê serên hukimeta Tirk xistiye sergêjiyeke mezin. Ji ber ku hîn çend roj derbasnebûne, ji Enqerayê ve niha jî daxuyanîyên qedexekirina kurdî derdikevin.

Çend rojnameyên Tirkiyê, îro bersivên Wezîrê Adaletê Oltan Sungurlu çap dikin ku dibêje :

*" Di hemû dezgehên resmî yên Tirkiyê de , zimanek tenê tê axaftin, ew jî Tirkî ye. Di zimanê nivîsî yê şirketên şexsî de jî, ew qanunên heta îro derbas dibin. Di dadgehan de ji dervî Tirkî , zimanek din naye bikaranîn. Parastinên bi zimanên din, bi rê ya werger dê bibin. Di cihên mehelî de, mirov dê bikare bi zimanê xwe yê zikmakî bipeyve. Di dawet û govendan de û di şahiyên heremî de, dê mirov bikare bi zimanê kurdî yan yekî din stranan bibêje. Bi wan zimanan kaset jî dibe bên dagirtin û weşandin. Di fîlman de stran bi wan zimanan dibe bên gotin."*

Kesê di cihên resmî de zimanê kurdî bikar bêne, ji 3 mehan heta 2 - salan dê cezayê hepsê bibîne. Ew kes dibe memur be û dibe hemwelatiyek basît be.

Gava mirov van tiştan dixwîne, ji xwe pirs dike - ev

zimanê kurdî serbest an qedexe dikin.

Şer bi xwe re gelek îmkanên bazarê ji hin fîrmayan re vekir, gelek kes jî şansên xwe ji niha ve derxistin. Wekî numûne rojnamevanê CNN ê ku bi Saddam re hevpeyvin çêkir û herweha ji Bexdayê nûçeyên şer dan telewizyona CNN, heta dawiya jiyana xwe dê di dewlemendiyê de bije. Bi dehên fîrmayên reklaman dixwazin wî di reklamên xwe de bi kar bînin.

Israîlê têra xwe alîkarî ji Rojava girt. Bi milyaran dolar deynên Misirê hatin xirab kirin, bi ser de alîkariya maddî jî, jê re hate nîşandan. Tirkiye jî para xwe, ji "kirinên" xwe di şer de dibîne.

Li Urdunê fîrmayekê, di ser de suretên Saddam saet, rozet, medalyon û hwd. pêşkeşî bazarê kirin. Wekî hate zanîn Urdunî û Filistînî ji bo ku fraxek bi wêneyê " serokereban " bikirin, bi saetan di dorê de dimînin.

Iraq bi her awayî xwe nêzîkî Iranê dike. Do alîkar Serokwezîrê Iraqê Sadun Hammadî di dîtina xwe bi Serokkomarê Iranê Rafsancanî re, dîyar kir, ku Bexda li ser pirsa tezmînatê, ji bo şerê 8 salan amadeye bi Tehranê re rûne. Di civîna xwe de, ji dervî wê Hammadî nîşan da, ku ew amade ne da Şiî û Kurd jî di îdareya Iraqê de cî bigrin. Her weha wî ji Rafsancanî xwest, ku ew belafirên Iraqê ên reviyane Iranê musaadeya vegera wan bê dan. Bersiva Rafsancanî nayê zanîn, lê wî nîşan da, ku amadeye di navbera Iraqê û Amerîkayê de li ser rawestana şer barekî hilgire.

**6' ê Sibatê**

Saddam, serokê Filistîniyan ê nû ye. Serokê RNF Yaser Arafat doza filistînî xiste destên Saddam de. Li ser zimanên Filistîniyan tenê Saddam heye. Filîstînî di xwepêşanan de, bi navê Intîfada Filistînî wêneyên

Saddam hildidin. Di ekranên telewizyonan de gava bi yekî filistînî re hevpeyvînek dibe, li ser zimanê wan navê Saddam diçe û tê. Ew bi navê Saddam dikevin xewê û bi navê wî şiyar dibin.

Serokê PLO Arafat, di axaftinên xwe yên bi rojnamevanan re xuya dike, ku Saddam brayê wan ê mezin e. Gava pirsek li ser Kurdan tê, ji bersivê direve. Lê, ya xerîb " pêşverû û şoreşgerên " dinyayê, rexne li wan nagrin, ku bi dîktatorek wusa re ketine piştgiriyê û xwedîtiyê li yek dozê dikin.

Parlamenterê Kurd ji Mêrdînê Nurettin Yılmaz ji Partiya ANAP, parlamentoya Tirkiyê tevî lev xist. Wî ji bo parlamenterên Tirk ên ANAP'ê got :

- *Berî hûn ji Asya ya Navîn werin, em li ser vê axê dijîn, em xwediyê vê axê bûn.*

Serbestkirina zimanê kurdî di nav ANAP'ê de munaqeşeyên dijwar têne xolê.

Serokê YN, Perez de Cuèllar ketiye rewşek xerab. Do piştî, ku Hevkaran kamyonên Urdunê yên siwîl, derbasî Iraqê dibin bomba kirin, wî rexne li van êrîşan kir. İngilîstanê jî bi zimenkî hişk ew rexne kir. Londrayê got, ji cihê Cuèllar me rexne bike, divê Iraqê rexne bike. Wan rojên derbasbûyî jî Tariq Azîz, Cuèllar wek berpirsiyarê şer nîşan da.

Wezîrê Parastinê yê DYA Dick Cheney û Serokleşker ê DYA Colin Powel di dawiya hefteyê de diçin Suudî Erebistanê. Ji bal gelek pîsporan ve ev çûn wekî nîşana destpêka şerê erdê tê dîtin.

İro di parlamentoya Swêdê de, ji Partiya Çep ( VP ) Bertil Mobrink di axaftina xwe de rewşa Kurdan bi ferehî anî zimên. Wê got : " Divê Kurd wekî çavdêr di YN'de cihê xwe bigrin. Ev şer bi awakî fereh jî li ser axa Kurdan dibe. Kurd carek din di bin tehdîda çekên kîmyewî de ne. Lê, maskeyên Kurdan dijî vî çekî nînin. Li Tirkiyê di

heremên Kurdistanê de, ji karmendên Tirk re maske hatine belavkirin, lê ji bo milyonên Kurdan na! Swêd li ser vê babetê divê raweste.

**7 'ê Sibatê**

Bombardimanên Hevkaran pêşberê hêz û bajarên Iraqê berdewam dikin. Hêzên Hevkaran ên deryayî jî, ji deryayê ve raketan davên hedefên Iraqê.

Pentagonê diyarkir, ku her çend ev sê hefteyan hêzên Iraqê tên bombardiman kirin jî, Muhafizên Komarê hîn hêza xwe diparêzin.

Iraq pêwendiyên xwe yên dîplomatî bi welatên, ku di Hêzên Hevkar de cî digrin re dibire. Iraq wan bi bombardimankirina hedefên siwîl sucdar dike.

Wezîrê derve yê DYA, James Baker dîyar kir, ku piştî şer dê sîstemek nû ya parastinê bête danîn.

Wezîrên Derve yê Brîtanyayê Douglas Hurd û yê Suriyê Faruk Şara li ser planeke aştiyê civînek pêk anîn.

Alîkarê Wezîr ê Derve yê Sovyetê Aleksander Belonogov û Wezîrê Derve yê Tirkiyê Ahmet Kurtcebe Alptemoçin, ji bo rawestandina şer bi Serokkomarê Îranê Rafsancanî re li Tehranê hevdu dîtin. Rojnameya Cumhuriyet nivîsî, ku li gor raporên ji DYA ketine destên wan Amerîka naxwazê Kurd serxwebûnê bigrin, lê razîye ku mafê Kurdan ên fereh ê kulturî hebin. Li gor vê raporê, Cumhuriyet dinivîse, ku Kurd nîşanên xwe yên Netewî nînin. Ew di nav kulturên dijin de xeliyane.

**8'ê Sibatê**

Berê 12'ê îlonê ( roja înqîlaba eskerî li Tirkiyê di 1980 de ) Kurdan, pîvan a demokratbûna rewşenbirên Tirkan li ser dîtina wan ji bo Tevgera Kurd ve derbasdibe - digotin.

Sal derbasbûn. Îro li Tirkiyê rexneyên ku li dijî eskeran

tên kirin, wekî pîvan ji bo demokratbûnê tên nîşandan. S. Demirel jî yek ji wan " qehremana " ye. Lê, gava pirs tê ser Kurdan, demokratbûna kesên weke wî diqede. Piştî ANAP ' ê bikaranîna zimanê kurdî serbestkir, Demirel peyvên wusa gotin :

" Neteweyek bi navê Kurdan nîne. Ku hun wusa hesêb bikin, hûn rê ji bo perçebûna Tirkiyê vedikin. Li ser bingeha mezheb û nîjadan, ku veqetandin li Tirkiyê bên kirin, ev îxanet bi doza welatê me re ye."

Ev peyvên jorê, ji axaftinên Demirel di rojnameya " Hürriyet " a do de hatine girtin.

Danezanên ragihandinan li cîhanê îro bûyerên terorîstî ji xwe re kirine sernivîs. Li Swêdê nameya bombayî, Li İngilîstanê li hember avayiya serokwezaretê êrîşa bi topa hawanê, ya ku ji bal İRA ve ( Ordiya Komara İrlandayê ) ve hate kirin, Li Tirkiyê li bajarê Adana kuştina leşkerekî Amerîkayî û hwd.

Meha Ramazanê nêzîk dibe. Ev tişt, di nav Hevkaran de welatên musilman dixe telaşê. Di vê mehê de gelek kes bawer dike, ku Saddam êrîşek fereh a manewî bibe ser hêzên Hevkar, bi taybetî jî welatên Ereb û yên din ên musilman, ku îro şerê Iraqê dikin. Ji ber vê yekê niha gelek pispor daxuyaniya didin, ku dibe şerê erdê berê Ramazanê destpêbike û di demek kurt de bê qedandin.

Şerê Kendavê bi xwe re, ji bo Kurdan guhartin anîn. Ya herî giring di nav wan de xwedîderketina berjewendiyên neteweyî ye. Kurd hin û hin fêrdibin, ji pencereya Kurdistanê ve lêkolînan li ser bûyerên çêbikin.

**11'ê Sibatê**

Şer berdewam e. Hevkaran daxu yanî da, ku heta tevayiya hedefên ku dikarin ji ezman ve îmha bikin hebin, dê balafirên wan êrîşên xwe dom bikin. Saddam jî her dibêje, ku dawiya dawî dê serfirazî ya Iraqê be.

Hate dîyar kirin, ku Konferansa Navnetewî ji bo mafên mirovî yên Kurdan di 15, 16 û 17 - ê adarê de li Stockholmê dê bê bi dar xistin.

**12'ê Sibatê**

Heta niha pêşniyar û daxwazên çend dewletan ji bo rawestandina şer û çareserkirina pirsgirêkan bi riya aştiyê tû berhemên xwe nedane.

Ji nav welatên negirêdayî blokan 15 dewlet, ji bo amadekirina planek aştiyê li paytexta Yugoslavyayê Belgrad dicivin.

Herweha dîsa wekî pêngavek, ji bo peydakirina aştiyê, Çîn sefîrekî xwe rêdike Tirkiyê, Îranê, Suriyeyê û Yugoslavyayê.

Saddam bi awakî neyekerast ( indirekt ) bersiva xewlên Îranê ji bo peydakirina aştiyê da û got : "Em heta negihin serfiraziyê em ê tû pêşniyarên ji bo aştiyê qebûl nekin."

Sefîrê Gorbaçov ê taybetî diçê Bexdayê. Xuya ye Gorbaçov bi rewşa Iraqê, ku ketiyê ve nexweş e. Ew dixwaze di zutirin dem de Iraq jî Kuweytê hêzên xwe bikşîne, wekî din rewşa Iraqê dê gelek ber bi xerabiye biçe, dibêje Gorbaçov.

Nûnerê Filistîniyan li Swêdê Eugene Makhlouf diyarkir, ku ew amadene bi Parastina Swêdê ( SÄPO ) re, li ser êrîşên terorî xebatê bikin.

Her wekî Iraqê jî qebûl kir, do êrîşên Hevkaran 15 dezgehên leşkerî yên Iraqê wêran kirin. 15 hezar leşkerên Iraqê hatine kuştin.

Iraqê biryar girt, ku ciwanên 17 - salî jî bixe bin çek. Bi peyveke din, xwendevanên gimnasium jî di bin leşker û hember Hevkaran dikevin eniya şer.

Li gor daxuyaniyên ku belav dibin, xuya dike şerê erdê

nêzîk destpê dike.

Heyecana serbestkirina zimanê kurdî li Tirkiyê hin û hin cihê xwe berdide gumanan. Di nav germbûna heyî di Rojhilata Navîn de biryargirtina li ser babeteke weha, Kurd bi fikrên cuda re tên berhev. Baweriya, ku ev leyistik û hîleyek Enqerayê ye zêdetir hevalbendan dibîne. Rojên Lozanê tên bîra Kurdan. Gava İsmetê kerr çû bû hingî xwe wekî nûnerê Kurd û Tirkan dabû nasandin. Di dawiyê de jî felaketa ku hate serê Kurdan diyar bû. Mirov bixwaze, nexwaze li rûpelên dîroka xwe dinere, kes jî jibîr nake serpêhatiyên wusa gelek hatine serê me Kurdan. Û em dipirsin - gelo dîsa dîrok dubare nebe ?

**13'ê Sibatê**

Li gor danezanên ragihandinê yên Tirkiyê, Saddam niha jî li aştiyê digere. Alîkarê Serokwezîrê Iraqê Sadun Hammadî piştî ku li İranê bi Rafsancanî re hevdu dît, derbasî Urdunê û ji wir jî derbasî Libyayê bû.

Saddam jî diyare têgihişt, ku bi ajîtasyonê mirov di şer de bisernakeve. Gelo vêca dê pêngavên Saddam ji bo rizgariya xwe wè tèr bikin, yek nizane. Piştî hevqas bûyeran, gelo dê Hevkar raziyê aştiyê bibin jî ne diyar e. Ji ber ku Saddam di rewşa îro de bi Hevkaran re li ser masaye aştiyê rûnê, di çavên Ereban de wekî ji şer serfiraz derketî dê bê dîtin.

Amadebûnên şerê erdê hin û hin bi cî tên. Hêzên Deryayî yên Hevkaran berên raketên xwe dane hêzên Iraqê li Kuweytê. Girêdanên leşkerî yên Iraqê di bin bombardimanên fereh ên Hevkaran de ne. Pir, sîstema elektronîk, riyên erdê û yên hasinî tên bombardiman kirin û ji karbûnê tên derxistin. Mirov dikare bibêje plana Hêzên Hevkar a îzolasyona hêzên Iraqê di Kuweytê de ber bi serkeftinê ve diçe. Ji êrîşên ji hewayê ve hemberê sînorên

navbera Iraq û Kuweytê jî mayinên ji bal Iraqê ve hatine danîn tên îmhakirin.

Dîtin, pêşniyar ê planên ji bo heremê piştî şer jî hêdî hêdî derdikevin ronahiyê. İngilîstan piştî şer di nav pirsên heremê yên çareserkirinê de wekî pirsa Filistîn, her weha Pirsa Kurd jî heye, dibêje. Li gor agahdariyên gihan guhên me Kurdan, Eniya Kurdistana Iraqê berê demekî bi nûnerên dewleta Brîtanî re hevdu dîtibûn.

Diyare ne tenê jî Brîtanya Mezin, herweha gelek dewletên din jî li gel çareserkirina Pirsa Kurd in. Lê, bê guman dîtina welatan ji hev diguhere. Bi taybetî jî piraniya wan li gel mafên Kurdan ên mirovî ne, pirsa netewî dikeve xalên paşîn. Kes naxweze niha bi vî rengî pirsa Kurd bigre dest. Herweha welat di çareserkirina pirsê de berjewendiya xwe dide berçavan. Wek tê zanîn jî, em Kurd ji hêza ku bikaribin berjewendî û daxwazên xwe bi dinyayê bidin erêkirin dûrin. Perçebûna Kurdistanê wekî sedekî di pêşya çareserkirinek giştî, ji bo pirsa me ya neteweyî disekine.

Kurdên her perçeyî jî siyaseta perçeya, ku li ser dijin dikin. Ji siyasetek giştî ya neteweyî mixabin em gelek dûr in. Pêwendiyên di nav parçan de, ku tên danîn jî, ne li ser baweriya giştî, lê li ser perçeyekî tên danîn. Zanistiya me ya netewî jî karakterek giştî nagre, dibe perçeyî.

**14'ê Sibatê**

İro, avayiyeke binerd a hilandinê di Bexdayê de, yên ku ji sedî zêdetir siwîl tê hebûn, ji aliyê belafirên Hevkaran ve hat bombardimankirin. Rojname, radyo û telewizyonên cîhanê vê bûyerê, wekî nûçeya yekem belav dikin.

Hevkar di daxuyaniyên xwe de dibêjin, ku ev prowakasyonek Saddam bûye, ku di vî cihê eskerî de siwîl dagirtine û bûye sedema kuştina wan. Lê, dixwaze vê bûyerê

wekî propaganda hemberê Hêzên Hevkar bi kar bîne. Iraq jî dibêje : *"Fermo, bibînin Hevkar çawa siwîlan qetl dikin."*

Yên li dij şer in jî, dîyar dikin, ku ev berhemên şer in û ev wekî numûneke ye, çima mirov divê li hember şer raweste.

Yekîtiya Sovyet û Gorbaçov destpêkirin xwe nêzîkî Saddam bikin. Di nav hefteyê de sefîrê Gorbaçov, Jevgenij Primakov ê ku çû Bexdayê, xuyanî kir, ku Saddam amade ye bi Sovyetê re çarekê ji şer re bibîne.

Her berî jî, di 31'ê meha berê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetê, ji bo çareyek ji şer re bê dîtin înîsîyatîfek xurt ji Gorbaçov xwestibû.

Di rojên dawî de, di weşanên resmî yê Sovyetê de nivîsên, ku siyaseta DYA rexne dikin tên çapkirin. Li gor van nivîsan DYA şer ji bo, ku bikeve heremê û planên xwe ji bo Rojhilata Navîn bixe jiyanê derxist.

Pîsporên siyasî li vê nêzîkahiyê wekî tewrek tebîî meyze dikin. Dostaniya Iraqê û Sovyetê rayên xwe yên kur hene û hîn jî ew ra nehatine birîn, dibêjin.

Herweha diyare YKSS ditirse, ku tesîra xwe li ser Rojhilata Navîn winda dike.

**15 'ê Sibatê**

Şerê, ku dihat bawerkirin dê di çend rojan de biqede, kete roja xwe ya 28 - an.

Tariq Azîz îro diçe Moskovayê. Birêkirina Azîz ber bi Sovyet ve bala tevayiya dinyayê kişandiya ser Kremilê. Vegera Primakov ji Bexdayê bê daxuyaniyek qediya, ev jî hevdîtina Azîz bi nûnerên Sovyetî re bala mirov dikşîne. Tenê Moskovayê nîşanda, ku ji bo aştiyê hêviyên xurttir hene. Herweha Gorbaçov do bi Wezîrê Derve yê Kuweytê Şêx Sabax Exmed El - Sabax re li Kremilê hevdu dît.

Yek ji heremên herî zêde êş ji şer dîtî jî bakûrê Kurdistanê ye. Bi taybetî di heremên ser sînoran de jiyana ticaretê ketiye sifirê. Wek tê zanîn riya, ku Ewropa bi Rojhilata Navîn ve girêdide ji vir derbas dibe. Miletê heremê jî zêdeyiya sermaya xwe daniye ser bazirganiyê.

" *Em amadene, ku ji Kuweytê derkevin.*" Ev biryara, ku îro ji alî Radyoya Bexdayê ve hate xwendin, tevayiya agahdarî û nûçeyên din xistin siya xwe de. Bi vî awayî Iraqê daxuyanî kir, ku biryara 660 - an a YN qebûl dike û dê hêzên xwe ji Kuweytê vekşîne. Weke tê dîtin û tê diyarkirin, ev pêngav wekî berhema pêwendiyên dîplomatî di navbera YKSS û Bexdayê de, tê girêdan. Sovyetê, ya ku bêriya rojên xwe yên berê, yên rojên superdewletbûnê dike, destşikestiyê Saddam jî her wekî berê di bin siya xwe de dixwaze biparêze.

Pêwendiyên Prîmakov li Iraqê û dawî jî daxuyaniya Iraqê, ku dikare ji Kuweytê derkeve, bi yekcar Moskova kire navendiya herî girîng a dîplomasiyê. Wezîrên derve yek li pey yê din, li Moskovayê peya dibe. dib Moskovayê. Îro wezîrê derve yê Îranê hate Sovyetê, piştî wî jî wezîrên derve yên Civata Aborî ya Ewropayê tên Moskovayê. Piştî wan jî Wezîrê Derve yê Iraqê Tariq Azîz dê werê paytexta Sovyetê. Çavên dinyayê ber bi Moskovayê ve hatine zîvirandin.

Iraq di daxuyaniya ku da de, çend şertan jî anî ser masê. Ew dibêjin " *Em ji Kuweyt derdikevin*", lê divê :

- *Îsraîl ji axa Ereb a dagîrkiriye derkeve.*
- *Suriye ji Lubnanê derkeve.*
- *Deynên derve yên Iraqê bên mixandin.*
- *Li ser xesarên ji bombardimanên Hevkaran pêkhatine* jî, divê em bên rawestan û Iraq bê ava kirin.

An em ji Kuweytê dernakevin - wusa dibêje Bexda. Bi gotinên din diyar dike, ku ji Kuweytê dernakeve.

Wekî tê dîtin daxwazê Saddam, daxwazên aliyê serfiraz

ji şer in. Lê, her kes jî dibîne aliyê serfiraz di şer de ne Iraqê. Yên ku dê şertan jî, ji bo aştiyê deyne ne Iraq be. Dîsa jî ev gotinên Bexdayê, wekî êrîşek dîplomatî tê dîtin.

Gotin a Saddam, ku dibe ji Kuweytê derkevin piştî nêzîkî mehekê şer hatin zimên. Di vê demê de wekî agahdarî tên belavkirin, bi dehhezaran leşkerên Iraqê hatin kuştin, sîstema leşkerî ya Iraqê birînek mezin dît, rewşa aborî ya Iraqê kete xitimandinek mezin û hwd.

**16'ê Sibatê**

Îro di gelek rojnameyan de, li ser hêza leşkerî yên dewletên Rojhilata Navîn statîstîk hatin weşandin. Li gor firotina çekan ji bo welatên heremê jî, di rêza yekem de Yekîtiya Sovyet tê. Sovyet herweha dewleta ku herî zêde çek firotiye Iraqê ye, bi 6 milyar û 354 milyon dolaran çekên Sovyetî di destê hêzên leşkerî yên Iraqê de ye. Sovyetê herweha bi bûhayê 5 milyar û 347 milyonan çek firotiye Suriyê û bi 2 milyar û 230 milyonan jî çek firotiye Lîbyayê.

Ji dervî wê şer îro jî bi hemû hêza xwe dom kir. Rojnameyên dinyayê wêneyên ji navendiya şer hîn jî nikarin bidin, ji ber ku hem Hevkar û hem jî Iraq , ji bo ewletiya parastina xwe nahêlin ji navendiya şer rojnamevan agahdariyan bidin. Ji ber vê yekê jî reqamên kuştina leşkeran ên Iraqî yan ên Hevkaran, tenê li ser daxuyaniyên her du hêzan tên belav kirin.

**17'ê Sibatê**

Çavên dinyayê li Moskovayê ye. Tariq Azîz îro diçe Moskovayê. Roja duşembê jî, dê bi Gorbaçov re hevdu bibînin.

Bush xuyanî kir ku dê manewrayên Iraqê bikaribin hevkariya di navbera Sovyetê û DYA de xerab bikin.

Rojnameya Newyork Times dinivîse, ku li ser daxwaza Sovyetê, DYA destpêkirina şerê erdê hemberê Iraqê bi paş ve xistiye. Herweha soza domkirina hevkariya xwe jî bi DYA û hêzên Hevkar re aniye zimên.

**18'ê Sibatê**

Tariq Azîz û Gorbaçov îro hevdu dîtin. Piştî plana aştiya Sovyetê, ji bo çareserkirina şer, xiste çenta xwe, dîsa vegera Bexdayê. Niha her kes di meraqê de ye, dê Saddam çawa bersiva Gorbaçov bide. Li ser naveroka plana Sovyetî heta niha tû agahdarî nehatine belavkirin.

Iraqê agahdariyek belavkir, ku piştî êrîşên hevkaran bi hezarên siwîlan jiyana xwe windakirine. Bi dehên hezaran jî brîndar in. Herweha hate gotin, ku piştî êrîşa belafirên Brîtanyayê hemberê bajarê Iraqê li Felluce 130 insanên sivîl hatine kuştin.

**19'ê Sibatê**

Bush ji Qesra Spî daxuyanî da, ku planê aştiyê yê Sovyetê têr nabîne. Li gor nûçe û agahdariyên tên belavkirin, naveroka planê wusa ye :

- *Iraq bê ku tû şertan deyne divê ji Kuweytê derkeve.*
- *Ji bo ewletiya sînor û ya dewleta Iraqê dive garantî bên dan.*
- *Dive embargoya li dijî Iraqê rabe û tû ceza ji bo Saddam dê neyên dan.*
- *Dê pirsên din jî yên Rojhilata Navîn ji bo çareserkirinê werin rojevê û bi taybetî jî Pirsa Filistîn.*

Wekî ku hat weşandin ev xalên jorîn di planê Sovyetê de cîh girtine, mîna" *Planê xelaskirina Saddam*" tê binav kirin.

Herweha li gor agahdariyên di danezanên ragihandinê de, niha pirsa Hevkaran ne tenê derxistina Iraqê ji Kuweytê ye. Ew di aliyê din de dixwazin di herema Rojhilata Navîn de, li gor berjewendiyên Rojava Sîstemek Nû ya Ewletiyê jî deynin. Ji bo ku ev armanc jî bi serkeve bê gûman çûna Saddam xalek herî girîng e. Saddamek ê ku li ser hukim bimîne, wekî serfiraz ji şer derketî dê bê dîtin. Ji roja Iraqê Kuweyt dagîr kir heta îro, raya giştî ya cihanê bi waxşet, teror û dîktatoriya Saddam tê nasandin. Li ser hemû van tiştan jî, eger Saddam dîsa rejîma Bexda di destên xwe de bigire, bi rastî jî, wekî serfirazî ji bo Saddam re dê bê dîtin.

Ji ber van hemû tiştan, Hevkar - bi netêrbûnê - planê Sovyetê bi nav dikin. Lê, xwe ji Sovyetê jî naxeyidînin, çawa be Sovyet heta niha li ba Hevkaran cî girtiye û ev ji bal wan ve gelek girîng tê dîtin.

**20'ê Sibatê**

Dîyar e, ku Hevkar li xistina Saddam wekî xalek herî girîng mêze dikin. Ji rûpelên rojname û kovaran ve, ji mîkrofonên radyoyan û ekranên telewizyonan ve her roj nûnerek Hevkaran an DYA li ser dadkirina Saddam piştî şer dipeyivin.

Di nav propaganda xwe ya dijî Iraqê de, di telewizyonên Rojava de her roj li ser rewşa Kurdan li başûrê Kurdistanê jî gelek agahdarî tên belavkirin. Hema hema her roj li ser Helepçâ û qetlîamên Tebaxa 1988 - an tê axaftin. Wêneyên Helepçe û yên jenosîda Tebaxê tên ekranên telewizyonan. Dinya sê salan piştî van qetlîaman, niha bi awayakî herî fereh li ser wan rojên reş tê agahdar kirin.

**21'ê Sibatê**

Gava ev rêz tên nivîsandin, Moskova li hêviya Tariq Azîz e. Herweha hemû aliyên, ku hêviyek wan bi planê

Gorbaçov ve girêdaye, ku dê aştiyê bêne çavên xwe ber bi Moskovayê ve kirine. Dê çi bersiv di çantê Azîz de bê ? Danezanên ragihandina fikrên cuda cuda li ser tênin xolê.

Do şev Hevkaran, bi gotinên wan - ji bo cara dawî, Iraq îkaz kirin da ji Kuweytê derkeve. Niha her kes dibêje, ku Iraq ji Kuweytê dernekeve, di demek herî kin de şerê erdî dê destpêbike. Li gor çavkaniyên Amerîkayê di rojê de 100 aletên şer ên giran ên Iraqê tên îmhakirin. Di daxuyaniya, ku ji aliyê alîkar serokwezîrê Iraqê ve jî hate gotin, ku heta niha 20 000 Iraqî hatine kuştin û 60 000 jî brîndar bûne.

Di daxuyaniya xwe, ya ku di Radyoya Bexdayê de do şevê hate weşandin, Saddam diyarkir, ku : "vê plana aştî qebûl nake."

Lê, di dîtina xwe bi Gorbaçov re Tariq Azîz nîşan da, ku : "Iraq amadeyê aştiyê ye û planê Gorbaçov ji bo aştiyê jî qebul dikin."

Niha her kes vê pirsê didê xwe, gelo dijîtî di navbera Iraqiyan de derketiye an axaftina Saddam di Radyoya Bexda de pêşberê xelkê Iraqê propagandek bûye ?

Bi meraqek mezin danezanên ragihandinê û raya giştî ya cîhanê li hêviya sibê ye, ku dê çi bersiv bêne dan ji bo raya Iraqê, ya ji bo aştiyê.

**22'ê Sibatê**

Di daxuyaniyên hatin belavkirin de, diyare Hevkar wekî Sovyetê ji bersiva Iraqê ne xweş in.

Li aliyê din hevdîtinên Tariq Azîz bi nûnerên dewleta Sovyet re domdikin. İro jî Azîz bi Wezîrê derve yê Yekîtiya Sovyetê re hevdu dibînin. Ji planê ku Azîz aniye Moskovayê ve jî dîyare, ku Iraq şikestina xwe di şer de qebûl kiriye. Li gor vê planê, Iraq amadeye bê şert ji Kuweyt derkeve. Çareserkirina pirsa Filistînê jî wekî

şertekî ji ber derketina xwe ji Kuweytê dide aliyekî. Saddam ê ku pirsa Filisyînê ji bo armancên xwe demek fereh bikar anî, niha dîsa wê davêjê pişt guhên xwe. Yên ku ji piştgiriya Saddam zêde winda bikin, ji niha ve xuya ye, ku dê Filistînî bin. Iraq herweha qala derketina Israîlê ji axa dagîrkirî yan jî derketina Suriyê jî ji Lubnanê nake. 7 xalên ku ji planê Iraq qebûl kirî ve hatine xuyanî kirin ev in :

*1 - Iraq qebûl dike, ku bê şert ji Kuweyt derkeve.*

*2 - Ji Kuweytê derketin, piştî du rojan ku dê çekdanîn ( ateşkes ) hebe, dê dest pê bike. ( Amerîka li vê xalê bi şik mêze dike. Ditirse, ku Iraq di van her du rojan de çekên giran û yên sivik ên Kuweytê bibe Iraqê. Ew jî naxwazin vê imkanê bidin Saddam )*

*3 - Paşve kişandin ji Kuweytê dê di demek kin de biqede. ( Berî niha DYA ji bo paşvekişandinê 4 - roj ji Iraqê re naskiribûn. Herweha gotibû, ku çekên giran jî yên li Kuweytê bihêle. DYA naxwaze Saddam bi çekên xwe yên giran û modern bimîne. Dixwaze Iraqê bê van çekan bihêle. )*

*4 - Gava ku ji 3 / 2 ê Kuweytê vekşandin pêkhat, divê embargoya li dijî Iraqê bê rakirin. ( Amerîka dixwaze vekşandin ne bi merxelan lê yekcar û zû bibe. )*

*5 - Gava tevayiya leşkerên Iraqê ketin nav sînorên xwe de, divê her 11 biryarên YN, ku li dijî Iraqê hatibûne girtin, rabin. ( Di vê xalê de DYA bi tevayî li dijî vê gotina Iraqê ye. Ji ber ku eger bibe û Iraq ji Kuweytê vekişe, lê carek din bixwaze Kuweytê werbigre, hingî hemû ev biryarên YN ji nû ve divê bêne girtin. Tebîî Amerîka niha qet naxwazê pirsa rakirina biryarên YN bê rojevê. )*

*6 - Piştî çekdanînê, divê hemû dîl ên şer bêne serbestkirin.*

*7 - Paşve veksandin ji alî welatên, ku di nav şer de cî negirtine dê bê taqîb kirin.*

Vê sibê Gorbaçov ê ku bi telefona Sor bi Bush re peyiviye, li ser navê xwe ev her 7 - xal wekî planek aştiyê pêşkeşî Serokê DYA kiriye. Axaftina di nav wan de, ya ku 33 deqîqan dom kiriye, bê encamek hatiye tewa kirin. Bersiva Bush weha bûye : " Em spasiya we dikin. Em girîngiyeke mezin didin pêngavên Sovyetê yên ji bo aştiyê. Lê, li ser vê planê divê em bifikrin, bi welatên din re jî yên di nav hêzên Hevkar de ne li ser vê rewşê bipe yvin. Herweha gelek gûman me jî li ser vî planî hene. Paşî em ê bersivek bidin . "

Brîtanya jî nerazîbûna xwe bi vî planî re têne zimên, ku ew li dijî biryarên YN' e. Fransiyan heta niha dîtina xwe li ser ne dane diyarkirin. Dibêjin, piştî em bi welatên di Hêzên Hevkar de ne bipeyvin, em dikarin helwesta xwe bidin diyar kirin. Li gor nûnerê Çînê di YN de, plan hêviyekê ji bo aştiyê dide. Bi peyvên nûnerê Misrê di YN de jî, plan ji bo aştiyê gavek gelek giringe. Kuba, Yemen û Rêxistina Rizgariya Filistînê ( PLO ) jî, bi dilxweşiyek mezin ev plan pîroz kirin. Li gor wan, niha riya aştiyê li Kendavê dîsa hate vekirin.

Di nav welatên li dijî vî planî ne, yekem İsraîl tê. İsraîl dibêje, ku heta sîstema çekdarî ya Bexdayê neyê îmhakirin dê Iraq her dem astengek bingehîn li pêşya aştiyê di heremê de be. Herweha ew ê tehdîdek li ser ewletiya Israîl jî be.

Xuya ye, ku Kurd jî ji vî planê nerazî ne. Saddam heta xwedî çekên xwe yên di dest de be, dê tehdîdek pêşberê netewê Kurd be - ev jî dîtina Kurdan e. Heta Saddam neye xistin jî, dive Hevkar şerê xwe ne rawestînin. Madem li Bexda dixin, pêngava herî girîng hilweşandina rejîma Saddam e.

Hevkar heta niha bersiva dawî ya plana Gorbaçov ne dane. Tebîî ye yekser neqebûlkirina planê Gorbaçov dibe ku navbera Sovyet û Hevkaran jî xerabike. Ji ber vê çendê

Rojava bi zimanek dîplomatî, bi dereng hiştina bersiva xwe nerazîbûna xwe jî bi planê re didin dîyar kirin. Di vê demê bi xwe de Hêzên Hevkar dom dikin, êrîşên dijwar bibin ser Bexda.

**23'ê Sibatê**

Îro hate zanîn, ku di navbera 16 û 17 - ê Sibatê de bi xwestina Enstîtuya Kurd li Parîsê, Kurd ên ku ji 15 dewletan hatine û nûnerên rêxistinên Kurd li Parîsê civînek bidarxistine. Di civîna ku du rojan domkiriye de, ji başûrê Kurdistanê li ser navê Bereyê Kurdistana Iraqê Samî Abdurahman û Adnan Muftî, ji bakûrê Kurdistanê Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistan ( PPKK ), Partiya Demokrat a Kurdistan ( PDK - T ), Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê - Baskê Sosyalîst ( KUK - SE ) û Rizgarîxwazên Netewî yên Kurdistanê ( KUK ), ji Rojavayê başûrê Kurdistanê Partiya Hevgirtina Gel û ji Rojhilatê Kurdistanê jî Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê beşdarî kirin e. Herweha ji şexsiyetên bangkirî jî, di nav de Nacî Kutlay, Îbrahim Güçlü û ji Kurdên Sovyetê Xidoyê Şakiro jî li Parîsê di civînê de cî girtine. Di daxuyaniya civînê de ev xalan cîh digirin.

*- Divê Konferansek Kurd di demek herî kin de kom bibe.*

*- Ji bo cî girtina nûnerîtiyek Kurd di platformên navnetewî de, divê îdareyek bi zûyî bê hilbijartin.*

*- Di Kongreya Netewî de, bê ferq hemû rêxistinên Kurd ên siyasî, demokratî û dezgehên meslekî, herweha şexsiyetên Kurd ên serbixwe jî bikaribin cî bigrin.*

*- Di platformên navnetewî de, Pirsa Kurd divê ne wekî pirser mafên mirovatî, lê wekî pirsek netewî û bi gişayiya xwe bê girtine dest.*

*- Ji bo ku potansiyela heyî ya fereh a Kurd li derveyî welêt bi erkên xwe yên netewî baştirin bikaribe rabe, divê dezgehên heyî bighin avaviyek navendî.*

Di civînê de rêxistinên wekî Partiya Rizgariya Kurdistanê ( Rizgarî ), Partiya Karkerên Kurdistan ( PKK ) û Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê ( PSKT ) beşdarî nekirin. Sedemên ne amadebûna wan jî, bi tû daxuyaniyan nehatiye eşkere kirin.

Herweha îro agahdariyek din a girîng li ser Kurdan hate weşandin. Li gor wê li Londrayê di navbera nûnerek Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal û Celal Talabanî de hevdîtinek hatiye kirin. Li ser naveroka civînê tiştek naye gotin û tiştek resmî jî ne hatiye belavkirin.

Dema dawî ya ku hêzên Hevkar dane Iraqê ji bo vekşandinê ji Kuweytê îşev diqede.

**24'ê Sibatê**

Dema ku ji bo derketina Iraqê ji Kuweytê hatibû naskirin şevê din di kathejmar 19. 00 an de qediya. Iraq ji Kuweytê derneket.

Bi dehhezarên leşkerên Ordiya Sor a Sovyetê, yên ku li dijî Borîs Yeltsin xwepêşandanek bidarxistin, di destên wan de wêneyên mezin ên Saddam, piştgiriya xwe bi dîktatorê Bexda re anîn zimên. Yek ji wan leşkeran bi navê Nîkolay Valitov wusa digot :

*- Ez li hember şerek dinyayê yê sêyemin im, ê ku ji alî împeryalîstên Amerîkayê û siyonîstên Israîlê ve destpêka wê tê danîn. Ereb û Rûs tû caran li hember hevdu şer nekirin e. Ji ber ku dijminên me yek e .*

Dijminê hevbeş ( muşterek ) ê ku Valitov digot, di destê

leşkerek din ê Ordiya Sor da bû Stêrka David bi peyvên din İsraîl bû.

Şerê erdê yê ku hevqas li ser dihat axaftin li gor kathejmara Ewropê 02.00-an de dest pêkir. Li gor danezanên ragihandinê yên Rojava, hêzên Hevkar wekî hirmîyan leşkerên Iraqê berhev dikin. Li gor agahdariyên ku Saddam belav dike, êrîşa Hevkaran ji aliyê Iraqê ve hatiye şikestin. Serok leşkerê hêzên Hevkar Norman Schwarzkopf, ji her aliyan ve, ji erdê, ezman û deryayê ve li Iraqê dixin û ber bi pêş diçin.

Daxwaza Sovyetê û ya Gorbaçov, ku bibin kevokên aştiyê bi ser ne ket. Bi dilek xemgîn, niha ew li şer û şikestina Iraqê temaşe dikin.

**25'ê Sibatê**

Sernivîsên rojnaman, agahdariyên yekemin ên radyo û telewizyonên cîhanê bi tevayî li ser destpêkirina şerê erdê ne. Nûçeyên din wekî agahdarî û înformasyonên biçûk rê digrin.

Wezîrên derve û yên parastinê yên welatên Rojhilatê Ewropa, îro li Budapeşte dicivin, ji bo ku biryara belavkirina Pakta Warşow bidin. Wek tê zanîn, berê di navbera wan welatan de wekheviyek li ser felişandina Paktê hatibû pêk anîn. Civîna niha tenê bi awayek formalîte dê biryara belavkirina Paktê bigire..

Xwepêşandanek din a mezin di paytextê Sovyetê Moskova de, ji bo piştgiriya Boris Yeltsin pêk hat. Nêzîkî 40 - hezar kesan piştgiriya xwe bi Yeltsin re anîn zimên. Li hember siyaseta Gorbaçov, hevkariya xwe li gel Yeltsin nîşan dan.

Şerê erdê li dinyayê bi hîsên cuda cuda hate qebûlê. Yekîtiya Sovyet acizbûna xwe, ji şer re dîyar kir. Serokdewletê Misrê Husnî Mubarak, got ku:

- *Leşkerên Misrê di şerê erdê de dê nekevin axa Iraqê.*

Xwendevanên unîwersîteya Qahîre, yên ku protesto li dij şer kirin û polîs ketin nav hev. Urdun û Cezayirê jî nerazîbûna xwe, ji destpêka şerê erdî re dîyar kirin. İsraîl jî dîsa daxuyanî da, ku dê li dervî şer bê.

Wekî ku Ajansa İranê - İRNA da xuyanî kirin, ji roja destpêka şerê erdî di 17'ê Sibatê de heta îro 5000 kes li Iraqê, di nav de zarok, jin û pîr ji ber tunebûna dermanan mirin e. Nexweşiyên ku zû belav dibin jî, dibe ku li Iraqê dest pê bikin.

Do li Stockholmê, çend hêzên Kurd bi hevre, panêlek bi navê " Şer û Kurd " bi dar xistin.

Gazinek di nav Kurdan de belav dibe, ku siyasiyên Kurd raya giştî ya Kurd bi pozisyona xwe nadin nasandin. Şer derket û nêzîk e ku biqede . Ji nû ve sîyasiyên Kurd li ser şer dîtinên xwe dîyar dikin.

Civîn ji alî Komîteya Hevkariyê Hêzên Siyasî yên Kurd û Kurdistanî li Swêdê ( HEVKARİ ) hatibû pêk anîn. Tê de li ser navê TEVGER Kemal Burkay, bi kurtayî dîtinek li dijî şer xuya kir. Li ser navê Bereyê Kurdistana Iraqê Dr. Mecîd Cafer dîsa li hember şer axaft û dîtina nûnerê PDK - İranê Selîm Baban li ser şer baş diyar nebû. Li ser navê Partiya Demokrat a Kurd a Pêşverû ya Kurdên Suriyê Azad Cigerxwîn dîtinek, ku şer ji alî Iraqê ve hatiye destpêkirin û her çend ne dostên me jî bin hilweşandina rejîma Iraqê ji bal hêzên Hevkar ve, ji me re jî baş e - got. Herweha wî rexne li Gorbaçov û polîtîka Sovyetê girt, ku ew dixwazin Saddam xelas bikin.

Welatên Rojava yên Ewropa, Pakta Worşow felişandin.

## Kuweyt rizgar bû

**26'ê Sibatê**

Îro şerê Kendavê kete proseseke û girîng. Hêzên Hevkar ketin Kuweytê. Kuweyt hate rizgarkirin. Biryara 660 a YN jî, ji bo derxistina hêzên Iraqê ji Kuweytê kete jîyanê.

Lê, dîyar e, hêzên Hevkar naxwazin tenê bi rizgarkirina Kuweytê, êrîşên xwe li dij Iraqê rawestînin. Xuya ye, şer di nav axa Iraqê de dê dom bike. Bi taybetî DYA û Brîtanya ên ku naxwazin Saddam pêşberê xwe li ser masê bibînin, ji bo hilweşandina hêzên Iraqê yên leşkerî şer didomînin. Gorbaçov daxwaz ji Komîteya Ewletî ya YN kir, ku bicive. *"An dê pêwendiyên me bi Amerîka re xerab bibin"* got.

**27'ê Sibatê**

Di navbera Hêzên leşkerî yên Komarî yên Iraqê, ku ketine çembera hêzên Hevkar û hêzên Hevkar di nav axa Iraqê de şerekî berfereh dibe. Telewizyonên dinyayê nîşan didin, ku çawa leşkerên Iraqê yên di şer de hatin şikestin xwe teslîmê leşkerên Hevkar dikin. Leşkerên Iraqê perîşan in. Bi hezaran ji kozik û çeperên xwe yên bin erdê der dikevin û dest û lingên leşkerên hêzên Hevkar diramîsin. Tê gotin ku leşkerên Iraqê bi rojan in ku di kozik û çeperên xwe de tî û birçî ne. Li benda hatina leşkerên Hevkar in ku xwe teslîmê wan bikin.Trajediya şikestina leşkerên Iraqê di ekranên telewizyonan de, ji bo raya giştî ya cîhanê tê pêşkeş kirin, . Niha tû sansur li hemberê rojnamevanan nîne. Hevkar ji bo propaganda xwe, rê didin rojnamevanan ku serbest kar bikin.

Hêzên Hevkar dîyar dikin, ku di rojek de tevayiya Kuweytê hatiye rizgar kirin. Meydana şer niha jî Iraq e. Leşkerên Iraqê yên mayî bi paş ve ber bi Basra û Bexdayê ve dikişin. Hêzên Hevkar ji hewa, erdê û avê ve der û dor

li wan teng dikin. Balafirên hêzên Hevkar bi tonan bombe û gulle bi ser wan ve dibarînin. Li pêş wan pird û neqeban firandin û xerab kirine û dikin. Fort û peshên Saddam derew derketin. Leşkerên wî nikarin çek biteqînin. Ji sedî not dest nabin tetîka çek. Panîk, rev û dîlbûn heye. Ji navê rakirna hêzên leşkeriyên Iraqê bi du-sê rojan ve girêdayî ye. Heger heta du-sê rojan jî şer dom bike ordiya Iraqê namîne.

**28'ê Sibatê**

Hevkaran di kathejmar 06.00 de biryara rawestandina şer gihandin leşkerên xwe. Piştî sê saetan Iraqê jî biryara rawestana şer girt. Do daxwaza Iraqê ya rawestandina şer nehatibû qebulkirin. Lê, îro bi daxuyaniyek ji Qesra Spî ya Waşîngtonê ve, biryara rawestandina şer gihişte tevayiya dinyayê. Û herweha hêzên leşkerî yên Iraqê yên mayî ji kuştinê rizgar bûn. Lê ordiya Iraqê bi 100 hezaran kuştî û jî dîl li pey xwe hişt. Aparata leşkeriya Iraqê perçe perçe bû.

Hêzên Hevkar ên ku Hêzên Leşkerî yên Komarî şikandin, bi biryara xwe ya rawestandina şer, xuya dikin, ku dev ji xistina Saddam jî ne berdan e. Planên xistina Saddam dîyar e, bi riyên din dê bê pêk anîn.

Hevdîtinên li ser aştiyê jî, bê guman li gor daxwazên Hevkaran dê formek bigre. Tiştê Saddam bike yê mayî, bi bikaranîna hemû îmkanan hiştine xwe li ser hukmê Iraqê bide qebûlkirin e. Ew jî bi riyên dostên xwe, ku bikaribe vî tiştî bidest bixe. Di rêza yekem de jî dê Sovyet we re. Lê, ji niha ve xuya dike, ku dê Sovyet jî nikaribe Saddam rizgar bike.

# DINYAYÊ KUWEYTÊ RIZGAR KIR, PÊŞMERGE JÎ KURDISTANÊ RIZGAR DIKE

Şerê, ku dinyayê bi mehan mijûl kir, ê ku di vê demê de, di jiyana siyasî ya dinyayê de bû pirsa herî girîng, piştî qebûlkirina ji aliyê Iraqê ve, hemû şertên DYA û hêzên Hevkar, di roja 28'ê Sibatê de, bi erêkirina Komîte ya Ewletî ya RYN, bi biryar a danîn a çekan, rawesta. Lê, herweha ew nayê mana ya ku şerê Kendavê bi tevayî qediya. Ji bo vê pêwîst e, Iraq van 8 - şertan bicîh bîne û di demek kurt de, bersiva wan ji Qesr a Spî ya Wasîngtonê re bide xuyakirin. Ev şert di roja 22 - yê Adarê de, ji aliyê DYA ve ji bo danezanên ragihandinê re hatin belavkirin. Li gor wan :

1 . Roja yekem : Komîte ya Ewletî ya RYN, biryara rêkirin a xwarinê ji bo Iraqê qebûl dike. Pêwîstî yên din ên bingehîn di destê Komîte ya Sezayê de ye, ku çavdêriyê dike, gelo çawa Iraq şertên RYN bicîh tîne û weha biryar a rêkirina tiştên din ên bingehîn digre.

2 . Roja duwem : Serokê RYN Perez dè Cuellar bi Iraqê û Kuweytê re li ser pirsa sînorê civînekê bidar dixe û biryar li ser vê pirsê digre. Ew, herweha biryara bicîhkirin a leşkerên RYN, ku çavdêrî ya vê biryarê bikin digre.

3 . Roja 15 - an derengtir : Iraq sîstema xwe ya çekdarî ya giran, çekên kîmyewî û bîyolojîk, ji RYN re vedike. Herweha eger amadebûnên Iraqê yên nû hebin ji bo sazkirina sîstemek nûjen a çekdarî, pêwîstê ew jî ji bo RYN bêne vekirin.

4 . Roja 30 - an an zûtir : Serokê RYN xesarên ji şer pêkhatine hesab dike. Ji bo vê çendê fondekê di damezrîn e, ya ku xesarên şer ji firoştina petrola Iraqê derdixe.

5 . Roja 45 - an an zûtir : Serokê RYN , komîteyeke taybetî dê deynê ya ku çavdêriya sîstemên çekên giran ên Iraqê bike.

6 . Roja 60 - an : Komîte ya Ewletî ya RYN biryara erêkirin a, rakirina çend cezayên girîng a embargoya li dijî Iraqê ye dê werbigre.
7 . Roja 90 - î an zûtir : Komîte ya Ewletî ya RYN biryara erêkirin a rakirina tevayiya embargoyê ku li dijî Iraqê' ye dê werbigre.
8 . Roja 120 - an : Serokê RYN planekê amade dike - ji bo qedexekirina pêkanîna sîstemên nû yên çekên giran ji bo Iraqê û bikaranîna wan.

Herwekî, ku heta niha diyar bûye, ku hemû daxwazên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka, di warê pirs a Xelîçê de ji bal RYN ve hatine qebûlkirin, xuya ye ev şertên nû jî beramberê Iraqê - ji bo bi tevayî qedandin û rawestandina şer, dê bên erêkirin. Lê, li aliyê din, ne diyare ku Iraq dê çawa bersiva van şertan bide. Tenê yek tiştî mirov dikare bibêje, ku Iraqê ala teslîmîyetê hildaye û ji bo vê çendê hîn dê gelek caran pêwîst bibe serê xwe deyne. Alternatîv a din jî, wekî ku têkoşînê ji bo destpêkiriye - rakirin û rûxandin a rejîma Saddamê Tekrîtî ye.

Mirov heger bi rêz, çavekî ji bûyerên ku ji meha 7 - an heta niha li Rojhilata Navîn û bi taybetî li derdor a Xelîçê pêkhatine derbas bike, bêgûman dê bi tabloyek enteresan û balkêş re berbiçav bibe.

Bûyer a herî girîng û bingehîn, wekî ku her kes dizane - dagîrkirin a Kuweytê, di roja 2 - ê tebax a 1990 - î bû. Rejîma BAAS û serokê wê yê dîktator Saddam, bi ti awayî daxwaz û hêvî yên dinyayê, ku bê şer û şert ji xaka Kuweytê derkevê pêk ne anî. Ji ber vê çendê, şeva ku 16 - ê çileya paşîn bi 17 - an ve girêdide, di saet 00. 30 de şer destpêkir. Piştî mehek û nîvê şerê belafiran, derbeyek a herî mezin li sîstema giran a çekdarî, çekên bîyolojî û kîmyewî yên Iraqê ket. Pêwendiya leşkerî di nav esker ên Iraqê di nav Kuweytê de û yên li ser xaka Iraqê de ji hev hate birîn. Koordînasyon a leşkerî ya di navbera naven-

diya leşkerî û hêzên wan de qut bû û ew ji hev hat xistin. Wekî, ku ji serokatiya leşkerî ya hêzên Hevkar li paytexta Siudî Erebistanê Rîyadê ve hate belavkirin, ji % 80 îrade ya berxwedanê ya leşkerên Iraqê di şer de hate şikandin. Bi ser van hemû tiştan jî, ya rastî di dinyayê de tu kesî bawer nedikir, ku di mehek û nîvê de hêzên Hevkar ên ku ji nêzî 30 dewletan pêk dihat û DYA dê nikaribin Iraqê bi çokan bixin erdê. Lê belê, di dawî de di navbera 100 saetan şerê erdî de, Iraqê 100 000 leşker windakirin û nêzîkê hevqasan jî xwe teslîmê leşkerên Hevkaran kirin. Iraqê hemû qeyd û şertên RYN qebûlkir û xwe ber bi sînorê xwe yê berî 1 - ê tebax a 1990 - î ve vekşand. Saddam Huseyn El - Tekrîtî yê ku Kuweyt wekî wilayet a 19 - an a Iraqê dabû diyarkirin, di roja dawî ya şer de, di Radyo ya Bexdayê de daxuyanî dida, ku " ji îro pê de Kuweyt ne wilayet a 19 - an a Iraqê ye ". Herweha, wî di axaftina xwe de da nîşandan, ku çawa " leşkerên Iraqê yên qehreman, mala hêzên Hevkar xerakirin e û ew mecbûrê rawestandina şer kirin e " ( ! ). Axaftinên Saddam tiştek bûn û rastî tiştek din... Kuweyt - ji şer welatekî xerakirî, yê ku di bin dû yê reş ê agir ê petrolê yên ku Iraqê şewitand de derket û ji welatê ku di tevayiya dinyayê de - welatê herê dewlemend bû - gelekî dûr ket. Xesar a Kuweytê, her çend heta niha nehatiya hesibandin jî, tenê bi xesarên tebîatê bû tehlûkeyek tebîî ji tevayiya herema Rojhilata Navîn re.

Tiştekî din ê herî balkêş ev bû, ku piştî rizgariya xwe gelê Kuweytê, ji bo şahî yên azadiyê bi hefteyan li hêviya Emîr ê xwe Şeyh El Sabah bimîne. Belê îro bûyer jî û encamên wan jî li ber çavan in - Kuweyt, piştî 7 - mehan ku bi dehên dewletan ji bo " rizgariya " wê leşkerên xwe xistin şer, dîsa welatek azad, xwedî sînor û mekanîzma dewletê ye. Her çend ji bo avakirin a Kuweytê dehên salan pêwîst bibin jî, ji niha ve monopolên Ewropa û DYA' yê dest bi rekabeta avakirina wê kirin jî.

## HESABÊN SADDAM ÊN MALÊ Û SÛKÊ LI HEV DERNEKETIN !

Bûyer a din a herî girîng rewşa Iraqê ye. Berî Krîz a Xelîçê, wekî hate diyarkirin, Iraq ber bi hêza çaran a leşkerî di tevayiya dinyayê de diçû. Her çend Bexda, ji şer ê 8 - salan bi Iranê re, bi deynekî gelek giran - nêzî 100 milyar dolar - derketibû jî, di nav heremê de û bi taybetî jî, di nav welatên Ereban de bû bû xwedî peyvek giran. Li gora Saddamê Tekrîtî ev peyva giran pêwîst bû wekî kulmekê li dewletên Ereb ên dewlemend, lê zeîf in ketiban e. Lê, hesabên malê û sûkê li hev derneketin. Hat dîtin, ku welatek wekî Kuweytê jî, gava pirs tê ser berjewendiyan - xwedî piştgirîyek gelek gelek fereh e. Ji xwe, ev tişt îro ji Iraqê re baş diyar e. Tiştê li Kuweytê ji bal Iraqê ve hate kirin, bi zêdetirîn û dijwartirîn hemberê Iraqê, ji bal hêzên Hevkar ve hat kirin. Tevayiya Iraqê, bi taybetî jî cîh ên meqerên eskerî, bi dehên hezaran car ji bal belafirên Hevkaran ve bombardiman bûn. Rewşa jiyanê li Iraqê vegeriya sedsala XIX - an. Sîstem a elektrîkê, av a vexwarinê, sîstem a telefon, telewîzyon û koordîne ya parastinê ya elektronîk ji 3 / 4 di tevayiya xaka Iraqê de hate hilweşandin. Iraq wekî welatek xerabûyî û serîtewandî ji şer derket.

Dervî ku hesabên malê û sûkê yên Saddam li hev derneketin, herweha piştî rawestan a şer, heta niha ( 23 - yê adar a 1991 ) man a rejîma BAAS bi xwe le ser hukim, ne diyar e û şerê opozisyon a Iraqê, bi taybetî jî ya Şîî' yan li dijî rejîma Bexdayê her berfereh dibe. Li gor deng û ba's ên hatin belavkirin, di 22 - yê adarê de, di Bexdayê bi xwe de muhalefetê dest bi çalakiyên leşkerî kiriye û şer di navbera leşkerên bi Saddam re ne û li dij in destpêkiriye. Ji aliyê din ve Saddam jî dest bi " demokratbûnê " kir ( ! ). Di roja 17 - ê adarê de, di axaftina xwe di Telewîzyon a Bexdayê de,

wî diyarkir, ku " amade ye ji bo destpêka jiyanek demokrat di Iraqê de. Li gele, ku partiyên cuda di Iraqê de eşkere ( legal ) karbikin. Mîllet ê Iraqê vekirî dîtin, raman û rawêja xwe bibêjê. Rexne dijî rejîmê serbest bê kirin. Di vî warî de Saddam " reform " a xwe ya yekemin jî, di roja 23 - ê adarê de pêk anî. Sadûn Hammadî musilman ê Şîî, yê ku heta niha alîkarê Serokwezîr bû, bû Serokwezîr ê Iraqê. Tariq Azîz jî, yê ku heta nûha Wezîrê derve bû, hat şûn a Hammadî û bû alîkarê serokwezîr ê Iraqê. Wek tê zanîn heta îro ji dervî Serokkomar û Serokatiya hemû kar û barên leşkerî, Saddam Huseyn Serokwezîrtî jî dikir. Ew dê her du karên din berdewam bike.

Piştî şer bi awakî vekirî hat dîtin, ku germbûna Iranê nîşanê Iraqê dikir, di dem a şerê Xelîçê de ne bi dilsozî hatibûye kirin. Ji ber ku, hîn bi rawestan a şer, Şîî yên ku dest bi şer li hemberê Bexdayê kirin, diyarbû alîkariyê ji Tehranê werdigrin. Her çend Iranê ev tişt qebûl jî nekir, lê li gor agahdariyên ji heremê tên, leşkerên Iranê bi xwe, ji bo ku meqerên " Mucahiddîn ê xelk " ( rêxistin a li dij Iranê bi alîkariya xurt a Iraqê têdikoşe ) li Iraqê birûxênê, ketiye erdê Iraqê bi xwe. Serokên Şîî yan ji ekranên telewîzyon a Tehranê, serkeftinên şerê xwe li dij Bexdayê dan xuyanîkirin. Wan dîyar kir, ku kontrola bajarên Necef, Kerbela, Basra û bi dehên bajarên din ên biçûktir û zêdeyiya herem a Bakûr ê Iraqê di destên wan de ye.

Di dema piştî şer de, em bûn şahidên pêwendiyên fereh di navbera muhalefet a Iraqê û tevgera Kurd de. Ji bo ku di bin alayekê de - Şîî, komunîst, BAAS'î yên pêşberê Saddam, Nasirî û hêzên din ên muhalefet a Iraqê kom bibin, gelek civîn hatin bidarxistin. Rengarengiya dîtin, îdeolojî û alternatîf a pêşeroja " Iraqek çawa ? " di nav hêzên cuda de, bê guman bi awayek cuda jî tê zimên. Di roja 22 - ê Adarê de danezanên ragihandinên cîhanê ev nûçe belavkirin, ku rêberiya muhalefet a Iraqê, ji bo ku bi-

karibe şerê li dij Saddam bi awakî xurt di cîh de birêve bibe, dê biçe ser xaka Kurdistana Iraqê.

Piştî derxistin a leşkerên Iraqê ji Kuweytê , bidestxistin a parçeyek ji xak a Bakûrê Iraqê ji bal hêzên Hevkar ve û danîn a çekan, li Rojhilata Navîn trafîk a dîplomasî, gihişte encamek bilind. Roj tûne ye, ji dem a rawestan a şer heta niha, ku di navbera dewletên heremê û welatên Ewropa Rojava yan DYA re pêwendî yên dîplomatî nebin. Di vê germbûna jiyan a siyasî de, girîngtirin pirs - peydakirin a çareyekê ji bo problem ên Rojhilata Navîn, aştî û ewletiya heremê ye. Di vî warî de dest bi planên pratîk jî hate kirin. Her çend di dem a şer ê Kendavê de, bi hemû hebûna xwe Rexistin a Rizgariya Filistînê ( PLO ) li gel Saddam cîh girt jî, pirs a Filistînê ji bo çareserkirinê tê rojeva siyasî. Israîl bi xwe nîşan da, ku amade ye dest bi pêwendiyan bike - ji bo çareserkirina pirs a Filistînê. Lê, her li gel vê dîtinê jî, diyarkir, ku PLO wekî rêxistinek terorîst dibîne û tû caran dê pê re pêwendiyek bidar nexe.

Lê, eger mirov li bûyerên pêkhatî di dem a dawî de li Rojhilata Navîn temaşe bike, bêguman dê bibîne, ku girîngtirin û dînamîktirin pirs li Rojhilata Navîn pirs a Kurd e.

## AXA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ DI DESTÊ GELÊ KURD DE YE

Şerê neteweyê Kurd - ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî, wekî hemû neteweyên dinyayê, ne ji do û îro ve ye. Ev 150 - sal in, piştî ketina Mîrîtî ya xwe ya dawîn ji bal Imparatorî ya Osmanî ve heta nûha çek di destan de, şer û têkoşîn a xwe didomîn e. Carna ji bo demek kurt serketin, lê paşî dîsa şikestin, bindestî û li ser xaka xwe bê maf... bû

jiyan a wî, bû jiyan a her Kurdekî xwedî hîs û xwedî dil... Di vê dîrok a dagirtî bi rûpelên şeref, berxwedan û têkoşînê, bi serî netewandinê pêşberî hemû zilm û neinsaniyetê, gel ê Kurd gelek dîktator û faşîst naskirin. Di nav wan de, cîh ê Saddamê Tekrîtî - cîhek xûya ye.

Saddam ê ku berpirsiyariya herî giran a qetlkirin a zarokên Qaladizê, şehîdbûn a 5000 - zarok, jin û pîr ên Kurd li Helepçeyê, windakirin a 8000 - Barzaniyan, li ser milên wî ye, berî çend rojan di telewîzyon a Bexdayê de weha got : " Kurd ên hêja ! Bi ya çend kes ên ku dixwazin we bînin leyistikan nekin. Tevger a Kurd her dem bi alîkariya hêz ên derveyî ve hatiye geşkirin û vê carê jî weha ye. Ew an dest datînin ser çek ên meqerên me, yên ku kes di wan de tune ye. Çekên xwe bere deynin ! Wekî din em ê serê wan bipelixînin ! "

Saddam wekî her car dîsa derew dikirin. Pêşmerge yên qehreman, ên ku bi çalakiyên xwe yên serfîraz, her roj agahdariyên pîroz dighînin danezanên ragihandinên cîhanê, tenê di serkeftina xwe di şerê Zaxo' yê de dan nîşandan, ku şerê wan şerekî çawa ye. Li gor ajansên dinyayê, bi hezaran leşkerên Iraqê wekî dîl ketina destên pêşmergan de. Bi hezaran jî, yên ku ji tirsan reviyane, ketin e sînorên Tirkiyê û İran ê. Hukimet a Tirkiyê bi xwe ev rastî qebûlkir, ku bi hezaran leşkerên Iraqê di nav wan de subay jî bi rev ketin e nav xakên başûrê Rojhilat û Rojhilatê Tirkiyê ( Bakûrê Kurdistanê )

Serfiraziyên pêşmergan û daxûyanî yên wan, ku Kerkûk di dest wan de ye, dawî bi kamerayên telewîzyonên Japonyayê, ji bo hemû dinyayê hatin nîşandan. Pêşmerge bangdikin - Bijî Kurd û Kurdistan! Pêşmergeyek di dest de kêr suretê Saddam xera dikir û di nav bajêr bi xwe de pêşmerge şerê helîkopterên Iraqê dikirin... Bi vî awayî, carek din pêşmergan nîşan dida û dinyayê hemû di dît, ku Kerkûk Kurd e û bajarê Kurdistanê ye.

Suleymaniye bû pîroz a yekem, ku hatiye rizgarkirin, paşî wê Amediyê, Xanikîn, Hewlêr, Zaxo, Dixok û... Helepçe... Helepçe ya şehîd. Nuha şehîdên Helepçe - ew pênc hezar û belkî zêdetir dikarîbûn ewran biqetînin û temaşe bikin - Di roj a 3 saliya bîranîna Helepçe de, ew di destên pêşmergeyan wan de bû.

Her weha di pêwendiyên dîplomasî de, Bereyê Kurdistana Iraqê li gor agahdariyên tên, diyar bû dest bi aktîvîtetên fereh kirin e. Di nav vê demê de, agahdariya sensazyonal ji bal Serokkomarê Turgut Ozal ve, gava bi rê ya Moskovayê bû, ji bo ziyaret a resmî bi Gorbaçov re hate belavkirin. Özal got :

*" Me pêwendî bi Bereyê Kurdistana Iraqê re daniye. Ji bo vê çendê di 8 - ê Adarê de, du serokên wan hatin. Yek Celal Talabanî û yê din jî nuner ê Mesud Barzanî, Muhsin Dizayî bû. Ew an, bi nunerên me yên Wezareta Derve, yên leşkerî û parastinê re rûniştin. Me dîtin û hêvîyên xwe ji bo wan diyarkirin û wan jî yên xwe gotin.*

Em û Kurd bi hevdu re dijin, çima wekî bira em li hevdû nekin. Ji nuha û pê de divê em piştgiriya Kurdan bikin. Divabû berê jî me piştgirî ya Kurdan bikira, hingê jenosîd a li Helepçe jî pêk ne dihat."

Piştî vê bûyerê heraret a siyasî pir bi jor ket. Hemû partî yên muhalefetê li Tirkiyê, yên ku di Parlamento de beşdar in, wekî grubên siyasî nerazîbûna xwe ji kare Özal re diyar kirin. Li gor dîtin û rawêj a wan, kar û barê Özal, karek şexsî ye û parastina dewleta Tirkiyê dixe xeterê. Her weha berî çûn a Özal a Waşîngtonê, hemû partiyên siyasî yên Parlamento ya Ankarayê bi taybetî jî kurê Paşê Erdal İnönü û Suleyman Demirel û her weha Kenan Evren jî daxuyanî dan, ku Ozal nikare tu tawîzan bide Bush li ser pirs ên Kurd, Ermenî û Qibrisê.

Piştî hevdîtinên xwe li Enqerayê bi siyasetvanên dewlet, leşker û parastina Tirkiyê re Celal Talabanî hevpeyvîn bi radyo ya BBC û Ajansa Nûçeyên Kurdistanê ( ANK ) re kirin. Wî di hevpeyvînên xwe de dîyar kir, ku tu tawîz nedan e Tirk an. Lê, dîtinên xwe ji hev re gotin e. Di gelekên babetan de wekhevî di helwestên wan de hebûye û di hinekan de jî cudabûn di dîtinên wan de derketine holê.

Heta niha ne dîyar e, gelo Bereyê Kurdistana Iraqê, yên ku ji % 95 axa başûrê Kurdistanê di destên xwe de digirin, dê bi biryarek çawa Pirs a Kurd ber bi çareserkirinekê ve bi rê ve bibin. Hîn gelek tişt der dora pirs a Başûrê Kurdistanê ve ronî ne bû ne. Rojên nêzîk dîyar in. Em dê çarçova pirsa Kurd de, bibin şahîdên kirinên redîkal.

*Cemal Batun*

# KURDAN SERÎHILDA

**11'ê Adarê 1991**

Ji Kurdistana Başûr baş nûçe nayê stendin. Di herêma Kurdistanê de bê dengiyek heye. Ordiya Saddam li wir jî ketiye panîkê. Xelkê herêmê dest bi serî hildanê kirine. Lê, baş agahdarî tune. (*)

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal çû Moskovayê. T. Özal di balafirê de, ji rojnamevan re got ku "di vê heftê de Celal Talabanî û temsîlvanê Mesûd Barzanî hatin Tirkiyê."

Li ser pirsên rojnamevanan, Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal, weha bersiv dida:

- *Kurd di herêma me de dijîn. İngiliz, Amerîka û dewletên din yên Rojava wan bi resmî qebûl dikin û bi wan re rûdinin, lê çima em bi Kurdan re rûnenin? Em dixwazin li bakurê Iraqê dewleteke federatîf avabibe û Kurd û Tirkmen jî di nav vê federasiyonê de bin. Garantoriya vê dewleta han jî, yek jê Tirkiye be; an jî Tirkiye, Suriye û İran bin. Li Tirkiyê jî, 12 milyon Kurd hene. Kurd neteweyek in. Divê Tirkiyê hamîtî li Kurdan bike. Lê, em li dij dewleteke serbixwe ya Kurdan in. Em bi*

(*) Paşê dîyar bû, ku di 3'yê Adarê de cara pêşî li herêma Ranyayê serîhilda û serîhildan berfireh dibe. Di 5'ê Adarê de leşkerên Saddam ji herêmê revîn. Di 8'ê mehê de xelkê Silêmaniyê jî radibe. Hêzên pêşmêrge gîhane alîkariyê. Serokên emnîyet û leşkeran revîn. Qasî 850 ajan hatin kuştin. Di 9'ê Adarê serîhildan gehîşt Şeqlewayê. Di 10'ê mehê de. Rewanduz, Dîyana û di 11'ê Adarê de jî Hewlêr di navbera çend saetan de rizgar dibe. Û di 20 Adarê de bi hezaran hêzên çekdar ên kurd bi ser Kerkûkê ve digrin û di roja 21'ê de aliyekî Kerkûkê ji destê leşkerên Saddam rizgar dikin , lê şer dom dike. Saddam giraniya xwe dide ser bajarê Kerkûkê.

*qetîyet, li bakurê İraqê dewleteke Kurd ya serbixwe naxwazin. Heger çêbibe jî, em dê bi xwe mudaxelê wê bikin.*

Ev nûçe li Tirkiyê wekî bombeke teqîya. Muxalefet li dij hatin û hevdîtina Tirkiyê û Kurdan derket. Muxalefetê, Turgut Özal bi xayîntiyê îtham kir.

Li gor nûçeyan, Kurd li Kurdistana İraqê gelek herêman girtine bin kontrola xwe. Di nav de bajarê Silêmaniyê jî heye. Li gor nûçeyan, İro jî hêzên Kurd derdor li bajarê Hewlêrê girtine û Hewlêr li ser ketinê ye.

**12'ê Adarê**

Li gor nûçeyên ku ji Kurdistana Başûr tên, gelê Kurd li dij rejîma Saddam serîhilda. Li Başûrê İraqê jî, li bajarên Basra, Necef, Kerbela û li hinek bajarên din yên ku Şiî lê dijîn li dij rejîma Saddam serîhildan her ku diçe geş û berfireh dibe. Lê, yek bi rastiyê nizane, ku li herêmê çi dibe û diqewime. İmkanên masmediya cîhanê tuneye, ku nûçeyên rast û teze bigire û belav bike.

**13'ê Adarê**

Bereyê (Cepheyê) Kurdistanê bi gelê Kurd re bû yek û pêşengiya serhildanê girt destê xwe. Ew Kurdên ku heta niha bê teref bûn û yên ku di ordiya İraqê de leşker bûn, dest dan ser çek û cebilxanên ordiya İraqê. Wan ji bo serîhildanê bangê partî û hêzên Kurd kirin, ku werin û bi hevdu re, li dij rejîma Saddam şer bikin. Mesûd Barzanî bi pêşmêrgan ve kete Kurdistanê.

**14 ê Adarê**

Li bakur û başûrê İraqê Kurd û Şiî şerê berxwedanê berfireh kirin. Li Kurdistanê çend bajarên biçûk ketin destê

hêzên Kurd. Bereyê Kurdistanê bi pêşmêrgeyên xwe ve li Kurdistanê cîh dibe û xwe ji şerê mezin û giran re amade dike.



**15'ê Adar ê**

Li gor radyo û televîzyonên cîhanê, Silêmaniye, Helepçe û Xaniqîn ketin destê hêzên pêşmêrge. Ordiya Iraqê li Kurdistanê belav dibe.

Di 15-17 Adarê de Konferansa Parastina Mafê Gelê Kurd li Stockholmê civîya. Konferansê, bi dilşahî û germî silav li şoreşê kir.

**16'ê Adarê**

Hewlêr bi temamî rizgar bû. Pêşmêrge derdor li Kerkûk û Zaxoyê girtin. Ordiya Saddam li Kurdistanê bi

çekên xwe yên giran ve teslîmê hêzên pêşmêrge dibe. Balafirên Saddam hêzên pêşmêrge bombabaran kirin. Amerîka, 2 balafirên Iraqê xistin. Û komûtanê Amerkîa yê hêzên Kendavê ultîmatomek da Iraqê û got ku :

- *Li gor peymana şêrê, Iraq nikare balafir û helîkopterên xwe rabike û bikar bîne. Heger Iraq balafir û helîkopterên xwe bikar bîne, ev îhlala peymanê ye û em dê dest bi şer bikin.*

Hêzên Amerîka bi vê ultomatonê re 50 km ber bi Bexdayê ve meşîya. Iraq tirsa û dev ji bikaranîna balafir û helîkopteran berda.

Piştî şer, îro cara yekem Saddam Huseyîn derket TV'ya Iraqê û gelek firehî li ser pirsa Kurd rawesta û banga Kurdan kir:

- *Piştî şer ez dê demokrasiyeke rastîn bînim Iraqê û dê Kurdên bira yên me jî, di nav vê demokrasiyê de otonomiya xwe û heqên xwe yên netewî û demokratîk bigrin...*

Parlementoya Belçîkayê biryar girt ku pirsa Kurd bibin Koma Neteweyan û heta ku pirsa Kurd çareser nebe, dê Belçîka nehêle Tirkiye bibe Endamê Civata Bazara Ewropê.

16'ê Adarê di dîroka Kurd de, rojeke tarî û şîn e. Roja qetlîama Helebçeyê ye. Piştî 3 salan îro Helepçe rizgar e û di destê hêzên Kurd de ye. Di serî de li bajarê Helebçê li her derê Kurdistanê û li seranserê Ewropa Kurdan qetlîama Helebçê bi civîn, mîtîng û meşan bi bîr anîn. Li Stockholmê di roja 16 Adarê de,bi însîyatîfa Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, qasî 3500 kesî bi meş û mitîngeke, qetlîama Helepçê bi bîranî. Konferansa Stockholmê saetek nabeyn da civîna xwe û gelek nûnerên Konferansê beşdarê meş û mitîngê bûn. Dr. Mahmûd Osman li ser navê Bereyê (cephe) Kurdistanê di derheqê rizgarakirina axa Kurdistanê û rewşa Saddam de agahdarî da

beşdaran. Televîzyon, radyo û rojnameyên Swêdî gelek cîh dan meş, mitîng û nûçeyên Konferansa Stockholmê.

**17'ê Adarê**

Kerkûk û Zaxo ketin bindestê pêşmêrge. Ala Kurd li her derê Kurdistanê li ba dibe.

Mesûd Barzanî nûçevan û rojnamevanên Ewropî vexwend (dawet kir) Kurdistanê. Rojnamevan û nûçegîhanên Ewropî ji bo çûndina Kurdistanê, diçin Suriyê, İran û Tirkiyê. Van her sê dewletan sînorên xwe ji bo rojnamevanan jî girtin. Konferansa Stockholmê 3 roj dom kir û îro dawiya wê hat. Ji bo bi destxistina mafê gelê Kurd biryarên hêja girt. Ji bo pêkanîna van biryaran komîte pêk anîn û deklerasyonek belav kir.

Hemû partî û hêzên Kurd li Stockholmê bi civîneke taybetî silav û rêzên xwe pêşkêş kirin û heta dawî pişgiriya xwe ji serhildanê re dan dîyar kirin.

*Gaveke pêşketî û pozîtîv:*

## KONFERANSA STOCKHOLMÊ

*" Ev stemkariya ku îro li ser Kurdan heye, di bingehê xwe de, li ser aştiya cîhanê ye. Divê pirsa Kurdan di nav aştiyê de bêt çareser kirin. Ji bêyî pirsa Kurdan li Rojhilata Navîn aştî ne mumkun e."*

Serokê Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê berêz, C.H. Hermansson bi van gotinên jorîn konferansa Stockholmê vedikir.

Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê, di 15-17 'ê meha Adarê ya 1991'ê de, li bajarê Stockholmê bi 200 nûnerî ve Konferansa Parastina Mafên Kurd pêk anî.

Ji her çar perçeyên Kurdistanê, Yekîtiya Sovyetê, Avustralyayê heta Ewropê û Amerîkayê nûnerên partî, rêxistinên demokratîk û şexsîyetên Kurd yên serbixwe beşdarê Konferansê bûn. Ji derê Kurdan gelek prof., polîtîkvan, zanyar û rewşenbîrên demokrat û dostên Kurdan di Konferansa Stockholmê de beşdar bûn. Dîtinên xwe anîn zimên, pêşnîyarî anîn, alîkari û piştgiriya xwe dan dîyar kirin.

Konferans ji çapemeniya Kurdan û ya cîhanê re vekirî bû. Ji 50 kesî bêtir rojnamevan û nûçehîgan temaşe û guhdariya konferansê kirin û li tevahiya cîhanê nûçeyên konferansê belav kirin.

Serokê Komîta Mafê Kurdan yê Mirovî li Swêdê C H Hermansson, di axaftina xwe ya vekirina Konferansê de, behsa rewşa Kurdistanê û Kurdan a îroyîn kir. C. H. Hermansson:

- *Ev stemkariya ku îro li ser Kurdan heye, di bingehê xwe de li ser aştiya cîhanê ye. Divê pirsa Kurdan di nav aştiyê de bêt çareser kirin. Ji derî pirsa Kurdan li Rojhilata Navîn aştî ne mumkun e.*

Par, dema me dest bi hewldana amadekirina vê konferansê kir, em nedizanibûn dê rewşa Kurdan weha zû bêt guhartin. İro têkoşîna Kurdan êdî mêweyên xwe dide. Ez hêvîdar im, ku dê konferans di vî warî de biryarên berbiçav bigire.

Piştî pêkhatina dîwanê, wezîra Macir û Penaberan a Swêdê Maj-Lis Lööw heqê axaftinê girt. Di axaftinaMaj-Lis Lööw de baş dîyar bû, ku dewleta Swêdê di polîtîka xwe ya di derheqê Kurdan de tû guhartin çênekiriye. Wê di axaftina xwe de Pirsa Kurd wek pirseke penaberî û mafê mirovî da dîyar kirin.

*- Hukimeta me gelek li ser Kurdan radiweste û di vî warî de xebat jî kirîye. Swêd, li herêmê piştgiriya demokrasiyê dike. Em li her derî piştgiriya mafê Kurdan dikin; ew êş û jana ku li ser Kurdan heye, em baş pê dizanin. Hinek Kurd hatin Swêdê. Lê, em nizanin, ku çend Kurd li Swêdê hene. Bi texmînî qasî 10 hezar Kurd îro li Swêdê dijîn...*

**"Gelê Kurd serokekî bi hêz dixwaze"**

Dîwanê mafê axaftinê da Prof. David McDowall. David McDowall, ji Londonê hatibû û li ser perspektîva polîtîka Kurd peyîvî. Wî , rewşa Kurdan a dema Osmanî û ya niha bi mînakên dîrokî û berçav da berhevdu. Bi kurtî weha digot:

*- Em di demekî gelek girîng de dijîn. Niha gelê Kurd li Kurdistana Iraqê rabûye ser lingan. Serîhildaye. Berî çend rojan jî Turgut Özal, bi Kurdan re civînek çêkir. Ev jî dîyar dike, ku Özal dixwaze îdeolojî û polîtîka kemalîst li Tirkiyê bişkîne. ERNK jî li Parîsê daxuyanî da ku Tirkiye bixwaze bi PKKê re têkiliyan dêne, ew amade ne û dikarin çek bidin rawestandin. Ev tiştekî baş e.*

Berî şer hinekan digot; " *dibe, ku Kurdistaneke serbixwe çêbe.*" Tirkiye ji vê yekê tirsiya, ku Iraq perçe bibe. Tirkiye ji Şîîyan jî ditirse, ku li Iraqê ew bêne ser îktîdarê. Ji ber van sedeman Tirkiye hewl dide ku zimanê kurdî serbest bike. Lê, bi tenê zimanê axaftinê. Heger kovar, rojname û pirtûkên kurdî dîsan qedexe bin, ev ne tiştek e. Armanc dîsan xapandina Kurdan e. Ji bo pêşveçûna ziman û kultura kurdî, divê pêwendî di nav hukimet û Kurdan de

hebin. Lê, ew Kurdan asîmîle dikin û dikujin.

Îraq dibêje " belê Kurd hene," lê ji aliyê din ve, wan dikuje. Wek Bush dibêje; " divê li Rojhilata Navîn aştiyek hebe." lê divê Kurd jî di nav vê program û plana aştiyê de bin. Ji derî Kurdan li Rojhilata navîn aştî û demokrasiyeke rastîn nabe.

Di sedsala 18-an de Osmanî kesên din ji der ve danî Kurdistanê. Ji aliyê din ve, Kurdan di navbera Osmanî û Iranê de dikirin tampon. Abdulhamîd digotin: " Em îslam in." Kurdan bi îslamiyê dixapandin. Mustafa Kemal vê polîtîka Osmanî dewir girt. Wî dît, ku Yewnanî û Areb dixwazin Osmanî hilweşînin, berê xwe da Kurdan û ji wan alîkarî xwest. Gelê Kurd bû qurbana Komara Tirk. Herweha li Îranê jî Kurdan kirin qurban. Bûyera Simko sîyaseta Îranê dide dîyar kirin. Îro ji li Îranê rejima îslamî heye û dîsan dixwazin Kurdan ji navê rabikin. Problema Kurdan ne ya îslamî ye, ya netewî ye.

Wek tê zanîn, Îraq ji 3 wîlayetan çêbûbû: Basra, Bexda û Kurdistan. Çi bû, dewleta merkezî çêkirin û di dawî de Saddam Kurdan kuşt û Kurdistanê wêran kir. Kurdan di nav 3 dewletan de kuştin, girtin û rakirin. Ji Ş. Seîd re gotin; *" paşverû ye." Giş derew bû. Niha jî dibêjin "* Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîka Kurdan bi kar tînin. Îran jî PDK-I bi kar tîne. Îro jî, ji bo ava Firad, Suriye PKKê bi kar tîne." Rast e. Ev dewlet hemû ji bo kara xwe dixebitin, kara Kurdan têde tune.

Kurd bi civata navnetewî bawer nakin. Mustafa Kemal wan xapan. Îngilîstanê 1920 de got "em dê li Îraqê pişta Kurdan bikin." Nekir.

Di dema Osmanî de herêma Kurdistanê ji aliyê aborî û civakî ve bi paş ve hiştin. Giraniya xwe dan ser pêşvebirina rojava, ango herêma Tirkan. Îro jî weha ye. Hemû industrî û kompleksên wê li herêma Tirkan e. Bi ser re jî, hemû heyînên Kurdistanê dikşînin hêla xwe.

Polîtîka Osmaniyan, ew bûn, ku dubendî dixistin nav eşîrên Kurdan. Wan berdidan hevdu. Osmaniya Alayên Hamîdiyê pêk dianîn. Îro jî parazgerên gundan (köykorucusu) pêk anîne.

Gelê Kurd dixwaze serokekî wan yê bi hêz hebe. Hebûna eşîretan ji doza Kurdan re probleman derdixe. Dîn jî probleman derdixe. Kesên dîndar ji xwe re bi kar tînin. Sunî û Şiî bi hevdu bawer nakin. Wan li dij hevdu bi kar tînin.

Dewlemendên Kurd û xwedî ax bi dewletên re ne. Ev ji berê ve weha ye. Mesela, Kamuran Înan bi xwe xwedî ax e û mirovê dewleta Tirk e. Ji % 80 gundiyên Kurd bê ax in. Ew, li hember xwedî ax in. Hukimet pişta xwedî erd dike. Şoreşa PKKê û yên din bi maf e û li hemberê axayan e.

Di bajaran de hestên netewetiyê pêşketî ye. Di dema Osmanî de jî weha bû. Xwendevan û ronakbîrên Kurd li Stanbolê xebat dikirin.

Wî, sedemên cudabûn û têkçûna Kurdan îdeolojiyê didît û weha digot:

**"Îdeolojîyê şer xist nav Kurdan"**

-Problema îdeolojiyê ji bo Kurdan gelek xirab bû. Îdelojiyê, şer xist nav hêzên Kurdan. Divê mirov bikaribe rexne li hevdu bigre, lê, bi awayekî demokratîk. Ne ku hevdu bikuje, an bi hevdu re kar neke. Kurdan di sala 1918-an de, li ser serxwebûn û otonomiyê bi hevdu nekirin. Bi hevdu ketin. Hinek li dij M. Kemal û hinek jî li gel wî cîh girtin. Ew rewş û dîtin îro jî berdewam e. Gelo dê bikaribin dewleteke serbixwe çêbikin? Ji ber ku pêwendiyên wan bi Sûnî, Şiî û Cuhîyan ve heye. Kurdên Îraqê mumkun e, ku otonomiyê bi dest bixin. Problem ew e, ku dema dewleta Îraqê dîsa bi hêz bibe, dê otonomiyê ji

navê rabike. Bi baweriya min, dê li Tirkiyê mesela Kurd li pêş bikeve. Îro gelê Kurd layîqê pişgiriya navnetewî ye.

Ez nikarim ji gelê Kurd re polîtîka û stratejiyek pêşkeş bikim. Ew bi xwe biryara xwe dide. Lê, ez dikarim ji Amerîka û dewletên din re bêjim, "pirsa Kurd di nav pirsên Rojhilata Navîn de bigrin destê xwe." Heger welatên Rojava, aştiyeke nû dixwazin, pêwîst e, pirsa Kurd jî bigrin rojevê. Bila nebêjin *" dê Tirkiye sil (tûre) bibe, an biqehre."*

**"Azadiya Kurdan bi pêşketina edebîyata kurdî ve girêdayî ye"**

Profesor Joyce Blau, (Paris) li ser perspektîva kultura kurdî axaft. J. Blau, di axaftina xwe de, got ku Kurd ji berî ve li ser axa xwe ne. Kurd ji dema Medan ve heta niha li ser axa xwe jîyane. Med bapîrên wan in. Kurdan heta niha gelek mîrîtî û dewletên herêmî damezrandine. Mesela serokê dewleta Eyûbiyan ji Şeddadiyan bû. Şaddadî Kurd bûn.

*- Di sedsala 17-an de di medreseyên kurdî de muzîk, edebîyat, stran û kultura kurdî gelek pêşketibû. Ahmedê Xanî bi eserên xwe yên hêja hestên kurdayetiyê bi hêz kir. Ziman û kultura kurdî gelek kevin û dewlemend e.*

Di sedsala 7-an de Ereb û di sedsala 11-an de Tirk hatin herêma Kurdistanê û êrîş anîn ser Kurdan.

1924-an de M. Kemal kurdî qedexe kir. Tirkî kire zimanê resmî. Şovenîzma Tirk bû polîtîka dewletê. Navê Kurd û Kurdistanê qedexe bû. Navê Kurdistanê bû *"Rojhilat."*

Profesor J. Blau, li ser alfabe û zaravayên kurdî rawesta. Li Kurdistana Başûr û Sovyetê behsa pêşveçûna edebîyata kurdî kir. Di van çend salên dawî de, li Ewropa çawan ziman û edebîyata Kurdî gulveda. J. Blau, azadiya Kurdan bi pêşketina ziman û edebîyata kurdî ve girêda.

**"Kurd bi serkevin,**
**dê xencerên xwe bikşînin!"**

Profesor Johan Galtung (Stockholm) li ser rewşa Kurdan û krîza Xalîcê axaft. Johan Galtung, bi kurtasî digot ku:

- *Problem ne ya Kurda e; ya dewletên ku Kurdan din nav xwe de parkirine û yên ku ji wan re alîkariyê dikin e. Divê li Rojhilata Navîn hemû Ereb Israîl qebûl bikin. Israîl jî Filîstîniyan qebûl bikin. Pirsa petrol û avê bêt hel kirin. Av girîng e. Bi qasî petrolê girîng e. Li Rojhilata Navîn aştiyeke fereh bêt pêk anîn. Bazareke hevbeş çêbibe. Israîl jî di nav de be.*

Kurd di nav 5 împaratoriyan de hatine parvekirin. Sucê me Ewropayîyan jî divê yekê de heye. Bi taybetî Ingilîstan. Iro Kurd ne bi tenê bê dewlet in, hinek gelên din jî hene. Wek li Swêdê Samer, Filîstin, li Amerîka sorik (îndîaner) ûwh... Iro Kurd bibin xwedî dewlet, sibê yên din dibin. Ji ber vê yekê, çima Kurd bibin dewlet? Kurd hemû dewletan nas dikin, lê ew Kurdan nas nakin!

Dibêjin Kurd şervan in. Lê metodên din jî hene. Belkî Kurd li Gandiyekî bigerin. Belkî jî Gandiyekî rabe... Ewropayî li ser petrolê radiwestin. îhtîyaciya cîhanê bi petrolê heye. Divê xêra petrolê li Kurdan jî bêt parkirin. Sê tiştên girîng hene. Petrol, av û dewlet. Divê mirov wan bi parve bike. Di herseyan de heqê Kurdan jî heye. Divê di konferansa Rojhilata Navîn de, li ser van parvekirina hersê tiştan rawestin. Niha hinek dibêjin "heger Kurd bi serkevin, dê xencerên xwe bikşînin. Heyfa (tola) xwe bigrin." Raste heyf girtin heye, lê ku mirov eynî metodî bi kar bîne.

Ewropayî dema neteweyên bê dewlet dibînin û dibêjin "

ev sîstemeke klasîk e." Wek yê ku pereyê wî hebe û bêje "pere ne tişt e." Kurd dixwazin dewleteke çêbikin, ku ev aparat di destê Ewropayiyan de bi xwe heye. Lê, Ewropî dixwazin dewletên super çêbikin.

**"Divê Swêd alîkariya însanî bike!"**

Nûnerê bereyê (cepheyê) Kurdistana Iraqê Hoşyar Zebarî, di derheqê kirinên Saddam de, bi hejmar mînakan da û di derheqê rewşa Kurdistanê ya nû û çalakiyên pêşmerge de, bi kurtasî van agahdariyan da Konferansê:

- *Niha li Kurdistana Iraqê û Iraqê serhildana gel heye. Kurd, EEreb, Asûrî û Tirk bi hevdu re, li dij rejîma Saddam têdikoşin. Piraniya axa Kurdistanê hatiye rizgar kirin. Ji Xaniqîn heta Silêmaniyê, Zaxo û Dihokê ketine destê pêşmêrgeyên Bereyê Kurdistanê. Kurd di nav muxelefeta Iraqê de hêzeke girîng in. Em dixwazin demokrasî bêt Iraqê û ji bo Kurdan jî otononiya rasteqîn pêk bê. Çareserkirina meselê helkirina pirsa netewî ye. Heta mesele Kurd li Iraqê hel nebe, aştî nayê Iraq û herêmê. Em wek Bere dixwazin civata navnetewî bi awakî aştî meseleyê bigre destê xwe û hel bike. Bere, ji Swêdê daxwaz dike ku ew piştgiriya însanî ji bo Kurdistana Iraqê bike. Saddam û rejîma xwe dikarin hemû gelên Iraqê bikujin.*

**"Programa TEVGERê ya dûr û nêz heye"**

Li ser navê TEVGERê S. Dîcle axaft. Nûnerê TEVGERê, ji dîrok û cografiya Kurdistana Bakur destpêkir û behsa dema Osmanî û Kurdan kir. Di dema Osmanî de polîtîka şovenîst a ku Kurdan kuşt, talan kir, koçbar, asîmîle, ziman û edebiyata wan çawan qedexe dikir. Mustafa

Kemal vê polîtîka Osmanî dewr girt û hîn tûjtir û barbartir li ser Kurdan bikar anî. Wî, behsa di wexteke hewqas zor de, dîsan di navbera 1970 û 1980' î de hestên kurdayetiyê çawan pêşket û hêzên Kurd çawan xwe bi organîze kiribûn, kir. Bi taybetî piştî 1980'î dewleta Tirk bi awakî vekirî çawan Kurdistanê dagîr û talan kir. Nûnerê TEVGERê, di axaftina xwe de:

*- Ji ber vê rastiyê TEVGER armancên dûr û dirêj ên miletê Kurd û yên acîl ên dema nêzîk tevî hev nake. Di armancên dûr û dirêj de, li pêş me serxwebûn heye. Lê, di yên nêz de bi kurtasî em dikarin weha bêjin: Divê hebûna miletê Kurd bê qebûl kirin. Qanûnên fevqalade û Walîtiya herêmê bê rakirin. Ordî ji Kurdistanê vekişe. gundên valakirî û şewtandî bên avakirin. Efûya giştî derkeve. Divê pirsa Kurd di konferansa navnetewî ya Rojhilata Navîn de cîh bigre. Kurd jî wek terefekî di konferansê de beşdar bibin.*

**"Divê bûyera Qasimlo bê zelalkirin."**
Li ser navê PDK-Îranê K. Dawidî axaft. Dawidî, di axaftina xwe de, behsa kirinên zilm û zordestiya rejîma Îslamî ku di nav 12 salan de çawan li ser gelê Kurd kirîye anî zimên û di van 12 de salan de, çawan têkoşîn û berxwedanan dane. Di nav 12 salan de rejîma Îslamî 50.000 Kurd kuştine, dîyar kir. Wî, li Rojhilata Navîn Konferanseke navnetewî pêşnîyar kir û got ku:

*- Daxwazeke me yê din jî, ji Konferansa Stockholmê heye. Ew jî, Konferans ji bo kuştina Qasimlo rejîma Îslamî protesto bike û ji bo dîtina qatilê wî, daxwaza zelalkirina bûyera kuştina Qasimlo ji dewleta Avusturyayê bike.*

Dawidî di axaftina xwe de Piştgiriya serhildana Kurdistana Îraqê kir.

**Mistek ji çanda Kurdî**

Komîtê, êvarê programeke kulturî pêşkeşî nûner û mêvanan kir. Helbestvan Şêrko Bêkes çend helbestên xwe bi kurdî xwend û paşê wan wergêrandin îngilîzî. Nûnerê Awistraliyayê nivîskar Şahîn B. Soreklî bi kurdî û îngilîzî du helbest pêşkêş kir.

Koma Dîlan bi lîstikên xwe şevê geş kir. Şivan û Gulîstanê jî, reng dan konferans û şevê.

**"Zordestî sist û çewsandin sivik bûye"**

Kemal Ahmed li ser navê Tevgera Nîştîmaniya Neteweyê Kurd li Suriyê axaftinek kir. Nûnerê Kurdên Kurdistana Suriyê Kemal Ahmed, behsa zordestî û stemkariya 1962 û ya ku piştê wê li ser Kurdan hebûn kir. Behsa koçkirina Kurdan û ji deststendina axa Kurdan kir. Lê, li ser rewşa niha jî weha berdewam kir:

- Lê, di van salên dawî de hinekî zordestî hatiye sistkirin û ew çewsandina berê sivik bûye. Wek numûne, girtîyên Kurdên sîyasî di zindanan de nemane. Pencereke demokratî ji miletê me re hatiye vekirin. Cara pêşî di dîroka Suriyê de tê dîtin, ku hinek nûnerên Kurd diçin parlementoya welêt.

Tevgera Kurd xebata xwe ya demokratî - aştî didomîne. Çi li der û çi li hundirê parlementoyê, bi cîhkirina daxwaz û mafên gelê Kurd, wek:

* *Naskirina meşrûtîyeta tevgera Kurd*

* *Ew dezgehên ku li herêma Kurd heye divê rengên xwe yên demokratîk bigrin.*

** Gelê Kurd bibe xwediyê mafê xwe yên çandî, sîyasî û civakî*
** Hilanîna hin sîyaset û planên ku bîhna şoveniyê ji wan tên.....*

**"Divê pirsa Kurd here Koma Netewan"**

Prosefor Şakirê Miho li ser navê Kurdên Sovyetê axaftineke Kurt kir. Ji bo Konferansê çend pêşniyarên pratîk pêşkêşî Konferansê kir:

*- Ev Konferans sembolîk e. Dijberiyên (konflîkt) herêmê ne yên dewletên biçûk in, yên dewletên mezin in. Dema di herêm û cîhanê de dijberî hebin aştî çênabe.*

*Du riyên pirsa Kurd hene: yek bi rengeke aştî. Ya din jî wek Helebçe jenosîd e. Pirsa Kurd bi metoda Helebçê nayê hel kirin.*

Ev Konferans divê rêçek bihêle. Sê tişt bikevin rê:

*1- Divê di Koma Netewan (FN) de wek Filistîyan nûnerê Kurdan hebe.*

*2- Divê Komîta Swêdê, ji konferanseke netewî re fotomateryalek be. Wek 1963-an pirsa Kurd bibe Koma Neteweyan.*

*3- Bi argumentan agahdarî bidin dewletên mezin ku pirsa Kurd bigrin rojevê.*

**"Divê hevkariyeke rast û durust were pêşkêşkirin."**

Nûnerê PKK Maşallah Öztürk, berî ku dest bi axaftina xwe bike, rexne li Komîta amadekar girt, ku çima li ser navê PKKê gazî wan nekirine. Di axaftina xwe de mînak

ji serhildan û berxwedanên Kurdan da. Sedemên tekçûna û serneketina wan anî zimên.

*-Lê, ev çend salên dawî ku li Kurdistana Bakur ew şerê ku têye dayîn rewş û çarenûsiya gelê Kurd bi rengekî cuda da dîyar kirin. Ev jî, ji tecrûbeyên dîrokiyên me tên.*

Di derheqê konferansê de jî bi kurtasî van tiştan got:

*- Pirsa Kurdan ne pirseke çandî ye, Ne pirseke koma biçûk ya mirovan e. Ne pirsa çend kesên di zîndanan de ne. Yanî ne pirsa mafê mirovî ye. Pirsa Kurdan, pirsa azadiya 25 milyon Kurd û serxwebûna welatê wan e. Em dibêjin hinek bi çavên ticaret û bazirganiyê xwe nêzikê pirsa Kurd dikin. Bila her kes bizanibe ku rizgariya Kurdan, divê bi îrada Kurdan be. Piştgiriya Kurdan, piştgiriya têkoşîna serxwebûn û azadiya Kurdan e. Prensîbên demokratiya rast jî, ji bo me ev e. Pirsa vê civînê, pirsa hevkariyeke rast e. Divê hevkariyeke rast û durust bê pêşkêşkirin.*

## "Di peymana Sewrê de dewleta Kurd jî hebû"

İsmet Şerîf Wanli, rexne li pêşnîyara deklarasyonê girt, ku tê de mafê çarenûsiya Kurdan cîh negirtiye û di şûna wê de mafê mirovî heye.

- Di peymana Sewrê benda 64-an de: " Heger Kurd doza dewleteke bikin divê em li dij dernekevin."

- Min çav li deklarasyonê gerand, mafê mirovî girtî ye. Pirsa Kurdan ne pirsa mirovî ye, pirsa netewî ye. Me di Konferansa Lozanê de jî, vê yeke da dîyar kirin. Divê mafê netewî bikeve deklarasyona vê konferansê.

**"Li her perçeyî taybetiyên xwe yên cuda hene"**

Şêx Izzedîn, li ser navê xwe, Komela û Hîzbî Demokratî Kurd Rêxirabî Şoreşger axaft. Behsa kevneperestî û nîjadperetiya rejîma îslamî kir. Got ku:

- Li her perçeyê Kurdistanê taybetiyên xwe yên cuda hene. Ji bo Konferansê pêşnîyariyên me hene. Divê ji bo Kurdan konferanseke navnetewî pêk bê. Li her perçeyî Kurd heqê xwe bigrin. Ji Konferansê re dua dikim û serkeftin dixwazim.

**"Bi navê Kurdistanê welatek heye"**

Li ser navê 14 (1) rêxistinên Kurdistana Bakur İ. Delen axaftineke kurt kir. Wî di axaftina xwe de, ji dema Lozanê heta niha ew zilm û zordestiya ku liser Neteweyê Kurd heye anî zimên û pêşnîyariyeke 8 xalî pêşkêşî konferansê kir:

1- Kurd ne wek mînorîtet, divê wek netewe bên qebûl kirin û ev bikeve deklarasyonê.

2- Di platformên çareserkirina pirsa Rojhilata Navîn de, pêwîst e, ku Kurd jî bên temsîl kirin.

3- Divê komîsyoneke navnetewî bê damezrandin, ku ka kî wan çekên kîmyewî çêdike, difroşe û bikartîne. Rejîma Iraqê li hember Kurdan çekên kîmyewî bikaranî, divê Iraq û ew fîrmayên ku çekên kîmyewî çêkirne û firotine, tazmînata wê bidin Kurdan.

4- Di biryara Konferansa Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê de kêmkirina çekan, divê Kurdistana Bakur jî bigire nav xwe.

5- Ji bo temsîliya çavdêrî ya Yekîtiya Netewan û ji bo nûneriya daîmiya gelê Kurd di muessên navnetewî de, bila xebat bê kirin.

6- Bila ordiya Tirk ji Kurdistanê vekişe û îdara ewlekarî li Kurdistanê bê rakirin.
7- Ew çekên ku ji bo şerê Xalîcê, di riya NATO re çûne Tirkiyê, bila bi şûn ve bê şandin.
8- Ji bo birêvebirin û taqîbkirina biryaran, bila komîteyeke çavdêr pêk bê û di vê komîtê de Kurd jî hebûn.

(1) Kawa, Rizgarîvanên Neteweyên Kurdistanê, Tevgera Rizgariya Kurdistanê (TEVGER), Tevgera Sosyalîsta Kurdistanê, Partiya Karkerên Kurdistanê (KIP), RIZGARÎ, Platforma Demokratik ya Welatparêz û Şoreşger a Kurdistanê, Platforma Yekîtiya Ala Rizgarî, Partiya Demokrata Kurdistana Tirkiyê û Têkoşîna Sosyalîst.

**"Yekgirtî û serketî bin!"**

Asbjörn Eide (Oslo): Di derheqê Kurd û mafê çarenûs de ya girîng ew e, ku xelk bi xwe biryar bide. Ev otonomî, federasyon an serxebûn e. Mafê çarenûs li ser daxwaziya gel, azadiya gel e.
Li Kurdistanê gelek faktor hene, ku mafê çarenûs bêt stendin. Neteweyê Kurd yek netewe ye. Divê ev yek li ser qanûn û prensibên netewî be. Heger dewletek çêbikin çawan dikarin vî mafî bigrin? Encama mafê çarenûs wek welateke serbixwe raste rast bi dewletê ve girêdayî ye. Ev mutlaq nîne. Heqê her neteweyî ye, ku çarenûsiya xwe bi destê xwe bigre. Ev heqê Kurdan e jî. Di peymana Sewrê de jî, her çiqas ne vekirî bû jî, ev tişt hebû.

**"Sîstema kevin û ya nû"**

Profesor Richar Falk (Stockholm): Niha dem hatiye ku Kurd mafê xwe yê çarenûsî bigrin û biparêzin. Doza Kurdan li Ewropa û DYA baş nehatiye fam kirin. Filistînî

gelek hindik in, lê her kes baş dizane doz û rewşa wan çi ye. Di bin zordariya Saddam de xelkê Ewropî baş ji rewşa Kurdan agahdar bûn. Armanc û encama vê konferansê divê agahdariyeke baş bidin Ewropiyan, çapemenî û sîyasetan.

Bûyera Xalîcê pirsa Kurdan guhart. Bush bi xwe got ku, " *divê mirov li Rojhilata Navîn rêzgirtinê bide mafê mirovan. Ev nîzama cîhanê ya nû ye.*" Lê, gelo armanca wî çi ye? Gelo xelkê herêmê ji bo kara xwe bi kar bîne?

Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, armanc, parvekirina Kurdistanê bû. Petrol hebû. Peymana Sewr û Lozanê bidin ba hevdu; di Sewrê de mafê Kurdan hebû, lê, di Lozanê de rabû. Û welatekî nû - Tirkiye hat çêkirin. Niha jî, piştî şerê Xalîce çi polîtîka tên çêkirin? Du rojan berê Kamuran İnan digotin, " dawiya welatê mezin li herêmê tên û yên biçûk dest pê dikin." Ev girîng e. Hesabê Saddam têkçû. Gelo dê niha di herêmê de, rola Tirkiyê, Suriyê û İranê çi bin?

Ez du tiştên nîzama kevin bêjim. Rewşek hat afirandin di navbera netewe û dewletan de. Bi taybetî ya gelê Kurd. Ev jî ax e. Erd û netewe probleman çêdikin. Gelek kes baş nizanin nîzama dewlet û netewan çi ye. Di polîtîka kevin de, dewlet dihatin zanîn. Lê, trajedya Kurd bûbû esîr û eserê dewletê. Dibêjin "Tirkiye dewletek e û temsîlê neteweyekî dike." Ji ber vê yekê dema mirov behsa Kurdan bike nabe. Lê, li gor qanûnên navnetewî dewlet hene. Niha jî dibêjin" dewlet û netewe ne yek in." Me dît, neteweyên ku dewletên wan tunin, çi tên serê wan.. Pêwîst e, ew xwedî dewlet bin.

Sîstema kevin û ya nû çi ne?

Berî krîzê sîstem bi hevdu re keti bûn hemberiyê. Dema fêda DYA tê de hebe çek didin Kurdan. Çawan İran û İraqê berhev dan. Saetên Kissinger ên tarî hene, ku çi anî serê Kurdan.

Niha di vê navê de Tirkiye çima vê rolê dilîze? Gelo dixwaze Iraq ji navê rabe, an bi rastî ber bi guhartinên nû ve diçe?
Ji bo Kurd û Filistîniyan dibe ku dewletên ne otonom derkevin holê...

**"Aştî di mala min de nîne"**

Dr. Mahmûd Osman: sîyaseta DYA ev e, ku pirsa Kurd di nav dewletên herêmê de hel bike. Her dema ku me pêwendî bi DYA dadanî, wan digot:
*" Belê, belê, em we fam dikin, lê îhtiyaciyên me hene. Em ji ber vê yekê nikarin."* Iranê di dema Şah de bi Tirkiyê re nedixwest, ku pirsa Kurd bê rojevê.
Piştî krîzê em carek din çûn Amerika. Dîsan gotin:
" Bes bi Saddam re promlemên me hene."
Çendek berê jî, em çûn konferansa Amerika, Madam Mitterand jî li gel me bû. Dîsan bi me re pêwendî danenîn. Bi tenê me pêwendî bi berpirsiyarê Mafên Mirovan re danî, lê ew jî paşê nehiştin.
Gelek caran em çûn FN. Gotin:
*"Ev pirsa hundir e û divê dewlet wê bînin rojevê."*
*Ji me re gotin; "dewletên ku têkiliyên wan zêde bi wan dewletên herêmê ve tune, bila ew pirsê bînin FN. Gotin baştir ew e, ku hûn herin Izlandê. Ew dewleteke biçûk e û ji bo vê pirsê gelek di cîh de ye. Em çûn Izlandê û me wan dît. Gotin "baş e." Paşê em çûn Newyorkê, gotin " nabe. Amerîka gotiye hûn nikarin."*
Em çûn ba sekreterê FN. Me derdê xwe jê re got:

*" Bi hezaran penaberên me li Iran û Tirkiyê hene. Birçî ne. Tazî ne û perîşan in. Ji wan re alîkarî bikin."* Wî got ; *"Rast e. qanûnên FN û navnetewî hene. Em nikarin."*

Em rabûn çûn rêxistina Koma Penaberan. Me ji wan re jî got; " *wek Filistiniya, wek Afganistaniyan ji penaberên me re jî alîkari bikin. Statuya penaberiyê bidine wan."*

Gotin; "*na Tirkiye nahêle."*
Baweriya min bi Tirkiyê tune. Lê, dibe ku qezenca wan hebe û ber bi me bên.
Belê, rewşa niha hêviyê dide me. Lê, pereyê me tune. Niha piştî rewşa li welêt hinek sempatîzanî çêbû. Niha pirsa me bû pirsa navnetewî. Piştî rewşa nû, em çûn Fransê. Wan ne raste rast lê, gotin "belê." Her weha Moskova jî, em çûn û me bersivên pozîtîv girt. Me biryar da ku em pirsê bibin FNê. Parlementoya Fransê biryar girt ku pirsê bibe FNê. Ji serokê Fransê Mitterand pirsîn:

- *Gelo li derî pirsa Kurd aştî li Rojhilata Navîn çêdibe?*
Wî got:
- *Na. Aştî li mala min bi xwe çênabe. Bi jina min bimîne nahêle!*

**"İngilistanê di derheqê Kurdan de polîtîka xwe guhartiye"**

Parlementera Partiya Karkerê İngilistanê, Ann Civyd behsa zilm û zordestiya li ser Kurdan kir û di derheqê polîtîka İngilîztanê ya niha de weha digot, an soz didan:

- *Niha di polîtîka İngiliztanê ya nû de, di derheqê Kurdan de guhartin çêbûne. Di vî warî de hemû partiyên İngiliztanê bi hevdu re ne. Ez bawer im, ku İngiliztan dê li ser Amerîka jî tesîreke pozîtiv bike. Partiya me ji bo Kurdan dest bi xebatên baş kiriye....*

**Pêşkêşkirina raporên Komekî**

Komîta konferansê ji berê ve biryar girti bû, ku hinek kes û komikên xebatê li ser rewşa Kurdan raporan pêşkeşî Konferansê bikin. Li ser rewşa Kurdistana Îraqê Viola Furubjelke û Omer Şêxmûs; ya Tirkiyê Maria Leissner, Şerefxan Cizîrî, Eşref Okumuş û Anders Utas; ya Îranê Bo Utas; ya Kurdên Sovyetê Cemşîd Heyderî û li ser Kurdên mahacir jî Birgit Amman, Keya Îzol, Omer Şêxmûs û Olof G. Tandberg raporên xwe pêşkêş kirin.

**Deklarasyon û qanûnên navnetewî**

Thomas Hammarberg li ser deklarasyona dawî agahdarî da. Ji nûneran daxwaz kir, ku deklarasyonê weha formile bikin, ku li gor qanûnên navnetewî be. Û di organên navnetewî de bên qebûl kirin û avuqat jî, wê bibin Koma Neteweyan.

**Komên xebatê pêk hatin**

Roja paşî, ji bo pêşniyarî û daxwazên nûneran xebatên komekî pêk anîn. Xebatên komekî weha hatin dabeşkirin:

1- Koma rêxistinên demokratîk li Ewropa;

2- Koma rêxistinên navnetewî li der;

3- Koma weşan û çapemeniyê...

Her kom cuda civiya. Di nav xwe de biryar, daxwaz û pêşnîyaran gotûbêj kirin. Û di dawî de, her koma xebatê rapora xwe pêşkêşî Konferansê kir.

**Gotûbêj li ser deklarasyonê**

Nûneran li ser pêşnama (taslaxa) deklarasyonê dîtinên xwe anîn zimên. Xala li ser bêtir gotûbêj bû, xala ku "*parastina mafê Kurdan ên mirovî*" bû. Bi taybetî nûnerên

rêxistinên Kurd yên polîtîk giraniya xwe danîn û di şûna gotina *"mafê mirovî"* de *"mafê çarenûsî"* kirin xala daxuyaniyê (deklarasyonê). Xweza ev jî gaveke pêşketî bû. Taybetiya Konferansa Stockholmê ji xwe yek jî, ev bû û ya din jî mirov giraniya partî û rêxistinên Kurd bi awayekî vekirî didît.

Nûnerên Konferansê piştî van guhartinan bi yek dengî deklarasyonê qebûl kirin û dawiya konferansê hat.

Piştî konferansê, di eynî cîh de, Kurdan di nav xwe de civîneke taybetî çêkir. Di vê civînê de, li ser pêwîstiya pêkanîna kongreke netewî rawestan û pirsa kongreya netewî gotûbêj kirin.

## PLATFORMA MORAL Û ŞÊWRÊ

Konferansa Stockholmê bi nûçeyên xweş vebû. Dema li Kurdistana Başûr hêzên pêşmêrge, di Bereyî yekgirtî de, bi gelê Kurd re dibûn yek û gav bi gav axa Kurdistanê ji rejîma Saddamê xwînrêj azad dikir, pêk hat. Ev serfirazî û pêşketin ji Kurdên nûner û kesên amadekarê Konferansê re bû moraleke bilind û xurt. Vê rewşa ha pirsa Kurdan li cîhanê aktuel kir û anî rojevê.

Konferans di vê demê de bû platforma hevdîtina hêz û kesên Kurd. Li ser rewş, polîtîka û statûya Kurdistana Başûr, di nav Kurdan de gotûbêj, şewir, dîtin û daxwaz germ û geş bûn. Konferans ji Kurdan re bû platforma moral û şêwrê. Di bingehê xwe de, Konferans ji nav çar dîwarên salonê derkete der.

Di dema civîna Konferansê de, rizgarkirina Kurdistana Başûr li seran serê cîhanê olan da û di çapemeniya cîhanê de rêza yekemîn girt. Ji ber vê yekê Konferans di bin sîya wan bûyerên ku li Kurdistana Başûr dibûn, de ma. Ma ji xwe armanca Konferansê jî, ev bû ku pirsa Kurd di raya giştî û çapemeniya cîhanê de aktuel bibe û bikeve rojevê. Dîsan ji ber van bûyerên Kurdistanê, gelek kesên polîtîkvan û ronakbîrên Kurd nikaribûn beşdarê Konferansê bibin. Herweha ji aliyê beşdarbûniyê ve jî sewiya Konferansê nizm bû. Dîsan mirov di vê mijarê de didît, ku pîvan û prensîbên komîtê, di derheqê hilbijartina nûneran de, kêmasî û çewtiyan derdixistin navê. Ev prensîb di roja dawî de, hîn jî sist bû.

Di Konferanseke weha de, li ser navê gelek rexistinên Kurdan cuda cuda axaftin, carek din belavbûna Kurdan da dîyar kirin. Û ji ber vê yekê jî, eynî tişt dihatin tekrar kirin.

Di Konferansê de, bêdengiya Kurdên Rojhilat bala mirov dikişand.

Di Konferansa Stockholmê de, bi daxwaz û însîyatîva hêzên Kurdistana Bakur û hinek nûneran, çarçova daxwaz û pêşnîyariyên Konferansa Stockholmê, ji yên berî firehtir û pêşketî bû. Konferans ji çarçova mafê mirovî û kulturî derket. Di nav xalên (nuqtên) deklarasyonê de mafê çarenûsî cîhê xwe girt. Ev yek, ji bo rojên pêş, di platformê weha de, divê bêt parastin û daxwaza dewleteke Kurd bêt kirin.

Divê em ji bîr nekin, ku her platformeke navnetewî, ji bo standina mafê neteweyê Kurd, geveke pêşketî ye. Em Kurd divê gavan bavêjin...

**Amed Tîgrîs**

## *Deklarasyona Konferansa Stockholmê*

*Zordariya ku li ser ji 20 milyon Kurdî bêtir heye, divê ji aliyê civaka cîhanê ve êdî neyê qebûl kirin. Ev tehdîdek e, li ser aştî û edlayiya Rojhilata Navîn êrîş û destdirêjkirinên li ser standartên mafên mirovî ye, ku bi peymanên navnetewî hatine tespît kirin.*

*Destdirêjkirinên li ser mafên mirovayî li Kurdistanê gelek salan pêk hatin û niha jî sîstematîk û bi berfirehî dom dikin: Girtinên sîyasî, êşkence, cezayên giran ên piştî mehkemekirinên xapînok û ne li rê yan jî qet bê mahkeme, "wendabûn", cezayên mahkemên fewqelade, şerê kîmyewî, valakirin û wêrankirina waran, xwarin û wesîtên jîyanê, înkara mafê ziman, edebîyat, muzîk û hebûna dîroka xwe, rewşa dijwar û nemirovayî ya li kampên penaberan!..*

*Gelê Kurd tû caran jîyana demokrasiyê nedît. Xerabtirîn xwedî îdarekirinek bi qîmet nebû para wî. Iraqê - welatê ku li ser kaxezê soza awayek otonomiyê ji bo wan da - di riya zordarî û pêşkêşkirina karmendên xwe yên hefsarkêş re, ev peyman binpê kir.*

*Iran, Irak, Suriya, Tirkiye û Sovyet hemûyan di demên cihê cîhê de, bi zanabûn hewldan ku di riya teşebûsa guhartina mîzana demografîk a herêmên Kurd re şexsiyeta netewî ya Kurd bibişêfin.*

*Heta ku ev bê edaletî dom bike, dê tû aştiyeke rastîn li Rojhilata navîn peyda nebe.*

*Konferans;*

*Daxwaz dike, ku hukimetên Iran, Iraq, Suriye, Tirkiye û Sovyetê Beyana Navnetewî ya mafên*

*Mirovî, herweha peymanên mafên mirovayî qebûl bikin û wan li Kurdistanê û herêmên din ên ku gelê Kurd lê dijîn, bi her awayî bi cîh bînin.*

*Konferans, bi taybetî ji van her pênc hukimetan daxwaz dike ku:*

*- Di demekî kin de koçkirina Kurdan û wêrankirina avayî, talankirina mal û hebûnên wan rawestînin;*

*- Bi carekê de girtiyên Kurd yên sîyasî berdin, êşkence û cînayetan rawestînin;*

*- Riya vegera penaberên sîyasî yên Kurd vekin û hemû mafên wan ên hemwelatiyê garantî bikin;*

*- hemû dezgehên di nav hêzên polîs, emnîyet û eskeriyê de belav bikin, ku ew ji bo zordariya li ser gelê Kurd hatiye bikaranîn.;*

*- Sîstemên xwe yên dadgehî û qanûnî li gor standartên navnetewî yên mafên mirovayî reforme bikin;*

*- Zerara qurbanên îhlalkirinên derbasbûyî yên mafên mirovayî tazmîn bikin;*

*-Mafê ziman û kultura kurdî, herweha mafê çapemenî û weşanê bi kurdî qebûl bikin û mafê zarok û ciwanên Kurd hene bi ziman, xwe hîn bibin û bixwînin;*

*- Rê li bergirtina pêwendiyên navbera Kurdan li ser tixûbên navnetewî bisekinin û dest bi hêsakirinê bikin;*

*- Daxwaz dike ku her ev hukimet mafê çarenûsiya gelê Kurd qebûl bikin, hewla guftûgoyeke li ser bi destxistina vî mafî bikin ku bi awayekî ku têkiliyên aştîdar, dualî û dilovanî di navbera Kurdan û civakên cîran de peyda bibin.*

*- Bangî hemû hukimetan dike ku îhlalên*

*Kurdan li wan welatên ku ew lê dijîn ji ber kişandine û dikêşin, di Konseya Mafên Mirovayî ya Neteweyên Yekbûyî de berpêş bikin;*

*- Bangî hemû hukimetan dike ku bi xurtî bixebitin ji bo bicîhanîna peymana normên navnetewî ya li ser bikaranîna çekên kîmyewî;*

*- Bangî hemû hukimetan dike, ku doza Kurd - mafên mirovayî yên kesên Kurd û herweha mafê çarenûsî ya gelê Kurd - di insîyatîfa aştiya Rojhilata Navîn a piştî şerê Xalîcê de bikin xwedî par;*

*- Bangî Sekreterê Giştî yê YN dike, ku lê bikole û pêşnîyar bike ku gelê Kurd û civakên din yên bê dewlet çawan çêtirîn dikarin di karûbarên Neteweyên Yekbûyî de bên temsîl kirin;*

*- Daxwaz ji hemû hukimetan dike ku pêwendiyên li gel penaberên Kurd li ser bingehekî însanî bin û mafên penaberiya wan jî, bi qasî yên pênaberên grûbên din bin, ciddiyeta zordariya li ser Kurdan a ku li welatên wan ê eslî bi ser wan de tê, li ber çav bigrin;*

*- Bangî Komîsyona Bilind a Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Mafên Mirovayî (UNHCR) dike, ku beşdariyek mezin bide parastin û alîkariya penaberên Kurd ên Rojhilata Navîn, bi taybetî yên Tirkiye, Iraq, Iranê, bangî hemû hukimetan dike, ku di vê meselê de piştgiriya UNHCRê bikin.*

**18'ê Adarê**

Pêşmêrge êrîşeke mezin bir ser bajarê Mûsilê. Ji derî Mûsilê hemû bajarên Kurdistanê yên mezin rizgar bûn. Mesûd Barzanî li Bajarê Silêmaniyê bi milyonan re

mîtîngeke pêk anî. Li herêmê hemû dezgehên dewletê ketine destê Bereyê Kurdistanê. Li Kurdistana Başûr dewleta Îraqê hildiweşe.

**19'ê Adarê**

Celal Talabanî li Şamê daxuyanîyek da, ku bi hemû hêzên oposîzyona Îraqê re, amadeye ku herin Kurdistanê û di nav şer de hukumetekê saz bikin. Talabanî xwe bi çûndina Kurdistanê re amade dike.

**20'ê Adarê**

Celal Talabanî di sînorê Suriyê de, bi hinek serokên oposîzyonê û hêzek pêşmêrge ve çû Kurdistana Başûr. Li gel wî gelek rojnamevan û nûçegîhanên Ewropî jî çûn Kurdistanê.

**21'ê Adarê**

Talabanî bi heyeta xwe ve gehêşt bajarê Dihokê. Li Dihokê mîtîngek pêk anîn. Bi hezaran kes beşdarê mîtîngê bûn. Talabanî di mîtîngê de axaft.

**22'ê Adarê**

Li gor nûçeyan, hêzên Saddam ên Parastvanên Komarî li Başûr bi barbarî Şîîyan dikujin û serhildana Şîîyan li ber têkçûnê ye. Ji bo êrîşkirina Kurdistanê jî, xwe ji şereke gelek giran û dijwar re amade kirin. Ji bo êrîşa mezin û dijwar Kurd çeperên şerê dikolin. Kozikan çêdikin.

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal piştî vegera Sovyetê, îro jî çû Amerîkayê.

**23'ê Adarê**

Saddam giraniya xwe da eniya Kurdistanê. Şer di navbera hêzên pêşmêrge û yên Saddam de dom dike. Lê, ji % 90

axa Kurdistanê di bin kontrola pêşmêrge de ye.

Turgut Özal, li Camp David li ser pirsên Rojhilata Navîn bi Bush re civînek pêk anî. Yek bi naveroka civînê nizane. Li gor texmînan pirsa Kurdan ya sereke ye.

**24'ê Adarê**

Bush û T. Özal piştî hevdîtinê presskonferansek pêk anîn. Bush got em mudaxeleyê karê nav Iraqê nakin. Nûçegîhanê CNN ê ji Turgut Özal pirsî:

- Hûn Iraqeke bê Saddam dixwazin?

Bersiva Turgut Özal:

- *Em mudexela hundirê Iraqê nakin.*

Çapemeniya cîhanê û ya Tirkiyê bi xwe nivîsandin, ku *"Turgut Özal mesaja Saddam ji Bush re birîye ku Bush bihêle ku balafir û helîkopterên xwe li dij Kurdan bikarbîne. Bush û Turgut Özal li ser wê pêşniyariya Saddam li hevdu kirine."*

**25'ê Adarê**

Şer di nav hêzên pêşmerge û Saddam de dom dike. Ji ber ku rojnamevan û nûçegîhanên bîyanî li Kurdistanê û Iraqê tune ne, kes baş nizane ka rewş çi ye. Her du alî jî dibêjin, ango hem Kurd û hem jî Iraq dibêjin ku *" em bi pêş ve diçin. Hêzên me bi ser dikevin."*

**26'ê Adarê**

Li gor CNN hêzên Saddan êrîşeke mezin birin ser bajarê Kerkûkê ku di bin kontrola Kurdan de ye. Şerekî gelek dijwar di nav hêzên Kurd û Saddam de heye.

---

(*) Paşê dîyar bû ku di 27'ê Adarê de Kerkûk bi paş ve ketîye destê hêzên Saddam.)

Li gor nûçeya Îranê ÎRA hêzên Şiî xwe berhev dikin û dixwazin êrîşekî mezin bibin ser bajarê Bexdayê.

**Kroll CBS TV** lêkolînek çêkir û li gor vê lêkolînê Saddam Huseyîn bi wesîta zirbirayê xwe **Barzan el Tikritî 10 milyar dolar** pere li ser hesabê xwe derxistiye der û birîye Amerîka. Barzan el Tikritî niha li ser navê Iraqê li Cenevrê, di Buroya Koma Netewan ya Mafê Mirovî de nûnerê Îraqê ye. Ev pereyên wî niha li ser navê birayê wî di şirketên Amerîka de ne. Ev pere ji %5 petrola Îraqê hatiye girtin. Herweha Saddam di dinyayê de dewlemendê yekemîn e.

## TRAJEDIYA KURD

**27'ê Adarê**

Di riya Mûsil û Dihokê de, di navbera Kurd û hêzên Saddam de şerên dijwar pêk tên. Herdu alî jî, dibêjin *"em bi serketin"*. (*) Hêzên Saddam çekên giran û dûrmenzîl bikar tînin.

**28'ê Adarê**

Şer berdewam e. Kes baş nizane ka li Îraqê rewş çawan e. Lê, Saddam hemû çekên xwe yên giran yên ku nikaribû li dij hêzên Hevkar bikar bîne, li dij Kurdan bikar tîne. Li gor Bexdayê paqijkirina Kurdan çend roj digire. Hema hema li Kurdistanê kontrolê girtiye destê xwe.

Kurd, Îraqê bi derewan îtham dikin û dibêjin *"şer berdewam e û di bin kontrola me de ye."*

**29'ê Adarê**

Şer her berdewam e û tû kes nikare ji Kurdistanê û Îraqê nûçeyên rastîn bigire. Îraqê bi tevayî serhildana li Başûr ya Şîîyan şikestandiye û hemû giraniya xwe daye Kurdisatanê. Hêzên pêşmêrge di berxwe dide. Nûçegîhanên Rojava dibêjin plana Saddam ew e, ku ji Kerkûkê heta Zaxo şerîta sînorê Kurdistanê û Suriyê bigire. Heger hêzên Saddam riya Suriyê li Kurdan bigre, êdî Kurd nikarin alîkariya xwarinê ji derve bigrin û dê di çend rojan de teslîm bibin. Ji ber vê yekê ordiya Saddam a Parastvanê Komarê ber bi sînorê Suriyê û Tirkiyê ve diçin.

**30'ê Adarê**

Saddam dest bi karanîna balafir û helîkopteran kiriye. Li dij Topên dûrdirêj bi kartîne. Çekên kîmyewî û napalm bi kartîne. Scud davêjin bajarên Kurdistanê. 11 skûd bi tenê avêtiye bajarê Kerkûkê. Şer bi dijwarî di nav hêzên Saddam û pêşmêrge de dom dike. Amerika û hêzên Hevkar ji bo bikaranîna balafir, helîkopter û çekên kîmyewî Saddam re çavên xwe digrin. Çendek berê, dema Saddam balafirên xwe bi kar anî, Amerîka ji wan balafiran dudoyan xist û Îraqê tehdît kir ku "heger ew balafir û helîkopterên xwe bikar bîne, dê Amerîka hingê peymana şer a rawestandinê ji navê rabike û dîsa dest bi şer bike." Lê, Saddam niha balafir, helîkopter û scud li dij Kurdan bi kar tîne û Amerîka û hevalbendên xwe jê re tamaşevan in. Bi satelîtan lê temaşe dikin.

**31'ê Adarê**

Li gor nûçeyan hêzên Saddam bi balafir û helîkopteran li Kurdistanê gav bi gav pêşve diçin. Hêzên Saddam bi topên dûrmenzîl û scûdan Kurdistanê wêran dikin.

Bajarê Kerkûkê bi paş ve ketiye destê hêzên Iraqê. Êrîş dibin ser bajarên din. Li gor nûçegîhanên CNN, li Kerkûk, Hewlêr, Silêmaniyê kevir li ser kevir nemane. Saddam ew teknîka ku nikaribûn li hember hêzên Hevkar û Amerîka bikarbîne, li dij Kurdan bi kartîne. Bajar hema hema li ber ketinê ne. Xelk ji bajaran derdikeve. Bajar ji dûxan û agir nexuyane. Hêzên pêşmêrge, li



hember çekên modern, kîmyewî û bîyolîk bi qehremanî li ber xwe didin.

**1'ê Nîsanê**

Beyanî (sibehê zû) berey ê Kurdistanî hemû rêxistinên xwe yên Ewropa agahdar kir, ku ji ber êrîşên balafir, helîkopter û scudên Saddam bi hezaran xelkê sivîl bajar û gundê xwe hiştin û ber bi tuxûbên Tirkiyê, Suriyê û Iranê ve direvin. Qasî milyonek kes ji malên xwe derketine û li rê ne. Ji ber neqetilkirina xelkê sivîl, pêşmêrge xwe ji hinek bajaran paşve kişand. Li derê bajaran şer dom dike. Ji bo pêkanîna raya giştiya cîhanê û bi taybetî ya Ewropa, Kurdên li derê welêt divê xwe bi hemû îmkanên xwe ve amade bikin.

Rêxistinên Kurd û Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, bi hevdu re komîteya çalakiyan pêk anîn û dest bi çalakiyan kirin. Xwepêşandanek li hember konsolosxana Amerîka ya li Stockholmê pêk anîn. Qasî 700 kesî beşdarî xwepêşandinê bûn.Xwepê şandanan xwestin ku hêzên Hevkar, Amerîka û Koma Neteweyan qetlîama ku li Kurdistanê dibe, mudaxeleyê wê bikin. Welatên Hevkar û Koma Neteweyan divê li ser soz û peymana xwe rawestin û li gor peymana ku di nav hêzên Hevkar û Iraqê de pêk hatibû, divê Iraq balafir, helîkopter, scud û çekên kîmyewî û bîyolojîk li hember Kurdan jî, bikar neyîne. Bila Koma Neteweyan û hêzên Hevkar rê nedin bikaranîna wan çekan. Pêşî li qetlîama faşîstê Bexdayê bigrin.

# Li ber konsolosa Amerîka

Ji Federasyonê re telefon dikim. Kirîv, berpirsîyarê Berbangê, tê ser telefonê. Dibêje, heger li ber sefaretxanê tiştek interesant hebe, ji bo Berbangê binivîsîne.

Li ser daxwaza Enîya( bereyê) Kurdîstana Iraqê, Kurd ji şeva çûnê da li ber sefaretxana Amerîkayê rûniştine. Gava ez diçim wir saet li dora 18.00'an e. Êdî roj diçe ava. Li ser Stockholmê ewrên baranê hêdî hêdî berev dibin. Pelên ji daran weşyane erdê û li wir komî ser hev bûne. Swêdî, di nav otomobîlên xwe yên nerm û germ da, bi çavên şaşmayî li porreşên li ber dîwêr, li pankartan wan dinêrin û derbas dibin.

-Selamuneleykum!

-Eleykumselam.

Bi qasî deh kesên, wisa xuya ye, ku ji Kurdîstana başûr in, li hember sefaretxana Amerîkayê, li ber dîwarê baxçeyekî, di nav xwe da dipeyîvin. Silava min radigrin û axaftina xwe didomînin. Li ser çend lewhên tirafîkê û şîşên dîwarê bêxçe, çend alên reş û çend pankart hatine daliqandin. Gava ba tê, alên reş piçekî pêl didin û pişt re, weke zarokên stûxwar, bêhereket dimînin.

Mirovên din çûne mal, dê sibehê bên. Ez rismên çend pankartan digrim û ji wir diçim. Tarîyek sivik xwe berdide ser Stockholmê.

Bi hezaran kîlometir ji Stockholmê dûr, li Kurdîstana başûr, bi hezaran Kurd, zar û zêç, pîrek û peya carek din ketine rîya macîrtiyê.

Hevkar (Mutefîk) li Saddam rabûne xezebê. Ordîya Saddam ji hev xistin. Lê belê Saddam ji holê ranekirin. Hesabên wan her çawa bû, hat guhertin. Saddam li cîyê xwe ma. Ev Saddam e,ku bi Îranê nikare, bi Hevkaran nikare, lê bi Kurdan dikare. Kurdên sivîl û bê çek.

Ev çend roj in, ordîya ku di destê Saddam da maye, bi

ser bajarên Kurdîstanê agir dibarîne. Bi hezaran Kurdên sivîl, ji ber tirs û xezeba Saddam bajarên xwe yên bav û kalan terk dikin. Zarokên xwas, pîrekên bi betena kiras û kal û pîrên bêteqet, di bin bombe û gulebarandina helîkopteran de ber bi tixûbê (sînorê)Tirkîye û çiyayên Kurdîstanê ve dimeşin. Dimeşin û dimrin. Ji birçîbûnê, ji sermê, ji nexweşîyê û ji napalmên Saddam dimrin. Yên ku xwe ji bombeyên Saddam xelas dikin û xwe dighînin ber tixûbê Tirkiyê, vê carê ji alî eskerên Tirk ve gulebaran dibin.

Li gor nûçeyan, heta niha 300. 000 kes li ber tixûbê Tirkîyê kom bûne. Tirkiye wan bernade hundir, eskerên li ber tixûb, ji bo ku kes tixûb derbas neke, gulan bi ser serên wan de dibarînin. Herweha carek din Kurd li ber çavên dinê, li ber çavên hemû mirovên bê namûs û bi namûs macir û qetil dibin. Hawara Kurdan li esmanan diçerqe, olan dide. Lê, ne deng e û ne hes e. Deng bi paş ve, li xwedîyê xwe vedigere.

Sibetirê, roja 2'ê Nîsanê carek din diçim ber sefaretxana Amerîkayê. Endamên Komela Jinên Kurd dest bi grewa birçîbûnê kirine. Penc- şeş endamên Komelê, li kêleka rê, li hember konsolosa Amerîkayê, li ser erdê şil rûniştine, di grewa birçîbûnê da ne. Zîlan, endama Komîta Karger a Komela Jinan, ew jî li wir e. Dibêje:

*"Ger tu ji min bipirsî, divê me Amerîka ji bo durûtiyê protesto bikira. Lê, em nuha li vir in û dixwazin nîşan bidin ku pîrekên Kurd, di bin her şert û rewşî de dê li ba xelkê xwe cî bigririn."*

Grewa wan dê çend rojan bajo ne dîyar e. Lê, du rojan carek dê penc endamên wan bi dor grewê bimeşînin.

-Saddamê faşist û qatil!

-Alîkarî ji bo Kurdan!

-Qetlîama Kurdan bidin sekinandin!

Bi dengên sloganan re mirov li wir komê ser hev



GRUNDAD 1830 AV LARS JOHAN HIERTA

Pettersson överföll ung flicka

# AFTONBLADET

TORSDAG 4 APRIL 1991

UNIKA BILDER – ENDAST I AFTONBLADET

# Saddams mord på barnen

■ ■ Hon är bara ett av Saddams tusentals offer. I hans eget land.
■ ■ Aftonbladet har som första tidning i Norden varit inne i Irak.
■ ■ Vi såg blod och förintelse. Vi såg napalmoffer och stympade barn.

■ ■ Vi såg förtvivlade ögon, skräckens och smärtans ögon.
■ ■ Vi såg små barn som var så undernärda att de inte orkade gråta utan pep, barn som bara hade timmar kvar att leva.

AFTONBLADET INNE I IRAK

7 384107 000509

li xaniyê sefaretxanê ye. Di hundirê çavên wan de nîşanên kîn, qehr û hêvîyê li hev piçikî ne. Qehrek giran û kûr, di nav çavên wan de û li ser rûyê wan diçe û tê. Yên ku nû tên, bêdeng derbasî nav koma mirovan dibin û dest bi sloganan dikin. Di destên gelekan de cixare hene. Dûxana cixarê hêdî hêdî bi hewa dikeve, bi qasî çend saniyan, weke mirovê ku, nizanibe bi ku de biçe, li ser komikê digere, piştre wenda dibe.

Şev nîvê şevê ye. Naxwazim rakevim. Heger bixwazim jî nikarim. Gava zarokên xwas ji ber xezeba Saddam xwe li çol û çiyan dixin, gava pîrekên Kurd li ser erdê şil, di nav cil û paçan de grewa birçîbûnê dom dikin, kîjan Kurd dikare bi rehetî, bê kul û keser rakeve.

Saet di 01'ê de xwe digihînim ber konsolosxana Amerîkayê. Xort û pîrekên delal û dilşewitî xwe li erdê dirêj kirine. Heger yekcarna, xwe nelivînin, mirov dibêje qey ew mirî ne. Ji ber bataniyan û kumên li serên wan, mirov nizane kî kî ye. Xwenga min jî di nav wan de ye, lê belê, nizanim kîjan e. Ronahiya li der û dora wan car car dide rûyê wan. Hevalekî li wir, dibêje xwenga te va ye li wir e. Bi tiliya xwe nîşan dide. Silavê li xwenga xwe û çend pîrekên din dikim. Dibêjin:

-Ji me ra tiştek ne lazim e. Em naqefilin.

Çend çilkên baranê dikevin. Baran bibare halê wan xirab e. Ji ber ku çadira wan tune. Polîsên ku ji bo grewa birçîbûnê destûr dane wan, destûra çadirvekirinê nedane. Divê grewa birçîbûne, di bin ba û baranê de bidomînin.

Ji wan xatir dixwazim û ji wir bi rê dikevim. Ji ber qamyonekê derbas dibim, du hevalên Kurd di nav qamyonê de bi termosên çay û qehwê ve mijûl in. Yên din jî pîyase dikin.

**Xorto**

.2'ê Nîsanê

Kurdan li seran serê Ewropayê dest bi meş, mîtîng û grevên birçîbûniyê kirin. Li Stockholmê Komela Jinan li ba konsolosa Amerîka dest bi greva birçîbûniyê kir. Gelek komele û kesên din jî beşdarê çalakiyên birçîbûniyê bûn. Bi sedan kes bi şev û roj li ba Konsolosa Amerîka civiyan. Kon vegirtin. Ji bajarên din Kurd hatin Stockholmê. Hema hema her Kurdekî dest ji kar û mala xwe berda û şev û roj li ba Konsolosê beşdarê çalakiyan bû.

Televîzyon û radyoyên cîhanê dest pê kirin nûçeyên li ser Kurdan di rêza yekemîn de dan. Ew Kurdên ku ji ber barbariya Saddam tengezar û derbeder dibûn, fotografên wan hatin ekranên TV û rûpelên rojnameyan.

Bush di tatîla xwe ya Paskalyê de bû û masî digirt. Nûçegîhanên TV qetlîama Kurdan jê pirsîn. Bê dil bersiv da û got:

*-Me eleqeder nake. Ew karê nav Iraqê ye. Em mudaxela nav Iraqê nakin.*

3'ê Nîsanê

Li Stockholmê, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, li Stockholmê, li dij konsolosxana Iraqê meş û mîtîngeke protestoyî pêk anî. Bi hezaran kes beşdarê meş û mîtîngê bûn. Li ba Kosolosxana Iraqê çend xortan xwestin êrîş bibin ser konsolosxanê. Şer di nav polîs û wan kesan de derket. Polîs bi hesp û kûçikan êrîşî beşdaran kir. Gelek kes birîndar bûn. 33 kes ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li ba Konsolosxaneya Amerîka greva birçîbûniyê dom kir. Bi hezaran Kurd û Swêdî birçiyan zîyaret kirin û gul dane wan û piştgiriya xwe dîyar kirin.

Di eynî rojê de, li Çekoslovakyê jî, li dij konsolosxana Iraqê meşek û mîtîngek pêk hat.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê, Hêzên sîyasî yên Kurdistanê û Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê di

nav xwe de komîteyeke çalakîyan pêk anîn û dê ji vir şûn ve, ev komîte çalakîyan bi plan û program bimeşîne.

**4'ê Nîsanê**

Komek Kurd bi çek konsolosxana Belçîkayê dagîr kirin. Personalên wê dîl girtin. Ala Îraqê daxistin û ala Kurdistanê dakişandin ser konsolosxanê.

Kurdan li Londrayê meş û mitîngeke çekirin. Ji jin û zarokan komek, serokwezîra kevin Margereta Theacher zîyaret kirin û pişgirî jê xwestin. M. Theacher, wan qebûl kir û soz da ku ew dê bi hukimeta Îngiliztanê re têkiliyan deyne, ji bo alîkariya Kurdan.

Li Elmanya li dij konsolosxana Îraqê meşek çêbû. Konsolosê bi çekên otomatîk meşvanan gulebaran kir. Kuştin çênebû. Gelek Kurd ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li Amerîka bûyereke mezin çêbû. Li ba Qesra Spî mîtîngeke pêk hat. Bêdengiya FN (Koma Neteweyan) û Amerîka hat protestokirin.

Dewleta Fransê pirsa Kurd bir Koma Neteweyan. Tirkiyê û Swêdê xwestin piştgiriya pêşniyariya Fransê bikin. Di civîna FN de Sovyet, Çîn û Kuba, Hîndistan û Zimbabwe li dij pêşnîyariyê derketin. Pêşnîyarî nehate qebûl kirin.

Senatoya Amerîka rexneyên tûj û dijwar li Bush girtin. Li dij tewrê Bush muxalefet bi hêz bû. Bush, di TV de axaftinek kir û gotinên xwe yên berê dûbare kir:

*- Em nikarin mudaxeleyê nav Îraqê bikin. Ev karê wan yê hundirî ye.*

Rojnamevanê Kurd Eşref Okumuş û fotografvanê

Norveçî Georg Kristiansen di dema rizgarkirina bajarên Kurdistanê de, di riyên îllegal de çûbûn Kurdistanê. Herdu ji Kurdistanê vegeriyan Swêdê. Di rojnameya êvarê Aftonbaldet de, li ser Kurdan dest bi weşandina fotograf û nivîsaran kirin. Aftonbladet, di rûpelên yekemîn de, fotografên zarokên birîndar û seqet pêşkêş kir û 3 roj li duv hev dom kir.



## PIRSA KURD DI KOMA NETEWEYAN DE

**5'ê Nîsanê**

Koma Neteweyan, Pirsa Kurd dîsan girt rojeva xwe. Di pêşnîyara Fransê de guhartin çêkirin. Naverokê hîn jî nerm û vala kirin. Bi tenê Îraq divê êrîşê ser ew kesên sivîl û bi taybetî yên ku di rê de, ji ber rejîmê direvin neke. Di nav 15 dewletên endam de dengdan çêbû. *Kuba, Yemen û Zîmbwe* li dij derketin, Hîndîstan û Çin bê deng man. Cara yekem pirsa Kurd di Koma Neteweyan de hate gotûbêj kirin û biryar li ser hat girtin.

Li Wîyanê, li dij Îraqê meş û mîtîngek pêk hat. Îraqê protesto kirin. Kurt Waldheim jî, Rejîma Saddam bi tûndî suçdar kir.

Li seran serê Elmanyayê Kurdan dest bi xebatên protestoyî kirin û têkiliyên xwe bi rêxistinên navnetewî yên polîtîk û humanîst re geş kirin. Li Bonn û Hamburgê gelek meş û mîtîng pêk hatin. Xaniyê Xaça Sora Hamburgê hat îşgal kirin. Xaça Sor soz da, ku 500.000 mark ji bo alîkariya Kurdan dê bişêne.

Li Cenewrê Kurdan li ba KN (Koma Neteweyan) meş û mîtîngeke protestoyî pêk anîn. Li Bajarê Bernê jî meşeke girsî çêbû.

Li bajarê Warşowê, xwendekarên Kurd û dostên Kurdan ên Polonî, li dij rejîma Îraqê meşeke protestoyî pêk anîn û ji hukimeta Polonyayê daxwaza protestokirina rejîma Îraqê kirin. Di 6'ê nîsanê de, parlementoya Polon yayê û Wezereta Karûbarê Derveyî ya Polonyayê bi daxuyaniyek rejîma Îraqê, bi qetilkirina Kurdan sûcdar kir.

Xwendekarên Kurd li Sofyayê 5 rojan ketin xwepêşandana birçîbûniyê. Li dij rejîma Îraqê qasî 40 hezarî îmze berhev kirin.

Folk Partiya Swêdê, pêşnîyarî ji parlementoya Swêdê re

bir, ku pirsa Kurd wek ya netewî bibe KN.

Li Amerîka li Qesra Spî û li derê wê opozîsyoneke mezin û berfireh li dij îdareya Bush çêbû. Di pirsa Kurd û Îraqê de rexneyên tûj li Bush girtin. Bush ket tengasiyê. Piçek xwe guhart. Ji bo alîkariyê biryara 60 milyon kronî da. Soz da, ku dê, di hewa de pireyek pêkbîne û xwarin, vexwarin û cil û bergan bigîhîne Kurdistana Îraqê, ew cihên ku penaber li wir in.

Li Swêdê li bajarên Stockholm, Göteborg û Uppsalê grevên rûniştinê, meş û mîtîng her berdewam dikin.

**6'ê Nîsanê**

Pêşniyariya Fransê hat guhartin û naveroka wê hat vala kirin. Pêşnîyar weha hat formile kirin: *"Divê Îraq li ew kesên ku ji ber şer direvin bombe neke..."* bi şêweke weha dîsan hat rojeva KN. *Dîsan Kuba, Yemen û Zîmbawe* li dij derketin û *Çîn* û *Hîndistan* bêdeng man. Ji 15 endamên daîmî 10-an ji pêşniyarê re gotin "belê." û hat qebûl kirin.

NATO li Bruxselê civiya û Rejîma Saddam bi tûndî protesto kir û ji KN xwest, ku qetlîamê bide rawestandin.

Derbeder û penaberên Kurd ber bi sînorên Tirkiyê û Îranê ve direvin. Leşkerên Saddam bi helîkopteran li ser wan gulebaran dikin. Zarok û kal û pîr di rê de dimrin. Sar e. Berf dibare. Gel tazî û birçîne. Ji birçîbûnê û sermanan di rojê de, bê hejmar dimrin. TV yên cîhanê hema serê her saetî penaber û derbederên Kurd nîşan didin. Mirî, nexweş, seqet û zarokên birçî....

Kurdan li peytextê Fînlandyayê, li Helsînkiyê li dij konsolosxana Îraqê meşek çêkirin. Kurdek xwest ala Îraqê ji dîrega konsolosxanê daxe û ya Kurdistanê bikşîne. Personalên Îraqê bi çov û çekan êrîşê Kurdan kirin. Şer derket.

Li Elmanyayê Komîta Kurd, ERNK û ji çepên Tirk

komîtekî çêbû. Komîtê meş û mîtîngek pêk anî. Di meş û mîtîngê de qasî 3000 kes beşdar bûn. Herweha li bajerên Bonn, Berlîn û gelek cîhên din meş û mîtîng çêbûn.

Li seran serê Elmanyayê MEDICO INTERNATIONAL û komîteyên din, bi hevdu re, bi alîkariya radyoyê postgiro vekirin. Pere, derman, kinc û betaniye berhevkirin.

Parlementerên Kurd *Ahmed Tirk, Mehmed Alî Eren* û wezîrê berê *Şerefedîn Elçî*, ji Tirkiyê frîn û çûn Amerîka, li ba xaniyê KN dê 3 rojan bikevine greva birçîbûniyê. Parlementerên partiya HEP jî, li Tirkiyê li ba parlementoya Tirkiyê, li Ankarê ketin greva birçîbûniyê.

**7'ê Nîsanê**

Papa li Vatîkan daxuyaniyekê da û di daxuyaniya xwe de kuştina Kurdan protesto kir û ji cîhanê alîkariyê xwest.

Bi berbanga sibehê re, li Stockholmê qasî 40 Kurdî avêtin ser konsolosxana Îraqê. Agir berdan xaniyê konsolosxanê û pencere û dergehên wê şikandin. Ji konsolosxanê bi çekên otomatîk li Kurdan agir barandin. Kes nehat kuştin. 34 Kurd ji aliyê polîsê Swêdî ve hatin girtin û wan dan mehkemê.

Komîta Mafê Kurdan li Swêdê li Stockholmê meş û mîtingeke şînî pêk anî. Meşa şînê saet di 13-an de li Humlegårdên destpêkir. Ji 5000 î bêtir Kurd û Swêdî bi cil û bergên reş beşdarê meşê bûn. Li semta Kungsträgården mîtîngeke gelek mezin pêk hat. Di mîtîngê de parlementerê Partiya Kesk Per Garton, ji Partiya Çep Brit, û dengbêja Swêdî ya bi nav û deng Lill Lindfors û keşîşekî Swêdî axaftin. Wan di axaftinên xwe de piştgirîya xwe dan dîyar kirin. Artîstê Swêdî yê navdar Gösta Ekmen mîtîngê îdare kir.

Mesûd Barzanî û Celal Talabanî, ji Kurdistanê, ji dew-

leta Swêdê re telgrafek şandin û alîkarî û pişgirtiya wan xwestin. Ev telgraf di mîtîngê de jî hat xwendin.

Li gor ajansên dinyayê heta îro qasî nîv milyonî Kurd derbasê Iranê bûne û hîn koçbarî û rev dom dike. Qasî 150.000 kes jî derbasê Tirkiyê bûne û qasî 300.000 kes jî, di sînorê Tirkiyê de ji aliyê eskerên Tirk ve hatine rawestandin. Tirk bi teqandina çek wan didin rawestandin.

Wezîrê Karûbarê Derve yê Amerîka, Baker ji bo çareserkirina pirsên Rojhilata Navîn û penaberên Kurd çû Tirkiyê.

**8'ê Nîsanê**

Wezîrê Karûbarê Derve yê Amerîka J. Baker bi helîkopterê frî qeza Hekariyê Çelê ( Çukurcayê) bi çavên serê xwe rewşa penaberên Kurd dît. Baker di vegerê de li Dîyarbekir presskonferansek çêkir û got:

- *Ev feleket e. Tirkiye û Amerika nikarin ji bin vê rewşa penaberên û derbederên Kurd derbikevin. Divê hemû dinya alîkariyê bike.*

Li Brukselê endamên Bazara Aboriya Ewropayê (EG) civiyan. Îngiliztanê di derheqê Kurdan de pêşniyariyeke bi çar madde pêşkêşî civînê kir:

*1- Li Bakurê Îraqê herêmeke cografî ji bo Kurdên penaber bêt dîyarkirin. Û penaber divê li wir bi cîh bibin, neçin Tirkiyê û Îranê.*

*2- Bazara Ewropê 180 milyon dolar bi lez û bez bigihîne penaberan.*

*3- Li ser rejîma Îraqê ambargoya çek bêt domandin.*

*4- Organa Yekîtiya Rojavayê Ewropa li ser vê pirsê bicive. Û KN heyetekê bi lez û bez bişêne herêma penaberên Kurd. Ji bo derengmayînê rexne li Sekreterê giştiyê KN hat girtin.*

İraqê, biryara Bazara Aboriya Ewropê mudaxela hundirê xwe dît û li gel KN wê biryarê protesto kir.

Parlementerên Kurd Ahmed Turk, Mehmed Alî Eren û Wezîrê kevin Şerefetin Elçî, dawî dan greva birçîbûniya xwe ya li ba xaniyê KN li Amerîka. Alîkarê sekreterê Giştiyê KN wan ji bo hevdîtinê qebûl kir.

Swêdê, ji bo penaber û derbederên Kurd biryara şandina 40 milyon kronî da.

Rojanamevanê Kurd Ferda Turan, xwe gihêştandibû nexweşxanên Suriyê yên ku li nêzî sînorên Kurdistana İraqê ne. Bi birîndarên Kurdên Kurdistana İraqê re hevpeyvîn çêkiribûn û fotografên birîndaran kişandibû. TV'a Swêdê, ji wan hevpeyvîn û wênan perçek nîşanda.

## Daxuyaniya Civîna Luksemburgê ya welatên Civata Aborî ya Ewropa (CAE)

Welatên, endamê Civata Aborî ya Ewropa (CAE) di 8-ê Nîsanê de, li Luksemburgê civiyan.Li ser rewşa başûrê Kurdistanê gotûbêj kirin û biryar girtin. Bi tawreke giştî serokkomar, serokwezîr û wezîrên derveyên beşdarê civîna Luksemburgê daxuyaniyek belav kirin. Herweha noxteyên ku di daxuyaniyê de cîh girtine wekî pêşnîyar, ji bo qebûlkirinê birin Komîta Ewletî ya Yekîtiya Netewan:

** Li İraqê, li ser axa Kurdan, ji bo bi milyonên insanên siwîl ên ku ji ber zordariya Saddam reviyane ber bi sînorê Tirkiye û İranê de pêwîst e. Heremên Ewletiyê bêne sazkirin. Ew divê ji aliyê Yekîtiya Netewan ve bê parastin.*

** Mafên netewî yên Kurdan pêwist e bê qebûl kirin.*

* *Penaberên Kurd pêwîst e, ji bo ku bikaribin vegerin ser erd û malên xwe garantî bigrin.*
* *Embargoya aborî, li hemberê Iraqê pêwîst e dom bike, heta ku Iraq, van noxtên jorîn pêk bêne.*

Ev biryarên Civata Aborî ya Ewropaya ku ji 12 welatan pêk tên, hat birêkirin ji Komîta Ewletî ya Rêxistina Yekîtiya Netewan ji bo munaqeşe û biryargirtinê. Her weha CAE nerazîbûna xwe pêşberê êrîşên Iraqê li ser xelkê siwîl ê Kurd anî ziman û diyar kir, ku amadeye bi alîkariyek xurt a insanî rabe. Ji bo vê çendê wekî destpêk, birêkirina alîkariya pêwîstiyên yekem û dermanan ji bal welatên endam hate qebûl kirin. Rêya qebûlkirina biryarên nû li ser babetê vekirî hat hiştin, heta pirs bê çareserkirin. Girêdayî wê di Civîna Brukselê de, ya ku piştî ya Luksemburgê hate bi dar xistin, Biryarek nû li ser pirsa Kurd hate girtin. Di biryarê de tê da xuyanîkirin, ku pirsa Kurd pêwîst e ji aliyê dewletên ku Kurd lê dijîn ve bi awayekî demokratîk bê girtin. Mafê Kurdan ji bo otonomî li ser axa ku ew lê dijîn hebe. Di biryarê de tê gotin, ku *"ji derê vê çareserkirina pirsa Kurd nîne."* Li hemberê vê biryara CAE wezareta derve ya Tirkiye nerazîbûna xwe anî zimên ku Civata Ewropa bi pirsên hundurî yê welatan ve mijûl dibe.

**9'ê Nîsanê**

Pêşniyara Ingilîztanê ya ku di Bazara Aboriya Ewropê de hat qebûl kirin, ew çû KN. Sovyet û Çîn ji pêşnîyarê ne memnûn in. Iraqê pêşnîyarê protesto kir.

Rojnamevanên ku li herêma sînorê Tirkiyê û Iraqê ne, dibêjin ku ;*"hîn jî alîkariya xwarin , cil û berg û îlaç nehatiye. Tirk bi zanabûn alîkariyê li paş dixin. Bi peran difroşin penaberan."* Işev TV. nîşanda ku penaber ji birçibûniyê reh û qurmê daran dixwin. Eskerên Tirk der-

bederên Kurd gulebaran kir û 3 kes hatin kuştin. Bi dehan birîndar bûn.

Mesûd Barzanî daxuyaniyek da çapemeniya cîhanê ku, dema hezên Saddam ketin herêma Kerkûkê gundê Karahejîn ji binî ve, ji navê rakirin. 3000 kes di gund de dijîyan, yek ji wan nehêştin hemûyan, biçûk bi mezinan ve 3000 kesî di navbera çend saetan de kuştin. Rojnameyên Swêdê Aftonbladet û Expressen di roja 9'ê nîsanê de, vê nûçeyê belav kirin.

Heta niha milyonek kes derbasî Îranê, 250 hezar jî derbasî Tirkiyê û qasî milyonek jî, li nêzî sînorê Tirkiyê di nav berfê de vekirî, tazî û birçî dimînin.

Li gor rojnamevanên BBC, Kurdên Kurdistana Tirkiyê bi kamyonan xwarin û eşyan berhev dikin û dibin herêmê, eskerên Tirk ji wan digrin û bi peran difroşin penaberan.

Kurdên Stockholmê, îro jî, li ba konsolosxana Amerîka protestoyên xwe domandin.

Hukimeta Swêdê civiya û ji bo konsolosxana Îraqê ku di roja 7'ê mehê de, li Stockholmê li dij Kurdan çek bikaranîbû, wê bûyerê bê qanûnî dît. Hukimetê 48 saet wext da konsolosxanê ku kê û kîjan çek bi kar anîye divê bêje. Çek teslîmê hukimetê bike. Konsolosê Îraqê çek bikaranînê înkar dike û dike ser Kurdan.

**10'ê Nîsanê**

Hukimeta Finlandiyê biryara derxistina dîplomatê Îraqê yê ku li konsolosxana Helsînkî dixebitî da. Wî çend roj berê çek li dij Kurdên xwepêşand bikaranî bû.

Berdevikê Qesra Spî îro di presskonferansekê de got, ku *" me Îraqê agahdar kirîye ku ji paralela 36 jor ve nikare balafir û helîkopterên xwe bifrîne û li dij penaberên Kurd bikar bîne."*

Ev herêm heta 30 km başûrê Hewlêre diçe.

Ji serî ve İngiliztan dixwaze, ku li Kurdistana Başûr herêmeke ewlekar pêk bîne û İraq nikaribe leşkerê xwe li vê herêmê bi cîh bike da ku Kurdên derbeder bikaribin li wir bi cîh bibin. Di vê mijarê de, Amerîka dudil e. İngilîztan dixwaze ji bo vê herêma ewlekar, Amerîka nerm bike û pê bide qebûl kirin. Lê, Sovyet, Kuba û Çîn li dij vê herêmê derdikevin û dibêjin *"em nikarin mudaxeleyê nav axa İraqê bikin."*

İran ji herêma ewlekar re pişgirî kir, lê belê, ne bi tenê ji bo Kurdan herweha ji bo Şiîyên bakur jî daxwaz kir.

Tirkiyê di derheqê herêma ewlekar de dîtina xwe guhart û got ku " heger İraq êrîşê penaberê Kurd neke, herêma ewlekar ne pêwîst e.

İraq, dixwaze Tirkiye boruya petrolê ku ji Kerkûkê tê û derbasî Tirkiyê dibe û li İskenderûnê eksport dibe, vebike. Ji ber ku di dema şerê Xalîcê de, Tirkiyê wan boriyên petrolê girtibû. Ew ambargoya ku li ser İraqê hebû heta niha dom dike. İraq dixwaze bi petrolê devê Tirkiyê şil bike. Û ambargoyê bişkîne. Lê, Tirkiyê bersiva İraqê neda. İraq dibêje ku " Ji derê vê, em dixwazin têkiliyên ekonomîk jî, bi Tirkiyê re daynin."

Tarik Azîz, di TV. de got ku; *"ev tiştên ku hate serê Kurdan ne sûcê me ye; sucê Amerîka, Rojava û Turgut Özal e. Wan, Kurdan xapandin û li dij me rakirin."*

Piştî şerê Kuweytê îro cara yekemîn rojnamevanên bîyanî çûn Bexdayê. Jîyanê li Bexdayê normal dîtin û sibê jî, dê herine Kerkûk û Silêmaniyê.

Tirkiyê bi awakî resmî da xuya kirin, ku heta îro 70 hezar Kurd derbasî Tirkiyê bûne û li aliyê İraqê jî, qasî 200 hezarî Kurd li çiya hene. Rewşa penaberan gelek xirab e. Hîn jî xwarin, cil û berg negehîştiye wan. Ji birçîbûn û sermayê dimrin. Ji birçîbûnê êrîşî erebayên xwarinê dikin û eskerên Tirk do li Çukurca 3 kes kuştin û gelek kes

birîndar kirin. Li Kurdistana Bakur gelê Kurd bi fedakarî xwarin, cil û berg berhev dike, lê, esker û çaş (koricî) ji wan digrin û bi peran difroşin penaberan. Dewleta Tirk jî ew alîkariyên ku ji Ewropa tên bi zanabûn formalîte sedem şandidin û bi paş ve dixin. Rojnamevanên Tirk bi xwe van tiştan dibêjin û dinivîsînin.

Li gor Rojava şer di nav Pêşmêrge û hêzên Saddam de cîh bi cîh dom dike. Pêşmêrge têkneçûye, lê ji bo kuştina xelkê sivîl xwe ji bajaran paşve kişandiye. Ya din jî, hêzên Îraqê bi helîkopter, balafir û scudên dûrmenzîl bajarên Kurdistanê wêran dikin. Ji ber van sedeman pêşmêrge şerê nav bajar rawestand û hêzên xwe kişand derê bajaran. Li gor nûçegîhan û rojnamevanên bîyanî, li derî bajaran hêzên pêşmêrge piraniya axa Kurdistanê kontrol dike û heger bixwaze dikare bajaran jî bigre. Gelek bajar û qeza



bi roj di bin kontrola hêzên Îraqê û bi şev di bin kontrola hêzên pêşmêrge de ne.

Kurdan li ba Parlementoya Swêdê xwepêşandanek pêk anîn. Ji derî Partiya Sosyal Demokrat, ji hemû partiyên ku di parlementoyê de grûbên wan hene, yek hat, axaft û pişgiriya xwe dîyar kir. Beşdaran ji ba parlementoya

Swêdê, bi gulên sor çûn ser gora Olof Palme û gul avêtin ser gora wî. Ji wir jî çûn ba ew Kurdên ku di xwepêşandana birçîbûniyê de ne û wan zîyaret kirin. Ji ber ku li Stockholmê, li dêrekê xwepêşandina birçîbûniyê domdike. Bi sedan Kurd çûn birçiyan zîyaret kirin.

Kurdên li Sovyetistanê, di nav xwe de komîtek çêkirin û komîtê dest bi karûbar kir. Kurdan presskonferensek li gel çapemenî, TV û radyoyên Sovyetê pêk anîn. Bê dengiya Sovyetê protesto kirin. Li ba Wezereta Karûbarê derveyî ya Sovyetê Kurd ketin xwepêşandanên birçîbûniyê. Herweha, Kurdan li bajarên Tîblîs, Bakû, Erîvan û Moskovayê civînên protesto kirinê çêkirin.

# Carek din li rêya penaberiyê

*"Serhildana dînî hat pelaxtin. Niha wexta reformên demokratîk û avakirina welêt e."*

30'ê Adarê, şeva Şemiyê, di radyoya Bexdayê de weha digot serokvezîrê Iraqê Sadûn Hamadî.

Li ber çavên dinê, li ber pozê general Norman Schwarzkopfê ku li ser biryara FN'ê û daxwaza Bush dê Kuveyt rizgar bikra û li Iraqê demokrasî bida avakirin. Tanq, top û helîkopterên Saddam agir dibarand ser serên Kurda. Kuveyt hat rizgarkirin, lê belê, avakirina demokrasîya Iraqê, her çawa bû ez nizanim, ji Saddam re hat hewale kirin.

Saddam dixwaze demokrasî û welatê xwe avake! Ji bo wî jî, divê berî her tiştî muxalefeta Iraqê û bi taybetî Kurdên reben û bê xwedî bên pelaxtin, bên kuştin û ji welatên xwe yên bav û kalan bên avêtin. Pêşî mirova bikuje û piştre demokrasiyê avake!

Di van rojan de, nûçeyên Rojname, televîzyon û radyoyên dinê der heqê penaberên Kurd de ne. Sefalet û trajedîya mirovên Kurd li ekranên televîzyonan kêm nabe. Nûçegîhanên gelek rojnaman li ser sînorê Tirkîyê, Irak û Îranê, di nav penaberan de nûçeyan çêdikin û bi rê dixin. Nûçeyên di der heqê penaberan de, nîşan didin ku Saddam û generalên wî, dê demokrasîyek û pêşerojek çawa ji bo Kurdan avake.

Di 2'yê Nîsanê de, helîkopterên Saddam 500 penaber li ber çavên rojnamevanan, bi bombeyên fosfor qetil dikirin. Bi hezaran penaberên Kurd di bin agir û gulebarandina helîkopteran de berbi tixûbê Tirkîyê, Îranê û çiyayên Kurdîstanê ve dimeşîyan. Zarokên betena kiras û xwas yên ku ji bombeyên Saddam rizgar dibûn, vê carê, di hemêzên dayikên xwe de ji serma û ji birçîbûnê dimirin.

Bi sed hezaran penaberên ku di 4'ê Nîsanê de xwe digîhêyandin ber tixûbê Tirkiyê, bi gulebarandina eskerên tixûb dihatin rawestandin. Li gor Wezareta Derveyî ya Tirkiyê çarîk milyon penaber li ber tixûb kom bûbûn û imkanên Tirkiyê tune bû, ku hewqas penaberan qebûl bike. Tixûbê Îranê carek din weha li rûyê penaberan hatibû girtin.

Di 4'ê Nîsanê de Îranê jî, wekî Tirkiyê digot, em nikarin bi sed hezaran penaber qebûl bikin. Li gor Ajansa Nûçeyê Îranê milyonek penaber li ber tixûbê Îranêrawestabûn. Îranê digot, "ji bo qebulkirina hemû penaberan em amadene, lê belê imkanên me tune." Îran û Tirkiyê, ji FN'ê, ji Xaça Sor û ji dewletên din alîkarî dixwestin.

Di 5'ê Nîsanê de, *"Komîta Şoreşê"* ya Iraqê carekî din digot:

*" Serhildan hat pelaxtin."*

Li gor Komîta Şoreşê, yên kuvê carê hatibûn pelaxtin pêşmêrgeyên Kurd bûn. Lê, di rastî de weha nebû.

Pêşmêrge ji bajaran paşve vekişyabûn. Yên ku hatibûn pelaxtin Kurdên sivîl û bêparastin bûn. Saddam û generalên wî, derveyî banga jorîn, afûyek tevayî jî, ji bo Kurdan îlan dikir. Lê ew Kurdên ku zor bikaranîne, Kurdên ku mal û tiştên xelkê talan kirine û Kurdên ku tecawuzî pîrekan kirine li derveyê afûyê diman!

Roja ku Saddam ji bo Kurdan efû îlan dikir, hêjmarên penaberan digihîşt 2 milyonan. 2 milyon mirovên Kurd, jin, mêr, pîr û zarokên tazî û xwas, bi zikên tîh û birçî, ji ber xezeba Saddam direvîyan, nexweş dibûn, dimirin û dihatin kuştin.

Di 5'ê Nîsanê de NATO, 6'ê Nîsanê de FN'ê ji bo trajedîya Kurda Iraqê lanet dikir. Lê, ne NATO û ne jî FN zêde nikarî bû tiştek bikira, ji ber ku mesela Kurd meseleyek hundirîn bû! Serokê Amerîkayê Bush di deryayê de masî digirt û digot:

" Ev mesele, meselekî hundirî ye. Em nikarin tiştek bikin. Li nav FN'ê, Sovyet, Çîn, Hîndîstan û Kuba nedihîştin ku biryarek pozitîf ji bo alîkarîya Kurdan bê girtin.

Lê, bi sed hezaran penaber, bi trajedîya xwe, mesela Kurd kirin meseleyek hemû dinê, hemû însanan û însanetiyê. Êdî li hember vî trajedîyê çavgirtin û kerrbûyin ne mumkun bû. Di 7'ê Nîsanê de, helîkopterên Amerîkayê xwarin, vexwarin, batanîye uhw. bi paraşûtan ve, ji penaberan re davêtin. Di eynî rojê de, Wezîrê Derveyî yê Amerîkayê, Jamas Baker, ji bo penaberan diçû Tirkiyê.

9'ê Nîsanê de Koma Ewropa (EG) li Luxemburgê, ji bo Kurdan, biryara avakirina herêmeke azad digirt.

Li gor texmînan Komîsyona Penaberan a FN'ê; herî dawî, 715 hezar penaber derbasî Îranê û 280 hezar penaber jî derbasî Tirkiyê bûbûn. Bi sed hezaran penaber li ber tixûbên Tirkîyê û Îranê, di bin sar û sermayê de diqefilin,

nexweş dibin û dimirin. Li gor nûçekanîyên Tirkiyê, heta niha 1500 kes mirine, piranîya wan zarok in.

Xwarin, vexwarin, derman, bataniyê û tiştên ku bi balafiran tên balafirgeha Dîyarbekirê, bi qamyonên mezin neqlên sertixûb dibin. Piştî 12 saet rê, qamyon digîhîjin ber tixûb. Lê belê, barên qamyonan nagîhîje wî alîyê tixûb. Çiyayên bilind û asê, rêyên herî û celb îmkan nade ku xwarin û vexwarin bigîhîje penaberan. Divê helîkopter bibin û helîkopter jî tunin.

Li vî alîyê tixûb, gava mirovên birçî û tîh ji bo nanek, bataniyek û tasek av bihev dikevin, li wî alîyê tixûb, zar û zêç, kal û pîr, çav li rê, benda nanek û benda tasek av in. Zarokên ku di hemêzên dayik û bavikan de diqefilin û dilerzin, laşê wan ên teze û bêteqet mor dibe û deng ji wan tê birîn. Êdî ew nan naxwazin, av jî naxwazin...

Volkmar Schultz-Igast, ji Xaça Sor a Elman jî çûye wir, ba penaberan. Ew ji rojnamevanek re weha dibêje:

- Ji 10 zarokan 9 emel in. Di laşên wan de av nemaye. Hêjmarên zarokên nexweş ji 10 hezarî zêdetir e û salê wan bin 5'an de ne.

Do min jinikek dît. Zarokek di hemêza wê de bû. Piştî sê rojan zarok li ser çiyê ji sermayê miribû.

**Xorto**

**11'ê Nîsanê**

Hîn jî alîkarî baş negehêştiya penaberên Kurdên ku li ser sînorên Kurdistana Tirkiyê û yê Kurdistana İraqê ne. TV bi dehan cesetên zarok û mezinan nîşanda. Kurd birçî û tazî ne. Êrîşê xwarinê dikin. Baran dibare. Serma bi şevan dikeve binê sifirê. Ji ber tirsa helîkopter, balafir û tanqên İraqê Kurd ên ku li nêzî sînorên Tirkiyê ne, li serê

çiyayên bilind dimînin. Newêrane dakevin cîhên rast, ku alîkarî zû bigehê wan. Çiya giş bi berf in. Derbeder,bê kon û kinc in. Piraniya wan bi cilên tenik û qetandî ne. Betanî û lehêv tunin. Ji ber vê yekê ji serma û birçînan rojê kêmasî 1000 kes dimrin. Piraniya yên ku dimrin zarok, kal û pîr in. Li gor nûçegîhanan, li ser tixûbê Tirkiyê hejmara penaberên Kurd gehîşt 400 hezarî.

Cara yekem nûçehînanên cîhanê gehîştin Îranê û rewşa penaberên Kurdên li Îranê nîşandan. Rewşa wan ji yên li Tirkiyê û ji yên ser sînor xerebtir e.

Hêzên Saddam îro li herêma Kerkuk û Sulêmaniyê li dij Kurdan dîsan helîkopteran bikaranî. Lê, Amerîka hîç deng dernexist. Xwe kerr û lal kir.

Wezîrê Karûbarê Derve yê Îraqê Tarik Azîz, Tirkiyê û Îranê sûçdar kir û got: " Tirk nahêlin Kurd li Tirkiyê bi kurdî bipeyîvin û Îran jî hebûna Kurdan qebûl nake; lê, me otonomî daye Kurdan. Dîsan jî, ev herdu dewlet ji bo Kurdan li ser me komployan çêdikin."

Ji aliyê din ve, Tarik Azîz xwest were Tirkiyê û li ser pirsa Kurdan bi Tirkiyê re rûne. Tirkiye li ser vê yekê difikire.

Di ser Bexdayê re, cara yekem di bin kontrola hêzên Saddam de, 20 rojnamevanên bîyanî çûne herêma Kurdistanê. Rojnamevanê Tirk Alî Haydar Yurtsever, nûçeya xwe weha digîhandin BBC' yê:

*"Îro em 20 rojnamevanên bîyanî di bin kontrola hêzên Saddam de çûne bajarên Kerkûk û Silêmaniyê. Her cîh wêran bûye.Li wan bajaran kontrol bi temamî di bin destê hêzên Îraqê de ye. Ji sivîlan bêtir esker li wan bajaran hene. Nehiştin em bi xelkê re qise bikin. Piraniya xelkê bi kurdî qise dikirin. Berê roket û topan bi çiyan ve ne. Li Silêmaniyê qetlîam heye. Bi dozeran ji bin erdê cesed deranîn. Bi sedan kes kuştine û kirine bin erdê. Cesedên wan nayêne naskirin. Îraq dibêje ku "Kurdan di dema*

*bajêr girtine hemû esker, endam û kadroyên Partiya BAAS qetil kirine."*

Bi Tirkmenan re peyîvim, wan digot *"sûcê me tune. Berê Amerîkiyan me bomba kirin, paşê Kurd hatin û mirovên me kuştin."*

Li Stockholmê konsolosxana Swêdê navê ew dîplomatê xwe yê ku bi çekê otomatîk li Kurdan çek teqandibûn da dewleta Swêdê. Hukimeta Swêdê, wî kesî ji Swêdê derxist û wê çekê otomatîkê ku bikaranî bû jî, ji konsolos dixwaze. Konsolosa Îraqê heta niha çek teslîm nekirîye.

Kurdan, li ba konsolosxana Kubayê ya li Stockholmê mîtîngek pêk anîn û helwesta Kubayê ku li KN li dij Kurdan girti bû protesto kirin.

**2'ê Nîsanê**

Hemû TV. yên cîhanê perîşanî û belengaziya derbeder û penaberên Kurd di nûçeyên xwe yên yekemîn de didin. Di rojê de, bi hezaran derbeder û penaber ji serma û birçînan dimrin. Hîn jî alîkariya navnetewî baş û têr negihîştiye wan. Tazî, birçî û pêxwas in.

Amerîka biryar girt, ku di hewa, erd û di avê de bi lez û bez alîkariyê bigîhîne penaberan. Amerîka ji bo vê yekê 100 helîkopter amade kir. Ji aliyê din ve Amerîka dîyar kir, ku *"li Kurdistanê ji bo penaberan herêmeke azad pêwîst e."*

Sovyet, li dij avakirina herêmeke azad derket û got:

- *Em pêşnîyariyeke weha qebûl nakin, ji ber ku dê ji bo rojên pêş ev bibe mînakeke ne baş.*

Îngiliztanê got:

- *Herêma azad bi nîyeta Îraqê ve girêdayî ye. Em pişgiriya vê pêşnîyariyê dikin.*

Koma Netewan biryar girt ku ji 50-100 kesî heyetek bişêne Îraqê û di derheqê rewşa derbeder û penaberan de

bi Îraqê re bipeyîvin.

Îraqê, ew efûya ku ji bo Kurdan çend roj berê derxistibûn hefteyeke jî dirêj kir. Li gor nûçevanên Ewropî ku li Îraqê ne, kêm kes bi paş ve vegerîne cîhên xwe. Kurd, ji Saddam û efûya wî bawer nakin.

Wek tê zanîn Civata Aboriya Ewropê 180 milyon dolar ji bo penaberan dê bişêne. Ji wê 3/2 bişênin Îranê.

Kurdên Awustralyayê jî li bajarên *Sydney, Briston* û *Melbourn* li ba konsolosxanên Amerîka dest bi xwepêşanên birçîbûniyê kirin. Kurdan delegasyonek pêk anîn û delegasyon bi bi wezîrê Karûbarên Derveyî yê Awustraliyayê re têkilî danî. Wezîr delegasyonê qebûl kir û guhdariya daxwazên wan kir. Serokê kevin ê hukimetê Malcon Frosor bi însîyatîva xwe dest bi kampanyaya alîkarî ya derbederên Kurd kir. Serokwezîrê Awustral yayê jî soz da Kurdan ku pirsa Kurd bibin Koma Netewe yan.

Swêdê, mîqtara alîkariyê ji 40 milyon kronî derxist 100 milyon kronî. Balafirên Swêdê dest bi birina xwarin û eşyan kirin. Swêd naxwaze alîkariya xwe teslîmê Tirkiyê bike. Ji ber vê yekê alîkariya Swêdê gelek bi derengî ket. Di vî warî de tecrûbeyên Swêdê hene. Di 1988-an de Swêdê ji bo penaberên Kurd alîkariyê şandibû Tirkiyê. Dema heyeta Swêdê çû û di cîh de alîkariya xwe kontrol kir, dît, ku Tirkiye, ji % 80 alîkariyê negîhandiye penaberên Kurd.

Konsolosê Îraqê, ew çekê otomatîkê ku li dij ew Kurdên ku êrîş biribûn ser konsolosxanê bikaranî bûn îro teslîmê dewleta Swêdê kir.

**13'ê Nîsanê**

Opozîsyona Amerîka û cîhanê di pirsa Kurd de zorê dide Bush û îdara wî. Bush, îro presskonferansek pêk anî û bi awayekî hêrs weha got:

*- Ez leşkereke xwe naşînim şer an jî herêma Kurdan. Bila vê yekê her kes bizanibe. Lê, em ji bo penaberan alîkariya cil û xwarinê dikin.*

Wezîrê Karûbarê Derveyê Almanyê Gensher, îro di derheqê Saddam de daxuyaniyekî da û di daxuyaniya xwe de got:

*- Saddam li dij huqûqa nav dewletan, li dij qanûna Koma Neteweyan sûcê mezin kiriye. Ew sûcdarê şer e. Ev sûç divê neyê efûkirin. Pêwîst e Koma Neteweyan Saddam mehkeme bike. Wek Hîtler û hevalên wî ku li mehkemeya Nurnbergê hatin sûcdarkirin..*

Îraqê, cara duyemîn rojnamevanên bîyanî bire Hewlêrê. Rojnamevanê Tirk Alî Haydar Yurtsever di vegerê de, li ser gera Hewlêrê ji BBC re weha digot:

*- Em îro di kontrola hêzên Îraqê de çûn bajarê Hewlêrê. Hewlêr wêran bûye. Şewitiye, xirabûye. Portreyên Saddam hemû hatine çirandin û li ser dîwaran sloganên hêzên Kurd hene. Bajar bi temamî di bin kontrola Îraqê de ye. Li nav bajêr û li derdor û ser xanî yên resmî bi çekên giran leşkerên Îraqê hene. Bajar bi tank û top tije ye.*

Min bi serokê herêma Otonomî El Berzencî re qise kir. Wî got:

*- Çete, çapûlvan û terorîst hatin bajar xirab kirin. Gelek kes kuştin. Talan kirin û çûn. Em dê cezayê wan bidin. Ji wan re efû tune. Ew hevsarkêşên dijmin in....*

Li gor şirovevanên BBC, "Amerîka û hevalbendên xwe pêşî pişt li Saddam şikandin. Paşê dîtin ku Kurd li Bakurê Îraqê bi hêz bûn û li başûr jî Şiî. Ev ji bo Amerîka, Tirkiye

û hevalbendên wan bû tehlîkeyeke mezin. Ji ber vê yekê rêdan ku Saddam vê tehlîkê bişkîne û yekîtiya Îrakê biparêze.. Û kirin. Saddam Kurd û Şîîyan şikand. Niha dor hatiye ser xistina Saddam. Dê di demeke gelek kin de Saddam bixin û herweha penaberên Kurd jî bi paş ve vegerin malên xwe. Ji ber vê yekê Amerîka niha ji penaberan re alîkariya xwarin û vexwarinê dike."

Kevneserokwezîrê Tirkiyê Suleyman Demirel îro çû Çukurcayê penaberan zîyaret kir û bi kurdî ji penaberan re got:

- *Merak meke!*

Û bi tirkî dom kir:

- *Em, we bi tenê nahêlin. Heta niha em bi tenê bûn, lê niha dinya hat alîkariya we.Di van çend rojan de di ber xwe bidin, alîkariyeke mezin dê bigêhe we.*

Li Hollandê Kurdan avêt ser konsolosxaneya Îraqê û agir berdan Konsolosxanê. Polîs 8 Kurd girtin.

Federasyon û rêxistinên Kurd li Swêdê bi hevdu re li gelek bajarên Swêdê li meydanan civînên vekirî pêkanîn. Di van civînan de li ser rewşa Kurdistanê agahdarî dan Kurd û Swêdîyan, merş û stranên şoreşgerî pêşkêş kirin, helbest xwendin, pere berhev kirin.

Îro jî hemû rojnameyên Swêdî di rûpelên xwe yên yekemîn de fotografên Kurdên penaber weşandin û li ser rewşa penaberan dûr û dirêj nivîsandin. Radyo û TV yên Swêdê jî, di serê her saetî de, li ser rewşa penaberên Kurd nûçe belav kirin.

**14'ê Nîsanê**

Trajediya penaberên Kurd her berdewam e. Hîn jî, ji birçî, serma û nexweşiyê bê bêjmar kes dimirin. Helîkopterên Amerîka, Fransa û Îngiliztanê xwarin

dawêjin serê çiyan, lê têr nake. Ji Kurdistana Iraqê ber bi sînorê Tirkiye û Iranê ve koçkirin berdewam e. Penaberên ku derbasî Tirkiyê bûne cîhwarê wan çiya ye û ji bo çûndin û hatinê ne baş e. Tirkiye destpêkir ku cîhwarên wan biguhêre û wan ber bi cîhwarê rast ve bîne.

Ji bo alîkariya xwarin û eşya 2000 leşkerê Amerîka hatin bajarê Iskenderûnê. Ingiliz 2 û Alman jî 6 helîkopter xiste xizmetê.

Iranê dîsan ji bo penaberan ji rêxistinên navnetewî alîkarî xwest.

Koma Netewa ji bo pirsa penaberan heyetek şande Bexdayê. Li gor ajansan, heyet bi wezîrê der û wezîrê agahdariyê yên Iraqê re rûniştin û pirsê gotûbêj kirin.

Saddam Huseyîn îro çû Hewlêrê. Li Hewlêrê axaftinek kir. Dîsan got ku:

- *Min ji bo penaberan efû derxistiye. Ew dikarin vegerin. Lê, ji qatil, talankar, xaînan re efû tune.*

Çend parlementerên Ingiliztanê li Kurdistanê bi Celal Talabanî re têkilî danîn.

Li gor nûçeyên ku BBC dide, hîn li herêma Kurdistanê Kurd û başûrê Iraqê jî Şiî cîh bi cîh li dij hêzên Saddam şer dikin.

Li Dîyarbekirê ji derê partiya ANAPê hemû partiyên legal û gelek rêxistinan bi hevdu re mîtîngeke mezin pêk anîn. Di mîtîngê de qasî 6-7 hezar kes beşdar bûn. Bi kurdî axaftin. Li dij Bush û Saddam derketin. Di dawî de, ji beşdaran hinek "bijî Kurdistan" qîrîyan. Şer derket. 10 kes birîndar bûn û gelek kes ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li Stockholmê Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê û çend rêxistên Swêdî bi hevdu re li Sergels Torgê mîtîngek çêkirin. Qasî 4000 kesî di mîtîngê de beşdar bûn. Li ser navê Hukimetê Wezîrê Karûbarê Derve yê Sten

Andersson qise kir. Wî behsa trajediya penaberên Kurd kir û got:

- *Pirsa Kurd ne bi tenê pirsa penaberan e. Pirseke polîtîk e. Divê di nav Pirsên Rojhilata Navîn de pirsa Kurd jî bê çareserkirin. Divê Saddam û rejîma wî ji desthilatiyê herin. Pirsa Kurdan pirsa demokrasiyê ye. Pêwîst,e Kurdên Kurdistana Iraqê di nav Iraqê de, xwe bi xwe îdare bikin.*

Niha di nav Wezîrên Karûbarên Derveyî yên Swêd, Fransa, Italya û Spanyê de, ji bo pirsa Kurdan hewldaneke xebatê heye, got Sten Andersson.

Serokê Partiya Folk Beng Westerberg, serokê Partiya Çep Lars Werner, ji Partiya Center parlementerek, Serokê Komîta Aştiyê û ji Komîta Parastina Mafên Mirovî ji bo Kurdan jî Thomas Hammarberg axaftin. Hemûyan di axaftinên xwe de, *"bi zûtirîn alîkariya penaberan bikin û pirsa Kurd, pirseke netewî ye, polîtîk e. Divê di organên navnetewî de bê rojevê. Koma Neteweyan divê insîyatîv bigire."*

Dr. Mahmûd Osman jî axaftinek kir û di axaftina xwe de ji Swêdê alîkariya navnetewî daxwaz kir.

Nazir Rezazî, çend stran û merş got û Şerko Bêkes jî çend helbest xwend û helbestvaneka swêdî ji helbestên wî wergêran swêdî.

**15'ê Nîsanê**

Çapemeniya cîhanê îro jî bi nûçe û fotografan derbederî û perîşaniya penaberên Kurd di rûpel û rêza yekemîn de dan û belav kirin.

Serokwezîrê Tirkiyê û yê Ingiliztanê li Londrayê, li ser



rewşa penaberên Kurd rawestan û li ser herêma ewlekar israr kirin. Penaberên ku li herêma Silopiyê li çiyê bûn , ji wan 20.000 î ji cîhên wan rakirin û birin heremeke navrast ku baştir bikaribin ji wan re alîkariyê bikin. Yên din yên li vê herêmê jî, dê peyder pey bibin wê herêma nû û wan bi cîh bikin. Amerîka ji bo herêma ewlekar li Batman û Dîyarbekrê karagahek pêk anî û xebata herêma ewlekar li ser temambûnê ye. Hîn doktor û personelên tendurûstiyê negîhane herêma penaberan. Piraniya nexweşan zarok in. Li Çukurcayê doktorekî Fransê daxuyanî da BBC ku "bi lez û bez tedbîr neyên stendin, dê ji nîvî bêtir penaber ji birçîbûn, serma û bê dermaniyê bimirin."

Penaberên nû yên ku li Kurdistana Iraqê ne ber bi Iranê

ve direvin, leşkerên İraqê bi helîkopter û topan wan gulebaran kirin û li gor nûçeyan bi sedan kes kuştin.

İngiliztanê di meclisa Avam de pirsa herêma rizgarkirî gotûbêj kirin. Gotin ku; " ev herêm nayê wê manê ku em Kurdistaneke serbixwe çêdikin, an dixwazin. Ev ji bo parastina penaberan e. Em yekîtiya axa İraqê dixwazin. Ji ber vê yekê, em di pêşniyariya xwe ya herêma rizgarkirî de israr dikin û divê em di Koma Neteweyan de dîsan wê bînin rojevê. Heger Saddam 3 caran êrîşê herêma rizgarkirî bike, divê em li dij wî quwetê jî bikar bînin."

Wezîrên derve yên Koma Ewropayê piştgiriya pêşniyara Elmanyayê kir.

Elmanyayê goti bû, ku *"divê mirov Saddam bide mehkemeya Koma Neteweyan, ji ber ku wî mafên mirovan îhlal kiriye. Saddam sûcdarê şer e."* Fransa, Belçika û İngiliztanê piştgiriya vê daxwazê dikin.

Celal Talabanî daxuyaniyek da:

*- Pêşmergeyên ku derbasî İranê bûbûn bi paş ve hatin Kurdistanê. Niha em gelek bi hêz in. Em dê êrîşeke mezin bibin ser bajarê Silêmaniyê. Em dikarin çend bajaran dîsan bi paş ve bigrin.*

TV ya Swêdê Kanal-1 bi endamê Komîta Kurd û serokê Rêxistina Parastina Zarokan Thomas Hammarberg re întervuyeke çêkir. Thomas, li dewletên Hevkar rexne girt ku ew durûti dikin:

*- Ew niha li pêwendiyên aştiyê digerin. Ma kuştina 2 milyon Kurd li derî aştiyê ye?*

Û Thomas, ji bo Kurdan ji Swêd û hemû cîhanê alîkari xwest.

Dîsan Endamê Komîta Kurd ji bo Mafê Mirovî Bilal Görgü daxuyaniyê da Radyoya Merhaba, wî, xebat û daxwazên Komîtê weha rêz kir:

*1 - Divê Koma Neteweyan ji bo penaberan herêmeke*

*azad û ewlekar çêbike.*

*2- Îran û Tirkiye sînorên xwe ji penaberan re vekin.*

*3- Koma Neteweyan çareserkirinên bingehîn û dûr û dirêj pêk bîne.*

*4- Divê oposîzyona Îraqê bê destek kirin.*

*5- Di pirsa Rohjilata Navîn de, pirsa Kurd jî bikeve rojevê.*

Îro jî, di rojnameyên Swêdê de gelek li ser Kurdan nûçe û şirovan cîh girtin.

**6'ê Nîsanê**

Di derheqê pirsa derbeder û penaberên Kurd de, muxalefet û raya giştiya Amerîka û ya cîhanê tesîreke mezin li Bush kir.

**Bush bi zixtan hişyar bû**
**û bi lez û bez kete atakê**

Bush nîvê şevê, di dîtinên xwe de 180 derece guhartin çêkir û kete hareketê. Wî, telefonê serokwezîrê Îngiliztanê John Major, serokkomarê Fransê François Mitterand, serokomarê Tirkiyê Turgut Özal, Şansolyê Almanyê Helmut Kohl û Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuellar kir û li Kurdistana Îraqê di derheqê pêkanîna herêma azad û ewlekar de dîtinên wan girt. Bush, biryar da ku hêzên Hevkar di cîh de bikevin Kurdistanê û alikariya penaberên Kurd bikin. Wî, emîr da ku 10 hezar leşkerên Amerîka bi helîkopter û satelîtan topografiya herêmê bikşînin û cîhê bajarên konan dîyar bikin. Bush da dîyarkirin, ku; *" ev kar li gor biryara Koma Neteweyan a 688-an e. Divê hêzên Hevkar li Kurdistana Îraqê ji paralela 36 jor ve bigrin garantiyê. Heger hêzên Saddam mudaxele bikin, pêwîst e, ku hêzên Hevkar bersi-*

*va wan bi çekdarî bidin. Divê di demekî gelek kin de hêzên Hevkar xwarin, kon, betaniye û îlaç bigihênîn derbeder û tengezarên Kurd."*

Serokwezîrê İngiliztanê John Major, got ku; "*ev kirinên Saddam jenosîd e. Divê Koma Neteweyan li Saddam mehkeme veke.*"

Serokwezîrê Tirkiyê Yıldırım Akbulut, li Londrayê presskonferanseke pêk anî û di derheqê penaberan de weha got:

- *Pêwîstiya derbeder û penaberan bi alikariyeke mezin heye. Divê Ewropî alîkariyê bidine Tirkiyê û Tirkiye jî rojek zûtir bigîhêne wan. Ewropî alîkariyê nakin, lê rexne li Tirkiyê digrin. Di 1988-an de jî, dîsan qasî 100 hezarî penaberên Kurd hatibûn Tirkiyê. Ewropiyan bi tenê 5 hezar girtin. Yên din di stuyê me de hiştin û rexne li me girtin û hîn jî digrin. Alîkari ne çareserkirina pirsa penaberan e. Çareserkirina bingehîn pêkanîna îmkanên bi paş ve şandina wan e.*

Nûçegîhanê BBC ya beşa tirkî Timûçîn Tüzecan bi helîkoptereke İngiliz li gelek cîhên derbeder û penaberan geriya û nûçeyên xwe gihêştan Londrayê. Wî rewşa penaberan felaketeke mezin didît. Wî, li Kampa Çukurcayê ji hemşîreke bidilxebat pirsî; hemşîrê digot:

- *Li vir aspirîn jî tune. Yek ji wan re alîkariyê nake. Di vê kampê de rojê bi kêmasî 40 zarok li ber çavên me dimrin. Ez bi xwe nikarim tiştekî bikim. Ev felaket e. Ez bi girînê alîkariya xwe didim xuya kirin.*

**"Em pismam in, lê,**
**ew Kurd in, ez Tirk im."**

Dîsan nûçegîhanê BBC ji parezvanekî gundan (Köykoruyucusu) dipirsî:

- Hûn çi dikin?

Parezvan:

- *Em alîkariya derbeder û penaberan dikin. Ji ber ku piraniya yên ku hatine vê kampê ji eşîreta me ne. Eşîreta me nîvê wê li Iraqê û nîvê wê jî li Tirkiyê ye. Em mirovên hev in. Em Pismam in, xal û xwarz in. Lê, ew Kurd in, ez jî Tirk im. Ez hemwelatiyê Tirkiyê me. Xwedê ji dewleta me razî be, dewleta me baş e û ji wan re gelek alîkariyê dike.*

**17'ê Nîsanê**

Li ser biryara Bush, îro leşkerên Amerîka bi helîkopteran daketin ser sînorên Iraq û Tirkiyê. Berî her tiştî dest bi avakirina konên xwe kirin. Bi helîkopteran ji penaberan re xwarin avêtin. Penaberên birçî êrîşî xwarinê dikin. Gelek kes dikevine bin lingan û dimrin.

Iraqê li gel Koma Neteweyan biryar û ketina leşkerên Amerîkî protesto kir. Tarik Azîz got ku; " *ev mudaxela nav Iraqê ye û li dij destûr û prensîbên Koma Neteweyan e.*"

Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuellar jî, li dij biryara Bush weha got:

- *Du berpirsîyarên Koma Neteweyan ji mêj ve ji bo pirsa penaberên Kurd li Bexdayê ne û bi hukimeta Bexdayê re li ser gelek tiştan li hevdu kirine. Lê, niha serok Bush rabû ji nişkan ve, vê biryara han girt. Divê em li ser vê biryarê hûr bifikirin....*

Gorbaçov, li Tokyoyê pesnê Bush da. lê, hîç behsa birya-

ra Bush nekir. Şirovevan dibêjin ku " pesindayîna raste rast piştgiriya biryarê ye."

Serokwezîrê İngiliztanê J. Major, piştgiriya biryara Bush kir.

Wezîrê Karûbarê Derveyîyê Elmanyayê Genscher, ji ber girtina vê biryara han dilxweşiya xwe da dîyar kirin. Piştgiriya Bush kir.

Tirkiyê, vê biryar û plana Bush di cîh de dît. Û bi vê yekê re, Tirkiye dixwaze İraq boriyên xwe yên petrolê veke û petrol bêt bajarê İskenderûnê.

Konseya Ewropa biryar girt û heyetek şand sînorê İraq û Tirkiyê ji bo di derheqê derbederên Kurd de raporek amade bikin û li gor wê alîkariyê bikin.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Luksemburgê daxuyaniyek da TV. ku; "divê her dewlet, sazgeh û kes alîkariya Kurdên Kurdistana İraqê bike."

Rojname û TV' yên Swêdê bi wêne û nûçeyan, rewşa penaberan anîn zimên. TV kanal-2 jî, li ser navê Mehkemeya Koma Neteweyan, mehkemeyeke temsîlî çêkir û Saddam kir sûcdarê şer û Saddam mehkeme kir. Ev mehkeme dê TV ê de peryodîk dom bike.

# PIRSA KURD DI ROJEVA CİHANÊ DE

**18'ê Nîsanê**

Parlementoya Ewropê biyar girt ku li herçar perçeyên Kurdistanê jî mafê Kurdan ên kulturî bête dayîn. Divê Tirkiye, İran, İraq û Suriye bi Kurdan re li dora maseyek danişin. Di Konferansa Rojhilata navîn de pirsa Kurd jî bikeve rojevê.

Sibeyê dê heyetek ji serdarên Hevkar û heyetek jî ,ji serdarên İraqê li bajarê Dihokê li ser pirsa penaberên Kurd hevdu bibînin.

Alîkariya penaberan hêdî dimeşe. Hîn jî derbeder û penaber birçî û perîşan in.

Alîkarê wezîrê Karûbarê Derveyê İngiliztanê, ji bo dîtina rewşa penaberan çû Dîyarbekrê.

Rojname û TV. yên Swêdî li ser Kurd û penaberan nûçe, nivîsar û şiroveyên xwe didomînin.

## Li ser bûyerên li başûrê Kurdistanê dîtinên hinek dewletan

*FRANSA*

***Serokkomar Francois MİTTERAND** : YN divê bi pêwîstiya xwe ku êrîşên İraqê rawestîne rabe. Ev zulm û zordarî divê bête rawestandin.Êrîşên İraqê yên li hember Kurdan aştiya navnetewî û ewletî ya heremê dixe tehlîkeye mezin. Heta ku êrîş neyên rawestandin hemû ambargoyên li dij İraqê divê berdewam bin. Komîta Ewletî li ser vê babetê pêwîst e, ku biryar bigre.*

## *BRÎTANYA*

*Serokwezîr John MAJOR : Pêwîst e êrîşên xwînrêj ê Saddam ên li dij gelê Kurd bi awakî bên rawestandin. Em divê bêjin Bexda "Bese!" Di bin parastina YN de, Kurd divê vegerin ser axa xwe. Li ser erdên xwe, di nav aştî û ewletiyê de bijin. Ger me dît, dê Bexda mafên Kurdan qebûl bike, wê demê parastina YN jî li herêmê dikare rabe.*

*Herweha ji bo dîtin û daxwazên Eniya Kurdistana Îraqê li ser pirsê bizanibe Serokwezîr J. Major, bi nûneriyekê Eniya Kurdistanê re, civînek bi darxist. Piştî ku dîtina Brîtanya bi awakî eşkere hate belavkirin, li ser pêşniyara wê di navbera pênc dewletên daîmî yê Yekîtiya Netewan - DYA,YKSS,Brîtanya Mezin, Fransa û Çîn de hevdîtin û muneqeşe li ser pirsa herêma ewletiyê dest pê kirin.*

## DYA

***Serokdewlet George BUSH** : Ev şerê ku li Îraqê dibe, şerekî hundiriye. Ez naxwazim yek leşkerê Amerîkî bikeve nav vî şerê, ku bi dehên salan in ku berdewam e. Lê, em ê alîkariya insanî bi şêwekî fereh bikin. Em ê li aliyê sînor ê Îraqê ji wan re xaniyan avabikin. Ji bo penaberên Kurd ji êrîşên mumkun biparêzin, dê 8000 leşkerên me bikevin heremê. Gava, em bawer bûn ew insan di nav ewletiyê de ne, dê bikaribin jîyana xwe bidomînin, dikarin wê demê vegerin ser erd û malên xwe.*

***Nunerê DYA, di Komîta Ewletiyê ya YN de,Thomas PICKERING:** Em, li gor biryara 688 a YN û biryarên Civata Aborî ya Ewropa, dixwazin - Zonên Bufer (parastinê) , ji Kurdan re pêk bênin. Daxwaza me ew e ku alîkariyek mezin ji Kurdan re bê nîşandan. Ji ber vê yekê, em bang dikin hemû welatên xwedî îmkan, ku di planên alîkariyê de cîh bigrin.*

## *ELMANYA*

*Wezîrê Derve Hans Dietrich GENSCHER : Saddam, li dij gelê Kurd sûcekî navnetewî dike. Ew divê di dadgehek navnetewî de cezayê vî sucê xwe bikşêne. Ji Şerê Duwemin ê Cîhanê, heta niha jenosîd û sûcek insanî weha mezin nehatiye kirin. Ne em û ne tevayiya dinyayê, li ber vî tiştî çavên xwe nikarin miç bikin. Li hemberê Bexdayê pêwîst e, biryarên dijwar bên girtin. Mafên gelê Kurd jî yê ku bû hedefa van jenosîdan pêwîst e bên parastin û di bin sîwana (şemsiya) navnetewî de bên garantî kirin.*

## *DANİMARKA*

*Saddam êrîşên neinsanî û dijwar dibe ser gelê Kurd Bi hezarên siwîl di bin vê terorê de hatin kuştin. Pirsa Kuweytê çawa bi beşdariyek dîrekt û pratîk ji aliyê YN ve hate çareserkirin ya Kurd jî, wusa divê bê çareserkirin.Divê YN bi hêzên leşkerî ve bikeve İraqê û van êrîşan rawestîne.*

## *SWED*

*Nunerê di YN de,Jan ELİASSON : Berpirsîyariya YN piştî rawestana şerê Xelîc divê dom bike. Em, êrîşên İraqê yên li dij gelê Kurd bi awakî dijwar protesto dikin. Bûyerên ku li İraqê dibin, pirsê ji pirsa hundurî derxistiye. Pirs bûye pirsek navnetewî. Eger çareseriyek jê re neye dîtin, ewletiya heremê dikeve bin tehlîkeyeke mezin. Alîkariya dinyayê jî pêwîst e mîna, ku ya Filistînî em ê niha bikaribin çareserbikin. Divê alîkariya însanî û ya sîyasî bê kirin. Jenosîda li hember neteweyekî tû caran ne mumkun e bê efûkirin. Mafên Kurdan pêwîst e bên parastin. Di nav dewleta İraqê de ew divê xwedî mafên insanî û netewî bin.*

## *İSRAİL*

***Wezîrê Derve David LEVY*** *: Em nikarin qebûl bikin, çawa dinya bi çavên girtî, jenosîda Iraqê ya li dij Kurdan derbas dike. Çawa ku ji bo Kuweytê hemû dewletên dinyayê rabûn ser piyan û bi hêzên leşkerî pirsê çareser kirin, a Kurdan jî weha pêwîst e çareser bibe. Wekî din divê tû kes li hêviyê nemîne, ku niha mumkun e pirsa Filistînî bê helkirin.*

## *TİRKİYE*

***Serokkomar Turgut OZAL*** *: Tirkiye nikare barê 400-500 hezar penaberan bikşîne. Ev pirs ji pirseke hundurî derketîye, bûye pirseke navnetewî. Niha sînorên me di bin tehdîdê de ne. Eger Saddam êrîşên xwe ne rawestîne, em dizanin çawa wî rawestênin. Ji bo van insanan YN divê riyekê bibîne. Heremên Ewletiyê ji wan re pêwîst e bên danîn. Hingê em dikarin bihêlin ku alîkarî ji wan re, ji ser axa me ve derbas bibin.*

## *RAN*

***Serokkomar Haşimî RAFSANDCANİ*** *:*

*Ji milyonekê zêdetir Kurd û Şîî ji zordariya Saddam reviyan û ketin axa me. Imkanên me li mêzekirina hevqas insanî nîne. YN berê dest deyne ser pirsê. Herêma Ewletiyê ji Kurdan û Şîî yan re çêbike. Em, alîkariya dinyayê ji bo wan dixwazin.*

## *İRAQ*

***Serokwezîr Sadun HAMMADİ*** *: Pêşniyara avakirina, heremên parastinê yan ên ewletiyê li ser axa welatê me, leyistikekê li hember Iraqê ye. Em vê pêşniyarê qebûl nakin û em ê bi hemû imkanên xwe ve li hember derkevin. Ev mudaxela pirsên hundurî yê welatekî ye. Di*

*destûr YN de rê ji karekî wueha re tune ye .Bê daxwaza me tiştekî weha nabe û em jî li dij in.*

## *BİRYARA 688 A YEKİTİYA NETEWAN*

** Komîta Ewletî ya Rêxistina Yekîtiya Netewan êrîşên Îraqê yê li dij gelê Kurd ê siwil protesto dike.*

** Ew êrîşên li hemberê gelê Kurd, tehlîkeyeke mezinin ji bo aştiya dinyayê û ewletiya herema Rojhilata Navîn.*

** Dinya divê alîkariyeke mezin ji bo, milyonan penaberên Kurd birê bike.*

** Êrîşên li hemberê siwilan pêwist e, bên rawestandin û tû êrîş neyên ser alîkariya ku ji bo penaberên Kurd re dibe.*

*Li hember biryara 688 a YN sê dewlet - Kuba, Zîmbabwe û Yemen- rabûn û dengên xwe li dij bi kar anîn.*

*Du dewlet - Çin û Hindistan- ,bêdeng man.*

*Deh dewlet jî,di nav wan de DYA, YKSS, Fransa, Brîtanya, Ekwador û hwd. li gel biryarê deng dan. Her weha rê, ji bo biryarên nû li ser pirsê vekirî hat hiştin.*

## *DİTINA NATO*

*NATO di civîna xwe de li ser kirin û bûyerên Îraqê rawesta. Bi awakî giştî NATO êrîşên Îraqê yên li dij gelê Kurd protesto kir û nerazîbûna xwe anî zimên. NATO, diyar kirin, ku ev êrîş pêwist e bên rawestan, ji ber ku, ew*

*tevayiya aştî û ewletiya heremê dixe bin tehdîdek mezin. Weke daxuyaniyek resmî jî ev tişt hate belav kirin.*

**19'ê Nîsanê**

Ji bo alîkariya penaberan, Amerîka 5 hezar leşker daxiste Kurdistana Bakur ser sînorên Tirkiye û Îraqê. Li gor nûçegîhan û fotografên ku di rojname û TV yan de belav dibin, rewşa penaberan gelek xerab e. Ji birçîbûn û sermayê bi kêmasî rojê 500 kes dimrin.

Di bin serokatiya qumandarekî Amerîkî de, heyeta dewletên Hevkar, bi 6 saatî dereng çû bajarê Dihokê û li wir bi qumandarê Îraqê re, li ser rewşa penaberan civînek pêk anîn. Îraqê paş ve gav avêt û berpirsiyarê heyeta Îraqê got ku; *"em nahatine bazariyê. Em hatine guhdariya heyeta dewletên Hevkar bikin û ji wan, di derheqê penaberan de agahdarî bigrin."*

Rojnamevanê Kurd Tahir Hewremanî, di dema şerê pêşmerge û Îraqê de, bi xwe di nav şer de bû û fotografên şer girtibû. TV' ya Swêdê ji van menzereyên şerê çend perça şan da û bi T. Hewremanî re li ser rewşa şerê germ hevpeyvînek çêkir.

Serokê Parastina Rêxistina Zarokan yên Kevin û Endamê Komîta Kurdan ya Parastina Mafê Kurd Thomas Hammarberg, di TV a Swêdê de, li ser rewşa penaberan rawesta û daxwazeke acîl ji Swêd û cîhanê kir ku rojek berê xwe bigêhênin penaberan. Herweha Serokê Rêxistina Parastina Zarokan yê nû jî, ji Kurdistanê, ji herêma penaberan dihat û di TV de, belengazî û trajediya zarok û penaberên Kurd anî zimên.

Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, di derheqê organîzekirina rêxistin û kesên Kurd û Swêdî de, ji bo Kurdan daxuyaniyek belav kir. Di daxuyani ya xwe de, ji hemû komele, rêxistin û kesan daxwaza xebateke aktîv û rêxistî ya merkezî kir.

## Heyeta Kurd çû Bexdayê

**20'ê Nîsanê**

Berpirsîyarên Partiya Demokrata Kurdistana Îraqê li Şam û Londrayê dan dîyar kirin, ku Bereyê Kurdistana Îraqê di bin serokatiya Celal Talabanî de, Nêçîrvan nûnerê PDK-Îraqê, Samî Abdurrahman serokê Partiya Gel, Resûl Mamend Serokê Partiya Sosyalîst heyetek şandine Bexdayê ku bi Saddam re danûstandinan pêk bînin. (*)

Paşê dîyar bû, ku Saddam di binî de bi Kurdan re têkiliyan danîye. Redaktorê kovara Armancê Murad Ciwan piştî guftûgoyan çûbû Kurdistanê û dema vegerîya, di Kovara Armanc hejmara 121'ê de bi sernivîsa " Gerrek li nav Şêrebirîndarên Warwêran -2" de, li ser vê babetê de weha dinivîse:

*" Hê di destpêka biserketina serîhildanê de, Mukerrem Talabanî, ku wezîr e di hukimeta Îraqê de û heta çi teklîfên rejîma Îraqê bûne wî bi xwe anîne ji Kurdan re, hat Kurdistanê, Celal Talabanî û Mesûd Barzanî dîtin, da dîyarkirin ku Saddam Huseyîn teklîfa guftûgo û lihevhatinê li Kurdan dike.*

*"Saddam Huseyîn dibêje" got Mukerrem Talabanî " ji cudakirina Kurdistanê pê ve Kurd çi bixwazin em hazir in bi wan re guftûgo bikin." Serokên Kurdan fikirîn ku teklîf, teklîfeke baş bû. Kurdan ji xwe cudakirin û serxwebûna Kurdistanê nedixwestin, ev yek di rewşa îro ya herêmî û cîhanê de mumkun ne didîtin....*

*Lê baweriya wan bi Saddam nedihat, têr îqna nedibûn ku Saddam ji dil wê hazir be, ku pirsa otonomiyeke rastir yan cumhuriyetek federalî bi wan re munaqeşe bike û qebûl bike. Loma, xwiya bû tenê bi hatina Mukerrem Talabanî dilê wan li cîh rûnedinişt, xwestin heyetekê bişînin Bexdayê, ew raste rast ji devê hukimetê û ji yê Saddam teklîfê bibihîzin.*

*Heyetek ji du kesan: endamê Mekteba Siyasî ya PDK Fazil Mutnî û yê YNK Ferîdun çûn Bexdayê û vegeriyan hatin, gotin; rast e hukimetê ji me re gotiye ku, em hazir in rûnin, her tiştî bi Kurdan re munaqeşe bikin û pirsa Kurd ji binî ve safî bikin."*

Li gor ajansan, li ser gotina Saddam heyet çûye Baxdayê. Dîsan li gor nûçeyên ajansan, Kurd dixwazin peymana 1970'î pêk bînin.

Em dîsa guhdariya Murad Ciwan bikin:

*".... guftûgoyan dest pê kir. Erê guftûgo resmî bû, lê hemû civîn, çi bi endamê hukimetê re, çi jî bi Saddam re li ser esasên çarçawên giştî dimeşiyan û şîfayî bûn. Zebt nedihatin girtin. Pirs bi berbiçavî, xal bi xal nedihatin munaqeşekirin. Li ser çerçewa otonomiyê û demokrasiyê dihat axaftin.*

*Heyetê digot, Kurd tişt ekî naxwazin, ji bilî otonomiyeke heqîqî. Saddam li wan vedigerand:*

*- Helbet, helbet ji xwe ne hewce ye em bi dûr û dirêj munaqeşa vê yekê bikin. beyana 11'ê Adarê berî bîst salan di navbera me de hatîye îmzakirin. Yê ku ew beyan qebûl kirîye, ez bi xwe me. Em îro hazir in ku beyana 11'ê Adarê bi guhartinek ber bi pêş de qebûl bikin. Ji beyanê vir de 20 sal derbas bûne, divê ev dem jî bê hesabkirin û pêşketin tê de bên qebûlkirin. Em hazir in ji beyana 11'ê Adarê zêdetir bidin.*

*Heyetê digot: Me divê demokrasî û azadiyek fireh li Iraqê hebe. Saddam peyva wan di devê wan de dibirî, digot:*

*- Lê çawa! Hîn berî ku hûn bêjin em bi xwe hazir in ku demokrasiyek heqîqî bînin Iraqê. Ne ku niha, hê ji berê de hukimeta me li ser vê meselê rawestîyaye..."*

Mirin û perîşaniya Kurdên penaber li ser sînorên Tirkiye - Iraq û Iraq û Iranê her berdewam e. Ji bo alîkariya penaberan leşkerên Amerîkî îro gehîştin Hekariyê. Pênc hezar leşkerên Amerîkî derbasî Kurdistana Iraqê bûn. Helîkopterên şerê, leşker û helîkopterên barkêş diparêzin. Ew dê Kurdên penaber ji çîyan daxin jêr û wan di nav bajarên kon de, bi cîh bikin. Bicîhkirina penaberan re, dê leşkerên Amerîkî ji herêmê derkevin û cîhên xwe dewrê hêzên Koma Neteweyan bikin.

Ji aliyê din ve, Amerîka pirda Xabûrê ku di dema şer de xira bûbûn, îşev temam dike û di ser riya papûrê re jî, dê

alîkariya penaberan bike.

Tirkiyê biryara Parlementoya Ewropê bi tûndî protesto kir. Wek ku tê zanîn do Parlementoya Ewropê di derheqê Kurdan de 2 biryar girtibû. Yek, divê di her perçeyî de mafê Kurdan yê kulturî bêt dayîn. Dudo, divê bi lez û bez ji penaberên Kurd re alîkarî bê kirin. Di vî warî de daxuyaniya Tirkiyê weha ye:

" Di qanûna me ya bingehîn de, hilbijartineke azad heye. Mafê her kesî wek hev e. Lê, cîhê parvekariyê û parvekaran tune. Welatê me yek e û nayê parçe kirin. Di hêla penaberan de jî yekî qasî me wezîfeyê xwe yê humanîstiyê bi cîh ne aniye. "

Federasyona Komeleyên Kurd, Komîta Kurd ya ji bo Parastina Mafê Gelê Kurd li Swêdê û Komîta sîyasî, li Kunsträgårdên civînek pêk anî. Qasî 500 kes di civînê de beşdar bûn. Ji bo penaberan ji hukimeta Swêdê û gelê Swêdê alîkarîyê xwestin. Li ser rewşa penaber û Kurdistanê agahdarî dan. Ji bo alîkariyê pere berhev kirin. Li ser rewşa penaberan bi kurdî û swêdî belavok hatin belav kirin. Hinek beşdarên civînê çûndina heyeta Kurd a Baxdayê protesto kirin. Qîriyan:

- *Celal û Mesûd bi Saddamê faşîst re danenişin!*

**21'ê Nîsanê**

Leşkerên Amerîka û yên Îraqê li ser avakirina kampên penaberan li hevdu kirin. Lê, li gor peymanê divê Îraq leşkerên xwe ji hêla Zaxo dûr bixistan. Dema leşkerên Amerîkî ji bo avakirina kampan çûn nêzî bajarê Zaxo, li wir rastî polîsên Îraqê yên çekdar hatin. Li gor daxuyaniya leşkerên Amerîkî, li Zaxo ji 200'î bêtir polîsên Îraqê hene û li nav bajêr digerin. Dema leşkerên Amerîkî wan dîtin, matmayî man. Li gor peymanê divê li wir kesên çekdar nemana.

Li kampa Hekariyê penaberan êrîşî kamyonên nan kirin, leşkerên Tirk berê tifingên xwe dan hewa û teqandin û paşê jî dan nav penaberan û bi wan vedan. Penaberek mir û 5 kes birîndar bûn. Penaberan li ser vê bûyerê leşkerên Tirk dan ber keviran.

Leşkerên Amerîkî û yên İngilîz Kurdan dişibînên sehoran (pilûran,simore). Dibêjin; "Kurdên penaber niha ji ser çiyê danakevin. Em dê, bi helîkopteran nan bavêjin wan û hêdî hêdî nan berjêr bavêjin, ew dê li dûv nan dakevin kontarê çiyê û pêre jî dakevin rastê."

Li gor agahdariyên leşkerên Hevkar Kurd bi Saddam bawer nakin û paşve venagerin.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê İranê Alî Ekber Welayetî, bi awayekî vekirî li dij avakirina kampên nêzî sînorê İraq û İranê der ket û got:

- *Em naxwazin li nêzî sînorên me kampên penaberan çêbikin. Û herweha em li dij perçekirina İraqê ne jî.*

Li gor ajansan, li başûrê İraqê Şiî bi taktîkên gerîllayî şerê xwe didomînin. Lê Kurd, ji bo lihevhatinê û peyman pêk anînê li Bexdayê ne.

İro serokê hêzên Hevkar yê şerê Kuweyt û İraqê General Norman Schwartzkopf Schartkopf vegeriya Amerîka mala xwe. Ew dema li Florîda ji balafirê daket jin, keç û kûçikê xwe hembêz kir û ji TV re got:

- *Min pir bêriya jin, keç û kûçikê xwe kiribûn.*

**22'ê Nîsanê**

Ji sînorê Tirkiyê 5 km bi hundir û 2 km re jorê Zaxo Amerîka û leşkerên Hevkar cîhên kampan çêkirin. Kamp di nav leşker û polîsên İraqê de tên avakirin. Xelk bawer nake û naxwaze herin wan kampan..

Bi helîkopteran, ji Silopiyê rojê 40 car eşya dibin cîhê

kampan. Îro bi helîkopterên Amerîkî 60 rojnamevan jî çûn cîhên avakirina kampan û paşê bi otomobîlan çûn nav bajarê Zaxo. Li gor nûçegîhanê BBC Ragıp Duran, li Zaxo polîsên Îraqê cirît davêjin. Berî şer nifûsa bajarê Zaxo 200 hezar bûn, lê, îro qasî 10 hezar kes li wir maye. Ew jî Areb, Suryanî û Tirkmen in. Ji derî çend kal û pîran hema hema Kurd tunin. Xelk ditirse, newêrin qise bikin.

Wezîrê Parastinê yê Amerîka Dick Cheney daxuyanîyek da TV û got:

- Ji bo alîkariya avakirina kampan û penaberan leşkerên Îraqê ji leşkerên me re gelek dibin alîkar û hemû îmkanên xwe pêk tînin. Bi kamyonên xwe ve amadene û di çiyayên bê rê de, rê şanê leşkerên Hevkar dikin.

Li gor BBC heyeteke Kurd li Amerîka û yek jî, li Îngiliztanê bi berpirsiyarên Wezîrên derveyî yên Amerîka û yên Îngiliztanê re rûniştin û li ser pirsa Kurd axaftin.

Li Tahran û Londrayê serokên Şîîyên Îraqê, çûndina Kurdan a Bexdayê protesto kirin û daxuyanî dan ku:

*" Wek muxalefeta Îraqê, em du car bi Kurdan re rûniştin û me hemûyan dîyar kir ku 'bi Saddam re rûniştin nabe. Peyman nabe. Ji ber ku mirov nikare bi Saddam bawer bike. Niha serokên Kurdan rabûn çûn Bexdayê ba Saddam. Saddam ketiye tengasiyê. Ji ber vê yekê jî, ew dixwaze bi Kurdan re rûne û li hev bê û giraniya şer bide ser Şîîyan. Dema karê Şîîyan tewa bike, vê carê dê dîsan vegere ser Kurdan."*

Îro çend roj in, ku Celal Talabanî bi heyeta Bereyê Kurdistanê ve li Bexadayê ne û bi Saddam re, li ser peymaneke aştiyê rûniştine. Lê, tû agahdariyek di vî warî de tune. Li gor texmînan, dibêjin; *"Kurd dixwazin peymana 11'ê Adara 1970'yî piçek berfireh bikin. Bajarê Kerkûkê jî bikin nav sînorên otonomiyê."*

# *Peymana 11' ê Adarê ya 1970'yî*

*1 - Di heremên ku piraniya rûniştvanên wan Kurd in, zimanê kurdî li gel ê erebî dê bibe zimanê resmî ; herweha zimanê kurdî di van herêman de dê bibe zimanê perwerdekirinê. Ji dervî vê li cîhên din ên li Iraqê, zimanê kurdî di çarçova Qanûna bingehîn de dê wekî zimanê duwem bête xwendin.*

*2 - Ji bo ku birayên me yên Kurd di jîyana îdarî de cîh bigrin ; di nav de wezîrtî, serokatiya leşkerî û hwd. di cîhên taybetî û giring jî, di hemû karên îdarî de tu ferq û cûdabûn di navbera Kurdan û yên din de neyinkirin. Ev armancek girîng a Hukimet a Şoreşê ye, ku dixwaze pêk bîne. Gava Hukimet a Şoreşê vê biryarê digre ; ji bo bicîhkirina vê biryarê bi awakî edîl divê kar bên kirin û herweha li gor hejmara brayên me yên Kurd, ku berê tehda li wan hatiye kirin jî, li ber çav bêt girtin.*

*3 - Ji bo paşvemayîna di warê kultur û perwerdekirinê de yên neteweyê Kurd ji holê bête rakirin dê plan û proje bêne amadekirin û di pêkanîna wan de, dê ev xal li ber çav bêne girtin :*

*A - Ji bo mafên gelê Kurd ên ziman û kulturî di radyo û televîzyonê de program bêne amadekirin û ji bo amade û îdarekirina kar û baran Konseya Şoreşê, ku ew bi Dezgeha Giştî ya Kultur û Informasyonî ya Kurd ve bên girêdan, zûtirîn dem bikeve jîyanê.*

*B - Ji ber rewşa tehdayiyê di heremê de şagirt û xwendekar, ku dev ji xwendina xwe berdabûn, bê*

*ku li emrê wan bê meyzekirin dîsa dest bi xwendina xwe bikin û çare ji problemên wan re bêne dîtin.*

*C - Di herêma Kurd de hejmarek zêde dibistan bêne vekirin. Dê hingava (sewiya) xwendin û perwerdekirinê bê bilind kirin. Xwendevanên Kurd bi awakî edîl di unîwersîte, zanîngahên leşkerî , dezgehên lêkolînî û dibistanên pîşeyî (meslekî) de bên qebûl kirin.*

*4 - Di herêmên, ku piraniya rûniştvanên wan Kurd in dê karmend ji nav Kurdan bêne hilbijartin, ku di nav Kurdan de bi awayê tê daxwazkirin karmend tûnebin, hingê dê karmend ên bi zimanê Kurdî bizanibin bên. Herweha walî, qeymeqam, mudirê polîsan û mudirên ewletiyê û ji bo karên din jî yên girîng karmend ji nav Kurdan dê bên hilbijartin. Di herêmê de yekcar dê dest bi avakirin û pêşxistina mekanîzm a dewletê bê kirin û ev kar, li gor bicîhanîna biryarnameyên komîteya bilind a ku dê çavdêriya vî kar û barî bike, bi awayekî parastina yekîtiya netewî û ewletiyê bê pêk anîn.*

*5 - Hukimet, mafên gelê Kurd, ku rêxistinên xwe yên xwendekaran, rêxistinên ciwanan, rêxistinan jinan, yekîtiya mamosteyan û dezgehên din ê taybetî deyne û qebûl dike. Ev dezgeh dê bibin endamên dezgehên wekî yên Iraqê.*

*6 - A - Xalên 1 û 2 yên biryara bi hejmarên 59 ji 05. 08. 1968 - an heta belavkirina vê daxuyaniyê dê derbas bibin û ev xal dê hemû kesên ku di herema Kurd de beşdarê tehdayiyan bûne bigre nav xwe.*

*B - Karkerên siwîl û her weha yên leşkerî, kar-*

*mend dê dîsa bi paş ve vegerin karê xwe û ev kar bê girêdayiya tu formalîtan dê bê destpêkirin. Ji sivîlên di herema Kurd de, li gor pêwistiyan alîkarî bê xwestin.*

*7 - A - Ji bo ku di demek herî zû de pêşketin di herema Kurd de, di hemû waran de bête pêk anîn, ji bo ku rewşa zehmet a hatî serê gelê Kurd di salên dawî de bê telafî kirin, ji pisporan heyet bêne danîn û ji bo bicîhkirina van karan butçeyek bête veqetandin û ev heyeta hatî danîn bi wezareta karên bakûr ve bête girêdan.*

*B - Ji bo ku herêmên cuda yên Iraqê, bi awayek girêdayê hev pêşbikevin, planên aborî bêne amadekirin û tê de bi awayek taybetî balkişandin li ser herema Kurd hebe.*

*C - Ji bo şehîdên tevgera çekdarî ya Kurd û yên din, ên ku di şerê ne bi dil ketin û yên ku di vî şerî de seqetbûn yan bi newxeşiyên giran ketin, bi xalek nû ya qanun a niha û maeşên teqawidê bên girêdan.*

*D - Ji bo kesên ku zerar dîtin e û hejar ketin e, alîkarî dê bête kirin. Ev alîkarî bi avakirina avayiyan, ji bo bêkaran dîtina kar, alîkariya aborî, tazmînatê ji bo kesên zerar dîtî - dê bête kirin. Ev kar jî dê di destê komîteya bilind de be. Kesên dikevin xalên berî vê, dê ji vê xalê îstîfade nebînin.*

*8 - Vegerandina gundî yên Kurd û Ereb ser cîh û warên wan ên berê. Lê, cîhên ku niha jiyan di wan de bê îmkan e û dervî cîhên ji alî hukimetê ve li gor qanûna bingehîn ji bo berjewendiya giştî bêne bi kar anîn, dest li ser wan hatiye danîn, dê rûniştvanên van cîyan di gundên herî nêzîk de bên bi cîh kirin. Xesar a ku dê bibînin jî dê li wan*

*bê vegerandin.*

*9 - Ji bo ku di herema Kurd de qanûn a reforma erdê pêk bê, dê kar û bar bi awayekî zû bêne kirin., ku ev reform pêwendiyên feodalî bişkîne û hemû gundî dê wekî hev ji vê qanûnê îstîfade bibînin. Ji dervî vê, dê baca( vergî ) bi salan li ser gundiyan kombûyî ji ber rewşa şer dê bêne efûkirin.*

*10 - Ji bo ku qanûna bingehîn a demî, bi vî awayî bête gûherandin levhatin û peyman hatiye peyda kirin.*

*A - Gelê Iraqê bi taybetî ji du neteweyan pêk tê. Ev her du netewe - neteweyê Kurd û neteweyê Ereb in. Ev qanûna bingehîn mafên netewî yên gelê Kurd û yên mînorîtet di çarçova yekîtiya Iraqê de qebûl dike.*

*B - Ev xal dê bi noqteya 4 - an a qanûna bingehîn ve bê girêdan :*

*Di herema Kurd de zimanê Kurdî dê erebî, bibe zimanê resmî.*

*C - Ev gûherandin, dê di qanûna bingehîn de bi awayekî mayî (daîmî ) jî bimîne.*

*11 - Vegerandina çekên giran û dezgeha radyoyê ji bo hukimetê, dê li gor pêkanîna hemû xalên vê peymanê ve bête girêdan.*

*12 - Ji alîkarên Serokkomar yek dê Kurd be.*

*13 - Qanûna wîlayetan girêdayî naveroka vê peymanê dê bête guherandin.*

*14 - Piştî belavkirina vê daxuyaniyê, Komîteya Bilind a ku dê çavdêriya pêkanîna biryarên di vê daxuyaniyê de bike, pê re girêdayî dê li gor statîstîkên resmî, herêmên ku Kurd tê de zêde ne îdareya wan bighîne hev. Dewlet dê vê yekîtiyê pêşbixe û di van herêman de hemû mafên gelê*

*Kurd nas bike, ji bo ku bibe xwedî îdareyek otonom dê van mafan bigre bin garantiyê. Heta ku ev yekîtiya îdarî peyda bibe, dê di nav komîteya bilind û waliyên herêmên bakûr de civîn bi awayek perîyodîk dom bikin û kar û barên girêdayî bi neteweyê Kurd ve dê bên koordîne kirin. Ji ber ku îdareya otonom dê di nav Komara Iraqê de pêk bê, bê guman bikaranîna dewlemendiyên tebîî jî dê girêdayê îdareya vê komarê bin.*

*15 - Gelê Kurd, li gor hejmara xwe di nav nufûsa Iraqê, dê bibe xwedî berpirîyariyên qanûnî.*

**23'ê Nîsanê**

Leşkerên Amerîka û yên Hevkar ji alîyekî ve xebata xwe ya çêkirina bajarên konan didomînin û ji aliyê din ve jî, dixwazin Kurdên penaber bidin bawer kirin, ku ew vegerin bajarên konan ku di nav leşkerên Saddam de çêdikin û hêzên Saddam dê zerarek nede wan. Ji ber vê yekê, li ser pêşnîyariya Tirkiyê, niha Amerîkî penaberan tespît dikin, ku kî ji Bajarê Zaxo ne wan paşve bişênin. Lê, Tirkiye di pêşniyariya xwe de dibêje ku; *"ew penaberên ku ji jorê paralela 36-an hatine, divê bi paş ve vegerin malên xwe. Ji ber ku ev herêm di bin kontrol û berpirsiyariya hêzên Hevkar de ye."*

Lê, Kurd ji rejîma Saddam bawer nakin û naxwazin paşve vegerin, an jî herin ew kampên ku Amerîka di nav leşkerên Îraqê de, an jî gelek nêzî leşkerên Îraqê çêdikin cîhwar bibin. Kurd dibêjin; "ew polîsên ku li Zaxoyê ne, ne polîs in. Ew leşkerên Saddam ên taybetî ne û wan cilên

leşkeriyê ji xwe kirine û di şûna wê de cilên polîs li xwe kirine."

Amerîkî û leşkerên hêzên Hevkar ji leşkerên Îraqê gelek razî ne.

Îraqê bi nameyekê, serî li Koma Neteweyan xist û hatina leşkerên Amerîkî û yên Hevkar protesto kir û ji Koma Neteweyan xwest, ku rojek zû ew leşker ji axa Îraqê derkevin. Îraq dibêje ku; "ev karê Amerîka û hêzên Hevkar, karekî tecawizî ye. Welatê me perçe dikin."

Konsolosê Sovyetê yê Ankarayê daxuyaniyek da rojnama Cumhuriyetê û di daxuyaniya xwe de, li dij mudaxela Amerîkayê rawesta û got; *"ev mudaxela nav karê Îraqê ye. Divê Amerîka leşkerên xwe ji Îraqê bi paş ve bikşîne û hêzên Koma Neteweyan bên şûna wan."*

Heyeta Kurd li Bexdayê karûbarên hevdîtinê bi hukimeta Îraqê re didomîne. Li gor berpirsiyarê Bereyê Kurdistana Îraqê yê Londrayê, li Bexdayê danûstandin bi pêş ve diçin. Danûstandinên Kurdan li Bexdayê di sewiyeke gelek bilind de çêdibin. Lê, nabêjin heyeta Kurd dîrekt bi Saddam re danûstandin pêk tînin, an bi kesên din re. Ev ne zelal e. Dîsan Berpirsiyarê Bere dibêjin ku; *" têkoşîna çekdarî pirsa me çareser nake."*

Li gor gotinan, welatên Ewropa baweriyê dane heyeta Kurd ku dikarin bi selametî herin Bexdayê. Dîsan tê gotin ku Saddam li hember her 4 endamên heyeta Kurd 4 mirovên xwe yên giregir, li herêma Hewlêrê wek rehîne teslîmê hêzên Kurd kirine.

Îro jî liderên Şîîyên Îraqê rexne li lîderên Kurd girtin, ku ew çawan çûne ba Saddam û pê re guftegoyan dikin.

Wezîrê Derveyê Amerîka J. Baker ji bo aştiya Rojhilata Navîn xebatên hevdîtinî didomîne. Piştî çûndina Suriyê, ew dixwaze here Sovyetê. Baker, ji bo aştiya Rojhilata Navîn gelek girîngî dide Sovyet û dixwaze di maseya hevdîtinên aştiyê de, serokatiyê bide Sovyetê.

Helmut Kohl biryar girt, ku hêzên xwe yên îstîhkam ji bo alîkariya penaberên Kurd bişêne Iranê. Amerîka jî dixwaze hêzeke biçûk bişêne Iranê.

**24'ê Nîsanê**

Di bin serokatiya Celal Talabanî de heyeta Kurd li Bexdayê bi Saddam re li ser hin maddeyan li hev kirin. TV yên cîhanê fotografên Saddam û heyeta Kurd ku dema hevdu ramîsan weşand. Ramîsana endamên heyeta Kurd û Saddam, Kurd û bîyaniyan matmayî hişt.

Celal Talabanî li Bexdayê preskonferansek çêkir. Serokê heyeta Kurd Celal Talabanî, di konferansê de, dîyar dikir ku; " *bi Iraqê re peymana lihevhatinê pêk anîne. Li ser gelek prensîban li hevdu kirine. Di vê peymanê de, li ser avakirina rejîmeke demokratîk li Iraqê, azadiya çapemeniyê, avakirina partiyên legal û piralî û otonomiya Kurdan a 11'a Adara 1970'î li hevdu kirine. Lê, ev hîn xebatên pêş in. Dê bi firehî li ser vê peymanê xebat bikin û di dawiyê de Mesûd Barzanî jî peymanê îmza bike."*

Lê, li gor ajansan, hîn sînor û çarçova otonomiyê ne dîyar e.

Berpirsîyarê hukimeta Iraqê Dr. Amelbarî jî, di derheqê peymanê de daxuyaniyek da ku; " *qad û çarçova otonomî gelek demokratîk û berfireh e. Nêzî serxwebûnê ye. Divê ev ji bo Iran û Tirkiyê jî bibe mînakeke baş."*

Ji aliyên din ve, Kurdên penaber ên bi hêzên Kurd re girêdayî peymanê baş dîtin. Lê, yên serbixwe yên ku ne nêzî tû rêxistinekê ne, bi Saddam bawer nakin.

## *PÊŞNİYARA OTONOMIYÊ*

*(Wek ku tê zanîn delegasyona yekemîn bê plan û proje çûbûn Bexdayê. Piştî vegara Bexdayê, Kurdan di nav xwe de civîn çêkirin û vê pêşnîyara proja han bi xwe re birin Bexdayê. Delegasyona duyemîn, di bin Serokatiya Mesûd Barzanî de, ji Samî Abdurrahman, Resûl Mamend, Nûşîrwan û çend kesên din pêk hat û delegasyon cara duyemîn çû Bexdayê. Dlegasyon 42 Roj li Bexdayê ma. Di van 42- rojan de, tû deng û agahdarî ji delegasyon û hêzên Kurdan dernediket.)*

*Beşê yekem:* ***Bingehê otonomiyê***

*Beşê yekem:* ***Bingehê giştî***

*Madde 1: a) Li gor vê qanûna herêma Kurdistanê xwediyê otonomiyê ye û navê wê "Herêm" e.*

*b) Herêm ji wîlayet û yekîtiyên îdarî yên ku piraniya hemwelatiyên wan Kurd in pêk tê û bi mercê ku dokumentên serhejmara giştî ya 1977'an bibe bingehê ser hejmara giştî ya ku di pêş de wê bê kirin, sînorê herêmê tespît dibe.*

*c) Herêm yekîtiya îdariya yekgirtî ye, xwedî şexsiyetek manewî ye û di çarçowa yekîtiya Komara Îraqê ya destûrî, sîyasî û aborî de hukmê wê yê otonomî heye. Dabeşbûna îdarî ya otonomiyê bi mercê ku hukmê vê qanûnê li ber çav bê girtin, li gor qanûna wîlayetan pêk tê.*

*d) Komara Îraqê ji yekîtiya sîyasî ya du neteweyên bingeh; Ereb û Kurd û mînorîtetên netewiyên bira pêk tê.*

*e) Hemwelatiya Komara Îraqê yek e û hemû hemwelatî xwediyê maf û erkên wekhev in.*

*f) Komara Îraqê xwedî yek alî û sembolê ye. Qanûna alê û sembolê bi awayekî ku avabûna pêkhatina netewiya Komara Îraqê nîşan bide, tê guhartin.*

*g) Navendiya wîlayeta Kerkûkê peytextê Herêma Kurdistan a Otonom e.*

*h) Dezgehên otonomiyê parçekî ji dezgehên Komara Îraqê ne*

*Madde 2 : a) Zimanê kurdî li herêmê li gel zimanê erebî zimanê resmî ye.*

*b) Li herêmê zimanê perwerde û hîndekariyê kurdî ye û hînbûna zimanê erebî di hemû qonaxên hîndekarî û perwerdê de mecbûrî ye.*

*c) Wargehên perwerde û hîndekariyê ji Ereban re tên vekirin ku hîn bûn bi zimanê erebî ye, hînkirina kurdî jî di van deran de mecbûrî ye. Herweha wargehên hîndekariyê li her çar aliyên Îraqê tên vekirin ku hînbûn di wan de ji bo Kurdên li wan ciyan bi zimanê kurdî ye û hînbûna zimanê erebî di wan de mecbûrî ye.*

*d) Li herêmê, hîndekariya ji bo mînorîtetan bi zimanê wan e û zimanê erebî û kurdî jî mecbûrî ye.*

*e) Hîndekarî, li herêmê di hin" qonaxên xwe de dikeve bin sîyaseta pedagojî û hînbûna giştî ya dewletê.*

*f) Divê taybetiyên netewî, jêbermayî û toreyên neteweyê Kurd û yên mînorîtêtên din li gor qanûna ku parlementoya herêmî datîne, di sîyaseta hîndekariyê de bên parastin.*

*g) Para herêmê di bursên xwendinê yên ji bo zanîngeh (unîversîte) akademiyên leşkerî de li gor nîsbeta nufûsa herêmê tê dîyarkirin û*

*pêşnîyarkirina xwendevanan ji aliyê dezgehên berpirsîyar ve li gor qanûnên heyî pêk tê.*

*Maddeya sêyem: a ) Neteweyê Kurd li gor nîspeta nufûsa xwe beşdarî hukim dibe, herweha navendiyên hesas û girîng jî tê de di hemû dezgehên dewletê de tê temsîl kirin. Nûnerên wî jî beşdarî biryarên Îraqê dibin.*

*b) Neteweyê Kurd li gor nîspeta nufûsa xwe di parlementoya navendî de tê temsîl kirin.*

*c) Alîkarê serokkomar Kurd e.*

*d) Li herêmê li gor destûr û biryarên ku ji bo vî karî hene, maf û azadiyên Ereb û mînorîtetan parastî ne û desthilata otonomiyê xwe dide ber parastin wan.*

*e) Li herêmê xelkê Ereb û mînorîtet, li gor nîspeta nufûsa xwe di hemî dezgehên otonomiyê de beşdar dibin û herweha di navendiyên giştî de li gor qanûn û biryarên ji bo vî karî derketine, dikevin wezîfe. Û Kurd jî li yekîtiyên îdarî yên li dervayî Herêma Kurdistanê ku lê ne, temsîl dibin.*

*Madda çarem: Li herêmê biryarên dadgehî serbixwe ne û tû desthilatiya gayrî qanûnê di ser re tune, perçek e ji dezgeha adlî ya Komara Îraqê, bi mercê ku taybetiya Kurdistanê wek herêmek îstîsnayî li ber çav bê girtin.*

*Beşê duyemîn: Butça Giştî ya Herêma Kurdistanê*

*Madda pêncem: a) Herêma Kurdistanê xwedî butçeyeke taybetî ye ku bi ser butça giştî ya yekbûyî ya dewletê ve ye. Ji van butçeyên liqê pêk*

*tê ku li jêr tên:*

*1-Butça salê*

*2- Butça plana hukimeta herêmî ya avakirin û pêşdexistin.*

*3- Butça dezgeh û sazgehên berhemdariyê yên ku li herêmê hene û ên ku di pêş de dê bên avakirin.*

*4- Deyn û alîkarî*

*b) butça Giştî ya herêmê ji çavkaniyên jêr dertê:*

*1- Para Kurdistanê ji berhemên petrola ku tê texsîskirin ji bo planên pêşveçûna avabûna netewî li gor nîspeta hemwelatiyên herêmê.*

*2- Parek ji butça salê ya peryodîk li gor nîspeta hemwelatiyên herêmê, bi awayekî ku texsîsatên para sazgehên navendî, parlementoya navendî, meclisa wezîran, parastin û karûbarê derve, petrol û madenan berî ku belakirnê ji butça welêt derkeve.*

*c) Pêwîstiyên planên pêşvebirina herêmê ji hatinên girêdayî bi tiştên ku li jor hate gotin, pêk tê. danîn û lihevanîna butça herêmî her li gor vê qaîdê û bingehên butça giştî ya dewletê pêk tê.*

*d) Qanûnek ji bo detayên bingeh û prensîbên ku li jor hatin gotin û xas bi butçeya giştî ya herêmî tê danîn.*

*e) Butçeyek taybetî ji bo nehêlana paşdemayîna Kurdistanê tê danîn.*

*Beşê duyemîn: Dezgehên otonomiyê*

*Beşa yekem: Parlemento*

*Madda şeşem: Herêma Kurdistanê ji aliyê desthilata parlementoya hilbijartî ku bi navê*

*"Meclisa Teşrîî ya Herêmê" tê binavkirin û tê îdarekirin ji aliyê Organa birêvebirina (OB) hukimeta Otonomiyê ku ji ya pêşîn dertê û navê wê " Meclisa Tenfîzî ya Herêmî" (MTH) ye, li gor qanûnê û qanûn û urf û edetên din.*

*Meslîsa Teşrîî ya herêmî*

*mada heftem: MTH ji çar salan careke ji aliyê xelkê herêmê bi riya hilbijartinên serbest û raste rast tê hilbijartin. Hebûn û nîzama wê û karê hundirê wê bi qanûnekê tê sererast kirin.*

*Mada heştem: MTH serokekî û alîkarên wî sekreterekî ji nav endamên xwe hildibjêre.*

*b) Civînên MTH bi hazirbûna piraniya endamên wê pêk tê û biryarên wê bi piraniya kesên amade tên wergirtin. Lê ji danîna qanûnan re 2/3'ê dengên amade pêwîst e.*

*Madda nehem: Di çarçova destûr û qanûnê de selaheyetên MTH ev in:*

*a) Danîna nîzamek daxilî*

*b) Di çarçowa sîyaseta giştî ya dewletê de danîna qanûnên pêwîst ji bo pêşvebirina herêmê û lêkirina dezgehên wê yên ekonomîk, civakî, kulturî, avahî.*

*c) Danîna qanûnên girêdayî bi pêşvebirina kultur, taybetî û edetên netewî yên hemwelatiyên herêmê.*

*d) Danîna qanûnên taybetî bi risûm, baca herêmê li gor destûr û bingehên esasî ku di qanûna navendî de hene.*

*e) Testîkkirina butça salê û ya avakirin û pêşxistina ya herêmê li gor para ku ji her yekê re hatiye texsîskirin û wergirtina biryarên li ser hesabên dawî ku wê ji bo biryardanê ji parlementoya navendî re bê şandin.*

*f) Li gor daxwaza planên navendî yên dewletê û daxwazên pêkanîna wan testîqkirina pêşnameyên (taslakên) projên tefsîlî yên ku Organa Birêvebirê di warê ekonomiyê, avakirinê, hîndekariyê, tenduristî û kar de datîne.*

*g) Hîn guhartin li ser butça salê ya herêmê piştî testîqbûnê, li gor wan diravên ku hatine texsîskirin di vê butçê de û li gor armancên wan, bi mercê ku ne li dijî qanûn û planên pêşvebirina dewletên bin.*

*h) Gotûbêj bi endamên OB re li ser karûbarên wan.*

*i) Bawerî jêkişandin ji OB yan jî, ji endamekî yan bêtir endamên wê yê ku bawerî jê hat kişandin ji wezîfe dikeve. Biryara vekişandina baweriyê bi biryara piraniya endamên MTH pêk tê.*

*j) Piştî bi cîhetên navendî yên berpirsîyar re muşawere bê kirin û li gor qanûnên heyî di welêt de MTH qanûnên dezgeh, sazgeh û daîrên nîv resmî datîne.*

*k) Biryarên guhartinên qanûna otonomiyê.*

*Fesla duduyan: Organa birêvebirina otonomiyê (OB)*

*Mada dehem: a) OB heyeta birêvebirina îdara otonomiyê ya li Herêmê ye.*

*b) OB ji serok, alîkarê wî û ji çend endaman pêk tê ku hejmarên wan wek dezgehên ku di madda yazdan de hatine yan wan zêdetir e.*

*c) Serokkomar yekî ji nav endamên OB ji bo serokatî û avakirina OB tayîn dike.*

*d) Serokê mukellef endamên OB û alîkarê xwe ji MTH yan ji wan kesên ku mercên enda-*

*metiyê di nav wan de hene, hildibjêre û pêşkêşî MTH dike ji bo bawerî pê anîna piraniya endamên meclîsê û fermanek Komarî ji bo avabûna OB derdikeve.*

*e) Serokê OB wê di derece alîkarê hukimetê yan ya alîkarê serokkomar de be. Endamên OB di dereca wezîran de ne û selahetiyên wezîrtiyê di warên wan de wê bi wan re hebe.*

*f) Mafê serokkomar heye ku serokê OB ji wezîfe bigire. Wê çaxê OB tê feshkirin.*

*g) Gava OB bê feshkirin yan bawerî jê bê şikandin, OB karê xwe didomîne heta ku organa nû di nav pirtirîn 30 rojan de çêbibe.*

*Mada yazdem: Avabûna organa birêvebirinê (OB)*

*a) Serokatiya organa Birêvebirinê û pê ve*

*1- BuroyaOB*

*2- Buroya teftîş û tehqîqê.*

*b) Riya avakirina van buroyan li gor nîzamekê tê sînorkirin, ku OB hazir dike.*

*c) Meclîsa plankirinê (MP) ya herêmî ya ku riya avakirina wê û selahiyetên wê bi qanûnek herêmî yan bi destûreke ku ji aliyê OB hatiye danîn tê dîyarkirin, girêdayî OB ye û ev meclîs bi hevkariya MP ya navendî re karê xwe dike.*

*d) OB berpirsiyariya dezgehên jêrîn dike.*

*1-Emîrdariya giştî (wezareta otonomiyê) ya hîndekariyê û xwendina bilind.*

*2- Emîrdariya giştî ya îskan û avayiyê.*

*3- Emîrdariya giştî ya çandiniyê û reforma ziraî û avdaniyê.*

*4- Emîrdariya giştî ya karûbarên hundirîn ku wîlayetan, polîs û parastina sivîl, nufûsê û ewleyiya herêmî digire nav xwe.*

*5- Emîrdariya giştî ya ragîhandin û neqlîyatê.*

*6- Emîrdariya giştî ya kultur û ciwaniyê.*

*7- Emîrdariya giştî ya karûbarên belediyê û gundan.*

*8- Emîrdariya giştî ya seyahet û turîzmê, hêsabûnê.*

*9- Emîrdariya giştî ya karûbarên civakî, tenduristî û kar digire nav xwe.*

*10- Emîrdariya giştî ya maliya ekonomiyê, bi karûbarên malî û tîcareta hundirî û ebûrê mijûl e.*

*11- Emîrdariya giştî ya edlîyê û ewqafê.*

*12- Emîrdariya giştî ya sinayiyê ku mijûl e bi avakirin û birêvebirina dezgehên sinaî li herêmê ji xeyrî derxistina petrolê û madenan ku karê hukimeta navendî ne.*

*13- Emîrdariya giştî ya plankirinê. Lêkolîn û statîstîkan datîne, detayan ji planên pêşvebirê re, berhemdariya herêmî re, bi hevkarî û lihevkirina li gel wezareta plankirinê di çarçova planên avakirina giştî ya welat de.*

*e) Berpirsîyariya wan muduriyetên ku di benda çûyî de hatin dîyarkirin, hîn endamên OB pê radibin, bi navê sekreterê giştî û çend mudurên giştî alîkariya her yekî ji wan dikin li gor destûrên wan beşên (departementên) ku OBH datîne.*

*Madda duwazdan: Berpirsîyariyên OB yên jêrîn in:*

*a) garantiya bicihkirina qanûn û nîzaman.*

*b) Bicihanîna biryarên edliyê*

*c) Bicihanîna belavkirina edeletê. Parastina ewleyî û nîzama giştî, dezgehên netewî yên giştî û herêmî, malê dewletê yên giştî û yên taybetî.*

*d) Derxistina biryaran di her maddeke de ku ji bo bicihkirina qanûnên herêmî lazim in.*

*e) Selahiyeta karekirina li ser dezgeh giştî yên herêmî.*

*f) Ew karmendên îdara otonomiyê yên ku tayînkirina wan re girêdayî fermanek komarî an muwafeqa serokkomar e, ji aliyê OB tên tayînkirin li gor qanûnên xizmetê û kadroyên ku ew dikevin bin hukmê qanûnên ku li ser tevayiya karmendên Komarê dimeşin, bi mercê ku ew karmendên li navçên îdarî yên ku piraniya wan Kurd in, ji Kurdan bin, mudurên rêxistin û daîrên navendî ku li herêmê ne jî tê de bêyî ku hukmê mada sisiyan a vê qanûnê bê jibîrkirin û bi mercê ku meclîsa karûbar a herêmê têkeve şûna meclîsa karûbarê giştî.*

*g) Pêşnîyarkirina wan karmendan ku ji bo tayînkirina wan fermanek komarî yan jî muwafeqa serokkomar lazim e.*

*h) Tayînkirina pisporên Îraqê û bîyanî li gor qanûnên heyî.*

*i) Bicihanîna butça salê ya avakirin û pêşdexistinê ya herêmê.*

*j) Raporek salane li ser rewşa herêmî amade dike û ji serokê komarê re û ji MTH re dişîne.*

*k) Rêkûpêkkirina îdarên herêmî jî tê de derxistina talîmat û nîzamnameyan.*

*l) Amadekirina pêşnameyên projeyên tefsîlî ên karûbarên ekonomî, civakî, projên avakirin û pêşdexistinê, hîndekariyê û xwendinê, tenduristiyê û kar li gor pêwîstiyên plankirina navendiya giştî ya dewletê û daxwazên wê hemûyan ji bo testîkkirinê dişîne MTH.*

*Besê sisiyan: Pêwendiyên di navbera desthilata navendî û îdara otonomiyê de*

*Mada sêzdehan: Selahiyatên ku di destê dezgehên otonomiyê de ne, ne tê de, desthilata hemû navçeyên Komara Îraqê girêdayî dezgehên navendî ne.*

*Mada çardeh: a ) Rêxistinên emna giştî, seyahet (sefer) hemwelatî li herêmê ji aliyê meslekî, fennî û warê xizmetkirinê ve girêdayî îdarên xwe yên giştî ne ku di nav Wezareta hundirîn de ne, ji alî bicihkirina erkên xwe ve dikevin bin emrê desthilatiyên taybetî yên wan di îdara otonomiyê de (emîrdarê giştiyê hundirîn) bi mercên liberçavgirtina qanûna wîlayetê. Lê, rêxistinên polîs di herêmê de girêdayî Emîrdariya giştiya (EG) ya hundirîn (otonomî) in.*

*b) Mudurên rêxistinên ku di benda( a) ya vê maddê de derbas dibin, bi emrekî ji wezîrê hundirîn û bi pêşnîyariya emîrdarê giştî yê hundirîn tên tayînkirin û tên neqilkirin, bi emrê wezîrê hundirîn û bi şêwrandina EG yê hundirîn beyî ku qanûna wîlayetan bê ji bîr kirin.*

*c) Karmendên daîra polîs û ya nufûsê di çarçova herêmê de bi emrê EGH yan wekîlê wî bêyî ku benda (B) ya vê maddê bê ji bîr kirin tên neqil kirin.*

*d) Karmendên rêxistin ên ku di benda (a) ya vê maddê de hatine, li gor qaîdê û selahiyatên û bi taybet bi wan ve di komara Îraqê de bêyî ku naveroka benda (b) ya vê maddê bê jibîrkirin tên tayînkirin û neqilkirin.*

*e) Emnê hundirîna herêmê û dezgehên berpirsîyarya karûbarên hundirîn bi EGH ve girêdayî ne.*

*Maada pazdan: a) Daîrên desthilata navendî yên li herêmê, dikevin bin desthilatiya wezaretên xwe yên ku ew pê ve girêdayî ne û karûbarên xwe li gor xusûsiyetên xwe pêktînin. Mafê desthilatên herêmî heye ku çavdêrî û kontrola giştî li ser wan bikin û rapora li ser wan bidin wezaretên ku ew pê ve girêdayî ne û divê ji bo berpirsîyariyên xwe bi cih bînin alîkariya wan bikin.*

*b) Li gor îstîsnayên xwe, mafê desthilata navendî heye, ku raya giştî bide her îdarên herêmî ku di madda yazdehan d a vê qanûnê de hatine belav kirin.*

*c) Mafê serokkomar û serokwezîr heye, ku wezîran bişînin civînên OBH.*

*d) Desthilata navendî tê agahdarkirin bi biryarên dezgehên otonomiyê û qanûnên wê di riya serokê MTH re li gor her warekî.*

*e) Serokê OB endamê Meclisa Wezîran û yê Meclîsa plankirinê ye.*

*Mada şanzdehan: Mahkemek Destûrî ya bilind çavdêriya meşrûîyeta qanûn û biryarên dezgehên otonomiyê dike ku ji bo qanûn û biryar ji desthilata navendiya muxalifî selahiyet û tifaqa otonomiyê li gor destûr û qanûnên wan dernekevin. Ev mahkeme ji neh endamên pisporên qanûnê pêk tê; çar ji wan xelkê herêmê ne, ew serok bilehevkirina serokê parlementoya navendî û yê MTH tên hilbijartin. mudetê dewra mahkema destûrî du sal in û dibe ev dewre carek din jî bê dirêjkirin. Biryarên wê bi piraniya endaman tê girtin.*

*Yan jî mehkeme ji serokê mahkema Temyîzê û du endamên wê û serok û alîkarê*

*serokê îstîn'afa herêmî û çar karmendên kadroya derece yekê, ku desthilata navendiya duduyan ji wan hildibjêre û herduyên dîtir heyetên herêmî hildibjêrin pêk tê. Yan jî ji çend endaman pêk tê ku nîvê wan MTH tayîn dike.*

*b) Wezîrê Edeletê dikare îtîrazê li biryarên dezgehên otonomiyê li cem Mahkema Destûrî ya Bilind bike ya ku di benda berê de hatiye bi navkirin, heger li dijî destûrê yan jî qanûnan bin, ew jî di nav 30 rojî de ji tarîxa ku desthilata merkezî pê agahdar bûye û Emîndarê Edaletê îtîraz li guhertinên destûrê, qanûn, biryarên ku ji aliyê desthilata navendî derdikevin li cem mahkema Destûrî ya Bilind bike ji alî muxalifî xusûsiyat û selahiyetên otonomiyê li gor destûr û qanûnên ku di têkilî pê ve ne, di nav 30 rojan de ji tarîxa ku dezgehên herêmî pê agahdar bûne.*

*c) Li qanûn û biryarên dezgehên otonomiyê îtîraz dike, guhertinên destûrî, qanûn û biryarên desthilata navendî li cem mahkema Destûrî ya Bilind îtîraz dike û bicîhanîna wan tê rawestandin heta biryara zelalkirina wan.*

*d) mahkema destûrî ya Bilind herî pir di 30 rojan de hukmê xwe li ser îtîrazê dide.*

*e) Guhertinên destûrî, qanûn û biryarên navendî, qanûn û biryarên herêmî ên ku mahkema Destûrî ya Bilind meşrû nabîne, hemû bi hev re yan jî beşek ji wan laxû dibin ji tarîha ku hatine derxistin. Û hemû eserên wan ên qanûnî jî tên hilanîn.*

*f) MDB biryarên xwe agahdarî wezîrê edaletê û emîndarê giştî yê edaletê dike û di rojnama resmî de jî dide weşandin.*

*Madda huvdan: a) MTH gava nikaribe sela-*

*hiyetên xwe ji ber îstîfakirina endamê xwe, pêk bîne, yan jî nîsbeta wê ya qanûnî di nav 30 rojan de ji tarîxa banga civînê temam nebe, yan jî ji ber bêtir ji sê caran bawerî pê neanîna endamên OB ku di benda (d) a madda 10.a vê qanûnê de derbas dine, yan heger xwe nede ber biryarên MDB a ku madda 16. a vê qanûnê de hatiye, mafê serokkomar heye ku wê fesh bike.*

*b) Heger MTH belav bû, OB selahiyetên xwe dimeşîne heta MTH ya nû tê hilbijartin yan jî di nav 60 rojan de ji tarîxa derketina fermana Komariya fesihkirina wê tê hilbijartin.*

*c) Çi benda destûr û qanûnê hebe, ku li dijî vê projê ye tê lexûkirin.*

*Mulaheze: Divê guhartinên destûrî yên pêwîst pêk bên ji bo bicihkirina pêkanîna otonomiyê û ji bo maddên esasî yên projê têkevin destûrê.*

*Yekîtiya nîştîmanî:*

*herêma Kurdistanê, di van sê dehsalên derbasbûyî de, ket ber hoyên gelek aloz û dijwar ku herkes pê dizane. Ev yek bû sedem ku welat têkeve ber xeteran û gelek potansîyelên mezin bên sekinandin, rûhê berpirsîyarê li cem beşekî mezin ji hemwelatiyan zeîftir kir, welê kir ku rewşên îstîsnaî di ser ên tabîî re bên wergirtin. Hemwelatî ji alî desthilatê ve ketibûn ber gumanan. Vê yekê tesîrek negatîv li ser yekîtiya nîştîmanî kir.*

*Xurtkirina yekîtiya nîştîmanî armanca her kesî ya bilind e û windabûna wê rê li ber pêşveçûna netewe û welêt digire û tû alî ji zerara wê nayên parastin. Loma jî divê ew li ser esasên jêrîn, zû bi bingehîn bê çareserkirin"*

*1- Yekîtiya nîştîmanî, bi hilanîna hoyên ku li ber geşbûn û xurtkirina biratiya Kurd û Ereb hene, tê xurtkirin.*

*2- Xurtkirina Yekîtiya nîştîmanî di riya hilanîna tadeyiya dîrokî ku gehaştiye neteweyê Kurd pêk tê û bi bicihkirina mafên rewa û belawkirina edaletê, temînkirina wekheviyê û wekheviya firsetdayînê ji bo hemû mînorîtetên netewî.*

*3- Bi serketina qanûn û nîzamê lazim e. Divê her kes vê yekê qebûl bike. Ev jî di riya zor û şîddetê re pêk nayê.*

*4- Divê serokatiya tevgera Kurd (CK) heta jê tê alîkariya hukimetê bike ji bo parastiana tixûb û emniyeta Îraqê li herêma Kurdistanê.*

*5- Serokatiya tevgera Kurd (CK) divê bi xurtî alîkarî bike ji bo rêlêbergitina awayên çekdarî yên neqanûnî li herêma Kurdistanê û ji bo parastin û xurtkirina yekîtiya nîştîmanî ya Îraqê.*

*Normalîzekirina rewşa li Kurdistanê: Hilanîna zerf û mercên îstîsnaî*

*1- Hemû mahkûm, tewqîf, fîrar, girtî û penaberbûyî yên ji ber sebebên sîyasî û yên ku gîhaştine hêza pêşmêrge; çi Kurd û çi jî xeyrî wan ji sivîl û eskeran, çi zabit û çi leşker (hemû endamên quwetên çekdar ji ordiyê, polîs û hêzên emniyeta hundirîn û çekdarên parastina nîştîmanî û mufrezên taybetî) divê bi giştî bên efûkirin. Cezayên eslî û yên ji wan derketî û netîcên wan ên sivîliyê divê têkevin ber vê efûyê. Hecza li ser malê wan ê menqûl û xeyrî menkul tê hilanîn û biryarên di heqê wan de derketibûn lexû bibin û tazmînatên adil (haqkirî) bigihên yên ku zerar dîtine û hemû mafên wan*

*li wan vegerin, mahkûm, mewqif û girtiyên ku dikevin ber vê efûyê bên berdan û efûyek giştî ji bo hemû mahkûm û girtiyên Iraqê yên sîyasî derkeve û bi munasebeta vê îttîfaqê. Ew qezencek e, ku alîkariya xurtkirina yekîtiya nîştîmanî û vê îtîfaqê xurt dike.*

*2- Karmend, mustaxdem, karker û endamên quwetên çekdar, zabit û yên bê rutbe ji leşker û polîsan û hêzên emniyeta hundirîn û Kurdên nobedarên tixûb û xeyrê wan ên qewîrandî ên ku xizmeta wan hatiye lêxûkirin û dûr bûne û yên ku hatine teqawidkirin ji ber sedemên sîyasî, divê vegerin ser karên xwe, bêyî girêdana bi jimara kadroyên ku dewra dûrbûn, derkirin, teqawidbûn û ezla wan bê hesabkirin wek dewrek aktîvî ji bo meseleyên zêdebûna maeş û terfîkirin û teqawidiyê.*

*3- Kardem û mustaxdem û karkerên ku ji daîre yan îstisasên xwe yên eslî neqlê daîrê û îxtîsasên dîtir bûne, yan ji herêma Kurdistanê hatine şandin ji bo wîlayetên din, ji ber sebebên sîyasî, Kurdên li her çar aliyên Iraqê divê vegerin daîre û ser karên xwe yên berê.*

*4- Xwendevanên qewirandî, mahkûm, girtî û bazdayî û penabûyî yên sîyasî yan yên ku gîhaştine hêzên pêşmêrge divê vegerin dibistan û fakulte û înstîtuyên xwe û alîkariya bursên xwendinê ji yên muhtac re bên dayîn da ku xwendina xwe xelas bibin û salên dûrkirina wan ên ku wenda bûbûn neyên hesibandin û xwendevanên Kurd ên li derveyî Iraqê karibin têkevin derece salên xwe û unkversîte û înstituyên xwe, bi mercê ku hemû mafên wan bi temamî bên temînkirin.*

*5- Xwendina Kurdan û mînorîtetên din di dibistan, înstutî û dezgehên hîndekariyê - universîte, xwendina bilind ên sivîl û eskerî de, herweha di bursên din de û di rêdanên xwendinê û burs li hundir û derve bê îstîsna yên ferqîtiyê û li gor kîfayeta wan bên qebûl kirin.*

*6) Unîversîta Silêmaniyê divê vebe.*

*7) Xelkên penaberbûyî yên gundan, qeza, belediye û wîlayetan divê vegerin gund û warên xwe û zerara wan bê dayîn û cih û warên wan bên avakirin û pêşdaxistin, bi awayê ku her awe xizmet bê gihandin ji bo wan da ku li gor îmkan û bikêrhatinên xwe yên tebiî, ziraî bibin navçên pêşketî di warê ziraî, heywan xwedîkirinê, sinayiya biçûk, turîzmê da ku li gel pêşvebirina ekonomiya welêt, ewleyî û parastina welêt xurt bibe.*

*8) Divê hemwelatiyên Ereb ên ku hatine î warên Kurdan yên xwe yên ne eslî bicihbûne, bên vegerandin û cih warên xwe yên eslî yên berê.*

*9- Divê barzanî û ew qurbanên êrîşa enfalê bên vegerandin û li ciyên xwe yên eslî bên bicihkirin.*

*10- Ew Kurdên fehlî yên ku hatine mecbûrkirin cih û warên xwe terk bikin û koçî cihekî din yan derveyî welêt bikin, divê destûra wan bê dayîn ku vegerin welêt, yan li cihên xwe yên eslî yan jî li herêma Kurdistanê bicih bibin. Milkên wan li wan bê vegerandin, zerar û zîyana wan bi adilî bê tazmînkirin û hemwelatiya Iraqê ji bo wan bê dayîn.*

*11) Qanûna reforma ziraî divê di herêma Kurdistanê de bê bicihkirin û bi awakî ku li gor menfeata cotkaran be bê guhartin û pêwendiyên*

*feodalî nîhayiyên tesfîye bike. Divê hemû cotkar bibin xwedî parçekî erdê munasîb û bac û deynên erdan ên ku di demên berê de li ser wan kombûne bên efûkirin.*

*12) Lexûkirina qanûnên rewşa îstîsna bi awakî weha ku erdên herêma otonomiyê kiribûn erdên dewletê li xwediyên wan ên eslî bên vegerandin û hemû qanûn, qerar û talîmatên îstîsnayî bên lexûkirin.*

*13) Ji nû ve avakirina akademiya Zanistiya Kurdî ku serbestiya xwe îdarekirina wê ya taybetî hebe û hewl bê dan ku li gor qanûna Akademiya Zanistî ya Kurdî ya reqema 183 a sala 1970'î bê neqilkirin ji bo navendiya otonomiyê.*

*14) Divê maeşê teqawidiyê bê texsîskirin ji bo malbatên ku endamên wan şehîdbûne, yan îdambûne di demên îstîsnayî yên berê de û ji yên din ên wekî wan û ji bo seqetan bi sebebê wan rewşan, xaniyên munasîb ji bo wan bên texsîskirin, qanûnek taybetî (biryarnamek) ji bo van karan divê derkeve, divê ew têkevin çarçova lazimiyên ku ji bo şehîdên welêt tên dayîn.*

*15) Divê ambargoya ekonomî ji ser Kurdistanê bê hilanîn û maddên serfê ji bo jîyanê bi hemû curên xwe ve li herêmê bên peydakirin, kontrol li ser bazara reş û spekulantiyê bê şidandin.*

*16) Hemû xizmetên karên avayiya pêşvebirinê divê vegerin Kurdistanê; projên turîzmê û havîngehan, avdanî, bandav û çandinî, elektrîk, îndustrî, kanal û avê, riyan, pir, avakirina dibistanan, ya nexweşxane û klînîkan, xaniyan û hemû projên curbe cur ên ku hatine*

*rawestandin, betalkirin û projên nû jî tê de. Çêkirina planeke ji bo pêşvebirina navçê, tazmînkirina ew pêşketina ku gîhaye wê, li gor siyasetên butça salane yan planên avakirina netewî û texsîskirina çavkaniyên pêwîst ji bo wan.*

*17) Li gor beyana 11'ê Adara 1970'yî, planek zûtirîn wext bê danîn ji bo pêşketina herêmê û telafîkirina paşdeketina wê.*

*18) Divê bi darê zorê hemwelatiyên Kurd neyên mecbûrkirin ku bibin endamên partiyên sîyasî û rêxistinên civakî. Bicihkirina maf û erkan û bidestxistina îmtîyazan û peydakirina berjewendiyan neyên girêdan bi wê endametiyê. Qanûn û nîzamên ku li dijî vê maddê re divê bên rakirin.*

*Demokrasî li Îraqê*

*Ew problemên aloz ên ku li pêşiya neteweyên Îraqê ne; bi Ereb, Kurd û mînorîtetên xwe yên netewî û dînî ve peyda nedibûn, nediketin serhev û nediazirîn heger demokrasiyek heta dereceyeke munasib hebûna, heger rê li ber hêzên sîyasî yên nîştîmanî yên cuebe cur vekirîbûna ji bo karîbûna bîr û baweriyên xwe li ser çareserkirina wan probleman û hin di destpêkê de rê libergirtina wan nebûna. Garantiya serekî û esasî û xurt ji bo çareserkirina problemên netewe û welatê me û pirsa neteweyê Kurd jî tê de li gor heyeta Cepha Kurdistanê, di peydakirina atmosferan ku netewe û hêzên wî yên sîyasî yên curbe cur bi hemû baskên xwe yên fikrî û sîyasî serbestiya xwe ya sîyasî li ser bingehê avakirina dewleta huqûqî, garantî û îhtîrama mafên mirovayî û*

*pirpartîtî û serbestiya hilbijartina nûnerên netewe di meclîsa Wetanî de û serbestiya azadî çapemenî û weşanî ya rêxistinên sendîqayî, meslekî û demokratî û cihgirtina di desthilatê de bi aştî li gor daxwaza netewe azadî de ye.*

*Ji bo bicihkirina demokrasiyê li Iraqê û otonomiyê li Kurdistanê divê hukimetek koalîsyonê ya muwaqet bê avakirin da ku ew bikaribe mercên pêwîst ên hilbijartinek serbest piştî 6 mehan ji roja danîna wê hukimetê pê ve amade bike. Di vê hukimetê de Cepha Kurdistanê jî tê de divê hemû hêzên nîştîmanî yên muxalîf beşdar bibin. Ji vê hilbijartinê meclîseke wetanî ya tesîsî derdikeve ku destûrek daîmî ji welêt re deyne û huki met piraniyê wê jê derkeve.*

*Projên ku heyeta Cepha Kurdistanî ji bo normalîzekirina rewşa welat û Kurdistanê pêşkêş kirin, programekî acîl e û di halê pêkanîna wê de, em zemînek saxlem ji bo çêkirina hilbijartinan ku welêt dixe emnîyet û îstîkrarê û ji bo hemû huner û hêza bên bikaranîn ji bo çareserkirina problemên welêt ên aloz û dijwar peyda dike.*

Saddam, hejmareke gelek zêde polîs şandiye Kurdistanê. Polîs li Zaxo cirît davêjin. Hêzên leşkerî yên Hevkar polîsan tehlîke nabînin. Hêzên Hevkar dixwazin penaber bi wan bawer bikin û paşve vegerin cîhwarê xwe. Lê, penaber ji polîs û leşkerên Saddam bawer nakin û naxwazin herin kampên hêzên Hevkar ku li nêzî Zaxo çêdikin. Irak dibêje ku:

- *Em bi şandina polîs didin dîyarkirin ku herêma Kurdan di bin kontrola me de ye û em ewlekariya herêmê kontrol dikin.*

Li gor ajansan, Amerîka ultîmatomek da Îraqê ku hêzên polîs û leşkerên Îraqê, divê di navbera 48 saetan de, ji herêmê derkevin. Lê Amerîka di derheqê rastî û çewtiya vê nûçê de, heta niha tiştekî negotiye.

Ji aliyê din ve, serokê NATO got ku:

- *Armanca me rizgarkirina mirovan e. Em karê xwe didomînin heta ku kar dewirê hêzên Koma Neteweyan bikin.*

Amerîka dest bi nivîsandin û tespîtkirina nav û navnîşanê penaberan kir. Piştî tespîtkirina nav û navnîşanan, Amerîka dixwaze penaberan nêzî mala wan bi cîh bike. Penaberên ku malên wan xerab nebûne divê herin mala xwe. Yên ku malên wan di dema şer de xerab bûne û şewitîne, divê bi şev di kampan de bimînin û bi roj jî herin xaniyên xwe ava bikin.

Lê, penaber ji Saddam bawer nakin û pişt bi garantiya Amerîkî û hêzên Hevkar jî girênadin. Piraniya wan dibêjin:

- *Heta em herin teslîmê Saddam bibin, em li serê van çiyan bimrin bi şereftir e.*

Hinek jî bêdeng in. Lê, penaberên ronakbîr dixwazin herin welatekî Ewropê.

Koma Neteweyan dixwaze îdareya Kampan bispêrin wê. Lê, sekreterê Koma Neteweyan, dixwaze berî ev biryar di Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan de bê girtin û paşê ew wezîfe bigrin ser milê xwe.

Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Tirkiyê M. Sungar dîyar kir ku; "*Tirkiyê pêşnîyariyek ji Amerîka re kir, ku ew penaberên ku ji jorê paralela 36-an hatine, divê dîrekt vege-*

*rin gund û bajarên xwe; lê yên ku ji jêrî paralela 36-an hatine, bila li kampan cîhwar bibin. Amerîka vê pêşnîyariya Tirkiyê di cîh de dît û herdu dewlet li ser pêk anîna vê pêşnîyariyê xebat dikin."*

Tirkiye, li ser guftûgo û peymana Kurd û Îraqê gelek radiweste. Bi awayekî balkêşî taqîb dike. Ji aliyê din ve, Tirkiye jî, ji bo bi Îraqê re têkilî danîn xwe nerm dike û riya têkiliyan vekirî dihêle. Wek tê zanîn çendek berê Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Îraqê Tarik Azîz dixwest biçe Tirkiyê, lê Tirkiye ne dixwest pê re têkiliyan dayine û ji hatina Tarik Azîz re çiv da xwe. Niha jî, ji hatina Tarik Azîz re lempa kesk pê dixin. Lê, Tirkiye dixwaze hatina Tarik Azîz bihêle piştî hatina Serokkomarê Îranê Refsancanî. Wek hat dîyarkirin dê Serokkomarê Îranê Rafsancanî di dawiya meha gulanê de here Tirkiyê. Hatina Refsancanî ya Tirkiyê ji bo pirsa Kurd e. Tirkiye, dixwaze li ser pirsa Kurd, bi Îran, Îraq û Suriyê re civînan pêk bîne û di vî warî de, dibe ku peymanên nû pêk bînin.

Îro Konseya Ewropayê, li ser jenosîda Kurdan, di derheqê Îraqê de biryara protestokirinê girt. Konseya Ewropayê ji bo alîkarîkirina penaberên Kurd jî, ji Tirkiye û Îranê re spas kir. Rexne li polîtîka Tirkiyê ya penaberan kir, ku Tirkiye ew kesên ku ji welatên Ewropê bên, wan di statûya penaberiyê de qebûl dikin û yên ku ji welatên Asya û Afrîkayê bên, wan li derê vê statûyê digrin û wan kesan penaber qebûl nakin.

Konseya Ewropê xwest, ku ji bo Kurdan mijara otonomiyê bigre rojeva xwe û li ser wê gotûbêj bike. Lê, Tirkiyê giraniya xwe danî û mijara otonomiyê ji rojevê derxist.

## Pêkanîna herêma ewlekar

**25'ê Nîsanê**

Qesra Spî dibêje ku *"Îraq aştî û ewlekariyê dixe tehlîkê."* Amerîka, bala Îraqê kişand û dîyar kir ku; *" heger heta dawiya hefteyê, Îraq polîs û leşkerên xwe ji Zaxo bi paş ve nekşîne, dê Amerîka li hember hêzên Îraqê şîddetê bi kar bîne."*

Serokê heyeta Kurd Celal Talabanî, ji peymana xwe û Saddam gelek bawer e û wê pêngaveke pozîtîv dibîne. Talabanî dibêje ku:

- *Em ji bo Îraqeke demokratîk û Kurdistaneke otonom têdikoşin. Em li Îraqê dewleteke serbixwe naxwazin. Otonomiya me, di çarçoveya, otonomiya 11 Adarê 1970'î de ye. Ev peymana ku me li ser prensîbên wê yên bingehîn li hevdu kir, pêngaveke gelekî pêşketiye. Divê ji niha ve derbeder û penaberên Kurd vegerin mala xwe.*

Sadûn Hamadî jî, li ser navê hukimeta Îraqê gotinên C. Talabanî rast dibîne û dom dike:

- *Li Îraqê rûpeleke nû vebûye. Ev jî demokrasî ye. Polîtîkayeke bê teref e. Pêkanîna otonomiya 11 Adarê ye...*

Kurd bi vê peymanê bawer nakin û dibêjin:

- *Ev, ji dek û dolabên 1970'î perçeyek e.*

Li Londrayê Serbest Aram dibêje:

- *Em matmayî man! Bi Saddamê ku 23 sal in, ku Kurdan dikuje û welatê wan wêran dike re peyman çênabe.*

Hoşyar Zabarî:

- *Gufûgo û danûstandin tiştekî baş e, lê bi Saddam bawerî nabe. Saddam bi tenê maye, ketîye davikê. Ew dixwaze xwe ji vê davikê derbixe.*

Di derheqê peymanê de dîtinên penaberên ku li ser sînorên Tirkiyê û Îraqê ne cuda ne. Ji penaberan hinek li

dij peymanê û hinek jî li gel in. Ew dixwazin zû vegerin malên xwe.
Şîîyên Îraqê ku berê bi Kurdan re li dij rejîma Saddam Bereyek Îraqî çêkiribûn, ew li dij peymanê ne. Ew rexneyên tûj ji Kurdan re tînin.
Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Îranê, ji peymanê razîbûna xwe da dîyar kirin. Tirkiye hîn jî bêdengiya xwe didomîne.
Helîkopterên Îngiliz, îro ji Yuksekovayê xwarin, kinc û îlac kişandin Kurdistana Îraqê.

**26'ê Nîsanê**

Amerîka, zorê da Îraqê û Îraq mecbûr ma, bê şert û şirût îro polîs û leşkerên xwe ji Zaxo û derdora wê bi paş ve kişand. Heta hinek leşker û polîsên Îraqê, fersenda bi otomobîlan çûndinê nedîtin, bi peyatî ji Zaxo derketin û çûn.
Celal Talabanî, li Kurdistanê daxuyaniyek da, ku :
- *Hîn di navbera Bere û hukimeta Îraqê de gelek dijberî hene. Ji bo peymanekê hîn gelek ji hevdu dûr in. Bi tenê li ser hinek pirsan peyîvîne. Ev îş dê hîn bi mehan bigre.*
TV ya CNN dîrekt nîşan da ku li Îraqê ji 70.000 bêtir leşkerên Yemen, Sudan û gerîllayên Filistîniyan hene. Ew li dij Kurd û Şîîyan aktîv şer dikin.
Rojnameyên Ewropî û Swêdiyan li ser guftûgoyên di navbera Kurd û Saddam de radiwestin û hema hemû bawerî bi Saddam û rejîma wî nayînin. Fotografên ramîsana Celal Talabanî û Saddam Huseyîn belav dikin. Vê ramîsan û hembêzkirinê gelek seyr dibînin. Û dinivîsin ku; *"Saddam dîsan dixwaze Kurdan bixapîne. Niha li seran serê cîhanê der û dor li Saddam teng bûye, ji ber vê yekê pêwîstiya wî û rejîma wî bi Kurdan heye. Lê, piştî çendekê, dê ew dîsan li Kurdan vegere û dest bi qirkirina Kurdan bike."*

**27'ê Nîsanê**

Polîs û leşkerên Iraqê li Zaxoyê neman. Lê, xelk dibêje ku; " *rejîma Iraqê bi kincên sivîl gelek muxbîr li Zaxoyê bi cîh kirine.*"

Li gor nûçeyên nûçevanan, îro li bajarê Zaxoyê jîyana normal dest pê kir. Lê, hîn jî, li bajêr elektrîk û av tune. Dukan vekirîne, lê kêmasiyên xwarin û eşyan hene.

Hêzên Hevkar, derbeder û penaberên mêr ên ciwan bi helîkopteran dibin Zaxoyê. Ew dê li wir di avakirina bajarê kon de bixebitin.. Heta niha 750 kon hatine daçikandin.

Dewletên Fransa û Ingiliztanê, ji bo Koma Neteweyan zêde berpirsiyarî û wezîfe dixwazin. Ingiliztan ji bo civînê bangê Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan kir.

Serokê leşkerê Amerîka li Zaxoyê, 3 serokê pêşmergan ji çiya bangê Zaxo kir û bi wan re li ser çalakiyên wan axaft. Li gor nûçevan û rojnamevanan, ji bo selametiya penaberan Amerîka naxwaze pêşmerge di herêmê de çalakiyan pêk bînin.

Serokkomarê Iranê Rafsancanî, îro li Şamê bi serokê Suriyê bi Hafiz Esat re rûnişt. Herdu serok li ser pirsa Kurd û Iraqê rawestan. Piştî hevdîtinê, Rafsancanî û Esat herduyan jî da dîyar kirin ku; "*perçebûna Iraqê naxwazin.*"

Iran dixwaze bi Suudî re têkiliyên nû û germ dayine. Ji ber vê yekê, ew dixwaze Suriye û Tirkiye navcîtiyê bikin.

Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, Komîta Parastina mafên Kurd li Swêdê û Komîta sîyasiya Kurd li Swêdê dîsan li Kungsträgårdên ji Kurd û Swêdiyan re civîneke vekirî çêkirin. Bi sedan kes di civînê de beşdar bûn. Ji Rêxistina Parastina Zarokan ya Swêdê, Xaça Sora Swêdê û rojnamevanên swêdî li ser rewşa Kurdan axaftin. Piştgiriya xwe dîyar kirin. Çend hunermend û dengbêjên

Kurd, surûd û stranên şoreşgeriyê stran. Belavok hatin belav kirin û ji bo penaberan pere hat kom kirin.

**28'ê Nîsanê**

Wezîrên derveyên Konseya Ewropê, bi yek dengî biryar girtin, ku di şûna leşkerên dewletên Hevkar de Koma netewan polîsên xwe pêkbîne û bişêne Kurdistana Îraqê.

Luxemburgê, pirseke weha ji Konseyê kir:

- *Heger Bexdat li gor biryara Koma Neteweyan a 688-an hêzên polîs qebûl neke, an jî paşê probleman derbixe dê çawan dibe? Pêwîst e, ku Koma Neteweyan tedbîra vê yekê jî bigre.*

Li gor gotûbêjan, rejîma Bexdayê li dij penaberên Kurd piçek nerm bûye, an xwe nerm nîşan dide. Yên ku bi paş ve vedigerin, ji wan re probleman dernaxe.

Li gor şirovevanan, êdî ji bo şandina polîsê Koma Neteweyan, ne pêwîst e, ku Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan biryar bigre. Ew dikare dîrekt polîsên xwe bişêne herêmê.

Qomitanên hêzên Hevkar li Kurdistana Îraqê, qada herêma ewlekariyê fireh dikin. Nêzî sînorê Tirkiyê 40 km. berfireh dikin. Ew herêm heta çend rojan digihêje sînorê Îranê.

Penaberên Kurd, ji bo vegerê bêdil û bêbawer in. Yên ku bi paş ve vedigerin ji aliyê pêşmergan ve tên rawestandin.

Hêzên Îraqê yên leşkerî hêdê hêdî ji herêma ku li ser navê ewlekariyê hatiye dîyar kirin, xwe ji wir bi paş ve dikşînin.

Hêzên dewletên Hevkar li Başûrê Îraqê jî, ji bo 15 hezar Kurdên derbeder û penaber, ji konan bajarek ji wan re çêkirin. Ew Kurd, di nav Şiîyên derbeder de li Başûrê Îraqê mane.

Amerîka û Îngilistanê, li Urdinê çend şirketên Saddam yên çekstandinê derxistin holê. Saddam li Urdinê li ser

navê tiştên xwarinê û eşya, çend şirketên Urdinî çêkiriye û bi wesîta wan şirketan, ji Çîn û Koreyê eşya dikire û tîne Urdinê. Ji wir jî bizî diçê Iraqê. Eşkera bû ku ev şirketên Urdinî yên Saddam in û ji Çîn û Koreyê li ser navê eşya çek û cebilxane dikire. Ji ber ku ambargoya Koma Neteweyan li ser Iraqê heye, ew bi xwe nikare dîrekt împort û eksport bike. Bi riya Urdinê û di bin naveke sexte de, çek û malzemayên şerê dikire.

Ev çend hefte ne, ku wezîrê Karûbarê Derveyi yê Amerîka James Baker, ji bo planeke aştiyê li Rojhilata Navîn qevz dibe. Di dawiyê de hêvîyên J. Baker ketin bin quma çolên Rojhilata Navîn. Baker bêhêvî û destvala vegeriya Amerîka.

## Bi Bexdayê re pêwendî

Di 19-ê Nîsanê de agahdariya sensasyonel, ku çend serokên Kurdan bi Bexdayê re pêwendî danîne, ji alî buroyên Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê ve, li Şamê û Londrayê hate belav kirin. Wekî, ku paşê dîyar bû, pêwendî berê li bajarê Kerkukê û Erbîlê hatibûne danîn. Piştî di gelek babet û aliyan de, li hevdu kirine, vê carê cihê hevdîtinan, biryar hatiye dan, ku li Bexdayê berdewambin. Nûneriya Eniya Kurdistana Iraqê ya ji bo bidesxistina otonomiya rastî, bi nûnerên rejîma BAAS û bi Saddam re rûniştin, ji çar kesan pêk tê. Celal Talabanî, serokê Yekîtiya Niştiman a Kurdistanê, Nêçîrvan Barzanî

endamê Polît Buro ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê, Resûl Mamend, Sekreterê giştî ya Hizba Sosyalîst a Kurdistana Îraqê û Samî Abdulrahman, Sekreterê Giştî ya Partiya Demokrat a Gelê Kurdistana Îraqê.

Heta niha nayê zanîn, gelo ew welatên ku di Hêzên Hevkar de cîh girtibûn, bi pêwendiyên di navbera Kurdan û Îraqê de, tû girêdayiya wan heye an na. Lê, bûyerên, ku çêdibin resmek tênin ber çavên mirov ku, bi awakî mantiqî bersiva tiştan derdikeve holê. Di 27-ê nîsanê de piştî derxistina hêzên Îraqê ji bajarê Zaxo, agahdariyek ji bal BBC ve hate belavkirin, ku berpirsîyarên pêşmerge û nûnerên leşkerî yên Îraqê, di meqerekî hêzên Hevkar de hevdu dîtine. Li ser naveroka hevdîtinê tiştek nehatiye diyar kirin. Her çend li Bexdayê nûnerên Bereyê Kurdistana Îraqê pêwendiyên xwe bi BAS re didomînin jî, xebata Hêzên Hevkar di çarçova paralela 36'an de dom dike. Di vê prosesê de nûçek hat weşandin, ku di navbera hêzên Brîtanya û hezên Îraqê ên leşkerî de, bûyerek tehlîke jî derbasbûye. Serokatiya Leşkerî ya Brîtanya, di paralela 36-an de dîyar kir ,ku Îraq dev ji provakasyonan bernede, dê bersivek dijwar bigre. Her di vê prosesê de, çend welatên din, wekî Ìspanya, Elmanya, Kanada û hwd. dîyar kirin, ku dê leşker birêbikin Kurdistana Îraqê, ji bo damezrandina-heremên ewleyiyê. Daxuyaniya dawîn li ser pirsa heremên ewletiyê di 28-ê nîsanê de hat. Hêzên Hevkar soz da, ku heremên ewletiyê pêk bînin û van erdan ji êrîşên mumkun jî biparêzin. Di 27-ê Nîsanê de Wezareta Derve ya Brîtanya bi daxuyaniyeke resmî nîşan da, ku dê Komîta Ewleyî ya YN bangê civîneke taybetî bike. Dê naveroka civîna li ser, sazkirina Hêzên Polîsan ên YN be, ku li Kurdistana Îraqê bêne bicihkirin. .Ji bo, ku Kurd ji êrîşên mumkun ên Bexdayê bên parastin. Ev pirs di 28-ê Nîsanê de, di civîna Civata Aborî ya Ewropa li Luksemburgê jî dê bibe rojev. Douglas Hurd Wezirê Derve yê

Brîtanya dîyar kir, ku ji aliyê wan ve hemû tişt dê bê kirin, ji bo qebûl kirina vê babetê.

Civînên Bexdayê yên ku heta 25-ê Nîsanê berdewam kirin, bi Konferansekê ji bo danezanên ragihandinê hat daxuyanîkirin. Celal Talabanî, li ser navê Bereyê Kurdistanê, babetên ku li ser wan hatiye lihevkirin, dîyar kir:

*"Heta niha me li ser çar nuxteyên girîng li hevdu kiriye. 1- Pêkanîna demokrasiyê li Iraqê. 2- Naskirina mafên netewî yên Kurdan. 3-Normalîzekirina rewşa jîyana siyasî û aborî li Iraqê. 4-Yekîtiya Iraqê. Evan tiştan bi awakî prensîp hatine qebûl kirin. Hemû hemwelatiyên me, ku dev ji erd û malên xwe berdane û reviyane, niha dikarin vegerin erd û malên xwe".*

Lê, her wekî, ku ji aliyê C. Talabanî ve jî hate nîşandan, îmzaya dawîn a lihevhatinê, divê ji aliyê Serokê Bereyê Kurdistana Iraqê û Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê,Mesûd Barzanî ve bê avêtin. Di dema pêwendiyên li Bexdayê, Nûnerê Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê li derveyî welat, Hoşyar Zebarî di hevpeyvina xwe ya bi televizyona BBC re da dîyar kirin ,ku: *"Baweriya me bi Saddam tune ye. Lê, em siyaseteke rast dajon. Gava mirov siyasetê dike, divê carnan pêl li hisên xwe jî bike. Em, dizanin, ku ji Kurdan re gelek zehmete rêberên xwe bi Saddam re bibînin. Lê belê, bê garantiyek navnetewî, em nikarin îmze bavêjin bin lihevhatinekê di navbera me û Bexdayê de".*

Di vê prosesê de, herweha hate dîyar kirin, ku nûneriyek ji Weqfa Mafên Insanî, di bin serokatiya Sitî Danielle Mitterand-xanima Serokkomarê Fransayê F.Mitterand û Instîtuya Kurdî li Parîsê, çûye Kurdistanê. Armanca çûna wan hevdîtina bi Serokê Bereyê Kurdistana Iraqê û PDK-Iraqê, Mesud Barzanî re ye. Di 27-ê Nîsanê

de jî Wezîrê Derve yê Fransa, Rolland Dumma dîyar kir, ku "Fransa bangê pênc dewletên endamên daîmî yên Komîta Ewletiyê ya YN-DYA, YKSS, Brîtanya, Fransa û Çînê dike ku li ser bûyera pêwendiya di navbera Kurdan û Îraqê de, munaqeşe bikin. Eger pêwîst be, biryarên navnetewî li ser vê babetê bêne girtin û parastina Kurdan bê kirin."

Wekî, ku tê xuyakirin, heta niha di navbera nûneriya Bereyê Kurdistana Îraqê û BAAS de, hîn li ser gelek babetên girîng ên ku hemû Kurd meraq dikin û berdikevin nehatine axaftin. Yek ji wan pirsên herî girîng, bê guman pirsa Kerkûk û Musulê ye. Ev pirs weke ku tê zanîn, a ku zêdetirîn Tirkiyê dixe hesaban e. Ji niha ve, bi devên Tirkmenan, dewleta Tirkiyê nîşan da, ku Kerkuk bikeve derê sînorên Kurdistaneke Otonom. Lê, Kurd jî bê Kerkukê , ku parçeyek ji Kurdistanê ye, îmkan nayê dîtin îmzayê bavêjin bin otonomiyekê weha. Dîyar e, li ser vê babetê diplomasiyeke germ dîsa di navbera Tirkiyê, Îranê û Suriyê de dest pê bike.Heta dest pê kirîye. Serokkomarê Dewleta Îslamî ya Îranê Rafsandjanî hate Şamê û diçe Ankarê. Alîkarê serokwezîrê Îraqê tê Enqerê. Di van rojan de li derdora pirsa netewî ya Kurd gelek tişt dê dîyar bibin. Ev, çend mehan in, ku pirsa Kurdan bi awakî pozîtîv bala dinyayê dikşîne ser xwe. Divê pirsa Kurdan jî, bi awakî pozîtîv bê çareserkirin. Daxwaza Kurd ev e!

*Cemal Batun*

**29'ê Nîsanê**

Hêzên Hevkar, sînor û qada herêma ewlekar fireh dikin. Ev herêm ji Sînorê Tirkiyê 60 km dom dike. Ev firehbûn ber bi sînorê Îranê ve diçe.

Penaberên ku li ser sînorên Tirkiyê bûn û bi paş ve vegeriyan, hêzên pêşmêrge wan 4 roj li geliyekî dabûn rawestandin û nedixwestin bi paşve vegerin kampên Kurdistana Başûr yên ku hêzên Hevkar ji wan re çêkirine. Qomutanê Fransê îro bi serokê pêşmêrge general Alî re peyîvî û piştî axaftina wan, generalê Kurd rê vekir û gel ber bi kampan ve berjêr çûn. Li gor qumutanê hêzên Hevkar heta du rojan dê gelek kes vegerine kampan. Zarok, jin, kal û pîran dê bi helîkopteran bikşînin kampên cîhên ewlekar.

Wek ku tê zanîn çend roj berê, li ser pêşniyariya İngiliz, Civata Aboriya Ewropa bi yek dengî biryara "di şûna leşkerên hêzên Hevkar de, polîsên Koma Neteweyan divê li Kurdistana İraqê wezîfe bigrin." hati bûn standin. İngiliz dixwazin, îro ev pêşniyariya xwe bibin Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan û li wir biryareke derkeve. Wek tê zanîn di Konseya Ewlekariyê de 5 dewletên endamên daîmî hene: Amerîka, İngilîztan, Fransa, Sovyet û Çîn. İngiliz hêvî dikin ku dê wan her çar endamên Konseya Ewlekar îkna bikin û biryarê ji Konseyê derbixin.

Dîtinên Kurdan li ser vê biryara İngiliz pozîtîv in û pişgiriya wê dikin.

Berpirsîyarê Partiya Demokrata İraqê li Londrayê, di derheqê hevdîtina Bere û hukimeta Saddam de got ku " me bi tenê li ser rojeva peymanê li hevdu kiriye. Ji derê vê yekê, heyeta me li ser tiştekî din nepeyîviye. Niha jî, em wek Bere di nav xwe de, li ser rojevê munaqeşe dikin. Di nav munaqeşeyên me de, "em bi rejîma Bexdayê re dîsan rûnin, an na" jî heye.

Serokkomarê İranê Alî Ekbar Haşîmî Rafsancanî îro ji Suriyê çû Tirkiyê. 16 sal in ku cara yekem serokê İranê diçe Tirkiyê. Berî ku Rafsancanî ji Suriyê here Tirkiyê, wî û serokkomarê Suriyê Hafiz Esat, li Şamê presskonferansek dan. Herdu serokan jî, ji hevdîtinên hev razî bûn.

İran dixwaze bi Suriye, Tirkiyê û bi çend dewletên herêmê re pakteke pêk bînin. Dîsan İran dixwaze bi alîkariya Tirkiyê têkiliyên xwe bi welatên Ewropa re baş bike.

**30'ê Nîsanê**

Berpirsiyarê İngiliztanê yê Koma Neteweyan, ji bo şandina hêzên polîs li Kurdistana İraqê, bi Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuellar re têkilî danî. Piştî hevdîtina wan, Cuellar dest bi xebata pêşnîyara polîs şandinê kir. İngiliztan bawer e, ku vê pêşnîyariya wî, dê di Konseya Ewlekariyê de derbas bibe. Lê, endamê Konseyê yê daîmî Sovyet dilxişûş e. İngiliztan bawer dike ku dê Sovyetê, di vî warî de îkna bike.

Wezîrê Karûbarên Derveyê Elmanyayê Gensher, daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de, piştgiriya pêşnîyara İngiliztanê kir.

Nûnerê İraqê yê Koma Neteweyan li dij pêşnîyara İngilistanê derket û nameyek da Koma Neteweyan û di vê nameya xwe de got:

- Ev dîrekt mudaxeleya hundirê karûbarên İraqê ye û li dij destûra Koma Neteweyan e.

Ji aliyê din, İraqê carek din serî li Koma neteweyan xist, ku ambargoya ku li ser İraqê danine divê bê rakirin. Koma neteweyan, di bersiva xwe de, ew mercên ku Koma Neteweyan ji bo rakirina ambargoyê danîbûn, İraqê wan pêk nehaniye û ji ber vê yekê jî, dê ambargo bê domandin; ta ku İraq wan mercan bi cîh bîne.

Li gor dîtinên PENTAGON, çareserkirina pirsa Kurdan ev e:

" Divê mirov baweriyê bide Kurdan û ew pêwîst in, ku bi rejîma İraqê re, ji bo otonomiyê rûnin, li hevdu bikin û herweha Kurdên penaber û derbeder vegerin malên xwe."

Wezîrê Karûbarên Derveyiyê İraqê Tarik Azîz, li ser pir-

seke rojnamevanan ya di derheqê sînorên otonomiya Kurdan de weha bersiv da:

- Bajarê Kerkûkê li derî plana otonomiyê ye.

Rojnamevana Alman Petra Reayner, ji Bexdayê heta Silêmaniye, Hewlêr û Zaxo geriya û hate Tirkiyê. Li gor dîtin û analîzên Petra, rewşa gelê Kurd ên sivîl ku li Kurdistanê koçbar nekirine û dev ji mala xwe bernedane, ji yên koçkirî xerabtir û perîşantir in. Xwarin, vexwarin û îlaç tune... Nexweşiyeke giştî dest pê kiriye. Di warê rewşa leşkerî de jî Reayner weha dibêje:

- *Belê bajarên Kurdistanê di bin kontrola Iraqê de ne, lê, leşkerên Iraqê bi roj jî nedikarin ji nav tanqan derkevin der. Mesela li bajarê Silêmaniyê leşkerên Iraqê di nav tanqan de xwarina xwe dixwin. Gelekî bi stres in. Derdorên bajar di kontrola pêşmêrge de ne. Hêzên pêşmêrge heger bixwazin herdem dikarin bajaran bigrin, lê ji ber du sedeman naxwazin bajaran bigrin: Yek ji ber ew xelkên sivîl ku di bajaran de ne. Dema pêşmêrge bajar bigire, leşkerên Saddam çekên giran bikar tînin û xelk dimre. Sedema dudoyan jî, dema leşkerên Saddam bajarên Kurdistanê bi paş ve girtin, bi hezaran ciwanên Kurd rehîne girtine û wan birine kampên leşkeriyê. Dema pêşmêrge bixwaze bajaran dîsan bi paş ve bigre, dê leşkerên Saddam wan rehînan hemû bikujin. Lê, şer ranewestiyaye. Hema hema her roj li gelekî herêman şer di navbera hêzên pêşmêrge û yê Saddam de çêdibin.*

Reayner dibêje, ku *"pêşmêrge, li dij hevdîtinên serok û rejîma Iraqê ninin, lê ji Saddam û rejîma wî jî bawer nakin."*

Rafsancanî cara dudoyan bi Turgut Özal re rûnişt û li ser pirsên herêmê û hevkariyê peyîvîn. Iran dixwaze bi alikariya Tirkiyê têkiliyên xwe yên derveyî bi welatên Ewropî re baş bike. Di vî warî de, ji Tirkiyê alîkariyê dixwaze. Ji aliyê din de Iran, Suriye û Tirkiye dixwazin ji bo

pirsa Kurdan peyman û pakteke di nav xwe de çêbikin.

Piştî hevdîtina Özal û Rafsancanî, herduyan presskonferansek pêk anîn. Li ser pirseke rojnamevanan Turgut Özal weha got:

- *Tû carî dewleteke Kurd çênabe. Ji bo avabûna dewleteke Kurd divê sînorên du dewletan bên guhartin. Ev ne mumkun e.*

Herdu serokkomaran carek din dîyar kirin, ku perçebûna dewleta Iraqê naxwazin.

Parlementoya Iranê li ser alîkariya welatên Ewropa ku dişênin Iranê munaqeşe vekir. Hinek parlementer bi taybetî li dij alikarî şandina Amerîkayê derketin û daxwaz kirin ku pêşî li alîkariya Amerîka bê girtin û yên ku şandine Iranê jî, bi paş ve bişênin. Li gor wan bi tenê Xaça Sor dikare alîkariyê bîne Iranê. Li gor şirovevanan ev li dij Rafsancanî jestek e.

**1'ê Gulanê**

Hêzên Hevkar penaberên Kurd bi paş ve vedigerînin kampên ku li nêzî Zaxo çêkirine. Lê, karûbarên vegerê gelek bi derengî dimeşe. Çûyîna ji kampa Işıkverenê heta Zaxo bi peyatî tam 3 roj digire. Gelek mirov jî naxwazin bi paş ve vegerin. Niha di kampa Işıkverenê de 40-50 hezar kes hene. Hîn li çiyayên Kurdistana Iraqê bi hezaran derbeder hene û ji çiyan daneketine.

Kaymakamê Şemdinliyê Erdoğan Ülker, xwest ku li kampa Yeşilovayê bigere û kampê kontrol bike. Leşkerên Ingiliz rêneda kaymakamê Tirk ku kampê kontrol bike. Di dav wan de lec derket û leşkerên Ingiliz lêdan û wî ji kampê derxistin der. Serokwezîrê Tirkiyê Yıldırım Akbulut gelek tûre(hêrs) bû û got:

- *Divê leşkerên Ingiliz lêborîna xwe bixwazin. Ji ber ku ew di bin emrê me de ne.*

Serokkomarê Îranê Rafsancanî îro li Ankarê presskonferansek pêk anî. Rafsancanî di presskonferansa xwe de got ku:

- *Divê ew leşkerên biyaniyên ku li herêmê ne, ji herêmê derbikevin. Tahran terefdarê avakirina dewleteke Kurd nîne. Ji ber ku li Tirkiyê û li Îranê jî pirsa Kurd heye. Dewletên Rojava ji penaberan re alîkariyê nakin. Ya herî baş divê ev penaber vegerin malên xwe.*

Ji aliyê din ve, li Îranê Ayahtullah Alî Hamyanî daxuyaniyek da:

- *Dinya di pirsa Kurdan de rabû ser piyan; lê, çima behsa Şîîyên Îraqê nakin û ji wan re jî wek Kurdan alikariyê nakin? Ji ber ku Şîî misilman in. Dinya ji misilmaniyê ditirse, pirs ev e! Sedem ev e!*

Li Swêdê gelek rêxistin cuda cuda 1 ê gulanê pîroz dikin. Lê, di nav wan rêxistinan de meş û mitîngên herî mezin û geş yên Sosyal Demokrat û yên Partiya Komunîst ya ku niha navê xwe kiriye Partiya Çep.

Rêxistinên Kurdan yên sîyasî û demokratîk û bi taybetî Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê heta îsal di 1'ê Gulanê de, bi rêza Partiya Çep re beşdarê meş û mîtîngê dibûn. Lê, îsal cara yekem hinek komeleyên endamên Federasyonê (ji derî Komela Kurd li Spångayê) û endamên hêzên Kurd hem bi Partiya Çep û hem jî bi ya Sosyal Demokratan re meşiyan.

Serokê Partiya Çep Lars Werner, di axaftina xwe ya 1'ê Gulanê de, li ser pirsa Kurd rawesta:

- *Îro gelê Kurd di bin tade û zordestiyeke gelek mezin de ye. Pêwîstiya gelê Kurd bi alîkarî û piştgiriya navnetewî heye. Bush banga gelê Îraqê û Kurd kir ku li dij Saddam serîhildin. Kurdan serîhilda, lê Bush bêdeng ma, gotina xwe dagurtand. Saddam dest bi jenodîdê kir. Saddam sûcdarê şerê ye. Divê hukimeta Swêdê hewl bide ku Saddam wek sûcdarekî şer li mehkema navnetewî bê*

*mehkeme kirin. Pêwîst e ku gelê Kurd mafê xwe yê netewî bigre.*

Di mîtînga Partiya Çep de, Serokê Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê Vildan Tanrıkulu jî axaftinek kir:

- Îro pêwîstiya penaberên Kurd bi alîkariyeke navnetewî heye. Ji ber zilm û zordariya Saddamê faşîst, li ser cîyayên Kurdistanê, bi hezaran jin zarok, kal û pîrên Kurd ji



birçîbûn û sermayê dimrin. Koma Neteweyan divê destê xwe bilvîne û bilezîne. Bawerî bi Saddam nabe. Divê Koma Neteweyan Kurdan û herêma wan bigre bin garantiyek.

Serokê Federasyonê, weha dawiya axaftina xwe anî:

- Pirsa Kurd bi tenê ne pirsa xwarin û alîkariya humanîstî ye; pirsa Kurd, pirseke polîtîk e. Pirsa welat û neteweyekî ye. Pêwîst e, ku Koma Neteweyan û hemû dewlet û sazgehên navnetewî bi vî awayî û çavî li pirsê binêrin. Bi vî awayî alîkarî û piştgiriyê geş bikin..

**2'ê Gulanê**

Wek tê zanîn, di bin serokatiya Celal Talabanî de heyeta Bereyê Kurdistanê, piştî hevdîtina hukimeta İraqê û Saddam vegeriya bû Kurdistanê. Bere, di nav xwe de, li ser hevdîtinê munaqeşe kir û biryara xwe ya dawî da. Li gor nûçeyan Celal Talabanî û heyeta Bereyê Kurdistanê, dê dîsan di roja 5'ê Gulanê de heyeta Kurd vegere Bexdayê û li ser prensîb û plana otonomiyê bi Saddam û hukimeta wî re guftûgo û gotûbejan bidomînin.

Li gor çavkaniyên Rojava, divê İraq Konseya xwe ya şoreşgeriyê belav bike, di tevayîya İraqê de, di 6 mehan de hilbijartineke serbest pêk bîne, efûyeke giştî derxe, Kurd û Şîîyên ku derketine derî welêt bi paş ve vegerin, qanûna bingehîya Iraqê bête guhartin, di wê de mafê Kurd û Ereban wek hev bin. Otonomiya Rasteqîn ya 11 Adarê bidine Kurdan û herêma Kerkukê jî di nav sînorê otonomiyê de be. Divê Koma Neteweyan û dewletên Hevkar jî garantiyê bigrin ser xwe.

Serokkomarê İranê Rafsancanî îro hevdîtin û guftûgoyên xwe temam kir û ji Tirkiyê vegeriya İranê. berî ku Rafsancanî bifire İranê, wî û Turgut Özal presskonferansek pêk anîn. Herdu serokkomaran di axaftinên xwe de dan dîyar kirin, ku hevdîtinên gelek baş derbas bûne û

li ser problemên herêmê û karûbarên hevkariyê gehîştine encamên pozîtîv.

Ji aliyê din ve Iranê daxuyaniyeke da ku 3 balafirên Amerîka ku ji bo derbederên Kurd eşya anîne Iranê, Iranê eşyayên balafirek qebûl nekir û balafirê bi eşyayên wê bi paş ve şand. Iran dibêje ku; "heger Rojava eşyayên kevin an jî yên ku bikaratî bişênin, em qebûl nakin û dê wan bi paş ve bişênin.

Bûyera Kaymakamê Şemdînliyê, li Tirkiyê bû bûyereke girîng û sereke. Serokwezîrê Tirkiyê yê kevin û serokê SDP Bulent Ecevit dibêje"

- *Welatê me, ji aliyê hêzên İmperyalîst ve hatiye dagîrkirin. Welatên Rojava dixwazin peymana Sewrê pêk bînin û Kurdistaneke çêbikin. Pêwîst e, ku rojek zû ev hêz bê şert û şirût ji nav axa Tirkiyê derkevin. Çi karê wan li nav axa me heye. Turgut Özal û hukimeta Yıldırım Akbulut îhanetê dikin. Divê ew bên mehkemekirin...*

Serokê Partiya Sosyal Demokrat Erdal İnönü jî hema hema wek Ecevit daxuyaniyek da.

Serokwezîrê Tirkiyê Y. Akbulut dibêje:

- *Ew leşkerên İngiliz yên ku li kaymakamê Şemdînliyê dane, ji xwe niha ji Tirkiyê derketine der û li bakurê Iraqê ne. Herweha mesele nemaye. Ji ber vê bûyerê, me bala İngilistanê kişand. İngiliz dibêjin ku "kaymakam sivîl bûye û leşkeran wî nasnekirine.*

Rojnameyên Tirk îddîa dikin ku Rojava li gor peymana Sewrê nexşeyeke (xerîteyeke) çêkiriye û di nav sînorên wê nexşê de proja GAP jî heye.

Hêdî hêdî pirsa Kurd û derbederên Kurd di çapemeniya Swêdê û cîhanê de kêm dibin. Wek nûçeyên biçûk tên belav kirin.

Li gor nûçeyan, niha Şîîyên Iraqê koçebarê Iranê dikin. Di başûrê Iraqê de qasî 500.000 hezar kes ber bi sînorên Iranê ve diçin. Heta çend rojan dê bigihêne Iranê.

**3'ê Gulanê**

Wezîrê Karûbarên Hundiriyê Iranê Abdullah Nûrî, di presskonseransê de got ku:

- *Rojava, ew xwarin û eşyayên ku ji bo derbederên Kurd dişêne, nayên xwarin û bi kar anîn. Ji ber van sedeman, me hinekî ji wan îmha kir.*

Ingiliztanê pêşnîyariyeke pêşkêşî Konseya Ewropayê kir. Ji bo zûtirîn alîkarî bigehê Kurdan, hêzên çalak bişênin herêma ewlekar. Konseya Ewropê pêşnîyara Ingiliz qebûl kir. Dê Konseya Ewropê, ji hêzên çalak çend grûb bişêne herêma ewlekar a Kurdistana Başûr ku ew grûb bi lez û bez alîkariyê bigihênin derbederên Kurd.

Herêma ewlekar her ku diçe berfireh dibe. Ji aliyekî ve, ji Zaxo ber bi sînorê Iranê ve dimeşe û ji aliyê din ve jî, ber bi hundirê Iraqê ve ber jêr, bi kurahî mezin dibe. Herêma Zaxo teng hat, îro Amêdiye jî ket nav herêma ewlekar. Li gor gotinan, dê di nêz de Dixok û Hewlêr jî bikevin nav vê herêmê. Weha dîyar e, ku dê hêzên Hevkar hîn demekî gelek dûr û dirêj li Kurdistanê bimînin.

Hîn jî piraniya Kurdên derbeder ji çiya daneketine jêr. Bi rejîma Saddam bawer nakin û naxwazin herin kampên ku hêzên Hevkar çêkiriye û çêdike. Alîkariya Ewropiyan hîn jî baş negihêştiye derbederan.

Tirkiyê, rojnamevanê Ingiliz Robert Fîsk girt û avêt der. Robert Fîsk di warê rojnamegeriyê de pisporê Rojhilata Navîn e. Ew di rojnama Indipendium de dixebite. Robert, çendekî berî, di derheqê derbederên Kurd de nivîsareke dabû Indipendium. Di wê nivîsara xwe de leşkerên Tirk çawan eşya û betaniyên ku tên ji derbederên Kurd re didizin û difroşin nivîsandibû. Ji ber vê nivîsarê, leşkerên Tirk li herêma Hakariyê Robert Fîsk girtin û wî anîn Dîyarbekirê. Li Dîyarbekirê îfadeyê wî girtin û dîrekt bi balafirê wî şandin Istanbûl. Ji wir jî, dê wî bavêjin der.

Her ku diçe navbera Ingiliztanê û Tirkiyê nexweş dibe.

Çend roj berî mesela alên hêzên Hevkar li kampan, piştwê bûyera lêdana kaymakamê Şemdînliyê û niha jî derxistina rojnamevanê İngiliz Robert Fîsk...

İro Tirkiyê qasî çend saetan sînorên xwe û İraqê girt. Li dergehê Xabûrê, bi sedan TIR ketin rêzê. Rojnamevan û nûçegîhan nikaribûn herin û werin.

Serokê Partiya Demokratîk a Çep Bulent Ecevît, rexneyên tûj anî ser hukimetê û T. Özal:

- *Özal çewtî û şaşiyan dike. Başûrê rojhilat (Tirk ji Kurdistana Bakur re dibêjin; "Başûrê rojhilat") kir kamp û bassên leşkerên Amerîka û İngiliz. Divê bi lez û bez hemû hêzên bîyanî ji herêmê derkevin. Bila herin İraqê, li wir çi dikin bila bikin.*

Di rojnama Waşîngton Post de, bi navê Peter nivîsarek hat belav kirin. Peter, di nivîsara xwe de rexne li polîtîka Bush digire û dibêje:

*" Bush, ji ber ku Tirkan netirsîne û ji xwe bi dûr nexe, ji pirsa Kurdan re çavên xwe girt."*

Bereyê Kurdistana İraqê Buroya Skandînaviyê îro cara yekem li ser guftûgoyên di navbera Bere û hukimeta İraqê de daxuyaniyek belav kir. Em vê daxuyaniyê li jêr pêşkêş dikin:

### *DAXUYANİ*

*Buroya Bereyê Kurdistanê li Skandînaviyayê van zan yariyên ku li ser guftûgoyên di navbere Bere û hukimeta İraqê de gehêştiye Buroyê, pêşkêş dike:*

*I - Guftûgo di pileya yekem de, li ser 4 çar bendan çêbû.*

*Yekem: Normalkirina rewşê li Kurdistanê... Me daxwaz ji bo rakirina hemû rewşên îstîsnayî û îcrayên raguhastin û bi Erebkirin û rakirina qanûnên îstîstaniyên zindan û surgunkirinê kir. Hukimetê hemû daxwazên me qebûl kir.*

*Duyem: Yekbûna nîştîmana Îraqê... Herdu aliyan behsa biratiya Kurd û Ereb li alîyek û sîyaseta şovenîstî li alîyekî din kir, em li ser vê yekê li hev hatin, ku bingehê sîyaseta yekbûna nîştîmaniya Îraqê bibe wekheviyeke birayetiya herdu netewan û prensîbên demokrasiyê.*

*Sêyem: Demokrasî û mafê mirovî... Me dawa kir ku "Manîfestoya Navnetewî ya Mafê Mirov" bêt qebûlkirin û prensîbên wê bikevin nav hemû qanûnên Îraqê. Wan vê daxwaza me jî qebûl kir.*

*Li ser demokrasiyê me dawa kir ku:*

*A - Azadiya bîrûbawerî, çapemenî û rojnamegeriyê.*

*B- Azadîya Partî, rêxistin, û jîyana pirpartî (pluralis) û nemana gotina "El hizib El qaid" (Partiya Lîder).*

*C- Hilbijardina azad û di hilbijartinê de wekhevî ji bo hemû partiyan.*

*D- Jîyana parlementeriya rastî.*

*Wan daxwazên me qebûl kirin.*

*Çarem: mafên neteweyê gelê Kurd û beşdarbûna wî li biryarên sîyasîyên navendî li Bexda... "Wan got ku li ser vê xalê çi munaqeşe pêwîst nîne.Em naveroka Beyana 11 Adarê bi teks, mane û temamî qebûl dikin."*

*II- Biryara serokatiya sîyasî ya Bereyê Kurdistana Îraqê di roja 30.4. 1991:*

*Serokayetiya sîyasî ya Bereyê Kurdistanî, carek*

*din amadeya xwe ji bo çareserkirina pirsa kurd bi aştî di çarçoweya Îraqekî demokratîk û yekgirtî de tekît dike, ji ber vê yekê ev biryarên jêr hatine girtin:*

*1- Şandina nûnerên xwe di van rojên nêzîk de, ji bo Bexda ku guftûgo bidomînin û pêşnîyar û projeyên xwe bidin nûnerên hukimetê.*

*2- Şandina spasname ji bo hemû dewlet û dezgeh û komelên ku alîkariya mirovî ji bo aware û derbederên Kurd şandine. Û herweha dawa ji wan bê kirin ku heta dikarin alîkariya xwe zêde bikin.*

*3- Em ji dewletên Hevkar (alierande) û ji Komîsyona Ewlekariya Koma Neteweyan daxwaz dikin, ku li lihevhatinê ku di navbera me û hukimeta Îraqê de, dê çêbibin, xwedî lê derkevin û bibin garantorê bicîhanîna lihevhatinê û herweha beşdarî bikin ji bo avakirin û pêşxistina Kurdistana Îraqê. Ji ber ku ev dibe sedemê berqerarbûna aştî li Îraqê û herêmê.*

*4 - Tîka li dost û alîkarên gelê Kurd dikin, ku di rewşa me de bigehîn û piştgiriyek pêwîst li xebata gelê me bikin. Ji bo çareseriyekî sîyasî û demokratîk, ji bo pirsa xwe ya rewa û rizgarkirina wê ya ji vê felaketa ku hatiye serê wî.*

*Bereyê Kurdistana Îraqê*
*Buroya Skandînaviyayê*
*1991.5.3*

**4'ê Gulanê**

Li gor nûçeyan, divê heyeta Kurd 5'ê mehê roja şemiyê biçûya Bexdayê û bi hukimeta Iraqê re dest bi guftûgoyan bikira. Ji ber hinek sedeman heyeta Kurd çûndinê bi paş ve avêtiye.

Tirkiyê biryar gir ku ew leşkerên hêzên Hevkar ên ku li herêma sînorên Tirkiyê û Iraqê ji penaberên Kurd re alikariyê dikin 30 roj bimînin. Piştî 30 rojan, divê musaadeya xwe dirêj bikin. Heger pêwîst be dikarin dîsan wextê dirêj bikin. Çend roj berê li Bangaldeşê bagerek rabû û qasî 100 hezar kesî mirin û bi milyonan kes bê mal û birçî man. Ev bûyera ha di çapemeniya cîhanê de kete pêş pirsa derbeder û penaberên Kurd. Ji aliyê din ve, roj bi roj pirsa Kurd û derbederên Kurd di çapemenî cîhanê de kêm dibin û ev pirs welê xuya ye, êdî tê girtin.

Li Swêdê, Federasyon û Komîta Parastina Mafên Gelê Kurd roja şemiyê li Stockholmê cîvineke vekirî li Sergel Torgê pêk anî. Wek civînên şemiyên din gelek kesên Swêdî, bîyanî û Kurd di civînê axaftin û alîkarî û piştgiriya xwe bi Kurdan re dan dîyar kirin. Ji bo derbederên Kurd pere hat berhevkirin. Lê, tiştek dîyar bûn, ku hejmara Kurdên beşdar li gor civînên din gelek kêmtir bûn.

**5'ê Gulanê**

Iraqê, carek din ji Tirkiyê daxwaz kir, ku Tirkiye rê bide, ku petrola wê di boriyan de were Iskenderûnê û bifroşe der. Tirkiyê bersiva Iraqê neda.

Wezîrên dewletên Xalîcê li Suudî civiyan û biryar girtin, ku ambargoya aborî ya ku li ser Iraqê heye, berdewam be. Hîn mercên rakirina ambargoyê nehatine cîh.

Amerîka dixwaze hêzên xwe yên şerê li Rojhilata Navîn bihêlê. Welatên Ereb jî, di vî warî de dudil in. Wezîrê Parastinê yê Amerîka Dîck got ku:

*- Em qasî 100 serleşkerên xwe li herêmê dihêlin."*

**6'ê Gulanê**

Hêzên Hevkar herêma ewlekariyê fireh dikin. Leşkerên hêzên Hevkar, ber bi Dihokê diçin. Leşkerên Iraqê bê deng û bê teq xwe bi paş ve dikşînin.

Ji bo guftûgoyan Heyeta Kurd di bin serokatiya Mesûd Barzanî de çû Baxdayê. Cara pêşî heyeta Kurd di bin serokatiya Celal Talabanî de çûbû Baxdayê û li ser hinek prensîban bi hevdu kiribû. Vê carê bi firehî û kûrahî dê li ser proje û programa otonomiyê rawestin. Divê heyeta Kurd çend roj berê li Bexdayê bûya, lê bi derengî ket. Li gor nûçehînan tê gotin, ku di nav Kurdan de dubendî hene û ji ber vê yekê çûndina wan li paş ket.

Di dema çûndina heyeta Kurd de, wezîrê Karûbarên Derveyî yê Iraqê Tarik Azîz, presskonferansek çêkir û li ser 2 xalên girîn rawesta:

1- Em petrola Kerkûkê nadin Kurdan; ji ber ku hemû petrola Iraqê ya merkezî ye.

2- Em garantoriya Koma Neteweyan û navnetewî naxwazin. Qebûlkirina daxwazeke weha ne mumkun e.

Civata Aborî ya Ewropê, pirsa derbederên Kurd girt rojeva xwe û li ser peyîvî. Di civînê de li ser awayên alîkariyê rawestan. Nûnerên Civata Ewropa gotin ku :

- Alîkarî diçe, lê gehîştandina wê zahmet e. Ji ber ku rê naçin çiyayên ku derbederên Kurd li wir in.

Çapemeniya Ingiliztanê, nivîsarên tûj û tûn li Tirkiyê girtin, ku Tirkiyê rojnamevanê Ingiliz Robert Fîsk derxist derê welêt.

Serokwezîrê Tirkiyê li Zelanda Nû presskonferanseke çêkir û di presskonferansa xwe de, di derheqê derbeder û penaberên Kurd de rexne li Ewropiyan girt û weha dom kir:

- Ewropî rexne li me digrin. Bi tenê Tirkiyê ji derbeder û penaberên Kurd re destê xwe dirêjî alîkariyê kiriye. Ji 1988-an ve, hîn 27 hezar derbederên Kurd li Tirkiyê ne. Me heta niha wan xwedî kir. Niha yên nû jî hatin. Em wan jî xwedî dikin. Ewropî tiştek nakin, bi tenê rexne li me digrin.

Li Dîyarbekir waliyê kolonîyalîst Hayrî Kozakçioğlu û Tumgeneralê Amerîkî bi hevdu re presskonferanseke çêkirin. Rojnamevanan ji generalê Amerîkî pirsin:

- Gelo rast e, PKK li helîkopterên we teqandiye û we jî 9 gerîllayên PKK kuştiye?

Generalê Amerîkî:

- *Ez ji vê yekê ne agahdar im, lê heger PKK li helîkopterên me biteqîne, ew wenda dike.*

**7'ê Gulanê**

Di bin seroketiya Mesûd Barzanî de heyeta Kurd li Bexdê guftûgoyan dimeşîne. Heyet û hukimeta Îraqê bi kurahî û firehî li ser otonomiya 11'ê Adarê radiwestin. Li ser navê hukimeta Îraqê Tarik Azîz û Îzzet Îbrahim beşdarê guftûgoyan dibin. Li gor nûçegînayê BBC yê li Bexdayê, guftûyo bi awayekî pozîtîv dewam dikin. Îrak pirsa Kerkûkê û garantoriya navnetewî qebûl nake.

Amerîka biryar da ku di navbera 48 saetan de, leşkerên xwe ji başûrê Îraqê bi temamî bikşîne Kuweytê û di şûna wan de, hêzên Koma Neteweyan cîhên xwe bigrin.

Wezîrê Ewlekariyê Amerîka Dîck Cheney got ku:

- *Êdî leşkerên Amerîka divê vegerin mala xwe.*

Dihok ket herêma Ewlekariyê. Amerîka û hêzên Hevkar di navbera Zaxo, Amêdî û Dihokê de stasyonan pêk anîn. Di rojê de, qasî 2000'î Kurdên derbeder bi helîkopteran ji çiya dikşînin warê kampan. Li gor daxuya-

niya serokê hêzên Hevkar, divê heta 4 rojan Kurdên derbeder bigihên mal û kampên xwe.

**8'ê Gulanê**

Guftûgo di navbera heyeta Kurd û hukimeta Îraqê de dom dikin. Îro piştî nîvro di bin serokatiya Mesûd Barzanî de heyeta Kurd û Saddam Huseyîn hevdu dîtin. Endamê heyeta Kurd Samî Rahman, îro li Bexdayê daxuyaniyeke gelek kurt da çapemeniya cîhanê ku *" goftûgo di navbera heyeta Kurd û hukimeta Îraqê de, bi awayekî pozîtîv berdewam e."*

Duh 2 balafirên Amerîka dema li ser Kurdistana Îraqê firiyan leşkerên Îraqê li wan teqandin. Balafiran îsabet negirt û gehîştin balafirgehên xwe. Wek ku qet tiştekî nebe, Amerîka deng dernanî.

Nûçegîhanê Radyoya Swêdê beşa tirkî Gönenç Erten Kurtîz, ji Kurdistanê Îraqê telefonê radyoya Swêdê kir û tiştên ku bi çavên xwe dîtibû weha pêşkêş dikir:

- Li Zaxo jîyan normal e. Piraniya dukanan vekirî ne. Em bi otomobîlê ber jêr çûn heta Batûfayê. Mirov du tiştan bi çavên serê xwe, bi awayekî vekirî dibîne: Yek Bakurê Îraqê şerekî giran dîtiye û wêran bûye. Xanî nemane, yên ku li pîya mane şewitine. Li qeraxên rê traktor û otomobîlên şewitî hene. Ev dîyar e, ku dema bi erebeyên xwe xwestine birevin, balafir û helîkopteran wan gulebaran kirine û şewitandine. Ango welat bi temamî wêran bûye. Ya duyem ev welatê wêran û şewitî di bin dagîrkirina Amerîka de ye. Mirov bi ku de diçe, ji derî leşkerên Amerîka tiştekî nabîne. Li çend ciyan me kampên pêşmêrgan jî dît. Leşkerên Îraqê li navê tunin. Bi tenê dema em ketin Îraqê, li nêzî Zaxo çend leşker di qereqoleke de hebûn. Ew jî gelek dûr bûn û wan karê xwe bi tiştekî nedianî.

Qumutanê hêzên Tirkiyê yê giştî orgeneral Doğan

Güreş çû herêma Hekarî û Sêrtê, hêzên xwe kontrol kir. Û di vegeride got:

*"Her tişt di kontrola me de ye. Divê hemû hêzên bîyanî di bin emrê me de bin."*

Berdevikê Wezareta Karûbarê Derveyî Tirkiyê Murad Sungur, li ser rewşa bûyerên ku li herêma Hekariyê û Sêrtê, di navbera hêzên Tirk û yên Hevkar de, bi taybetî di nav yên Tirk û İngiliz de pêk hatin weha anî zimên:

- Ew hêzên bîyanî ku li herêmê ne, li gor statûyeke li wir in. Ew ji bo alîkariyê li herêmê ne. Divê li gor wan prensîbên statûyê hereket bikin.

Li gor rojnameya Cumhuriyet (8 Gulan) Amerîka û dewletên Hevkar Kurdistana İraqê kirin depoya çek. Hem jî çekên giran. İhtîmaleke mezin heye ku van çekan ji Kurdan re bihêlin.

Rojnamevanê Tirk M. Ali Birand çûbû Bexdayê û bi navê 32 Rojan Programeke çêkir. Li ser pirsa Kurdan bi Serokwezîrê İraqê Sadûn Hamadî û wezîrê Karûbarên Derveyî Tarik Azîz re peyîvî. Li ser pirsa M. Ali Birand, Tarika azîz digot ku:

- *Em demokrasiyê tînin İraqê. Partiyan serbest dikin. Bi awayekî serbest dê hilbijartin pêk bên. Kurd jî, dikarin li ser navên partiyên xwe bikevin hilbijartinên herêmî. Helbet dê Kurdên din jî, li herêma Kurdan bikevine hilbijartinê. Êdî xelkê dengê xwe bide kî. Ji xwe niha jî otonomiya Kurdan heye. Em dê wê hinek jî fireh bikin.*

Serokwezîr jî digot ku:

- *Cîranên me (qesta wî Tirkiye, Suriye û İran bû) alîkariya terorîstan dikin. Ev ji bo wan jî nebaş e. Ji aliyê din ve, ev kar têkiliyên cîrantiyê jî xirab dikin.*

M. Alî Birand jê pirsî:

- *Terorîst kî ne, tu dikarî navên wan bidî?*

Tarik Azîz bê deng ma, lê, Sadûn Hamadî got:

- *Terorîst, Celal Talabanî û Mesûd Barzanî ne.*

Di eynî programê de, M. Ali Birand bi Yaser Arafat re jî hevpeyvînek kir û weşand. M. Ali Birand ji Arafat pirsî:

- *Gelo piştgiriya we ya ji bo Saddam, ji pirsa Filîstin re puanên negatîv ne anî?*

Yaser Arafat:

- *Na! tam ziddê wê. Me polîtîkayeke rast û durust ajot. Ma tu nabînî, heger niha pirsa Filîstîn aktuel e, ev jî, ji ber piştgiriya Saddam tê.*

Îraqê carekî din serî li Tirkiyê da, ku wezîrê Îraqêyê Karûbarê Derveyî Tarik Azîz here Tirkiyê. Wezîrê Tirkiyê yê karûbarê derveyî dixwest berî ku welatên Rojava Kurdistaneke çêbikin, Tarik Azîz here Tirkiyê û li ser pirsa Kurd guftûgoyan bikin. Lê, serokkomar T. Özal nexwest, ku Tarik Azîz here Tirkiyê û herweha çûndina wî bi paş ve avêtin.

Amerîka dest pê kir ji başûrê Îraqê leşkerên xwe dikşîne Kuweytê û ji wir jî dibe Amerîka. Lê, Amerîka li Kurdistanê hêzên xwe zêde û bi cîh dike.

Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan, dê li ser tazmînatdayîna Îraqê bicive. Amerîka ji hatina Îraqê ji %50 tazmînat dixwaze. Endamên din yên Konseya Ewlekariyê dixwazin ji %50'î kêmtir be. 5 dewletên daîmîyên Komîsyona Ewlekariyê, li ser vê yekê biryar bigrin.

Musteşarê maliya Tirkiyê jî, zerara ku di şerê Îraq-Kuweytê de li Tirkiyê bûye hesab kir. Li gor rapora Tirkiyê divê Îraq 6,2 milyar dolar tazmînat bide Tirkiyê. Çendekî berî, Tirkiyê zerara xwe 7,5 milyar dolar hesab kiribû û ji vî hesabî re îtîraz hebûn.

Turgut Özal îro firiya Avustraliyayê. Hukimeta Avustraliyayê nîşanek da wî. Di parlementoyê de partiyên muxalefet ji bo vê nîşandayînî, hukimetê protesto kirin. Hinek parlementerên îktîdarê jî li gel protestoyê bûn. Li der jî Kurd, Ermenî û Ruman hatina T. Özal protesto kirin. Hukimet dê zîyafetek bide T. Özal. Lê gelek parle-

menter û wezîran dan dîyar kirin ku dê beşdarê zîyafeta T. Özal nebin. Li gor ajansan, dê sibehê protestoyên mezin û girsî li hember T. Özal pêk bên.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Sovyetê Alexander Bessmertnîş, dê roja şemiyê, cara yekemîn dê İsraîl zîyaret bike. Sovyet dixwaze di pirsên Rojhilata Navîn de, di eynî masê de, bi Amerîka û İsraîl re rûne. Wezîrê Sovyetê, dê berê dostê xwe Suriyê zîyaret bike û paşê jî here Misirê.

Wezîrê Ewlekariyê Amerîka Dick, li Rojhilata Navîn hevdîtinên xwe didomîne. İngiliztan dixwaze hêzekî xwe yê giran û mezin li Rojhilata Navîn bihêle û bi cîh bike. Serokê Misirê Husnî Mubarek jî, hinek hêzên xwe ji herêma Xalîcê bi paş ve kişand.

**9'ê Gulanê**

İraq li dij bi cîhkirina polîsên Koma Neteweyan li Kurdistanê radiweste. Û dibêje:

- Ev biryar li dij prensîbên Koma Neteweyan e û dîrekt mudexela hundirê İraqê ye.

Ji aliyê din ve, İraqê qasî 2000 leşkerên xwe yên elît şand bajarê Dihokê. Leşkerê Amerîkî jî, li derdorê bajarê Dihokê ne, lê heta niha neketine nav bajêr. Dikare bûyerên lêdanê di navbera leşkerên İraqê û Amerîka de derkeve.

Tarik Azîz daxuyaniyek da, ku bajarê Kerkûkê divê li derî otonomiyê bimîne.

Li Bexdayê Mesûd Barzanî, di derheqê gufûgonyan de daxuyaniyeke kurt da û got:

- *Guftûgo dom dikin. Me heta niha pêngavên gelek pozîtîv û pêşketî avêtiye. Ez bawer im, dê em bi serkevin.*

**10'ê Gulanê**

Derbederên Kurd bi paş ve vedigerin Kurdistana İraqê, lê, ne bi hejmareke hewqas mezin. Piraniya wan benda encama guftûgoyan in. Bi rejîma Saddam bawer nakin. Li gor serokê hêzên Hevkar heta niha 12.443 derbederên Kurd bi paş ve vegeriyan Kurdistana İraqê û li wir di kampande bi cîh bûne.

Li bakurê Kurdistana İraqê 26 hezar leşkerên Amerîka û hêzên hevkar hene. Tirkiye ji vê yekê gelek fikar dike û ditirse.

Wezîrê Ewlekariyê yê İngiliztanê Tom King li ser têkiliyên navbera xwe û Tirkiyê û pirsa Kurdî daxuyaniyek da û got:

*- Ji bo pirsa Kurd, Tirkiye dipelikîne ango fikar dike. Ez baş bi vê yekê dizanim û heq didime Tirkiyê. Bûyera kaymakamê Şemdînliyê ji vê yekê tê. Em wek İngiliztanê avakirina dewleteke Kurd naxwazin. Em piştgiriya otonomiyê dikin. Em mutefîkê Tirkiyê ne. Ew çekên ku em dişênin bakurê İraqê ne ji bo Kurdan e; ji bo parastina leşkerên me ne. Tirkiye fikar dike ku ' dema hêzên İngiliz û yên dewletên Hevkar ji bakurè İraqê derkevin, dê van çekan bidin Kurdan.' Heger leşkerên min dema bi paş ve vekişin û çekên xwe bidine Kurdan, ez dê wan bidim mehkemeya leşkerî. Ji bo me jî, Kurdên çekdar tehlîke ne. Divê dostên me baş bi vê yekê bizanibin. Di pirsa penaber û derbederên Kurd de, Tirkiyê gelek alikariyê kir û dike. Ez bi xwe ji Tirkiyê re spasdar im.*

***11'ê Gulanê***

Hêzên Hevkar, xebata xwe bi lez û bez didomînin. Li gor daxuyaniya serokê hêzên Hevkar, îro qasî 10 hezarî derbederên Kurd bi helîkopleter û kamyonan birin cihên kampan û wan bi cîh kirin. Û divê her roj 10 hezar kes bi cîh bikin.

Heta îro, hêzên Iraqê û yê Hevkar li herêma Dihokê li hember hevdu bûn. Di nav bajêr de hêzên Iraqê û li derdorê jî yê Hevkar li hember hevdu rawestabûn. Hêzên Hevkar ji bo derketina ji bajarê Dihokê wexteke dabû hêzên Iraqê. Iro hêzên Iraqê mecbûr man û ji bajêr derketin. Lê, di şûna hêzên leşker de, vê carê Iraqê hêzên xwe yên sivîl bi cîh kiriye.

Mesûd Barzanî bi heyeta xwe ve îro cara dudoyan Saddam dîtin. Kes nizane guftûgoyên di navbera Iraq û heyeta Kurd de çawan diçin û di çi prosesê de ne.

Londrayê, îro di derheqê Saddam de daxuyaniyeke gelek tûj û tûnd da. Serokwezîrê Ingiliztanê John Major, got ku:

*- Heta ku Saddam li ser desthilatiyê (îktîdarê) be, em têkiliyên xwe bi Iraqê re tû carî danayînin. Ew pêşnîyarî û pêşnameyên ku di derheqê Iraqê de bên Koma Neteweyan, em dê wek Ingilistanê di Koma Neteweyan de, wan veto bikin û nahêlin derbikeve.*

Di vê mijarê de şirovevanên BBC şirove dikin ku:

*"Dibe ku Kurd ji ber vê daxuyaniyê ji John Major biqaherin. Heger Kurd li ser masê, bi Iraqê re li hevdu nekin û xwe bi paş ve bikşînin, dê kêfa John Major bêt. Dewletên Hevkar dixwazin ku Kurd ji rejîma Iraqê bi dûr bikevin. Ji bo Ingilistan û dewletên Rojavayên din polîtîkayeke nû ye. Heta niha wan nedixwest,ku Saddam bikeve û ji Kurdan re jî sînyal pêdixistin ku herin bi Saddam re, di maseyeke de rûnin. Ji derî vê alternatîf tune."*

Û şirovevanên Rojava didomînin:

*" Saddam, ji bo mayîna rejîma xwe bi Kurdan re rûdine û dest bi guftûgoyan dike. Saddam ji 100.000 pêşmêrgeyî ditirse û dixwaze bi dek û dolaban wê hêzê mezin û giran yê li dijberê xwe rawestîne. Ji ber vê yekê jî, dixwaze dest bi guftûgoyan bike û bi rawestina Kurdan bîhneke bigre. Ji aliyê din ve, rejîma Bexdayê dixwaze bi guftûgoyên navbera xwe û Kurdan, ambargoya ku li ser Iraqê heye, wê ji*

*navê rabike."*

Wezîrê Ewlekariyê yê Îngilistanê Tom King dê here Tirkiyê. Îngilistan herweha dixwaze, ew dilsariya ku di navbera wan û Tirkiyê de çêbûbû xweş û rabike .

Serokê hêzên Hevkar ê NATO, serokê hêzên giştî yê Tirkiyê General Güreş zîyaret kir. Ew dixwaze Güreş îkna bike, ku alîkariya Kurdan nakin û alîkarî bi tenê di warê humanîstî de ye. Wî, di vê mijarê de daxuyaniyek da:

- *Me çek nedaye Kurdan û nadin jî. Heger Îraq êrîşê Tirkiyê bike, em hêzên NATO amadene û dikarin di cîh de mudaxela Îraqê bikin.*

Wezîrê Karûbarê Derviyê yê Amerîka J. Baker, daxuyaniyek da, ku "deriyên hêviya hevdîtinan vebû. Dewletên endamên Konseya Hevkariya Xalîcê amadene, ku bi Îsrail re di maseyeke de rûnin. Sovyet jî daxuyaniyek da ku, ew jî wek Amerîka difikirin û piştgiriya plana Baker dikin.

Li ser pirsa derbeder û penaberên Kurd, rojnamevanan pirsek ji Baker pirsîn. Baker weha bersiv da:

- *Em niha meheke din jî, dema leşkerên xwe li bakurê Îraqê direj dikin. Heger paşê pêwîstî hebe, em dikarin pirsê bibin Konseya Ewlekariyê ya Koma Neteweyan jî.*

Stranvan û hunermendên muzîka pop, dê di 12 ê meha gulanê de, li Îngilistanê ji bo alîkariya derbederên Kurd galayeke (konsereke) mezin û navnetewî çêbikin. Hatina wê ji derbederên Kurd re dîyarî bikin. TV. yên gelek welatan, dê ji Gala Kurd çend saet dîrekt weşan bikin.

**12'ê Gulanê**

Dihok ket bin kontrola hêzên Hevkar. Sibehê dê qumutanê hêzên Hevkar û berpirsiyarê Koma Neteweyan bi hevdu re herin navça Dihokê û kar û bar kontrol bikin.

Stranvan û dengbêjên muzîka pop ên cîhanê îşev li

İngiliztanê ji bo alîkariya penaberên Kurd Galayek pêk anîn. Gelek muzîsyenê muzika popê beşdarê programê bûn. Rod Stewart programa muzîkê vekir. 100 hezar kes bi bilêt beşdarê galayê bûn. Di nav temaşevanan de Prensesa Dîana û Serokwezîrê İngiliztanê John Major jî hebûn. Televîzyonên 37 dewletan dîrekt programê weşadin. TV'ya Swêdê kanal-2 saaet 21'ê dest bi weşanê kir û heta saet 02 şevê dom kir. Em li jêr nûçe-şirova heval Cemal Batun a ku li ser galayê hatibû nivîsandin pêşkêş dikin.

## Muzîk - Gala " Dinya ji bo Kurdan"

Kalê Kurd, laşê nêviyê xwe yê çend rojî danî ser axa şil û ya herî. Li derdora wî çend kes kombûn, ku jê re alîkariyê bikin. Kalo rahişte bêrê û ber bi rê, dest bi kolandina erdê kir. Piştî hinekî ku kûr kir, bêr danî aliyekî. Neviyê xwe da ber himêza xwe. Bi çavên melûl, li neviyê xwe carekî din mêze kir. Betaniya, ku ew pê pêçabû dîsa kişand ser rûyê wî. Laşê bê can, danî kûrayiya ku nêzîkê metreyekê kolandibû...Û ax bi ser de kir...Her du destên xwe, ber bi ezman ve vekirin. Kesên li derdora wî jî, wekî wî kirin. Duaya xwe xwendin. Carekî din bi riya xwe ve çûn...Laşekî din binax kiribûn. Ew ê çendan bû, kesî ne hejmartibû. Kesî nedizani bû jî, gelo dê çend ji wan heta beyanî, heta dubeyanî bijin...

Bi hezaran bûn.. Piştî Saddamê xwînxwar, êrîşên giran anîbûn ser bajar û gundên wan, bi rê ketibûn. Dev ji malên xwe berdabûn. Gelekan nizanîbûn, ku malbatên wan niha li çi erdî ne ? Nizanîbûn ku, bavê wan, diya wan an xwişk û birayên wan dijin an na...Bi tenê dizanîbûn, ku bi milyonan hemwelatiyên wan, di rewşa wan de ne. Dane rê, ber bi "sînorên" Tirkiyê yan İranê. Yên mezin

dîsa bi rewşa têde "nedêşiyan". Bi wan re bi hezarên zarok hebûn. Bi hezaran pîr û kal hebûn. Dixwestin bighin çiyayên xwe. Çiyayên Kurdistanê...Yên ku wekî her car, wî carekî din pêsîrên xwe ji mirovên vê axê re vekin. Zarokên delal ên Kurd, di van salên xwe yên biçûk de, giraniyên herî mezin ên jîyanê dikişandin. Tî û birçî û xwas didan riyên dijwar. Weha zarokên Kurd, Saddam û dijminên din ên welat û netewê xwe nas dikirin. Di 7 - 8 û 9 - 10 saliya xwe de fêrî têkoşîn, berxwedan û serîhildanê dibûn. Lê di vê rastiyê de, trajedî û serfiraziya Kurd û Kurdistanê dihat nivîsandin. Naskirina peyvên wekî dijmin, serhildan, şer...ji bal zarokên 7 salî ve, di jîyanê de bi xwe trajedî bû...Lê, li aliyê din serfirazî bû. Dinyayê jî ev rastî, bi hemû awayê wê, vê carê baş didît. Gava bi milyonan Kurd piştî êrîşên Iraqê dev ji mal û ciyên xwe berdidan, danezanên ragihandinê ên cîhanê li Kurdistanê bûn. Trajediya Kurdan ji bal tevayiya cîhanê ve dihat dîtin. Kamerayên televizyonên CNN, BBC, NBC, SKY Channel û gelek ên din rewşa bi milyonan Kurd, ji başûrê Kurdistanê nîşandidan.

Di 15'ê nîsanê de Jeffrey Archer 51 saliya xwe pîroz dikir. Archer nivîskarekî navdar ê Brîtanya ye. Her weha ew berê alîkarê serokê Partiya Konservatîv bûye. Di saet 21.00 de, Archer bi malbata xwe re li televizyonê temaşe dikin. Kanala BBC wek nûçe herî girîng rewşa Kurd ên başûrê Kurdistanê nîşan dide. Di nav wan de çawa Kalê Kurd neviyê xwe binax dike jî, tên ekranê televizyonê. Kurê Archerê biçûk James jî li televîzyonê temaşe dike. Tiştê, ku ew bi çavên xwe dibîne, wî pir dêşîne. Ber bi bavê xwe ve dinere û dibêje :

- *Bavo, ma tu nikarê tiştekî ji vî xelkî re bike ?*

Jeffrey Archer, bi pirsê bersiva kurê xwe dide :

- Weke çi, lawo ?

Bersiva James kurt dibe :

- *Galayeke muzîkê.*

Bav û kur bi hevdu re rûdinin û li ser çêkirina galayeke muzîkê raman dikin. Wekî destpêk James navên çend dengbêjên navdar ê cîhanî jî dinivîse. Ji vir û pê de kar dikeve ser milên bav Archer.

Yek ji hevalên herî nêzîk ê Jeffrey Archer, John Gray e, ê ku serokê rêxistina Xaça Sor a Brîtanî ye. Her du li ser dîtina Jamesê biçûk, ji bo pêkanîna galayê dest bi kar dikin. Pêşî serokê Xaça Sor Mike Whîtlam dibînin. Whîtlam ji xwe daxaza wî heye, ku Xaça Sor bibe rêxistinek pratîk û aktîv. Ji ber vê, pêşniyarê bidil digire. Bi hevdu re, bi serokê BBC re jî pêwendiyê datînin. BBC jî dîrekt nîşandana galayeke wusa digirê ser milên xwe.

Wekî encamê xebata Archer Whîtlam, Gray û hemû amadekarên galayê, di 12'ê Gulana 1991'ê de gala pêk hat. Gala muzîk " Dinya ji bo Kurdan " li Stadîona Wemblay li Londrayê, bi beşdariya nêzîkê 100 - hezar kesan pêk hat. Galaya, ku di saet 21.00 de destpêkir û di 02.00 de qediya. Ji alî televizyonên 37 dewletan ve hate nîşandan. Wekî ku hate belav kirin, qasî 300 - 500 milyon kesî li galayê temaşe kirin.

Lê, dewletên dagirkerên Kurdistanê, galayê di televiz yonên xwe de nedan nîşandan. Bi vî awayî Kurdên ku ji bo wan ev gala mezin dihat bi dar xistin nekarîbûn, dengbêjên navdar ên cîhanê, ku ji bo wan distiran temaşe bikin. Dîsa jî li galaya " Dinya ji bo Kurdan " bi hezarên Kurdên li derveyî welat beşdarbûn. Alayên Kurdistanê, li Stadîona Wembley pêl didan.

Lîsteya grup û dengbêjên navdar ên amadekar, di galaya muzîkî ji bo Kurdan, gelekî fereh bû. Di danezanên ragihandinên cîhanê de navên herî tên naskirin, hatin belavkirin. Lê, ji bo me Kurdan, ew hemû girîng bûn. Di rojekê ku gelê me bi rastî hewcedarê alîkariyê bû, wan erka xwe ya piştgiriyê pêk dianîn. Bi rêza derketina wan, ev grup û

dengbêjên navdar, di gala ya " Dinya ji bo Kurdan " de amade bûn.

RUD STEWART, I N X S, CHRIS DE BURGH, LISA STANSFIELD, BEVERLEY CRAVEN, TOM JONES, LAVINE HUDSON, ALISON MOYET, ALEXANDER O' NEAL, STING, PETER GABRIEL, SINEAD O' CONNOR,NEW KIDS ON THE BLOCK, GYPSY KINGS, HALL AND OATES, SNAP , WHITNEY HOUSTON RYICHI SAKAMOTO, M.C. HAMMER,PAUL SIMON,YES,GLORIA ESTEFAN,ŞIVAN PERWER

Ji destpêka galayê heta dawiya wê, her di navbara stranan de, li ser dîrok û têkoşîna netewê Kurd agahdarî hatin weşandin. 500 milyon mirov, di carekî de dîroka Kurd û Kurdistanê fêrdibûn. Herweha wan teror û zulma, ku li netewê Kurd hatiye û tê kirin, ji aliyê ekranên televizyon ên gala ve dîtin. Bi vî awayî galaya " Dinya ji bo Kurdan ", ji bo têkoşîna netewê Kurd bû piştgiriyek siyasî jî. Li Stadîona Wembley beşdariya Serokwezîrê Brîtanya John Major û Prenses Dîana piştgiriya fereh a ku, ji bo gelê me tê nîşandan, baş dida dîyar kirin.

Li gor agahdariyên di danezanên ragihandinên cîhanê de hatin belav kirin, ji galayê nêzîkî 10 milyon pund ( 100 milyon kronê swêdî ) alîkarî hate kom kirin. Herwehaa hukimeta Brîtanya 10 milyon pund, ji galayê re birêkirin.

Dengê şêrîn ê Şivan, dengê dawiyê galaya ji bo Kurdan bû. Piştî wê bruska (mesaja) spasî, ya ku Mesûd Barzanî, ji bo hemû amadekar û organîzatorên galayê re birêkiribû hat xwendin. Gelek caran brusk bi çepik û qîrên bi dehhezaran beşdar ve hat birîn. Li pey ala rengîn, hemû beşdaran strana dawî gotin.

*Cemal Batun*

---

(*) Jeffrey Archer, ji hatina Galayê û berhevkirina alîkariyê 50 milyon sterlîn berhevdu kir. Vê pereyê han di riya resmî de xwestin bigihînin Kurdan. Li gor prensibên navnetewî pere teslîmê Xaca Sor û Koma

**3'ê Gulanê**

Hêzên Hevkar, îro bi konvoyên kamyonan ve ketin Dihokê. Di hewa de jî, balafirên Amerîkî komvoyê parastin. Di nav bajêr de leşkerên İraqê li hêzên Hevkar teqandin. Leşkerên Brîtanyayê bersiva leşkerên İraqê dan û 2 leşkerên İraqê birîndar bûn. Cara yekem e, ku di navbera hêzên Hevkar û yên İraqê de şer derdikeve. Piştî vê bûyerê, leşkerên İraqê bê deng man û xwe ji herêmê bi paş ve kişandin. Hezên Hevkar cara yekem ala Koma Neteweyan li Dihokê kişand.

Li ser pirsekî, Wezîrê Karûbarê Derveyî yê İngiliztanê got ku:

- Em, ji bo alîkariya humanîst çûne bakurê İraqê, ne ji bo dagîr kirinê.

**14'ê Gulanê**

Berpirsiyarê Koma Neteweyan Sadeddîn Axa Xan hate bajarê Zaxoyê û kampan zîyaret kir. Qasî 1000 kesî ji kampan dest pê kirin û ber bi Zaxo ve meşîyan û rejîma Saddam protesto kirin. Heta nav Zaxo hejmara wan ji 5000'î bêtir bû. Di nav Zaxo de meşiyan û qîriyan:

" Bimre Saddamê faşîst, me Helepçê ji bîr nekiriye, bijî Kurdistan..."

Meşvanên Kurd xwestin yekî Ereb linç bikin. Bi

---

Neteweyan kirin ku rojek zûtir bigihînin Kurdên Başûr. Çend meh paşê dîyar bû ku Xaça Sor û Koma Neteweyan li gor prensîbên xwe van peran birine teslîmê Hîva Keska İraqê kirine û herweha 50 milyon sterlîn kete destê Saddam. Li ser vê yekê Jeffrey Archer rabû lêkolînek çêkir û di dawî de heta Kurdistana Başûr çû. Li gor radyoya BBC beşa tirki, di roja 7 Meha 1'ê ya 1992[an de li Kurdistanê wî û Mesûd Barzanî presskonferansek çêkirin. Jeffrey Archer di preskonferansa xwe got, ji ber ku min pere teslîmê Xaça Sor û Koma Neteweyan kirîye ez ne poşman im. Ji ber ku wek prensîp riyek û metodekî rast bû. Lê niha ez heta vir hatim û li ser digerim ka ew pere bi destê kî û çawa çû an belav bûye.

gumana ku ew Ereb sîxurê Saddam e.

Li Swêdê Radyoya Merhaba ku bi tirkî weşandike, li Bexdayê bi Mesûd Barzanî re hevpeyvînek çêkir. Mesûd Barzanî digot ku:

- Em naxwazin nêzî sînorê Tirkiyê dewleteke Kurd ava bikin. Em otonomî dixwazin. Tirkiyê gelek ji penaberên Kurd re alîkariyê kir. Em ji Tirkiyê re spas dikin. Heger Turgut Özal bixwaze, ez bi xwe dixwazim werim Tirkiyê û wî zîyaret bikim.

Li herêma Şîîyan, li Başûrê Iraqê di nav Şîî û hêzên Saddam de şer derket. Kes bi encamê nizane.

Li herêma Kurdistanê leşkerên Iraqê, li helîkoptereke Amerîkî teqandin, lê rastê wê nehat. Lê, Amerîka di vî warî de tiştekî negot.

Iro Iraqê riya ji welêt derketinê serbest kir. Bi hezaran kes ji bo standina pasaportê serî li sazgehên pasaportê xistin. Rêz gelekî dirêj bûn. Ji wan hinek dixwazin ji Iraqê derbikevin der û hinek jî, mirovên wan wenda bûne, dixwazin li wan bigerin û bibînin.

Ji bo pêkanîna aştiya nav Ereb û Israîl, Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Amerîka J. Baker, îro di riya reş de, ji Amanê çû Qudûsê. Suriye û Israîl rika xwe didomînin. Wek tê zanîn Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Sovyet jî, li Rojhilata Navîn e. Ew jî, dê bi Yaser Arafat re rûne û li ser pirsa Rojhilata Navîn qise bikin.

**15'ê Gulanê**

Navbera Ingiliz û Tirkiyê gelek ne baş e. Wezîrê Ewlekarî yê Ingiliztanê Tom King çû Tirkiyê. Turgut Özal wî derengî qebûl kir. Wezîrê Ewlekariyê yê Tirkiyê Mehmet Yazar jî, bi dilsarî Tom King qebûl kir. Dîyar e, ku Tom King piçek naberê nerm kir û di axaftina xwe de got ku:

- Leşkerên me, ji bo alîkariyê hatine herêmê. Tirkiyê, di

vê babetê de alîkariyeke gelek hêja kiriye û dike. Em ji Tirkiyê re spasdar in. Divê rojek zû hêzên Koma Neteweyan were herêmê û em her tiştî teslîmê wan bikin. Divê leşker û personalên me bi paş ve vegerin.

Amerîka ji ber zerara Xalîce 200 milyon hîbe da Tirkiyê. Berê jî 50 milyon dabû. Li gor Tirkiyê, divê îsal welatên Rojava bi kêmasî 4,5 milyar dolar alîkariyê bidin Tirkiyê. Tirkiye dibeje ku; " me şerê Xalîcê de 6.2 milyar dolar zerar dîtiye. Divê Rojava vê zerara me bide."

**16'ê Gulanê**

Turgut Özal çû Kurdistanê herêma derbeder û penaberên Kurd. T. Özal li Silopiyê axaftinek kir. Wî di axaftina xwe de got ku:

- Piraniya derbeder û penaberên Kurd vegeriyane kampên ku hêzên Hevkar li bakurê İraqê çêkirine. Divê Koma Neteweyan bi awayekî aktîv bixebite ku ev kes vegerin malên xwe.

Rojnameya Kuweytê, Sewtil Kuweyt di hejmara 16 Gulanê de dinivîse, ku "Barzanî vegeriya Kurdistanê." Rojnamê, nûçeya xwe ji ajansa Royterê digire. Li gor Royterê Celal Talabanî li ser guftûgoyan weha dibêje:

- Em hîn negehêştine encameke pozîtîv. Heyetên Kurd û ya hukimeta İraqê li Bexdayê guftûgoyan didomînin. Pirsa me ya bingehîn li İraqê pirsa demokrasiyê ye. Otonomî jî di nav vê pirsê de ye. Em dixwazin qanûna bingehîn ya İraqê bê guhartin. Hukimeteke azad û koalîsyon pêk bê û paşê hilbijartina giştî çêbibe. Me li ser sînorên otonomiyê û garantoriya Koma Neteweyan jî, hîn bi hevdu nekiriye.

Û li gor rojnama Sewtil Kuweyt, Saddam zû dike ku bi Kurdan re peymaneke pêk bîne û ambargoyê ji ser xwe rabike û petrola xwe bifroşe.

Ji Vîyanê delegasyonek çû Bexdayê, ku li İraqê di

derheqê çekên atomî, bîyolojîk û skûdên dûrmenzîl de lêkolîneke çêbike û di vî warî de raporeke bide Koma Neteweyan. Delegasyon dê di navbera çend hefteyan de xebata xwe ya lêkolînî temam bike û here Amerîka.

**17'ê Gulanê**

Mesûd Barzanî hîn jî, li Bexdayê ye.. Îro wî, daxuyaniyeke kurt da çapemeniya cîhanê û got; " delegasyonên me li ser peymanê dixebitin.Pêngavên pozîtîv hene. Peyman li ser temambûnê ye. Me, hîn li ser hinek xalan bi hevdu nekiriye. Ez bawer im, ku em dê di demekî gelek kurt de , peymanê îmze bikin."

Rojnamevana Tirk Nadîre Mataracı, li bajarê Şaqlawayê bi Celal Talabanî re hevpeyvînek çêkir. C. Talabanî weha digot:

- *Amerîka berî ji gelê Kurd û Ereb re got "serîhildin, em dê alîkariya we bikin." Lê, dema me serîhilda, Amerîka polîtîka xwe guhart. Tevgera me tevgerekî gelêrî bû. Amerîka, li dij tevgerên gelêrî ye. Ji ber vê yekê jî, li dij derket. Lê, tewrê wê yê niha baş e.*

Li ser pirsa ku " gelo serhildana Kurd têkçû?", Talabanî weha bersiv da:

- Na. Rewşa me, ji 1970'î gelek baştir e. Netîce, qezenca me ye. Em xurt in.

Rojnamevanan li ser têkiliyên wan û PKKê jî pirsek ji C. Talabanî kirin. Wî weha bersiv da:

- PKK rêxistineke Kurd e. Apo, ji me re mesaja serkeftinê şand û piştgiriya xwe da dîyar kirin.

Li ser pirsa "gelo li Tirkiyê îdareke federatîf mumkun e?" Talabanî got ku:

- Li Tirkiyê, ji bo Kurdan îdareke federatîf mumkun e. Turgut Özal jî, li rê û metodên îdareke federatîfî digere.

**18'ê Gulanê**

Îro jî , Mesûd Barzanî li Bexdayê presskonferansek çêkir. Barzanî, di derheqê guftûgoyan de weha got:

- Em, efûyeke giştî, hilbijartin û çapemeniyeke azad, li Îraqê demokratiyeke giştî, otonomiyeke rasteqîn û universiteyên kurdî dixwazin... Piştî îmzakirina peymanê divê hêzên Hevkar ji herêmê derkevin...

Li ser pirsa, "niha xebate we di kîjan prosesê de ye jî?" Barzanî:

- Wek prensib, me bi hevdu kiriye, lê, di nav me de hîn xal hene, ku me li ser wan bi hevdu nekiriye. Heyetên me xebata xwe didomînin. Pêngavên pozîtîv hatine avêtin.

Lê, li gor şirovevanên Rojava, Mesûd Barzanî, ne terefdar e, ku derbeder û penaber vegerin Kurdistanê.

Serokkomarê Misirê Husnî Mubarek, berî ku here Ewropa çû Tirkiyê. Turgut Özal jê re merasimeke gelek mezin çêkir. Mubarek û Özal dê li ser dahatûya Îraqê, pirsa Filistînî û pirsa derbederên Kurd bipeyîvin.

Hêzên Hevkar îro 3700 penaberî ji hêla sînorê Tirkiyê bi kamyonan birin Kurdistana Îraqê û wan di kampan de, bi cîh kirin.

**19'ê Gulanê**

Hêzên Hevkar, bi kamyonan penaberên Kurd ji nêzî sînorê Tirkiye û Îranê ber bi Zaxo û Dihokê ve dikşînin. Ji guftûgoyan hîç nûçe tune.Dibêjin ku Îraq, bajarê Kerkûkê di nav sînorê otonomiyê de qebûl dike, lê, petrolê wî li ser hukimeta merkezî dihesibîne. Komîsyon li Bexdayê xebatên xwe didomînin.

Nûçegîhanê BBC li Londrayê pirsek ji berpirsiyarê PDK-Îraqê Hoşyar Zebarî kir; *"gelo Amerîka dixwaze Kurdistanê bigire?"*

Hoşyar Zebarî weha bersiva nûçegîhanê BBC da:

*"Me ji %90 Kurdistanê girtibûn; heger Amerîka alîkariyê bikira Saddam nikaribû bêye Kurdistanê."*

Rojnamevanê Kurd Mahmûd Baksî bi Şivan Perwer re çûbûn başûrê Kurdistanê. Mahmûd vegeriya Swêdê û TV'ya Swêdê, li ser rewşa Kurdistanê programek çêkir. Di vê programê de, bi Celal Talabanî û Mesûd Barzanî re, li ser rewşa Kurdistanê hevpeyvîneke çêkiri bû. TV'ya Swêdê wê pêşkêş kir.

**20'ê Gulanê**

Lêşkerên hêzên Hevkar, îro bajarê Dihokê bi temamî girtin bin kontrola xwe. Hêzên Hevkar dest pêkirin û tamîr kirina kanalîzasyon û elektrîkê kirin. Balafirên hêzên Hevkar jî li ser Dihokê firîn û xwestin bidin şandin ku ewletî û parastina Dihokê di destê wan de ye û penaber ji wan bawer bikin û vegerin bajêr. Çend polîsên rejîma Iraqê hatin bajêr ku agahdariyê bidin qumûtanê hêzên Hevkar. Li gor agahdariya hêzên Hevkar, hêzên Iraqê li jêrê bajarê Dihokê û li qesebeyên wê hejmara leşkerên xwe pir dikin û mewziyan dikolin.

Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan biryara firotina petrola Iraqê qebûl kir. Ji bo mesrefên şerê fondek çêkir. Biryar bi 11 dengan hat qebûl kirin. Iraq, êdî dikare petrola xwe bifroşe. Lê, Konseya Ewlekariyê biryara ji % çend prosentên petrolê ji fonda Koma Neteweyan re be dîyar nekir. Vê biryara han da Sekreterê Giştiyê Koma Netewe yan bide. Dema Sekreterê giştî prosentê dîyar bike, Iraq dikare dest bi firotina petrolê bike. Heger Iraq ji gor wê prosentê pere neşîne Fonda zerara Koma Neteweyan, wê çaxê dikarin ji nû ve ambargoyê bidin ser petrolê. Iraqê vê biryarê protesto kir û got ku " lê, ji ber ku alternatîfeke din nîne, em biryarê qebûl bikin."

BBC bi navê "Dosya Diziya CIA û Koza Kurd" programeke çêkir. Di vê programê de, bi gelek berpirsiyar û

pisporên CIA yên kevin re hevpeyvîn çekirin û dîtinên wan girtin.

Li gor berpirsiyarên CIA yên kevin Amerîka heta niha di 1956, 1975 û 1991 de 3 caran Kurdan bi kar anîn û wan xapandin. Di 1956-60'î de li Kurdan teda û zordariyê zêde kirin. Di Adara 1972-an de, CIA İranê zîyaret kir. Şah Kurdan pîj kir. Kurd û İraq bi hevdu ketin. Kurdan bi alîkariyê xapandin. Di dawî de, Şah û Saddam hevdu ramîsan û Kurd bi serî û lingan ve çûn.

Niha jî, gelo serokên Kurdan hewqas bê eqil bûn ku ji çiyan dakevin bajaran û Saddam wan derbeder bike? Kurdan ji Amerîka, Fransa û İngilis alîkarî xwest. wan jî sozên alîkariyê dan Kurdan. Kurdan dest bi şerê Saddam kirin, piraniya Kurdistanê girtin, lê Amerîka dîsan xwe paş ve da. Kurd bi tenê man. Bi zordana Fransa û İngilistanê, Bush mecbûr man, vê carê dest bi alîkariya însanî kir.

**21'ê Gulanê**

Nûçegîhanê CNN, li Kurdistanê bi Celal Talabanî re hevpeyvînek çêkir. Talabanî, *"guftûgo li Bexdayê dom dikin. Me hîn encameke negirtiye. Lê, heta niha rewş pozîtîv e."*

Li ser pirsekê nûçegîhanê CNN'ê, Talabanî di derheqê bikaranîna alafabeya otonomiyê de jî, weha digot:

*- Ji bo zimanê kurdî, alfabeya herî baş, alfabeya latînî ye. alfabeya erebî, ne li gor zimanê kurdî ye. Lê, ev ne karê rêxistinên sîyasî û kesên sîyasî ye. Ev karê zimanzane û mamosteyên Kurd e. Divê ew li ser alfabê xebat bikin.*

**22'ê Gulanê**

Mesûd Barzanî li Bexdayê di derheqê guftûgoyan de daxuyaniyeke kurt da çapemeniya cîhanê û got ku; *"li ser li hevdu kirina peymanê, em pêngavên pozîtîv davêjin. Ez*

*bawer im di demeke nêz de, dê temam bibe û em îmza bikin."*

Rojnamevanan jê pirsîn:

- Tu dibêjî ev dem dê çend roj an hefte bigre?

Barzanî, *" heta heftek-du heftan."*

Rojnamevanan vê carê, " madem ku pêngavên pozîtîv hûn davêjin, hûn çima hewqas dirêj dikin?" ji Mesûd Barzanî pirsîn.

Mesûd Barzanî di bersiva xwe de, *" dirêjkirin û derengxistin, ne ji me re û ne jî, ji wan re kar tîne. Lê, em dixwazin helbijartineke azad çêbe, demokrasiyeke rasteqîn were Iraqê. 20 sal in ku şerê çekdarî di navbera me û Iraqê de heye. Ev jî dîyar e, ku şer problemên me çareser nake. Divê em rûnin û li prensibên demokratîk bi hevdu bikin û bi vê metodê problemên xwe yên sîyasî çareser bikin. Riyeke din nîne..."*

Rojnamevan; " gelo mirov dikare bêje ku ev dirêjbûna guftûgoya li ser pirsa petrola Kerkukê û garantoriya welatên Rojava, an ya Koma Neteweyan e?"

Mesûd Barzanî: armanca me ne ew e, ku em ji hatina petrolê pay bigrin. Û herweha em garantoriyê jî naxwazin. garantoriya herî girîng divê em bi hevdu bawer bikin."

Rojnamevanên bîyanî, li Kurdistanê, pirsa dirêjbûn û derengmayîna guftûgoyan ji Calal Talabanî jî kirin. Talabanî; "dirêjbûn û derengbûna guftûgoyan li ser avakirina mecliseke muwaqet, helbijartina giştî, qanûna hîmî (anayasa) û sînorên otonomiyê dirêj dibe " wext digre."

Rojnamevanan pirsekî din ji Celal Talabanî kirin.

*"Qasî ku em pê dizanin Kurdên derbeder bi Saddam û rejîma wî bawer nakin û ji ber vê yekê jî hejmareke mezin naxwazin bi baş ve vegerin cîwarê xwe. Hûn li hev bikin, dê rewşa wan kesan çawan be, an jî hûn dê çawan wan kesan bidin bawer kirin.?"*

Celal Talabanî; *" demokrasî û garantî pêwîst e. Divê ew*

*bi çavên serê xwe bibînin û bawer bikin."*

TV'ya Tirkiyê kanala Ewropê, li ser guftûgoyên di navbera heyeta Kurd û Iraqê de, vê pirsê ji Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal kir:

- Li gor nûçeyan Kurd û rejîma Saddam li ser otonomiya Kurdan li hevdu kirine. Êdî dê Kurd bibin xwedî dewlet an hevpişkê wê. Gelo dê Tirkiye jî, ji bo Kurdên Tirkiyê rê û metodeke weha pêkbîne, an na?"

Turgut Özal:

- *Na. Ji ber ku Iraq dewleteke dîktator e. Li Tirkiyê demokrasî heye. mafê her kesî wek hev e.*

**23'ê Gulanê**

Wezîrê Ewlekariyê yê Fransê çû Tirkiyê û bû mêvanê Wezîrê Ewlekariyê yê Tirkiyê Mehmet Yazar. Herdu wezîran li ser pirsa ewlekarî ya Rojhilata Navîn û ya pirsa Kurdan muşawire kirin. Di dawiya hevdîtin û muşawiriyên herdu wezîran de rojnamevanan çend pirs ji Wezîrê Ewlekariyê yê Fransê kirin. Ji wan pirsan yek jî li ser Kurdan bû. Wezîrê Fransê weha bersiva rojnamevanan da:

- *Armanca me pêkanîna guftûgoyên navbera Kurd û hukimeta Iraqê bû. Em di vî warî de bi serketin. Kurd û hukimeta Iraqê niha guftûgoyan didomînin. Piştî li hevhatina wan ,em dê hêzên xwe ji bakurê Iraqê bikşînin.*

Wezîrê Fransê ji bo alîkariya penaberên Kurd ji Tirkiyê re spas kir.

Komîta Hevkariya Leşkerî ya Tirkiyê û Amerîka îro li Waşîngtonê civiya. Amerîka dê ji aliyê pere de alîkariya ordiya Tirk bike. Ji aliyê din ve, Amerîka dixwaze Hêzê Çalakî yê NATO li Tirkiyê bi cîh bike.

Hema hema hemû rojnameyên Tirk dinivîsînin, ku "hêzên Hevkar li bakurê Iraqê Kurdistaneke serbixwe

çêkiriye. Di rastiya xwe de, ev ne ji bo derbeder û penaberan herêmeke ewlekar e." Wek mînak nûçegîhanê rojnama Hurriyet Esen Ünür (Hurriyet, 23 Mayıs, Ünür wek nûçegîhan çûbû Kurdistana Başûr) di nivîsara xwe ya "Di sînor de çi dibin û çi nabin" de dinivîsine ku:

*"Kurdistan bi fîîlî hatiye avakirin. Barzanî bi kî re lihevtê bila bê, Talabanî çi dibêje bila bibêje, Apo li hember kî derdikeve bila derkeve, li herêmê hêzên Hevkar tixûb kişandine. Di bine kontrola hêzên Hevkar de fîîlî Kurdistan avakirine. Mesela li qesebeya Amêdiyê Huseyîn Çelkî kirine qaymeqam. Huseyin Çelkî, di sala 1988-an de wek penaber di kampa Dîyarbekirê de bû. Ew 25 roj berî bi paş ve vegeriyaye û vê berpirsîyariya han îro dane wî."*

**24'ê Gulanê**

Iraqê, li Kurdistanê bi cîhkirina polîsê sivîlê Koma Neteweyan re got "belê." Li ser razîbûna Iraqê di nav çend hefteyan de, dê di navbera 4500-5000 polîsên Koma Neteweyan ên bi kincên şîn û çekên sivik herin Kurdistana Iraqê û hêzên Hevkar dê ewlekariya herêma Kurdan bispêrin wan.

Iraqê heta niha qebûl nedikir ku polîsên Koma Neteweyan jî bêne Kurdistanê. Niha piştî qebûlkirina vê biryarê, berdevikê hukimeta Iraqê Abdurrazak el Haşîmî, daxuyaniyek da ku; " Amerîka û Îngiliz naxwazin leşkerên xwe ji Kurdistanê bi paş ve bikşînin û polîsê Koma Neteweyan şûna bigirin."

Haşimî, ji rojnamevanan re got:

- Divê Amerîka, Ingilis û hêzên Hevkar leşkerên xwe ji bakurê Iraqê bikşînin. Ev mudexela nav welatê me ye.

Li gor şirovevanan, Iraq dixwaze ji bo derketina hêzên Hevkar Kurdan îkna bike û Kurd jî daxwaz bikin ku

leşkerên hêzên Hevkar ji Kurdistanê derkevin. Tê gotin ku hezên Hevkar heta dîtinên Kurdan negirin ji Kurdistanê dernakevin û cihên xwe nadin polîsên Koma Neteweyan. Lê, gelê Kurd terefdarê derketina hêzên Hevkar nîne û heta demekî dirêj dixwaze hêzên Hevkar li herêma Kurdistanê bimîne:

Nûçegîhanê BBC ji Dihokê vê nûçeyê dişand:

- Êdî mirov leşkerê Îraqê li Dihokê nabîne. Dukan vebûn. Sûk gelek qelebalıx e. Ji derbederan hinek bi paş ve hatin malên xwe. Hêzên Hevkar dest bi tamîrkirina bajêr kirin. Doktor û personalên wan yên tenduristiyê ketin xizmeta xelkê. Xelk bi rejîma Îraqê bawer nake. Ancax Amerîka û hevalbendên xwe li herêmê bin, ew xwe di ewletiyê de dibînin.

Îraqê da xuyanî ku ew û Kurd li hevdu hatine û peyman li ber îmzakirinê ye. Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuellar ji bo pêşketina peymanê razîbûna xwe da dîyar kirin.

Balafireke Sovyetî ji bo derbederên Kurd xwarin û eşya bir Îranê û li wir ket. 10 personalên balafirê mirin.

Înstutuya Lêkolîna Aştiyê ya Stockholmê, li ser mesrefa şerê Xalîcê raporek belav kir. Li gor rapora Înstutuya Aştiyê, tevayiya mesrefên şerê Xalîcê 53 milyar dolar e. Bi tenê 12 milyar dolar ji bo çek û malzemeyê şerê hatiye bikaranîn.

**25'ê Gulanê**

Li bajarê Dihokê bûyer derketin. Qasî 2.000 ciwanên Kurd bi kevir û daran êrîşê qereqolên Îraqê kirin. Xaniyên qereqolan tehrîb kirin. Li gor nûçegîhanê BBC piraniya wan kesên êrîşkar keç bûn. Di nav wan de kesên çekdar jî hebûn. Sedemê êrîşê Kurd dibêjin ku " hukimeta Îraqê bi kincên sivîl leşker û polîsên xwe li wan qereqol û

daîreyên sivîl bi cîhkirine." Hêzên Pêşmerge xelkê rawestand. Û herweha 20 polîsên Îraqê ji lîncbûnê xelas bûn.

Derbeder û penaberên Kurd ên li Îran û Îraqê bi paş ve diçin herêma ewlekar. Li kampên li hundirên sînorên Tirkiyê qasî 40 hezar derbeder mane. Yên din giş bi paş ve vegeriyane Kurdistana Îraqê.

Îro li Stockholmê mahkemeya 33 Kurdên ku çendek berî avêtibûn ser konsolosxana Îraqê ya Stockholmê û cam û dergahên wê şikestibûn û agir berdabûn xaniyê konsolosxanê destpêkir. Mahkemê ji bo Kurdekî biryara serbestbûnê û ji bo 32 kesan jî biryara berdewambûna dozê da.

**26'ê Gulanê**

Li gor nûçegîhanê BBC, Mesûd Barzanî ji Baxdayê vegeriya Kurdistanê. Mesûd Barzanî, dê li ser guftûgoyên navbera heyeta Kurd û hukimeta Îraqê agahdarî bide lîderên Kurd yên din û dê ew di nav xwe de pirsê gotûbêj bikin. Li gor şirovevanên Rojava, "vegera Mesûd Barzanî nayê wê maneyê ku guftûgo têkçûn." Dîsan li gor texmînan dê heyeta Kurd qasî hefteyeke şûn de vegere Bexdayê.

Bülent Ecevit îro ji Bexdayê vegeriya Tirkiyê. Wek tê zanîn, di dema şerê Xalîcê de jî, Serokê Partiya Demokratîka Çep a Tirkiyê ya niha û serokwezîrê Tirkiyê yê kevin Bülent Ecevit wek rojnamevekî rojnama Hûrriyetê çûbûn ba Saddam û Sadam re hevpeyvîn çêkiribû. Ecevit, di hevpeyvîn û beyanên xwe de piştgirya Saddam dikir û digot; "rojek zû divê hêzên Amerîka û yên Hevkar ên împeryalîst ji herêmê derkevin."

Ecevit cara duyemîn ne wek rojnamevenek, wek serokê partiya xwe çû ba Saddam û vegeriya Tirkiyê. Dê ew li ser vê zîyaretiya xwe ya duyemîn jî agahdarî bide çapemeniya Tirkiyê û dîtinên xwe dîyara bike.

## Gala Stockholmê

Wek tê zanîn ji bo piştgiriya Kurdên derbeder û penaber gala yekem û ya herî mezin li diroja 12'ê Gulana 1991ê de, li bajarê Londonê çêbû. Ya duyem jî, di roja 26'ê Gulana 1991'ê de, li serbajarê Swêdê li Stockholmê hat çêkirin.

Bi plan û însîyatîva Komîta Parastina Mafê Kurd li Swêdê, artîst û dengbêjên Swêdî, ji bo derbeder û penaberên Kurd galayek (şahiyek) li bajarê Stockholmê li taxa Östermalstorg li dar xistin. Di dîroka Swêdê de heta niha Swêdiyan ji bo tû gelî galayeke weha mezin çênekirine. Artîs û dengbêjên Swêdî yên bi nav û deng weha nehatine ba hev û ji bo bîyaniyan tiştekî weha giranbiha û hêja pêk neanîne.

. Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê bi xwe di nav komîta amadekara vê şahiyê de bû. Piraniya karên pratîk û organîzekirina wan karan ji aliyê Federasyon, komeleyên endam û organên wê ve pêk hatin.

Roja 27'ê Gulanê 1991-ê meydana Östermalm bi reng, deng û bîhna Kurdistanê olan da; bi ala, cil û bergên kurdî jî xemilî. Bi hezaran Kurd, bîyanî û Swêdî li meydanê civiyan. Ji aliyekî ve xwarina kurdî hat firotin, ji aliyê din ve, bi dawil û zirne govendên û lîstikên kurdan meydanê geş û xweş dikir. Artîs û dengbêjên Swêdî yên bi nav û deng, li meydanê stran distriyan û lîstikên tîyatroyê çêdikirin. Li hundir li salona Folkan jî saet ji 13 heta 21'ê programa dengbêj û artîsan dest pêkir. Programa Folkan 8 matînên ( 8 carên) cuda cuda dom kir. Her matînek 50 deqîqe bû û bilêta wê jî 50 kron bû. Program Folkan weha bû:

Saet 13. Olof Buckard, Göran Fristorp, Stina Ekblad, Hasse Alfredson, Tommy Körberg.

Saet14. Irene Lindh, Göran Fristorp, Margaretha Krook, Hasse Alfredson, Tommy Körberg.

Saet 15. Anita Björk, Peter Lundblad, Lasse Berghagen, Helge Skoog, Peder Falk.
Saet 16. Margareta Kjellberg, Sven Wollter, Niklas Strömstedt, Anders Glenmark, På Håret.
Saet 17. Jarl Kulle, Niklas Strömstedt, Anders Glenmark, Margaretha Byström, Claes Malberg, Lill Lindfors.
Saet 18. Dema şîvê.
Saet 19. Börje Ahlstedt, Kristina Adolphson, Lasse Brandeby, Babben Larsson, Eldkvarn.
Saet 20. Jan- Olof Strandberg, Creme Fraiche, Nils Landgren, Lasse
Brandeby, Owe Thörnqvist.
Saet 21. Jonas Gardell, Lena Granhagen, Johan Rabaeus, Adde Malmberg, Tommy Körberg.
Amadekar û berpirsîyar: Gösta Ekmen
Artîsê Swêdî yê herî bi nav û deng Gösta Ekmen progarmê îdare dikir. Di destpêka her programê de, li ser dîrok û rewşa Kurdan ya îroyî bi swêdî agahdarî dihat dayîn û paşê programê dest pê dikir.

Hemû artîs û denbêjên Swêdî belaş beşdarê programê bûn û hatina galayê (şahiyê) bexşê Fona alîkariya Kurdan" kirin. Herweha xwarin, vexwarin, pirtûkên ku li wir hatin firotin û pereyên ku hatin berhevkirin jî teslîmê Fona Kurd" bû. Li gor plan û texmîna Komîtê, dê di vê gala han de nîv milyon alîkarê bihata berhevkirin. Û weha jî bû. Nîv milyon kronê swêdî pere hat berhevkirin.

Li meydanê komeleyên endamên federasyonê xwarinên Kurdî firotin. Artîsên Swêdî jî, li meydanê tabloyên resamên Kurd û hinek tiştên din derxistin mezadê. Beşdaran wan li ser hevdu zêdekirin û kirîn. Artîsan li meydanê bi destê xwe bi mesîn û kodikan ji bo alîkariyê ji xelkê pere berhev kirin.

Kurdan bi def û zirne lîstikên Kurdan nîşanê

temaşevanan kirin.
Dengbêjên Kurd stran gotin. Çapemeniya Swêdî cihekî mezin da galayê.
Ji bo hîn bêtir Swêdî ji pirsa Kurd agahdar bibin û alîkariyê mezin û firehtir bikin, di roja 3'ê Hezîranê de TV ya Swêdê programek li ser galayê çêkir û weşand. Program saetek bû. TV.'ê ji galayê perçe şanda û bi riya TV carek din, daxwaza alîkariyê ji gelê Swêdê kir. Di nav programê de numara alîkariyê ya banqê da ku yên ku bixwazin ji bo alîkariyê pere bişeynin hejmara banqê.

Li bajarê Stenbolê 130 ronakbîrên Kurd civiyan û di derheqê civîna xwe de vê daxuyaniya han bi zimanê kurdî, tirkî û îngilizî belav kirin:

## Ji raya giştî re

*Li ser bangkirina komek ronakbîrên Kurd ku li Stenbolê dijîn, bi armanca hewldana civandina konferansek fireh em 130 ronakbîrên Kurd li Stenbolê di 16. 5.1991'ê saet 17.00-an de di salona "Mülkiyeliler Birliği" de civi yan.*
*Ji beşdaran 22 kesên bangkirî axaftin kirin. Digel dîtinên cihê, di riya civandina konferansekî de tevî beşdaran li hev kirin. Û biryar hat stendin ku piştî demeke haziriyê, bi babeta mafê miroviyê Kurd konferansek bê amadekirin. Wekî din di dawiya vê konferansê de ji bo afrandina "Hewldana Maf û Azadiyên Kurd" bi yekîtiya dengan biryar hatiye standin.*
*Ev hewldan, li ser bingehek heq li hember îxlalkirina mafên bi hemû awayî yên Kurdan yê*

*demokratîk û mirovî berxweyî nîşan bide.*

*Ji bo bicihanîna haziriyên xebatên konferansê ku bi biryar hatiye stendin û li ser bi vatiniya tespîtkirina kesên ku dê bang li wan were kirin, ji 20 kesên ku li jêr navên wan hatiye beyan kirin, bi navê " Komîta hewldana Maf û Azadiyên Kurd" komîtek hatiye hilbijartin.*

30.05 1991
Stanbol

**27'ê Gulanê**

Kovara 2000'ê ku li Tirkiyê derdikeve, bi berpirsiyarekî PKK re li ser hêzên Amerîka û yên Hevkar ku li Kurdistanê ne, hevpeyvînek çêkir. Li gor hevpeyvîne berpirsîyarê PKK dibêje ku:

- *Amerîka bi tenê li Kurdistana Başûr bicih nebûye, herweha li Kurdistana Bakur jî, bi balafir û çekên xwe yên modern ve, bicih bûye. Heger Amerîka û hêzên Hevkar ji Kurdistanê venekişin, em dê êrîş bibin ser kampên wan.*

Rojnamevanê Tirk Rakıp Duran ku nûçegîhanê ajansa Reuter û BBC ye, hate Swêdê. Ji dema şerê Xalîcê ve Ragıp Duran li herêma şer û Kurdistanê bû. Radyoya Merhaba li ser rewşa Kurdan çend pirs ji Ragıp Duran kir. li ser pirsa "heger Kurd bi Îraqê re li ser otonomiyê bi hevdu bikin, dê tewrê Tirkiyê çi be?"

- Heger di sînorê Tiriyê de otonomiya Kurdan çêbibe, Tirkiye gelekî eciz dibe û dipelikîne. Ji ber ku ev otonomiya Kurdên Îraqê, li Kurdên Tirkiyê jî dê gelek tesîr bike. Ji aliyê din ve, Îraq îro wêran bûye. Di sînorê Tirkiyê de, ji Tirkiyê re bazar û pîyaseyekî gelek mezin vebûye. Tirkiye tucarî û bazirganiya xwe dike. Kurd li Îraqê li hember

Saddam têkçûn. Berî ku şerê Kurd û Iraqê dest pê bike, PKK got "baweriya xwe bi İngiliz û Amerîka neyînin, bi hêzên xwe bawer bin. Encam wek PKK derket. Niha gerîllayên Kurd ên Iraqê diçin nav refên PKK. Ji ber vê yekê PKK puan girt û yên din wenda kirin.

**28'ê Gulanê**

Partiya ANAP'ê di grûba xwe ya parlementoyê de, li ser pirsa Kurd gotûbêj çêkir. Parlementerên ANAPê di derheqê pirsa Kurd de bûn du beş û bi tûndî êrîşên hevdu kirin. Parlementerê bajarê Hekariyê Naîm Geylanî got ku:

- Pêwîst e, Tirkiye ji bo Kurdan sîstema federalî pêk bîne, an em nikarin behsa demokrasiyê li Tirkiyê bikin.

Li ser gotinên Naîm Geylanî, grûba faşîst gelek hêrs bû û ji wê grûba faşîst Bozkurt bi ser Naîm Geylanî re qîriya:

- Yên ku li Tirkiyê behsa dewleteke federal dikin di nav sefaletê, heta di nav gafletê, heta di nav xiyanetê de ne. Tirkiye dewleteke unîter e û dê heya heya jî weha be.

Naîm Geylanî di axatina xwe ya duyemîn de got ku:

- Turgut Özal jî dewleteke federatîf dixwaze. Ma li Amerîka û Elmanyayê binêrin, ew jî ne dewletên federal in.

Tirkiye dixwaze ji bo hilbijartina wîlayetan sîstema federalî bîne. Walî ji aliyê xelkê ve bên hilbijartin.

Israîl beyanek da û di beyana xwe de got ku:

- *Israîl li dij perçebûna Tirkiyê ye. Em li Iraqê dewleteke serbixwe ya Kurdan naxwazin. Menfeetê Tirkiyê û Israîl di herêmê de yek in.*

Saddam ji Bülent Ecevit re got ku; "*Kurd naxwazin Iraqê perçe bikin, yên ku dixwazin Iraqê perçe bikin dewletên Rojava ne. Ew dixwazin Kurdistaneke bi petrol çêbikin. Perçekirina Iraqê ji Tirkiyê û Iranê re kar nayîne, zerar tîne.*"



Ji bo parastina Kurdan cara yekem 36 polîsên Koma Neteweyan çûn Kurdistana Îraqê. Ew bawer nakin ku dema hêzên Hevkar xwe ji Kurdistanê bi paş ve bikşîne, ew dê bikaribin ewlekatiya herêma Kurdan biparêzin. Wan îro ew çend leşkerên rejîma Îraqê di destê pêşmêrgan de hebûn, bi paş ve xwestin. Ji ber vê yekê di nav polîsên Koma Neteweyan û serdarên pêşmêrge de leç derket.

Li gor nûçeya rojnameya swêdî DN, Serokê Amerîka Bush dibêje ku; "heta Saddam li Îraqê li ser desthilatiyêbe, em ne bi Îraqê re têkiliyên sîyasî û ne jî yên aborî datînin. Çi dibe bila bibe dê ambargo ya li ser Îraqê dom bike."

**29'ê Gulanê**

Çend roj berê, ajansan da dîyarikrin, ku Mesûd Barzanî ji Bexdayê vegeriyaye Kurdistanê û dê li wir li ser encama guftûgoyan bi serokên Kurdan re guftûgo bikin û dîsan bi paş ve vegere Bexdayê. Lê niha dîyar bû, ku Mesûd Barzanî neçûye Kurditanê û hin jî li Bexdayê ye.

CNN bi li Amerîka bi berpirsiyarê Bereyê Kurdistanê Eshat Xêlanî re, li ser guftûgoyan çend pirs pirsî. Xêlanî:

- *Min niha telefonê Kurdistanê kir û li ser guftûyon agahdarî yên teze girt. Delegasyona Kurd û hukimeta Îrakê hîn jî bi hevdu nekirne. Li ser 4 xalan bi hevdu nakin:*

*1- Pirsa kişandin û dîyarkirina sînorê otonomiyê; 2- Pirsa demokrasiyê li seranserê Îraqê; 3- Pirsa Kurd li Kurdistanê û ereb jî li Îraqê leşkerî bikin; 4- garantorî...*

BBC beşê erebî li ser guftûgoyan çend pirs ji Celal Talabanî pirsî. Celal Talabî:

*" Ji bo pêkanîna peymanê me gelek tawîz da hukimeta Îraqê, lê ew qet tiştek qebûl nakin û di dîtinên xwe de israr dikin. Guftûgo dom dikin, lê hêviyeke yê mezin jî tune."*

BBC ji Talabanî pirsî "heger guftûgo bi sernekevin, hûn dê çi bikin?"

*- Em ê çi bikin! Ne Amerîka, ne Sovyet û ne jî dewletên Ewropî yek jî perçebûna Iraqê naxwaze. Ez dema li Ewropa bûn, bi gelekî wan re peyîvim. Alîkariyê jî nakin. Em çûn bi hukimeta Iraqê re, ji bo otonomiyê daniştin. Heger ev jî nebe, em dê têkoşîna xwe bidomînin. 20.000 pêşmêrgeyên me hene.*

Serokê Giştiyê Leşkerî yê Amerîka Kolin Pawil çû Tirkiyê. Ew bi serokê giştiyê leşkeriyê Tirkiyê, serokwezîr Yıldırım Akbulut û bi serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal peyîvî. Serokleşkerê Amerîka li ser armanca hatina xwe du sedem nîşan da: 1- Ew dê here herêma Kurdistanê û li wir rewşa penaberan bibîne. 2- Ew dê hêzên Hevkar kontrol bike.

Sibehê dê Kolin here Dîyarbekirê û ji wir jî here Silopiyê li kampê derbederê Kurd lêkolînan pêk bîne. Ji wir jî dê ew here Kurdistan Iraqê hêzên xwe kontrol bike û ji wan agahdariyê bigire. Kolin daxuyaniyek di derheqê derbederên Kurdan de da û got:

- Divê hêzên Hevkar destê xwe bilvînin ku rojek zû derbederên Kurd vegerin mala xwe. Divê hemû derbeder û peneberên Kurd vegerin. Di vî warî de çi ji destê me bê, em dê bikin.

Her pênç endamên Koma Neteweyan yên daîmî, di nav xwe de komîsyoneke ji bo tespîtkirina xirakirin û ji navê rakirina çekên bîyolîk û atomiyên li Iraqê plan û projeke çêkirin û li ser wê dixebitin. Komîsyon di bin serokatiya Sekreterê Giştî yê Koma Neteweyan Javier Parez de Cuellar de dê xebata xwe bidomîne. Li gor agahdariyên komîsyonê, ji bo ji navêrakirina çekên Iraqê yên giran wextekî dirêj û gelek pere dixwaze. Iraq divê bi ser de mesrefa jinavêrakirina wan çekên xwe jî bide.

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal bi telefonê li ser rewşa Rojhilata Navîn bi serokê Libyayê Muammer

Kadafî re axaftinek kir. Li gor ajansên Tirk, axaftina herdu serokkomaran gelek baş derbas bûye.

Wezîrên ewlekariyê yên dewletên endamên NATO îro li Brukselê biryarên nû girtin. Bi van biryaran NATO di stratejî û taktîkên xwe de guhartin çekir. NATO di şûna hêzên mezin û qelebalix de, dê hêzên biçûk û êrîşkar ku bi teknîka nû amadekirî pêk bîne. Ev hêzê NATO dê bi hejmar kên bin, lê ji gelek welatan bin. Li gor vê rewşa nû, dê Tirkiyê bi tumenekê xwe ve beşdarê hêzên Çalakî yên NATO bibe. Dema li ku pêwîstî hebe, dê di demekî gelek kin de ew xwe bigihîne wê herêmê.

Tirkiye jî dixwaze li gor vê biryara NATO di hejmara ordiya xwe de kêmbûn çêbike û ordiya xwe ji nû ve modernîze bike.

**30'ê Gulanê**

Celal Talabanî li nêzîkî bajarê Silêmaniyê, li kampa pêşmêrge bû. Nûçegîhanê BBC dîrekt telefonê Celal Talabî kir û jê pirsî:

- Gelo çima guftûyoyên navbera we û Îraqê dirêj dibin? Rewş çawan e?

- *Iraq dawxazên me red dike. Daxwazên otonomiyê qebûl nake. Bi taybetî pirsa Kerkûkê û herêmên din hene.*

- Dibêjin ku Kerkuk bajarê Ereban e. Piranî Ereb li Kerkûkê ne?

- *Na! ne rast e. Piraniya xelkê Kerkûkê Kurd in. Tirkmen jî hene. Lê bajarê Kurdan e. Paşê Ereban anîn li Kerkûkê bi cih kirin.*

- Hûn hin ji hêvîdar in, ku rejîma Îraqê bi awayekî pozîtîv li guftûgoyan binêre?

- *Îraq divê rastiyê bibîne û li gor wê hereket bike. Em tarefdarê guftûgoyan in.*

- Lê, heger Îraq daxwaz û pêşniyariyên we red bike, hûn dê çi bikin?

*- Em dixwazin guftûyo berdewam bin, heger ew red bikin, em dê hemû xelkê İraqê bixin seferberiyê, pirsê bi dinyayê bidin nasandin û zanîn.*

- Tu behsa seferberiyê dikî, yanî hûn dê dîsan dest bi şer bikin?

*- Em naxwazin şer bikin. Em di xwazin bi awayekî aştî pirsa xwe çareser bikin, lê heger me mecbûr bikin, pêşmêrge ji vê yekê re amade ye.*

Serokleşkeriyê Giştî yê Amerîka Kolîn Pawil, îro çû Silopiyê û ji wir jî çû Kurdistana îraqê kampên Amerîka zîyaret kir. Bi helîkopterê di ser bajarên Zaxo û Amêdiyê re jî firî û li herêmê temaşe kir. Generalê Amerîkî di axaftina xwe de:

*" Oparasyona me di demeke gelek kin de gehîşt armanca xwe. Me problema Kurdan çareser kir. Dê hêzên Hevkar di demekî gelek kin de vegerin malên xwe. Herweha Saddam ji bo dewletên cîran û herêmê tehlîkeyek bû, lê niha ev tehlîke ji navê rabû. Niha ew bi tenê ji bo hundir tehlîke maye. Em sozê garantîdayiyê nadin Kurdan ku Saddam nikaribe êrîşê wan bike. Garantiyeke me yê weha nîne. Lê, divê İraq bizanibe ku neteweyên cîhanê dê baş Saddam taqîb û dîqet bikin."*

Rapora şerê Kendavê hat belav kirin. Li gor vê raporê: 200.000 kes mirin, 6 milyon bê mal man. 120.000 leşkerên İraqê katin kuştin. 76.000 sivîlên İraqê hatin kuştin. 2.000 Kuweytî hatin kuştin û wenda bûn. 343 leşkerên dewletên Hevkar di şer de mirin.

**31'ê Gulanê**

İsmaîl Beşikçi, ji bo pirtûkên xwe yên nû ku li ser Kurd û Kurdistanê nivîsandibû, çend meh berê dîsan hat girtin Ew niha li Tirkiyê di girtîxanê de ye. Li Amerîka Fonda Azadiya Qisekirinê, ji bo dîtinên Beşikçi ku li ser pirsa

Kurd dinivîsîne û ji ber vê yekê nîvê jîyana xwe di vê têkoşînê di girtîxaneyên Tirk de derbas kirîye, bi 10 hezar dolar xelateke madî da Beşikçi. Beşikçi, ji girtîgehê nameyek ji Fona Amerîka re şand û di nameya xwe de nivîsî ku:

"*Ji ber ku polîtîka Amerîka li dij neteweyê Kurd e, ez xelata we qebûl nakim. Dewleta Amerîka dijminê neteweyê Kurd e. Ez dewleta Amerîka protesto dikim. Lê, ez ji gelê Amerîka re spas dikim. Bi vê xelatê ku hûn piştgiriya xwe bi min re dîyar dikin, ji min re şeref e. Serbilindî ye. Lê, ji bo protestokirina dewleta Amerîka ez xelata we qebûl nakim*"

**1'ê Hezîranê**

Komîsyona Daîmiya Koma Neteweyan li ser hatina petrola Iraqê gotûbêj kir. Sekreterê Giştî Javier Perez de Cuellar biryara ji %30 hatina petrola Iraqê girt ku wek tazmînata şer bide fona Koma Neteweyan. Iraqê vê biryarê protesto kir û got; " *ji %30 tazmînata şer gelek e. Welatê me wêran bûye. Ji bo avakirina Iraqê niha ji me re 20 milyar dolar pere lazim e.*"

**2'ê Hezîranê**

Li bajarê Zaxo çend Kurd xwestin polîsên Iraqê protesto bikin û berê xwe dan qereqolê. Beşdaran daxwaz kirin ku bila polîsên Iraqê ji bajêr derkevin û Amerîka di demeke nêz de hêzên xwe ji Kurdistanê nekşîne. Polîsê Iraqê ji hundirê qereqolê, beşdaran gulebaran kirin. 4 Kurdên beşdar hatin kuştin. Pişre her ku çû nûçe li nav bajarê Zaxo belavbû û bi hezaran kes êrîşên qereqola Iraqê kirin û du polîs kuştin.

Wek ku me nivîsandibû, çend roj berê serokwezîrê

Tirkiyê kevin û serokê Partiya Demokratîka Çep a Tirkiyê Bülend Ecevit cara duyemîn çûbû Baxdayê ba Saddam Huseyin. Piştî vegerê Ecevit xwest li ser guftûgoya xwe û Saddam, Serokê Tirkiyê Turgut Özal bibîne. Îro Bülent Ecevit û Turgut Özal hevdu dîtin. Piştê hevdudîtinê, Ecevit li ser hevdîtina xwe û Özal presskonferansek çêkir. Di preskonferensê de Ecevit li ser hevdîtina xwe û Saddam û Özal weha digot:

*" Heger Kurd û Îraq di guftûgoyan de bi sernekevin, Amerîka û dewletên Ewropa li nêzê sînorê me li başûrê Îraqê îhtîmal e, ku dewleteke Kurd ya hevsarkêş çêbikin. Ew dixwazin peymana Sewrê ji nû ve pêk bînin. Wê çaxê Îraq perçe dibe. Civata Ewropayê ya Aborî jî çendek berê ji bo dewleteke Kurd biryar girti bû. Tirkiye jî di nav tixûbên wê biryarê de hebû. Ev ji bo Tirkiyê tehlîkeyeke gelek mezin e. Otonomiya Kurdan û demokratîkkirina Îraqê zidê hevdu ne. Bi rastî Îraq dixwaze demokrasiyê bîne. Lê, hinek hêz nahêlin ku demokrasî bê Îraqê. Tirkiye pêwîst e, ku têkiliyên xwe yên sîyasî û aborî bi Îraqê re deyne û geş bike. Tirkiye divê ji bo rakirina ambargoya li ser Îraqê hewl bide. Heta ji bo avakirina Îraqê kredî vebike û jê re alîkariyê bike.*

Piştî hevdîtina Ecevit û Özal, hukimeta Tirk dîyar kir, ku dê di 12-13 Hezîranê de Wezîrê Karûbarê Derveyê Îraqê Tarik Azîz were Tirkiyê. Tarik Azîz dê bi Turgut Özal re jî bipeyîve. Di roja zîyaretbûna Tarik Azîz de pirsa Kurdan û pirsa rakirina ambargoya li ser Îraqê heye. Tarik Azîz dixwaze ambargoyê ji ser Îraqê rabike, riyên navbera Îraq û Tirkiyê vebin. Petrola ku ji Kerkûkê bi boxriyan dihatin Îskenderûnê divê vebe. Li gor Tirkiyê, heger riya boxriyê û riyên bazirganiya navbera Tirkiyê û Îraqê vebibe, dê di salê de Tirkiye milyarek dolar qezenc bike.

**3'ê Hezîranê**

Hîn heyeta Kurd di bin serokatiya Mesûd Barzanî de, li Bexdayê bi hukimeta İraqê re, li ser guftûyoyan kar û xebata xwe didomîne. Lê, ji aliyê din ve, Kurdên Kurdistana Başûr dema bihîstin ku hêzên Hevkar hezira xwe dike ku ji Kurdistanê derkeve û her tiştî dewrê polîsê Koma Neteweyan bike, li gelek bajaran xelkê dest bi xwepêşandana kir û êrîşên birin ser polîs û leşkerên İraqê. Ji Kurdan 4 û ji polîsên İraqê jî 2 kes heta niha hatine kuştin. Qasî 60 kesî jî birîndar hene. Qereqol, xaniyên BAAS û otomobîlên dewletê ji aliyên Kurdan ve hatin şewitandin û tahrîb kirin. Her weha ne bi tenê li Zaxo, bûyer li bajarên Dihok, Hewlêr Silêmaniye û li yên din jî belav bûn. Serok û berpirsiyarên hêzên pêşmêrge dixwazin pêş li bûyeran bigirin û nehêlin ku xelk êrîşê polîs û leşkerê İraqê bike. Lê, nikarin xelkê bidin rawestandin.

Berpirsiyarê Polîsên Koma Neteweyan jî, li herêmê daxuyaniyek da ku *"heger hêzên Hevkar ji Kurdistanê vekişin, dê parastina herêma ewlekar gelek zehmet be. Weha dîyar e, ku polîsên Koma Neteweyan dê nikaribin li herêmê ewlekariyê biparêzin."*

Li gor nûçeyên CNN İraqê hêzên xwe yên leşkerî ber bi bajarê Silêmaniyê ve dikşîne.

**4'ê Hezîranê**

Tirkiyê daxuyaniyek da ku bakurê İraqê ji Tirkiyê re bûye bazareke mezin. Tirkiye di nav paralela 36-an a ku hêzên Hevkar kontrol dikin de bazirganiyeke bi qezenc dikin. Şîrketa Sabanci heta niha 3 milyon dolar û şirketeke din jî 2 milyon dolar li vê herêmê bi tenê av firotine. Ev daxuyaniya resmî ye; lê wek rojnamevan dinivîsin, Tirkiye bi milyaran tişt difroşin Kurdan û bineciyên herêmê û hêzên Hevkar ku li herêmê ne. Yekê bi

sedî difroşin. Ji derê vê yekê jî, alîkariya ku ji derve tê Tirk dest didin ser û paşê bi pere difroşin Kurdên derbeder.

Rojnama Gardin dinivîsine ku rojamevanê wî B. Dalagata di roja 23'ê Adarê li Cizîrê ji aliyê leşkerê Tirk ve hatiye kuştin û laşê wî veşartine. Wek tê zanîn di roja 23'ê Adarê de, li kampa Cizîrê leşkerên Tirk li derbederên Kurd xistibû û gelek derbeder birîndar kiribûn. Rojnamevanê İngilis Dalagata bûyerê hem bi kamara xwe kişandibû û hem jî bûyerê not kiri bû. Leşkerên Tirk li ser vê yekê wî digirin û paşê dibin û dukjin. Ji wê roje ve heta niha rojnamevanê Îngiliz wenda ye. Rojnama Gardîn vê yekê nivîsandîye. Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Tirkiyê vê îddîa rojnama Gardîn red kir û got; *"derew e."*

Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan ji bo tazmînata şerê ji petrola İraqê ji %30 tespît kiribû. Lê, Amerîka ji %30 kêm dît û red kir. Amerîka dibêje ku " ji %50 kêmtir nabe." Fransa, İngilistan û Sovyet jî piştgiriya pêşniyariya ji %30 dikin. İraq jî, ji %50 red dike û dibêje; *" ji xwe ekonomiya me felc bûye. Divê em bi hatina petrolê welatê xwe ji nû ve avabikin. Ji %30 gelek e."*

**5'ê Hezîranê**

Hêzên Saddam li bajarên başûrên Kurdistanê li Kerkûk, Hewlêr û li Silêmaniyê operasyonên wehşî pêk anî û tîne. Li gor çavkaniyên Koma Neteweyan di nav du rojan de 50 Kurd hatin kuştin. Lê, li gor ajansan bi sedan Kurd hatine kuştin û bi sedan kes jî ji aliyê hêzên Saddam ve hatine girtin. Ji ber van operasyonan xelkê herêmên Kerkûk, Hewlêr û Silêmaniyê carek din ber bi bakur ve koç kirin û dikin. Xelk koçê herêma ewlekar ku di bin kontrola hêzên Hevkar de ye dike. Ango direvin jorê pa-

ralela 36-an. Ji ber vê yekê serokê hêzên Hevkar, ji bo hevdîtin û axaftinê çû bajarê Amêdiyê. Li ser vê koçkirin û panîka han serokê hêzên Hevkar soz da, ku dê heta demeke din jî ew li herê bimînin. Heta problema Kurdan çareser nebe ew ji herêmê dê dernekevin.

Di rojnama Swêdê ya beyanî DN de, di warê psîkolojî de meqaleke li ser şerê İraqê derçû. Li gor vê nîvîsarê hêzên Hevkar berê ji aliyê psîkolojîk û moral de leşkerên İraqê şikandin û pişre bi çekên nûjen wan kuştin. Yên mayî jî dîl girtin. Hêzên Hevkar berî destpê kirina şerê erdê, 30 milyon belavok bi jor ve avête ser axa İraqê. Bi erdê re jî bi hoperloyên gelek bi hêz ji bo teslîmbûna leşkerê İraqê anons kirin. Di belavok û anonsên xwe de, "Heger tu naxwazî bimrî, zû teslîm bibe. Nemire bijî. Zû jîyana xwe biparêze..."

Li gor statîstikan, di şerê İraqê de 120.00 leşkerên İraqê hatin kuştin û 180.000 jî dîl hatin girtin. hejmara leşkerên İraqê 1.4 milyon bû. Heger Amerîka bixwesta dikari bûn di nav du-sê rojan de hemû ordiya İraqê ji navê rabikira.

**6'ê Hezîranê**

Kamyonên barkêş (TIR) ên ku bar ji Tirkiyê dibin İraqê li ser riya Zaxo û Dihokê ji aliyê pêşmêrgan ve îro 3 roj in ku hatine rawestandin. Pêşmêrge rênadin, ku ew barên xwe ber bi Bexdayê ve bibin. Tirkiye dibêje ku "ew baran dibin Kuweytê," lê berpirsîyarê pêşmêrge dibêje ku; "na ev bar diçin İraqê. Ji ber ku hîn jî biryara ambargoyê ya Koma Neteweyan li ser İraqê heye, em rênadin."

Şoferên Tirk serî li berpirsîyarê Koma Neteweyan yê li herêma Kurdistanê xist, ku ji wan re rê vekin. Berpirsîyarê Koma Neteweyan naxwaze têkilî vî karî bibe.

Li gor ajansên Tirkiyê, di van rojên dawî de, li bajarên Silêmaniyê, Hewlêrê û Kerkûkê leşkerên İraqê 300 Kurd kuştin.

Berpirsîyarê PDK-Îraqê Dr. Şewket li Tahranê daxuyaniyek da ku; " Mesûd Barzanî sax e û ew li Bexdayê ye. Guftûgo di navbera delegasyona Kurd û hukimeta Îraqê de dom dikin. Kar bi pêş ve diçe û heta çend rojan ez bawer im ku dê delegasyona Kurd û hukimet li ser otonomiyê bi hevdu bikin û Mesûd Barzanî û delegasyona Kurd dê vegerin Kurdistanê."

Ji aliyê din ve îro pêşmêrgan sê car li Zaxo meş û mîtîng pêk anîn. Di meş û mîtîngê de slogan avêtin:

*"Bijî Kurdistan."*

*"Ji Saddam re na!"*

*"Ji Amerîka re belê."*

Îro jî bi balafiran ji kampa Çukurcayê 881 derbederî birin. Kurdistana Başûr. Her ku diçe hejmara derbederan li kampan kêm dibin. Ji xwe gelek derbeder bi xwe dixwazin ji kampên Tirkiyê herin. Ji ber ku li kampan rewş ne baş e.

**7'ê Hezîranê**

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal, li Navendiya Çapemeniya Îstanbolê di derheqê hevdîtina Bülent Ecevit û Saddam de weha got:

- Hevdîtina Ecevit û Saddam polîtîka me naguhêre. Lê belê, em dikarin têkiliyên xwe bi Iraqê carek din di çav de biborînin û em dikarin Tarik Azîz jî qebûl bikin...

**8'ê Hezîranê**

Tirkiyê biryar da ku Tarik Azîz dikare were Tirkiyê. Tirkiye dê bi awayekî fermî bi Tarik Azîz re rûne û li ser hinek pirsan guftûgo û gotebêj bikin. heta niha çend caran Tarik Azîz dixwest ku bê Tirkiyê, lê Tirkiyê wî qebûl ne dikirin. Li gor hinek nivîskarên Tirk, Bülent Ecevit cara duyem li ser gotina Turgut Özal çûye Îraqê.

**9'ê Hezîranê**

Celal Talabanî ji nûçegîhanan re got ku:

*"Heger guftûgoyên navbera me û rejîma Iraqê bi sernekeve, divê hêzên Hevkar li herêmê bimînin; an em nikarin xelkên sivîl ji êrîşên rejîma Bexdayê biparêzin. Heger em bi serbikevin û peyman jî di navbera me û Bexdayê de çêbibe jî, dîsan divê hêzên Hevkar garantoriyê bigirin ser xwe. Bê garantorî baweriya me bi rejîma Bexdayê tune."*

Li herêma ewlekar Kurdan meş û mîtîngek pêk anîn û dawxaz kirin ku hêzên Hevkar zû bi zû ji herêmê dernekeve û benda encama guftûgoyan raweste.

**10'ê Hezîranê**

Mesûd Barzanî ji aliyê Saddam ve nehatiye girtin. Ew nûçeya ku berê belav bûbû ne rast bû. Îro Mesûd Barzanî li Bexdayê daxuyaniyek da û got ku:

- *Guftûgoyên navbera heyeta me û hukimetê baş dimeşe. Em nêzî dawiyê ne. Ez bawer im heta 20 Hezîranê dê hevtîninên me temam bibin.*

Celal Talabanî carek din da xuyakirin û bi awayekî vekirî got ku:

- *Divê ne bi tenê Koma Neteweyan bibe garantor, herweha bi Koma Neteweyan re Amerîka, Fransa û Îngilistan jî di navbera me û rejîma Iraqê de bibin garantor.*

**11'ê Hezîranê**

Sosyalîst Internasyonal li bajarê Stenbolê dicive. Li gor ajansan Celal Talabanî bi delegasyoneke ve di sînorê Kurdistanê yê Xabûrê de çû Kurdistana Tirkiyê, bajarê Dîyarbekirê û ji wir jî bi balafirê çû ÎStanbolê û dê ew beşdarê civîna Sosyalîst Înternasyonalê bibe. Celal Talabanî dê di civîna Sosyalîst înternasyonalê de axaftinek bike.

**12'ê Hezîranê**

Konseya 19-an ya Sosyalîst İnternasyonal li Îstanbûlê civiya. Di rojeva Sosyalîst İnternasyonalê de, li Rojhilata Navîn bê çekdarî, pirsa aştiyê, pirsa Kurdan û Filistiyan hat rojevê.

Serokê Sosyal İnternasyonalê Willy Brad, di axaftina vekirina Konseya Sosyal İnternasyonalê de, ji bo alîkariya Tirkiyê ku ji Kurdên derbeder re kiribû spas kir û got ku delagasyona Kurd ku di nav me de ye, em pê gelek dilşa dibin.

Xwediyê malê Erdal İnönü, di axaftina xwe de yekîtiya İraqê xwest û da dîyarkirin, ku dewleteke Kurd naxwaze. İnönü ji bo Kurdên Kurdistana Tirkiyê jî weha digot:

- *Partiya me ji bo Kurdan raporek amade kiriye. Em dixwazin mafê Kurdan ên netewî û kulturî di nav sînorên Tirkiyê de bimîne û weha li ser bê axaftin. Guhartina sînorê me, ne mumkun e.*

Celal Talabanî jî di axaftina xwe de, ji bo alîkariya derbederên Kurd, ji Turgut Özal re spas kir û ji bo pirsa Kurd jî methê Turgut Özal û Erdal İnönü kir. Talabanî weha digot:

- *Turgut Özal pirsa zimanê kurdî çareser kiriye. Bi rastî heger qasî ku li Tirkiyê demokrasî heye, hewqas li İraqê jî hebûya, me wê çaxê daxwaza otonomiyê ji İraqê ne dikir.*

Di pêşnameya (tasarıya) Konseya Sosyalîst İnternasyonal xala 6-an de, bi sernivîsa "Rewşa Gelê Kurd" cih dan doza Kurdan. Di pêşnamê de dibêje ku " *pirsa Kurd divê di herêmê de, bi awa û metodên demokratîk bê çareserkirin. Rêxistin, ji bo mafê gelê Kurd di her 5 perçeyan de jî banga hemû rêxistinan dike, ku alîkariya mafê gelê Kurd bikin."*

**13'ê Hezîranê**

Wezîrê Karûbarê Derveyî û Alîkarê Serokwezîrê Îraqê Tarik Azîz hat Tirkiyê. Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Tirkiyê Ahmet Kurtcebe Alptemuçin çû pêrgehê wî. Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal, Tarik Azîz qebûl kir. Tarik Azîz, di axaftina xwe de li ser cîrantiya Îraq û Tirkiyê rawesta û ji Turgut Özal daxwaz kir, ku Tirkiye xeta petrolê veke. Got ku "ev kara herdu dewletan e jî."

Di nav daxwazên Tarik Azîz de divê Tirkiye konsolosa xwe ya Bexdayê vebike, ew tiştên xwarinê yên ku li bajarê Îskenderûnê hatine blokekirin, divê rê lê bê vekirin û ew herin Îraqê. Ew 27.000 Kurdên ku 1988-an de ji ber zilm û zordariya Îraqê reviyabûn û xwe spartibûn Tirkiyê, divê bi paş ve bidine Îraqê. Lê, li gor ajans û nûçehgîhanan Turgut Özal bersivên negatîv da Tarik Azîz.

Li gor nûçeyên ajansa Swêdê TT, hinek rûniştvanên Kurdistana Îraqê ji Saddam bêtir ji Kurdan û otonomiya wan ditirsin. Bi taybetî Asûriyên ku li Kurdistanê ne, ji rejîma Saddam bêtir ji otonomiya Kurdan ditirsin. Dibêjin ku *" heger Kurd mafê otonomiyê bi dest bixin, dê li me Xirîstiyanan zordestiyê bikin."* Li Bajarê Zaxo tenê 7000 Xirîstiyan hene. Ji wan Xirîstiyanan wek derbeder niha 12000 jî hîn li aliyê Tirkiyê mane.

**14'ê Hezîranê**

Celal Talabanî li Tirkiyê ye. Talabanî bi gelek serokên partiyên sosyalîst û sosyal demokratên welatên cuda cuda re têkilî danî û datîne. Li gor rojnameyên Tirk dê ew bi Serokkomar Turgut Özal re jî biaxife.

Li gor Washington Timesê çekê nukleerê Saddam hîn jî tê parastin û di şer de hîç zerar nedîtiye. Zanyarekî Îraqî li Kurdistanê van agahdariya daye CIA yê. Niha jî Saddam li ser çêkirina çekên nukleer xebatê didomîne. Ji wan

cihên çekên nukleer yek li bakurê bajarê Mosulê di bin çiyayekî de ye. Di destê rejîma Îraqê de 40 kilo uran yum heye, ku uranyum di çêkirina çekên atomî tê bi kar anîn. CIA agahdariyên zanyarê Îraqê rast dibîne û navê wî bi dizî digire.

**15'ê Hezîranê**

Celal Talabanî îro ji aliyê Wezîrê Karûbarê Derveyi yê Tirkiyê û Serokê Daîra Îstîxbaratê Cenk Duatepe ve, li Ankarê hat qebûl kirin. Paşê bi awayekî resmî çû Çankayayê û ji aliyê Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal ve hat qebûl kirin. Li ser pirsa rojnamevanan, Talabanî:

- *Pirsa PKK pirsa Tirkiyê ya hundirî ye. Lê, em naxwazin tû kes û tû rêxistin li nav axa me, li dij Tirkiyê xebat bike.*

Paşê Celal Talabî bi lîderê Partiya Tirk a Mili ya Îraqê bi Muzaffer Aslan re peyîvî.

Li Tirkiyê qasî 17.000 î Kurdên penaber hene û ew naxwazin bi paş ve vegerin Îraqê, dixwazin herin welatê Ewropayê.

Amerîka dixwaze leşkerên xwe ji bajarê Dihokê bi temamî bikşîne. Kurd jî naxwazin heta ku peyman di nav Kurdan û rejîma Îraqê de pêk bê Amerîka leşkerên xwe ji herêmê bikşînin.

**16'ê Hezîranê**

Kurdan dîsa li Kurdistana Îraqê meş û mîtîngan çekirin û li dij xwe paşvekişandina leşkerên hêzên Hevkar rawestan û li ser bandrolên xwe weha nivîsandin: "Me bi tenê nehêlin. Bihêlin bila aştî li herêmê bijî!"

Li gor çapemeniya cîhanê, heyeta Kurd li Îraqê, li ser guftûgoyan bi hevdu kirine û dê di van rojan de heyeta Kurd vegere Kurdistanê. Piştre dê Kurd di nav xwe de, li ser prensîbên guftûgoyan bi kûrahî gotûbêj bikin û ji bo

îmzakirinê vegerin Bexdayê.

Li gor teks TV'ya Swêdê, PKK guftûgoyên di navbera Bere (Cephe) û hukimeta Îraqê de karekî îxanetî dibîne. Li gor PKK kara guftûgoyan û peymanan ji netewê Kurd re tune.

**17'ê Hezîranê**

Li bajarê Dihokê Kurdan xwepênîşandanek (mîtîngek) pêk anî. Di xwepêşandinê de "Yes Bush, no Saddam" qîriyan.

Amerîka û hêzên Hevkar xwe ji herêmê dikşînin û di şûna wan de polîsên Koma Neteweyan cih digirin. Îro Amerîka 150 leşkerên xwe ji Kurdistanê kişand. Hêzên Koma Netewe yan hemû 37 kes in.

**18'ê Hezîranê**

Radyoya Merhaba li ser têkiliyên Celal Talabanî û Turgut Özal, bi nivîskarê Tirk Haluk Gerger re hevpeyvînekê çêkir. Li ser pirsa "Kurd bi Rojava ve têkiliyên wan çawan in?" gerger weha bersiv dida:

*- Hinek Kurdên Tirkiyê jî gelek nêzî Amerîka û welatên Ewropa bûne. Xweza Celal Talabanî jî, bi Rojava ve girêdayî ye. Turgut Özal jî, mirovê Rojavayê yê herî xas e. Ji ber vê yekê jî sempatiya Celal Talabanî ji Turgut Özal re heye. Ji bo Talabanî Tirkmen û bajarê Kerkûkê gelek girîng e. Li pişt Talabanî xelk heye, lê mirov nikare xelkê bi hevsarkêşiya Rojrava ve îtham bike.*

**19'ê Hezîranê**

Mesûd Barzanî, li ser guftûgoyên di navbera delagas yona Kurd û hukimeta Îraqê de agahdarî da rojnamevanên bîyanî. Li gor agahdariya Mesûd Barzanî, *"peyman*

*ji îmzakirinê re amadeye. Bi tenê îmzakirina wê maye. Dê di nav 6 mehan de li Îraqê hilbijartina giştî çêbe. Yekîtiya Îraqê bê parastin. Li Kerkukê ne tenê Kurd dijîn, li wir Kurd, Ereb û Tirkmen bi hevdu re dijîn."* Bi kurtasî Mesûd Barzanî ji guftûgoyan gelek memnûn e. Wek tê zanîn Celal Talabanî li Tirkiyê ye. Mesûd Barzanî ji bo encama guftûgoyan telgrafek ji C. Talabanî re birê kiriye, ku ew rojek zû vegere Kurdistanê û li ser encama guftûgoyan wek Bereyê Kurdistanê gotûbêj bikin.

Rêxistina Hîzbullah a Kurd daxuyaniyek da ÎRNA yê û di daxuyanî ya xwe de dîyar kir, ku li dij guftûgoyên delegasyona Kurd û hukimeta Îraqê ye. Hîzbullah a Kurd " bi Saddam re rûniştin kar û şêleke çewt e. Divê mirov bi Saddam û rejîma wî re danûstendin neke."

PKK jî, li Beyrûdê daxuyaniyek da û "ev guftûgo dê ji Kurdan re trajediyên mezin û nû bîne" got.

**20'ê Hezîranê**

Amerîka berî ku hêzên Hevkar ji Kurdistanê bikşînin, dixwaze ji bo parastin Kurdan ji 5000 kesî hêzên Çalak (hêzên Çakûç) li Tirkiyê bi cih bike. Wezîrê Karûbarê Amerîka yê Derveyî Baker daxuyaniyek da ku " ji bo parastina Kurdan pêwîst e, ku hêzên Hevkar li Tirkiyê hêzên Çalak bi cih bikin; dema ku Saddam bixwaze êrîşê Kurdan bike, divê li gor peymana Koma Neteweyana 688-an hêzên Çalak li dij êrîşên rejîma Saddam, Kurdan biparêze. Ev hêz dê li Silopî û Încirlikê bên bi cih kirin. Hêzên Hevkar hin li ser vê projê gotûbêj dikin, lê biryarek nedane.

Celal Talabanî li Tirkiyê bi Serokkomar Turgut Özal, Wezîrê Karûbarê Derve yê Tirkiyê û serokên partiyên muxalefet Suleyman Demirel û Erdal Înönü re peyîvî. Li gor ajansan Talabanî ji Tirkiyê desteka leşkerî daxwaz kir

û ji wan soz jî stendîye.

Talabanî, methê şêla welatên Ewropa û bi taybetî methê Îngiliztanê kir û rexne li polîtîka Amerîka girt. Talabanî di derheqê guftûgoyan de jî weha digot:

- *Divê Bexda demokrasiyê qebûl bike û pêk bîne. Pêşmêrgeyên me otonomiyê biparêzên. Mafên Suryanî, Tirkmen û gelên din bê qebûl kirin. Zilm û zordarî li ser Şîîyan bê rakirin. Bexda garantiya dewletê Rojava qebûl bike. Welat ji nû ve bêt avakirin.*

Celal Talabanî li ser pirsa rojnamevanan a ku di derheqê Kurdên Tirkiyê de jî pirsîn, weha digot:

- *Divê Kurdên Tirkiyê ev demokrasiya ku li Tirkiyê heye baş tê bigîhên û demokrasiyê bi pêş ve bibin."*

# HÊZÊN ÇALAK DÊ KÊ BIPARÊZIN?

Ji mêj ve, bi salan in, ku Amerîka dixwaze li Rojhilata Navîn hêzên Çalak (hêzên Çakûç) bi cih bike. Armanc ew rejîm û hêzên ku li dij sîyaset û berjewendiyên Amerîka û hevalbendên wî ne, wan bitirsîne û bipelxîne. Lê, heta îro li Rojhilata Navîn rewşa sîyasî dest ne didan, ku Amerîka plana xwe ya hêzên Çalak pêk bîne.. Li hemberê bicihkirina hêzên Çalak gelek hêz û dewlet derdiketin. Amerîka û hevalbendên xwe ji ber wê yekê nikaribûn wê daxwaza xwe bi hêsanî bi cih bînin. Lê îro, hem li cîhanê û hem jî li Rojhilata Navîn rewşa sîyasî ji binî ve hatiye guhartin. Balansa sîstem û hêzên sîyasî ji binî ve xirab bûn. Amerîka her tişt e. Mezin e. Li her derî hazir û nazir e. Bavê demokrasî û aştiyê ye (!)

Nemaze li Rojhilata Navîn barbariya Saddam û paşverûtiya Ereban perde kişand ser gelek lîstîk û planên welatên împeryalîst, dagîrkerên herêmê û Kurdistanê. Hemû bi kirinên xwe ve, li hember barbariya Saddam bûn pêxemberê demokrasî û humanîzma Rojhilata Navîn û cîhanê. Rast e, Saddam li Rojhilata Navîn barbar, mêrkuj û Kurdkujê herî har e. Lê, Özal, Refsancarî û Esat jî ne pêxember, ne demokrat, ne humanîst û ne jî Kurdparêz in. Ew jî qasî Saddam dîktator û Kurdkuj in. Hemû eynî gurê di çermê mîhê de ne. Benda nêçîra xwe ne. Nêçîr jî her dem Kurd e. Ji sed salan ve ne, ku em Kurd bi çermê mîhê tên xapandin û nêçîr kirin. Niha jî weha ye. Qest ne serokên van her çar dewletên dagîrker in, qest her çar dewlet bi xwe ne. Kî bê ser hukim ferq nîne. Bi sed salan in, ku gelek serok û rejîmên wan hatin guhartin, lê polîtîka wan her berdewam e. Dibêjin ku "tarîx tekkerûr nabe." Lê, ez bawer im, ev teorî an jî gotin, ne ji bo me Kurdan e. Dibe ku ji bo hinek neteweyên din be. Ji bo me

tarîh gelek caran tekkerûr kirîye û hîn jî dike. An jî bi gotinekê din tarîx tekkerûr nake, em Kurd bi xwe tekkerûr dikin.

Bû çend meh in, ku Tirkiye û Amerîka li ser bicihkirin, plan û armanca bikaranîna hêzên çalak bi hevdu nedikirin û li ser vê yekê di nav xwe de pirsê gotûbêj dikin. Lê, di dawî de Tirkiyê bi awayekî fermî armanc û berpirsîyariya hêzên Çalak dîyar kir. Tirkiyê li ser prensibên ku "bi îzina Tirkiyê nebe, ne di erdê, ne di hewa û ne jî di deryayê de tû dewlet an dewletên endamên hêzên Çalak yek ji wan, an jî bi hevdu re nikarin hêzên Çalak bi kar bînin. Ew çekên ku ji bo hêzên Çalak bên, divê di bin kontrola Tirkiyê de be."

Hêzên Çalak ji leşkerên Amerîka, Hollanda, İtalya, Fransa, Belçîka û Tirkiyê pêk hat. Tirkiye bi 1.000 leşkerî ve beşdarê hêzên Çalak bû. Li gor daxuyaniya Tirkiyê û Amerîka, îdare û qumandariya hêzên Çalak, dê di bin desthilatiya generalên Amerîkî û Tirk de bin. Bi çûndina Bush a Tirkiyê re bi 3.000 hezar leşkerên komando hêzên Çalak bi awayekî fermî û vekirî li Kurdistana Bakur, li bajarên Silopî, Batman û Dîyarbekirê hatin bi cih kirin. Dê heta çend rojan ev hejmar bigehê 5.000 leşkerî.

Li gor daxuyaniya Amerîka, "dê hêzên Çalak Kurdên Kurdistana Başûr, ji zilm û zordariya Saddam biparêzin. "

Lê, kengê û çawan?

**Yê Amerîka "Soz nîne toz e"**

Dîsan li gor daxuyaniyên wan, "dema Saddam êrîşên mezin û giran ji nû ve bibe ser Kurdan û ew jî wekî meha Nîsanê, dîsan ber bi tixûbên Tirkiyê ve birevin, dê hêzên Çalak wê demê pêş li hêzên İraqê bigirin.

Lê, ev gotin jî wek piştî şerê Kendavê derew derket. Wek tê zanîn, piştî şikestina ordiya İraqê, Amerîka bi İraqê re peymana agirbirîn û şer rawestandinê îmza kir. Di vê

peymanê de ji mercên Amerîka yek jî ew bû ku:

*"Heger tu li dij opozîsyona xwe û xelkê Iraqê helîkopter, balafir û scudan bi karbînî, wê demê bi yek alî peyman xirab dibe û em dê ji nû ve mudaxele bikin."*

Lê, ne zêde, hefteyek piştî peymanê, dema Kurdan li dij rejîma Saddam serîhilda û ji %90'ê axa Kurdistanê azad kirin, Amerîka çav li Saddam girt û Saddam bi balafir, helîkopter û scutan di navbera çend rojan de Kurdistanê wêran kir. Wê demê Bush masî digirt û digot:

- *Ji me re çi, Saddam êrîşê gelê xwe dike. Ev pirseke hundirî ye. Em nikarin mudaxeleyê Iraqê bikin.*

Wê demê heger "Hecî Bush" bi yek gotinek bigotan:

- *Stop!*

Ne bi hezaran Kurd ji aliyê rejîma Saddam ve dihatin kuştin û ne jî bi milyonan koçebar dibûn û ne jî Kurdistan bi seran dihatin wêran kirin.

Çendek berê jî wezîrê ewlekariyê yê Amerîka û qumandarê Amerîkiyê li Kurdistana Iraqê daxuyanî dan ku:

- *Heger Saddam êrîşê Kurdan bike em dê mudaxele bikin. Heta ne bi tenê ji bo herêma Kurdan, heger li başûrê Iraqê jî tevliheviyek derxe, em dê dîsan mudaxele bikin.*

Lê, ka ev sozê Amerîka li ku ma. Dîsan di 17-18'ê meha Tîrmehê de Saddam êrîş bir ser bajarê Silêmanîyê û Hewlêrê. 500 Kurd kuştin û 30.000 sivîl mecbûr man koçebar kirin û ber bi tixûbê Iranê ve revîn. Dîsan ne hêzên Hevkar û ne jî hêzên Çalak deng dernexistin. Gotineke Kurdan heye, " *ya Amerîka soz nîne, toz e.*"

- *Hêzên Çalak tixûbên me diparêzin.*

Serokwezîrê Tirkiyê yê nû Mesut Yılmaz, di roja 22 meha Tîrmehê de, li ser rexneyeke Süleyman Demirel, armanc û perpirsîyariya hêzên Çalak weha dîyar dikir:

- *Bila zêde zirzopiyê nekin. Armanc û wezîfeyên hêzên Çalak parastina tixûbên (sînorên) me ye.*

Belê, Mesut Yılmaz rast dibêje. Pratîka hêzên Çalak jî gotina serokwezîrê Tirk rast şan dide. Ma ji xwe hêzên Çalak (Çevik Güç) û yên Hevkar (müttefik Güç) yek tişt in. Ji nav hêzên Hevkar, hêzên Çalak hilbijartin. Bi tenê nav hat guhartin. Lê leşker û malzemeyên wê aynî ne. Ma di roja 7'ê Tîrmehê de hêzên Hevkar bi yên Tirk re li herêma Botan bi hevdu re operasyon li dij gerillayên PKK çênekirin?

Li darê dinê yekî hêzekî weha yê Kurdparêz (!) nedîtiye û dê nebîne jî. Madem ku Kurdên Başûr diparêze, çima li wê herêma ku di bin kontrola wê de bû, bi cih nebû û ji wir anîn li Kurdistana Bakur bi cih kirin? Ma li wir bi cih bûbûna dê Saddam êrîş bibirana ser wan? An ji dûr ve baş dikarin Saddam Konrtol bikin? Gelo Saddam berî Dihok û Zaxo dê êrîş bibe ser Batman, Dîyarbekir û Silopîyê?

"Hêzên Çalak nikare li Îraqê operasyonan jî pêk bîne"

Di van rojên dawî de, dîsan gelek nûçe û nivîsar derketin ku "Amerîka xwe amade dike ku li ser ew cihên çekên atomî yên ku li Îraqê hene dê operasyonan pêk bîne. Amerîka heta niha 20 cihên cuda cuda yên çekên Îraqê yên atomî tespît kirîye. Îraq 3 car heyeta Koma Neteweyan xapand û rapor da ku çekên wî yên atomî tune. Heta li heyeta Koma Neteweyan teqand û nehişt heyet cihên çek kontrol bike. Ji ber vê yekê li Tirkiyê, li balafirgehên NATO, balafirên Amerîka dest bi firînên proveyî kirin. Li ser belavbûna vê nûçê xelkê bajarê Bexdayê, ji tirsa balafirên Amerîka bajêr terk kirin û derketin derê Bexdayê. Ev pirsa êrîşa Îraqê di çapemeniya Tirkiyê de jî bû rojane. Li ser vê babetê opozîsyona Tirkiyê li dij bikaranîna hêzên Çalak derketin û li Tirkiyê gotûbêjan dest pê kir. Serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz di roja 29'ê meha Tîrmehê de carek din daxuyaniyekê da:

- *Amerîka û hevalbendên wî nikarin bi hêzên Çalak, li Îraqê operasyonan pêk bînin. Hêzên Çalak ne ji bo vê*

*armancê hatiye avakirin. Armanca wê tiştekî din e. Wezîfe û armanca hêzên Çalak parastina tixûbên Tirkiyê ye. Pêşî lê girtina penaberên bakurê Iraqê ye. Ew divê nehêlin careke din dîsan bi milyonan kes bêne Tirkiyê û ji me re probleman derbixin.*

Belê, wê çaxê ev hêzên Çalak çi ye? Ew dê kê biparêzin û li dij kê bin?

Êdî bê şirove armanc û wezîfeyên hêzên Çalak bi awayekî vekirî û zalal derdikeve holê. Mêrikan bi vekirî dibêjin:

*" Me pêk anîye. Her tiştê wê bi emirê me dibe û xebata wê jî di bin kontrola me de be. Ew dê tixûbên me biparêzin û nikarin li Iraqê cihên çekên fîzyolojîk û atomî jî bombe bikin"* û hwd..

Hezên Hevkar û Çalak bekçiyê statûya Rojhilata Navîn in

Belê, parastina Kurdên Kurdistana Başûr bi rastî tiştekî baş e. Lê, pelaxtina Kurdên Kurdistana Bakur jî hewqas ne baş e. Wek serokwezîrê Tirkiyê jî dibêje bi rastî hêzên Çalak ne bi tenê tixûbên Tirkiyê diparêzin, her weha ew tixûbên her çar dewletên dagîrker ên Kurdistanê diparêzin. Xwediyên hêzên Çalak naxwazin statûya Rojhilata Navîn bê guhartin. Ew di bingehê xwe de bekçiyê ve statûya heyî ne. Ne ku filan perçeyî diparêzin û filan perçeyî jî dipelêxin. Û ne ku ew li gel filan rexistinên Kurdin, an li dij filan rêxistinên Kurd in. Ew li dij Kurd û Kurdistanê ne. Divê em Kurd, armanc û planên hêzên Hevkar û Çalak baş bizanibin. Ne bi tenê zanabûn, herweha li hember wan helwesta (tewrê) xwe jî dîyar bikin.

**"Guro were min bixwe!"**

Piştî van mînak û bûyerên berbiçav, bawerkirina parastina hêzên Çalak *" guro were min bixwe "* ye. Tirkiye gur e. Gurê har û manco ye. Dev bi xwîn e. Xwîna Kurdan...

Hîn çend roj berê li Dîyarbekirê di cenazeya Wedat Aydin de xwest bi sed hezaran Kurd bikuje. Û ew rabe bi Amerîka re Kurdan ji êrîşên Saddam biparêze. Gotineke Kurdan heye; " *ji dayika te re nabêjim, lê ji ya birayê te re dibêjim.*"

Kurd Kurd e. Çi li Îraqê, çi li Îranê, çi li Suriyê û çi jî li Tirkiyê, an jî li derekî din... Dijmin jî dijmin e. Çi li vê perçeyê û çi li perçeyên din. Hîç ferq nîne. Dema cih li wan teng dibe, tixûbên xwe yên dagîrker diguhêrin. Ma di şerê Agiriyê de çiyayên Agiriyê neguhartin?

Lê belê, em Kurd dîroka xwe ya bê bext zû ji bîr dikin. Bi dilê xwe yê pak bi wan bawerî tînin. Carnan jî em dixwazin wan bixapînin. Lê, bi sed salan in, ku em her û her hatine xapandin. Hem jî ji bo hesabên biçûk.

**M. Xarpêtî**
(M. Xarpêtî, Amed Tîgrîs bi xwe ye.)

**21'ê Hezîranê**

Berpirsîyarên hêzên Hevkar ji bo mayîna hêzên xwe yên leşkerî yên li Kurdistana Îraqê biryar girt, ku barkirin û kişandina leşkerê xwe rawestîne. Hêzên Hevkar bawerî bi Saddam û rejîma wî nayînin û gehîştin wê baweriyê ku heger hêzên xwe bi paş ve ji Kurdistanê bikşînin, dibe ku Saddam êrîşê Kurdan bike. Ji ber vê yekê hêzên Hevkar îro biryar girt, ku leşkerên wan heta demekî li Kurdistana Îraqê bimînin. Ji aliyê din ve hejmara polîsên Koma Neteweyan jî îro gehîşt 100 î.

Konseya Ewlekariya Koma Netewan civiya û li ser ambargoya li ser Îraqê gotûbêj kir. Di dawiya gotûbêjan de biryara berdewama ambargoya ku li ser Îraqê heye bê domandin girt.

**22'ê Hezîranê**

Li gor nûçeya CNN, ji bo rawestandina hêzên Hevkar yên li Kurdistanê Îraqê İngiliztan û Fransa zêde bi ser Amerîka ve çûn û Amerîka mecbûrma ku bi paş ve kişandina leşkerên xwe demdemî (muwaqet) da rawestandin. Heta demekî dê Amerîka leşkerên xwe ji Kurdistanê nekşîne.

**23'ê Hezîranê**

Celal Talabanî, îro ji Ankarê çû Dîyarbekirê. Ji Dîyarbekirê jî dê di dergehê Xabûrê de here Kurdistana Îraqê. Talabanî, li balafirgeha Dîyarbekirê bersiva rojnamevanan da:

- *Ji bo me hatin û pêkanîna demokrasiyê li seranserê Îraqê ji pirsa bajarê Kerkûk û pirsa otonomiyê girîngtir e.*

Ji aliyê din ve Mesûd Barzanî jî di derheqê guftûgoyan de daxuyanî da ku:

- *Pêşnamaye ku me di guftûgoyan de, li ser bihevdu kiriye temam e û îmzakirina wê maye. Niha Talabanî jî dê bê û em hemû hêzên Kurd li ser wê gotûbêj bikin û ez bawer im, ku di demeke gelek kurt de dê delagasyona me ji bo îmzakirina wê vegere Bexdayê. Li gor pêşnama me divê li Kurdistanê di nav 3 mehan de û li Îraqê jî di nav saleke de hilbijartina giştî pêk bê.*

Bazara Ewropê (EG) Ji bo mesrefa leşker û personalên hêzên Hevkar ku li Kurdistana Îraqê dimînin biryara 35 milyon dolarî girt. Hîn li Kurdistanê 5100 leşkerên Amerîka hene.

**24'ê Hezîranê**

Li Kurdistanê lîderên Kurdan li ser pêşnama peymana Bexdayê civîyan. Wek tê zanîn di bin serokatiya Mesûd Barzanî de delagasyona Kurd çû Bexdayê û hukimeta Iraqê re dest bi guftûgoyan kiribû. Di dawî de, li ser pêşnameya peymanê lihevdu kiribû û delegasyona Kurd vegeriyabû Kurdistanê. Niha li ser wê pêşnameya peymanê lîderên Kurd gotûbêj dikin û encamê dê bibin Bexdayê.

Li gor ajansan Mesûd Barzanî di xwaze di derheqê pêşnameya peymanê de Celal Talabanî îkna bike û ji bo îmzakirinê vegere Bexdayê.

Mesûd Barzanî ji rojnamevanan re got ku; " me ji %70 daxwazên xwe bi Bexdayê daye qebûl kirin. Ji sedî sed jî ne mumkun e."

**25'ê Hezîranê**

Li gor nûçeyên CNN û BBC Serok û qadroyên hemû hêzên Kurdên Kurdistana Başûr, li bajarê Şaqlawayê, li ser encama guftûgoyên ku di navbera delegasyona Kurd û hukimeta Iraqê de pêk hatibûn civîn çêdikin. Civînekî girîng û mêjûyî ye. Mirov dikare bêje Kurdan heta niha civîneke weha mezin pêk ne anîye. Civîna Kurdan gelek mezin û berfireh e. Li gor agahdariyan qasî 500 kesî beşdarê civînê bûne. Civîn îro du roj in hîn dom dike.

Li gor nûçeyên IRNa yê ji mercên rejîma Iraqê yek jî jê ew e, ku Kurd û Şîîyên Iraqê, pêwîst e, ku berê hemû çekên xwe teslîmê hukimeta Iraqê bikin û paşê li ser xalên din yê peymanê bipeyîvin û rawestin.

**26'ê Hezîranê**

Amerîka hîn fikar dike ku çekên Sadda ên atomî hene û ew di bin erdê de veşartine. Ji ber vê yekê banga civan-

dina Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan kir û li ser vê mijarê gotûbêj kirin. Li gor ajansan uranyuma ku di destê Saddam de heye, cihê wê diguhêre. Li gor agahdariyê Amerîka, rejîma Bexdayê bi Kamyonan cihê çekên atomî û uranyuma ku di destê wê de heye diguhêre.

Kurd li ser pêşnama peymanê hîn gotûbêj dikin. Encam tune.

## Guftûgo têkçûn

**27'ê Hezîranê**

Li gor nûçeya ajansa Rueyter, ku ji devê berpirsiyarê YNK daye ajansê, Celal Talabanî û Mesûd Barzanî li ser pêşnama peymanê ya ku di nav wan û rejîma Iraqê de çêbûbû û îro çend roj in ku li ser gotûbêj dikin, bi hevdu nekirin. Dubendî di nav wan de heye. Mesûd Barzanî di xwaze vê pêşnamê qebûl bike û Celal Talabanî jî pêşnama peymanê kêm û ne baş dibîne. Celal Talabanî dixwaze tixûbên otonomiyê berfireh bibe. Kerkûk bi temamî bikeve nav tixûbê otonomiyê. Ji derê Kerkûkê Talabanî dixwaze herêma Sincarê jî bikeve nav tixûbên otonomiya Kurdan.



**28'ê Hezîranê**

Delegasyona Koma Neteweyan li Iraqê xwest ku cihê çekên Iraqê yên atomî kontrol bike, lê leşkerên Iraqê li wan teqandin û nehiştin, ku ew herine kontrolê. Bush li

ser vê bûyerê daxuniyek da û got; " *Iraqê peymana agirbirînê îhlal kir.*"

Li gor Pentagon rejîma Saddam niha jî li ser çekên nukleer dixebitê. Bi 60 kamyonan çekên giran cih guhartîye û dixwazin delagasyona Koma Neteweyan bixapînin. Amerîka li ser vê bûyerê, Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan gaziyê civînê kir. Îhtîmaleke mezin heye, ku Amerîka ji nû ve, li Iraqê dest bi operasyoan bike.

Di roja 21'ê Gulanê 22 hezar Kurdên Kurdistana Başûr li aliyê Kurdistana Tirkiyê hebûn, lê îro bi tenê 10 hezar kes manê. Di rojê de 500 kes derbasê Kurdistana Başûr dibin. Heta çend rojan dê hemû derbasê aliyê din bibin.

Pêşmergeyên PKK li nahiya Şirnaxê, Serokê belediya nahiya Hîlalê û mirovên wî yên parazvanê gundan (caş) kuştin.

**29'ê Hezîranê**

Li gor tekst TV ya Swêdê Kurdan pêşnama peymana ku di navbera delegasyona Kurd û hukimeta Iraqê de hatibûn gotûbêjkirin qebûl nekir. Wek tê zanîn bû çend roj in, ku Kurd li ser vê yekê gotûbêj dikin. Di dawiya gotûbêjan de, Kurdan şertên Iraqê qebûl nekirin. Lê dîsan jî, riya têkilî û guftûgoyan vekirî dihêlin.

Bush got; " bawerî bi Saddam nabe." li ser pêşnîyariya berpirsîyarê Sovyet ê Koma Neteweyan, Koma Keteweyan ji bo kontrolkirina çekên nukleer heyeteke din şand Bexdayê.

Civata Aboriya Ewropê biryar girt ku "divê Koma Neteweyan çekên nukleerê Iraqê kontrol bike û yên ku mane bide îmha kirin. Civata Aboriya Ewropê da dîyarkirin, ku divê babetê de bi Amerîka re ye û piştgiriya pêşnîyariya Amerîka dike.

Di van 10 rojên dawî de, li Dîyarbekirê gelek bomba li xaniyên rêxistinên demokratîk hatin deqandin. Li ser vê rewşa han, îro li Dîyarbekirê 12 rêxistinên demokratîk bi hevdu re presskonferansek pêkanîn û di presskonferansê de, rewşê protesto kirin û gotin ku: "Hêzên tarî û paşverû dixwazin dengê me bifetsînin. Lê, ev ji wan zêde ye. Em dê deng û xebata xwe hîn jî bilind û zêde bikin..."
Li gor van rêxistiên demokratîk kontr gerîlla û MİT a Tirkiyê van provakisyonan pêk tînin. Armanca wan tirsandin û rawestandina xebatên demokratîk û Kurdperwerî ye.

**30'ê Hezîranê**

Mesûd Barzanî li ser navê Bereyê Kurdistanê daxuyaniyek da ajansên cîhanê ku di komcivîna Kurdan de biryara neqebûlkirina pêşniyariyên rejîma İraqê hate girtin. M. Barzanî dibêje ku :

" *Ew mercên (şertên) ku rejîma Saddam ji bo otonomiyê danîye,pêş me, ne mumkun e, ku em Kurd bikaribin qebûl bikin. Bexda dixwaze tixûbên Kurdistanê gelek teng bike. Em van tixûban qebûl nakin. Divê tixûbên otonomiyê bê fireh kirin.*"

**1'ê Tîrmehê**

Kurdan pêşnama pêyman a ku ji aliyê Bexdayê ve hatibû pêşkêşkirin qebûl nekir. Li ser vê pêşnama peymanê 8 partiyên Kurd û gelek kesên sîyasî li ser peymana rejîma Bexdayê 5 roj gotûbêj kirin û di dawî de qebûl nekirin. Bexda bi vê peymanê dixwaze, hêzên Kurdan yên leşkerî ji navê rake, Kerkûk li derê tixûbên

otonomiyê bihêle, hemû partî û Bereyê Kurdistanê têkiliyên xwe yên derveyî û navnetewî qut bikin û bikevine nav partiya BAAS. Kurdan mercên vê peymanê qebûl nekir û ji nû ve du pêşnameyên xwe ji bo peymaneke nû amadekirine û dê wan bibin û herin Bexdayê.

Îro heyeta Koma Neteweyan çû ew cihên ku Îraqê çekên nukleer li wir veşartibû. Tam hefteyeke ku heyeta Koma Netewan nikaribûn bikeve wan deran. Çend roj berê, heyeta Koma Neteweyan xwestibûn, ku here ew cihên ku şuphe dikin ku çekên nukleer hene, lê leşkerên Saddam wan gulebaran kirin û nehîştibûn ew herin û kontrol bikin. Bi zor bela hefteyekê paşê heyet çû û tiştek nedît. Amerîka û Koma Neteweyan dibêjin ku:

- *Em baş dizanin li wir çekên nukleer hebû. Me tespît kiriye, ku Îraqê me bi dereng xist û wan çekan bi 60 kamyonî ji wir girt û bire nêzî Bexdayê û li wir veşart.*

Ji ber vê yekê Amerîka lêgerina heyeta Koma Netewe yan da rawestandin û ew dixwaze li Îraqê dest bi operasyonên leşkerî bike.

Li gor ajansa Reuterê, Îraq dê îro li parlementoyê ji bo xebata pirpartî gotûbêj bike. Li gor Bexdayê ew partiyên ku têkiliyên wan bi welatên derve, re hene û yên ku hebin ew nikarin bixebitin.

Li Bismilê dukandaran ji bo bombakirina rêxistinên demokratîk dukanên xwe girtin. Ji aliyê din ve, li nav bajêr 300-400 kesî meşeke protestoyî çêkirin. Polîs gelek kesan girt.

**2'ê Tîrmehê**

Alîkarê wezîrê Ewlekariyê Amerîka Kolin Pawil, li Ankarayê berî ku vegere Amerîka presskonferansek çêkir. Wî di presskonferansa xwe de got ku:

*- Ji bo parastina Kurdan mercên avakirina hêzên Çalak li ser tamambûnê ye. Min bi serleşkerên hêzên Hevkar re têkilî danî. Hemû di eynî dîtinî de ne ku li Tirkiyê hêzên Çalak bicih bibin. Tirkiye jî, ji vê yekê re amade ye. Lê, di qanûna Tirkiyê ya hîmî de hinek dijwarî û problem hene. Ez bawer im, dê ew jî çareser bibe.*

Li ser pirseke rojnamevanan K. Pawil weha bersiv da:
*- Heger Saddam ji nû ve, ji Kurdan re problem derbixe, êdî dawiya wî ye.*
Li gor agahdariyê, dê li Silopiyê ji hêzên Hevkar 5000 leşker bimînin û bi wan hêzên Çalak çêbikin. Dema Saddam carek din êrîşê Kurdistanê bike, dê di demeke gelek kurt de hêzên Çalak bersiva wî bidin.
Serokê Amerîka Bush dê 19 - 20'ê Temûzê de were Tirkiyê. Bush dixwaze wê demê pirsa hêzên Çalak çareser bike. Û piştre hêzên Çalak bicih bikin.
Amerîka ajanên xwe yên ku bi kurdî, Tirkî û arebî dizanin li Kurdistana Îraqê di nav xelkê de belav kirîye û ew bi xelkê re sohbet dikin. Dîtinên wan digrin, rapor dikin û ji Amerîka re dişeynîn. Li gor wan raporan xelk terefdarê hêzên Çalak e. Amerîka ji ber vê yekê dixwaze li Tirkiyê hêzên Çalak bicih bike.
Lê, li gor lêkolîna nûçegîhanê BBC li Kurdistana Tirkiyê ronakbîrên Kurd bi Amerîka bawer nakin û li dij bicihkirina hêzên Çalak in. Bersiva wan ronakbîrên Kurd ên Kurdistana Tirkiyê weha ye:

*- Madem ku Amerîka hêzên Çalak ji bo parastina Kurdên Kurdistana Îraqê bicih dike, çima li Kurdistana Îraqê bicih nake û tîne li KurdistanaTirkiyê li Silopiyê bicih dike?*

Çend roj berê li herêma Licê 10 endam û aligirên PKKê

ji aliyê leşkerên Tirk ve hatibûn şehîd kirin. Ji ber şehîdkirina wan 10 kesan, PKK rojek şîn elan kir. Dukandarên Licê îro ji bo şîna şehîdên xwe, dukanên xwe girtin. Li Dîyarbekirê jî dukandaran dukanên xwe girtin. Qasî 6.000 karkerên sendîkayên bajarê Dîyarbekirê jî, ji bo vê bûyera han saetek dereng çûn ser karê xwe. Polîs li Licê û Dîyarbekirê gelek kes girt.

## Rewşa piştî guftûgoyan

**3'ê Tîrmehê**

Delegasyona Koma Neteweyan Îraqê terk kir û hate Cenewrê. Li gor daxuyaniya serokê delegasyonê:

*- Îraq fêlbaziyan dike. Berê ji bo kontrola çekên nukleer astengan ji me re derxist û piştre bi kamyonan malzemeyên çek kişand derdora bajarê Bexdayê û li wir veşart. Delegasyona me biryar girt ku îmkanên lêgerînê tune.*

Li gor ajansan, dê serokê delegasyona Koma Neteweyan sibehê here Amerîka û rapora xwe bide Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan. Piştî raporê dê Koma Neteweyan li ser raporê biryar bigire. Li gor berdevikê Qesra Spî, bi vê şêl û kirina xwe, Îraqê yek alî peymana şerrawestandinê îhlal dike. Dibe ku Koma Neteweyan biryar bigire " Amerîka ji nû ve li Îraqê dest bi operasyonan bike.

**4'ê Tîrmehê**

Tirkiyê li Silopiyê ji bo bicihkirina hêzên Çalak biryara pozîtîv girt. Li gor çapemeniya Tirkiyê, Tirkiye, bi şert vê pêşnîyariyê pejirandiye. Bi şertê bûyerên derê tixûbên xwe *"belê"* gotiye.

**5'ê Tîrmehê**

Delegasyona Koma Neteweyan rapora xwe pêşkêşî sek reterê giştiyê Koma Neteweyan kir. Koma Netewe yan li ser raporê civîn çêkir û Sekreterê Giştî Javier Perez de Cueller Îraqê protesto kir. Îraq lêborina xwe xwest û daxwaz kir ku Koma Neteweyan ji bo lêkolînê ji nû ve delegasyonekê bişeyne Îraqê.

**6'ê Tîrmehê**

Di bin serokiya Celal Talabanî û Mesûd Barzanî de heyeta Kurd careke din li bajarê Hewlêrê bi heyeta Îraqê re, li ser peymana otonomiyê rûniştin. Li gor ajansan Alîkarê Serokwezîrê Îraqê Hammadî serokatiya heyeta Îraqê dike.

Wek tê zanîn Kurd çend roj berê, di nav xwe de civîneke mezin pêk anîbûn û mercên rejîma Bexdayê ji bo otonomiyê qebûl nekiri bûn. Kurd dixwazin tixûbên Kurdistanê fireh bikin, herêma Kerkûk û Sincarê jî bikeve nav otonomiyê û garantoriya Rojava jî divê hebe...

Li gor nûçegîhanê BBC yê Rakip Duran ku dîrekt ji bajarê Cizîrê telefonê BBC yê kir:

Îşev li bajarên Cizîrê, Şirnaqê û Silopiyê teqênên mezin çêbûn. Berê elektrîkên bajaran hat birîn û bi dûv re bi roketan xaniyên leşkerî û yên emniyetê hatin gulebaran kirin. Piştre jî bi çekên otomatîk dom kirin. Di derheqê mirî û birîndaran de hîn tû agahdarî tune.

**7'ê Tîrmehê**

Heta niha Îraqê digot *"di destê me de ne çekên nukleer û ne jî malzemeyê çekirina wê tune ye."* Lê, îro raporeke bi 30 rûpelî teslîmê Koma Neteweyan û sazgeha Enerjiya Atomiyê ya navnetewî kir û di rapora xwe de dan dîyarkirin, ku uranyum û malzemeyên din hene. Amerîka li hember ve daxuyaniyê derket û got ku:

- *Em bi her tiştê Îraqê baş dizanin. Wan heta niha Koma Neteweyan dixapandin. Lê dîsan jî dixapînin. Ew mîktara ku Îraq dide kêm e. Hîn zêde di destê Îraqê de çek û malzemeyê atomî hene. Pêwîst e, ku heyeta Koma Neteweyan herê Îraqê û di cih de lêkolînan çêbike. An em ji Îraqê û raporên wî bawer nakin.*

**8'ê Tîrmeh**


**Kontr gerilla Wedat Aydin şehîd kir**

Serokê HEP'ê bajarê Dîyarbekirê ( Partiya Keda Gel) Wedat Aydin ji aliyê MÎT û Kontrgerilla ve hat şehîd kirin. 3 roj berê çend kesên sivîl bi ser navê polîs tên û wî ji mala wî ya Dîyarbekirê digirin û dibin. Piştî 3 rojan li ser riya Dîyarbekir û Elezîzê, di navbera Erxenî û Madene cesedê wî dibînin. Di cesed de derbe û birînên çek hene. Wedat Aydin miroveki şoreşger bû. Berî û piştî 1980'î ew gelek caran ji bo daweyên DDK û KİPê ji aliyê polîs û leşkerên Tirk ve hatibûn girtin. Bi salan di zîndana Dîyarbekirê de ma û êşkence û tada dîtibû. Wî tû carî serî ji dijmin re danenî û bîrûbaweriya xwe wenda nekir. Ew her tim di rêza têkoşînê ya pêşî de dimeşîya.

Amerîka û hêzên Hevkar li dij PKK bi hevdu re beşda rê operasyonan bûn.

Du roj berê, PKK êrîşên çekdarî biribûn ser xanî û qişleyên leşker û polîsên Tirk yên ku li bajarên Cizîrê, Silopî û Şirnaxê ne. Ji wê rojê ve leşkerên Tirk, hêzên

Amerîka û Hevkar bi hevdu re li dij gerîlayê PKK û xelkê sivîl operasyonan pêka anîn. Li gor agahdariyên wan heta niha 6 gerilla kuştin û bê hejmar kesên sivîl ên herêmê girtine. Rêxistinên demokratîk li dij êrîş û hevkariya Amerîka rawestan û daxuyanî belav kirin. Partiyên opozîsyonên Tirkiyê jî, li dij beşdarbûna Amerîka û operasyonan derketin. Konsolosê Amerîka yê Ankarê daxuyaniyek da ku; "ne leşker û ne jî helîkopterên Amerîka û hêzên Hevkar pêşkarê operasyonan nebûne."



**9'ê Tîrmehê**

Li Dîyarbekirê rewş gelek sert diçe. Hêz û kesên welatparêz û demokrat ji rakirina cenazeyê Wedat Aydin xwe amade dikin û yên derê Dîyarbekirê jî ketine rê û diçin Dîyarbekirê. Polîs û leşker jî tedbîrên mezin û giran digirin. Serokê partiya HEP û parlementerên wê jî, ji bo rakirina cenaze çûn Dîyarbekir.

**10'ê Tîrmehê**

**Dewleta Tirk li Dîyarbekirê dest bi qetlîamê kir**

Di rakirina cenazeyê Wedat Aydin de li bajarê Dîyarbekirê bûyerên mezin derketin. Dema cenaze ji Madenê bi trênê hate stasyona Dîyarbekirê qasî 40 hezar kes civiya û bi kurdî merş gotin û slogan avêtin. Piştre konvoya cenaze ber bi mala Wedat Aydin ve meşiya. Konvoy her ku çû mezin û dirêj bû. 80 hezar kes meşiya. Polîs êrîş bir ser meşvanan. Piştre li Derê Mêrdînê polîsên taybeti yên ku xwe li qulikên bedenê veşartibûn xelkê gulebaran kirin. Şer derket, encax nîvê konvoyê dikaribûn herin ser mezel û nîvê din li nav bajêr ma. Piştî veşartinê dema ji ser mezel vegerê de polîs dîsan xelkê gulebaran kir. Polîs otobusên Partiya HEP'ê rawestandin. Camên wan şikandin û bombeyên dûyê avêtine navê. Polîs, li serok û parlementerên HEPê xistin û piraniya wan birîndar kirin. Bajar bû qada şer. Li her derê bajêr, di nav xelkê, polîs û leşkeran de şer berdewam kir. Li gor ajansan heta niha 5 kesên kuştî hatine tespît kirin û 80 kes jî birîndar in. Lê bûyer bi şev jî dom dikir.

Li Licê, Bismilê, Hênê, Kiziltepê,Nusêbînê, Batmanê û Dîyarbekirê ji bo protestokirina kuştina Wedat Aydin dukandaran îro dukanê xwe venekirin.

Li Ankarê, li ser bûyera Dîyarbekirê, dewleta Tirk du civînên mezin pêk anîn. Yek jê civîna wezîran û ya din jî ya MÎT, Rexistina Emniyetê û ya Jendirmeyan bûn. Dewleta Tirk, di derheqê civînan de tû agahdariyekî resmî nedan.

Tirkiyê cara pêşî prensîbên dewletên Hevkar şikand û biryar girt ku konsolosa xwe ya Bexdayê veke. Li gor daxuyaniya Tirkiyê ya resmî, dê di dawiya heftê de serokkonsolosê Tirkiyê yê Bexdayê Ahmet Ökçu here Bexdayê û dest bi karê xwe bike.

Di bin serokatiya Mesûd Barzanî de delegasyona Kurd

cara sêyem çû Bexdayê. Li gor ajansan, vê carê Kurd bi mercên giran çûn Bexdayê. Di pêşniyariya Kurdan a nû de, firehkirina tixûbên otonomiyê, guhartina qanûna bingehiya Iraqê, demokrasî li tevayiya Iraqê û ji qebûlkirina garantoriya dewletên Rojava an jî ya Koma Neteweyan hene...

**11'ê Tîrmehê**

Li Dîyarbekirê hejmara kuştî û birîndaran zêde bûn. Li gor partî û hêzên demokratîk heta niha 12 kes ji aliyê polîsê Tirk ve hatine şehîd kirin, 1000 kes birîndar û 353 kes jî, ji aliyê polîs ve hatine girtin. Hîn jî bi tank, top û helîkopteran Dîyarbekir di bin îşgalkirinê de ye. Piraniya dukanan girtîne. Ji derê Dîyarbekirê ji bajarên Licê, Nûseybîn û Dargeçît îro jî dukandaran dukanê xwe venekirin. Dewlet, ji derê Dîyarbekir li bajarên din yên Kurdistanê jî bi leşker gelek tedbîrên giran stendiye. Ordiya Tirk li her derî, di alarimê de ye.

Hemû parlementerên HEPê birîndar in û di nexweşxaneyên Dîyarbekirê de ne. Di nav wan de rewşa Adnan Ekmen ya herî giran e.

Parlementerê Konseya Ewropê jî di nav meşê de bûne. Ji wan yek dibêje ku:

- Ez bû çend sal in, ku bi pirsa Kurdan ve mijûl dibim, lê ez nizanibûm ku Kurd hewqas di bin barbariyeke mezin û dijwar de ne. Ez li gelek welatên Latîn Amerîka jî geri yam, lê, do ew wehşeta ku min bi çavên serê xwe li Dîyarbekirê dît tû carî ez dê ji bîr nekim.

Rojnamevanekî Ewropî jî dibêje ku:

*- Berî ku em herin li rewşa merasima cenaze binêrin, polîs ji me re got; " baştir ew e, ku hûn di hotel, an jî di karakolên me de bimînin. heger hûn sibehê derkevin*

*der, hûn dê poşman bibin." Bi rastî jî wek polîs got derket. Her tişt ji berê ve, ji aliyê polîs ve hatibûn plankirin. Polîs me di erdê de kişand. Bi jop, qondaxan li me xistin. Makîneyên me şikandin. Em ji mirinê filitîn.*

Serokê Partiya Sosyalîst a Tirkiyê Doğu Perînçek jî di nav bûyerên Dîyarbekirê de bû. Ew ji BBC re dibêje ku:

- *Bi rastî yekî mudaxeleyê polîsan nekir. Du-sê zarokan kevir avêtin qereqolê. Lê, bûyer ji wir derneket, polîsên taybetî raste rast xelkê gulebaran kirin. Ev ji berê ve, ji jor ve hatibûn plan kirin. Armanc vekirîye. Dewletê li Kurdistanê di çiya û peseran de kontrolê êdî wenda kirîye, lê dixwazin li bajaran kontrolê ji dest bernedin. Ji ber vê yekê hedefa wan rêxistinên demokratîk in. Di nav hefteyeke de tam 18 kesên legal bi gulebarankirinê kuştin. 20 cihên demokratîk bomba kirin. Dewletê, êdî Kurdan wenda kiriye û ji ber vê yekê jî wan ji çar derdixe.*

Wezîrê Karûbarê Hundirî yê Tirkiyê daxuyaniyek da û:

- *Parvekar dixwazin provakasyon derbixin û Tirkiyê perçe bikin. Polîs wezîfeyê xwe bi cîh tîne. Wan kesên parvekar divê hîn cezayê xwe bidin û bikşînin. Polîs dixwaze ji nû ve kontrolê bigire destê xwe. Ev ji wan re bila bibe ders...*

Amerîka daxuyakirin ku karûbarê bicîhkirina hêzên Çalak ku ji bo parastina Kurdên Kurdistana İraqê li Tirkiyê pêk bê, li ser temambûnê ye. Bi cîhkirina hêzên Çalak re, dê Amerîka û hêzên Hevkar leşkerên xwe ji Kurdistana İraqê bikşînin.

Ji aliyê din ve, delegasyona Kurd li Bexdayê dest bi guftûgoyan kir.

İraq dîsan serî li Koma Neteweyan xist, ku bihêle petrola xwe bifroşe. Koma Neteweyan, bersiveke negatîv da İraqê.

**12'ê Tîrmehê**

Li navendiya bajarê Dîyarbekirê ordiya Tirk hakim e. Piraniya xelkê ji hundir dernakevin. Li taxên curbe cur gelek dukan hîn jî girtî ne. Ji derê bajarê Dîyarbekirê, li Licê, Hêne, Hezro, Kiziltepe, Nusêbîn û Bismilê îro 3 roj in ku dukan girtîne.

Ji ber ku hejmara girtî û wendayan gelek e, yek nizane heta îro çend kes hatine kuştin. Heta niha hejmara ku dîyar bûye 12 kes hatine kuştin.

Du parlementerên Partiya yekîtiya Sosyalîst pêşname dan parlementoyê ku li ser bûyera Dîyarbekirê li Parlementoya Tirkiyê guftûgo çêbin.

İro li gelek welatên Ewropa, Kurdan meş, mitîng û rûniştin pêkanîn û hinek ciyan jî konsolosxaneyên Tirkiyê îşgal kirin. Li Stokholmê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li meydana Sergel mîtîngek çêkir. Li ser kuştina Wedat Aydin û qetlîama Dîyarbekirê agahdarî hat dayîn û daxwazî ji Swêdê hat kirin ku dewleta Tirk ji ber metod û qetlîamên gelêrî protesto bikin. Çend parlementer û nûnerên partiyên Swêdê di mîtîngê de axaftin û Tirkiyê ji ber karûbarê barbarî û terorîstiyê protesto kirin. Ji aliyekî din ve jî, qasî 50 kes Kurd avêtin ser konsolosxana Tirkiyê ya Stockholmê û xaniyê konsolosê kevir kirin. Cam û pencereyên wê şikandin. Li Londrayê jî, çend Kurd avêtin ser konsolosxana Tirkiyê û konsolosxanê qasî saetek îşgal kirin û personalê konsolosê di dema îşaglkirinê de, di deriyên dizî de, xaniyê konsolosxanê terk kirin. Qasî 50 kesî jî li derê konsolosê slogan avêtin

xwepêşandan pêk anîn. Li Hollanda û Belçîkayê jî Kurdan meş û mîtîng pêk anîn û dewleta Tirk protesto kirin.

Wezîrê Parastinê yê Amerîka daxuyaniyekê da, ku heta 15 vê mehê divê Amerîka û hêzên Hevkar hemû hêzên xwe yên leşkeri yê ji Kurdistana Îraqê bikşînin. Ji bo parastina Kurdan jî, li Tirkiyê hêzên Çalak bicih kirin. Wezîrê Amerîka di daxuyaniya xwe de got ku:

*- Îraq nikare ji paralela 36-an jortir balafir û helîkopterên xwe bifrîne. Heger di erdê de jî êrîş bibe ser vê herêmê, em dê dîsan di cih de bersiva Îraqê bidin.*

Bush got ku :

*- Em baş dizanin çiqas çekên nukleer di destê Îraqê de hene û ew li kû ne. Heger Îraq heta 25'ê Temûzê lîsteyeke rast û têkûz nede Koma Neteweyan, dê bela û tofanên mezin û giran bên serê Îraqê.*

**13'ê Tîrmehê**

Li ser paşvekişandina leşkerên Amerîka û hêzên Hevkar, bi hezaran Kurdên penaber ji ser tixûbê Tirkiyê heta Zaxo meş û mîtîngek pêk anîn. Di axaftin û sloganên xwe dan dîyarkirin ku heta pirsa Kurd çareser nebe, divê Amerîka û hêzên Hevkar ji Kurdistanê bar nekin û neçin. Bi çûndina wan re, îhtîmalên êrîşkirina hêzên Saddam zêde dibe. Li ser meş û mîtîngê serokleşkerê Amerîkî û serokpêşmerge çûn herêma meş û mîtîngê û wan îkna kirin û *"heger leşkerên Saddam êrîş bikin, em dê bersiva wan bidin."* gotin.

Li navça bajarê Konyayê qasî 200 kesî meşeke korsan pê kanîn. Di meşê de sloganên "bijî Kurdistan, bijî PKK" avêtin. Di nav wan û polîs de şer derket. Polîs qasî 50 kesî girt binçav.

**14'ê Tîrmehê**

Hêzên Hevkar sibehê bi temamî ji Kurdistana Iraqê derdikevin. Ji ber vê yekê, îro jî Kurdan li herêma Xabûr û Zaxoyê li dij çûndina leşkerên hêzên Hevkar meş û mîtîng pêk anîn. Qumitanê hêzên Hevkar ji wan re got ku:

- *Baweriya xwe bi hêzên Hevkar bînin. Em we bi tenê nahêlin. Em ji vir diçin Silopiyê. Ji wê derê we diparêzin.*

Li Fransê Bush û Mitterand civiyan Di civînê de, pirsa çekên nukleer ên Iraqê girtin dest. Di dawiya civînê Mittrand daxuyaniyeke da TV ku:

- *Em û Amerîka li ser operasyona Iraqê hemfikir in. Heger Iraq li gor biryara Koma Neteweyan di demek nêzîk de, ji bo îmhakirinê çekên xwe yên nukleer teslîmê Koma Neteweyan neke, divê Fransa û Amerîka bi hevdu re, dîsan li Iraqê dest bi operasyonan bikin.*

Iraq ji bo operasyona Amerîka û Fransê serî li Koma Neteweyan û Rêxistina Yekîtiya Ereban xist û ji wan tîka kir ku ew pêş li êrîşên Amerîka û Fransê bigirin. Iraq dixwaze li ser vê pirsê Rêxistina Yekîtiya Ereban civîneke awarte çêbike.

Serokê Misirê, Husnî Mubarek, li ser vê bûyerê daxuyaniyek da Kovara Der Spigel û di daxuyaniya xwe de, li dij êrîşa Amerîka û hêzên Hevkar derket û got ku:

- Em li dij êrîşê ne. Di dema şerê Kendavê de jî, me ji bo rizgarkirina Kuweytê şer kir, ne li dij Iraqê.

Ji aliyê din ve Kaddafî jî bi tûndî daxuyaniyek da û li dij êrîş û operasyonên nû derket.

Celal Talabanî di derheqê guftûgoyên di nav heyeta Kurd û hukimeta Iraqê de agahdarî da çapemeniya cîhanê û got ku:

*- Îraqê daxwaz û pêşnîyarên heyeta Kurd bi tevî qebûl kiriye. Bi taybetî ji bo hatina demokrasiyê li Îraqê, mafên mirovî û hilbijartina giştî. Ev gavên pozîtîv in.*

Li ser bûyera Wedat Aydin û bûyerên Dîyarbekirê îro jî li Kurdistanê gelek bûyerên xwînrêtinê pêk hatin. Li herêma Meraşê 9 kes hatin kuştin. Di nav wan de çend parêzvanên gundan jî hebûn. Li Bismilê jî hêzên dewletê 7 welatparêz şehîd kirin. Li Hîzanê jî gerilla kemîn li pêş hêzên dewletê danî û du leşkerên taybetî hatin kuştin û konvoya wan tahrîb bû. Li Bajarê Nusêbînê jî xaniyeke dewletê hat şewtandin. Li ser vê bûyerê ji aliyê dewletê ve, li herêmê rewşa awarte hat dîyarkirin.

Li Ewropa jî Kurdan li gelek welat tevger û çalakiyan pêk anî. Li bajarê Frankfurtê dilsozên ERNK êrîşek birin ser xaniyê şirketa balafirên Tirk "Turk Hava Yollariyê." Xanî gelek xesar dît. Li Hollanda, Belçîka û Swêdê jî Kurdan dest bi çalakiyên birçîbûniyê kirin.

**15' Tîrmehê**

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Îraqê Ahmed Huseyîn, namek ji Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan şand û di nameya xwe de Amerîka protesto kir ku Amerîka dixwaze dest bi operasyonan bike. Serok Wezîrê Îraqê S. Hammadî jî li Bexdayê preskonferansek çêkir û di preskonferansê de got ku: "Armanca Amerîka vekiriye, ew dixwaze ji bo sîyonîstan carek din Îraqê wêran bike."

Hammadî di axaftina xwe de got ku: "Amerîka mudaxeleyê nav Îraqê jî dike. Ew û Rojava nahêlin ku li bakurê Îraqê jî îstîkrar pêk bê. Di navbera me û Kurdan de pêngavên pozîtîv tên avêtin..."

Celal Talabanî jî gotarek da rojnama El Sawra û di gotara xwe de dibêje ku: " Di hevdîtin û guftûyoyên nav-

bera me Îraqê de pêngavên pozîtîv hene. Ji bo yekîtiya Îraqê em hewl didin."

Hêzên Hevkar îro bi temamî ji Kurdistana Îraqê derketin û hatin Kurdistana Tirkiyê. Dê qasî 3000'î li wir bicih bibin û yên din herin welatê xwe. Qumûtanê hêzên Hevkar generalê Amerîkî, li ser vegera xwe axaftinek kir û got ku:

*"Bi rastî me di nav 3 mehan de wezîfeyê xwe bi serfirazî bicih anî. Me li herêmê bingehek avêt. Bila Kurd fikar nekin û netirsin, ne bi tenê li herêma wan, heger rejîma Saddam li seranserê Îraqê tevleheviyek çêbike, em dê di cih de mudexele bikin."*

Li gor rojnameyên Tirkan, li balafirgeha NATO ya Încirlikê ku li Tirkiyê ye, îro rewşeke taybetî hebû. Gelek balafirên Amerîka yên şerê rabûn û danîn. Piştî şerê Xalîcê rewşeke weha hîç nehatibûn dîtin. Li gor şirove û texmînan, Amerîka xwe ji bo êrîşeke nû ku bibe ser Îraqê re amade dike.

Bülent Ecevit, li ser bicihkirina hêzên Çalak li Tirkiyê presskoferansek çekir û bi tundî li dij biryara hukimeta Tirk rawesta û bi kurtasî weha got:

*- Amerîka û Rojava dixwazin peymana Sewrê bidin jîyandin. Ew dixwazin li bakurê Îraqê dewleteke Kurd ya hefsarkêş çêbikin û paşê vegerin Tirkiyê û li rojhilatê Tirkiyê jî dewleteke weha yê bi Rojava ve girêdayî çêbikin. Hukimet xirifî ye. Amerîka û Rojava li serê wê dek û dolaban çêdikin.*

**16' Tîrmehê**

Îro du roj in ku 7 dewletên super (Amerîka, Îngilistan, Fransa, Elmanya, Kanada, Îtalya û Japonya) li Londrayê

civîna xwe ya herî bilind pêk tînin. Di dawiya civînê de belavokeke polîtîk belav kirin. Di belavoka xwe de, li ser rewşa Îraqê jî rawestan û biryar girtin ku "divê Îraq li gor biryarên Komîta Ewlekariya Koma Neteweyan, di wexteke nêz de, bê kêmasî bicih bîne û lîsta û cihên çekên atomî bide Komîta Ewlekar a Koma Neteweyan. An dê li ser Îraqê operasyonên nû pêk bên. her heft dewletên dewlemend ji bo Koma Neteweyan biryarên nû û girîng jî girtin. Ji vir şûn de, divê Koma Neteweyan ne bitenê mafê dewletan biparêze, herweha dê Koma Neteweyan ji bo her kesî aştî û ewlekariyê biparêze. Ev biryar ji bo gelên bindest gaveke nû û pozîtîv tê dîtin û şirovekirin.

Di bûyera Dîyarbekirê de 14 kes jî wenda ne. Navên wan 14 kesan ne di lîsta girtiyan de heye û ne jî di ya mirîyan de. Ji aliyê din ve serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz presskonferansek çêkir û got ku:

*" Têkoşîna me li dij terorîzmê her berdewam e. Ew kes û rêxistinên ku dixwazin welatê me bi parve bikin, divê polîs li dij wan têbikoşe. Ji ber vê yekê jî, carnan prensîbên demokrasiyê jî dikevin bin lingan û tê pelçiqandin. Ev jî tiştekî normal e..."*

Komîta Helsînkiyê li ser Kuştina Wedat Aydin û bûyerên Dîyarbekirê namek ji serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz re şand û di nameya xwe de vê bûyerê protesto kir.

**17'ê Tîrmehê**

Bi munasebetê salvegera Înqilaba 17ê Temûzê, Saddam îro di radyo û TV ya Îraqê de axaftinek ji neteweyê Îraqê re kir. Saddam di axaftina xwe de, li ser du xalan rawesta: 1- Parastina yekîtiya Îraqê; 2- protestokirina êrîşên Amerîka û Rojava.

Saddam ji bo yekîtiya Iraqê gaziyê xelkê Iraqê kir. Li gor şirovevanên Rojava, gaziya Saddam ji Kurd û Şîîyan re ye.

Iro Komîsyona Hevpişkî ya Parlemento ya Ewropayê, li bajarê Îstanbolê civiya. Di civînê de parlementerên Hollanda û Belçîkayê pirsa kuştina Wedat Aydin û bûyerên Dîyarbekirê anîn rojevê û rexne li Tirkiyê girtin. Wan, li ser van bûyeran ji hukimeta Tirk raporek xwestin. Di civîna beyanî de, dê rapora hukimetê ya li ser bûyerên Dîyarbekirê bê xwendin. Nûnerê Belçîkayê di axaftina xwe de got ku; " li Tirkiyê pirsa Kurd a netewî heye. Divê ev pirs bi riya demokrasiyê bê çareserkirin."

Nûnerê Tirkiyê, vê gotina nûnerê Belçîkayê red kir.

**18'ê Tîrmehê**

Iro li Stanbolê dawiya civîna Komîsyona Hevpişkî ya Parlemento ya Ewropayê hat. Berpirsîyarê grûba Ewropî got ku: " *me do li ser bûyerên Dîyarbekirê ji hukimetê rapor xwest. Wan gotin em sibehê tînin, lê heta niha rapor nehatiye û civîna me jî teva bû...*"

Parlementerên Ewropê sibehê dê herin herêma Kurdistanê li bajarên Riha, Dîyarbekir û Mêrdînê bigerin.

Partiya ANAPê ji bo lêkolîna bajarê Dîyabekirê 4 parlementerên xwe şandine herêmê. Ew du rojin ku li Dîyarbekirê lêkolînên xwe didomînin. Her çar parlementer îro çûn xaniyê HEPê yê Dîyarbekirê zîyaret kirin û ji berpirsîyarên HEPê agahdarî girtin. Parlementerê HEPê yê Dîyarbekirê Salîh Sümer ji wan re got ku; " *hukimeta we wisa zilm û zordariyek kir ku ez ji parlementeriya xwe êdî şerm dikim. Ji ber vê yekê ez dê ji parlementeriyê îstîfa bikim.*"

Berpirsîyarê grûba parlementerên ANAPê ji rojnamevanan re got ku; " piştî lêkolîna me, em bawer in ku dê

hukimet li ser bûyerên Dîyarbekirê dîtina xwe biguhêre."

Piştî hevdîtina Serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz û Serokkomar Turgut Özal, Mesut Yılmaz, di derheqê Hêzên Çalak de cara yekem bi awayekî fermî daxuyaniyek da çapemeniyê. Mesut Yılmaz:

*- Pirsa hezên Çalak temam e. Tirkiyê 1000 leşkerê xwe ve beşdarê hêzên Çalak dibe. Giraniya hêzên Çalak dê li Silopiyê bin. Her tiştê wê dê di bin kontrola Tirkiyê de bin. Dema operasyonên li derê Tirkiyê pêk bên divê dîsan îzna Tirkiyê hebe. Hêzên Çalak dê heta Îlona 1992-an wezîfeyê xwe bidomîne. Piştre domandina wê li gor mercên wê demê dê bêt guhartin.*

Di nav opozîsyona Tirkiyê de li ser hêzên Çalak gotûbêjên tûj hene. Ji hukimetê dipirsin:

- Gelo dê hêzên Çalak bi tenê ji bo parastina Kurdên Iraqê bê bikaranîn, an li Kurdistana Tirkiyê jî dema ji aliyê Kurdan ve bûyerên mezin pêk bên, li dij wan jî dê bêt bikaranîn an na?

Hukimeta Tirk, xweza bersiva vê pirsê nade.

**19'ê Tirmehê**

Li bajarên Silêmaniyê û Hewlêrê di navbera hêzên pêşmêrge û Iraqê de şer derket. Roja çarşemê Kurdan xwest li bajarên Silêmaniyê û Hewlêrê meş û mîtîng çêbikin. Lêşkerên Iraqê wan gulebaran kirin. Pêşmêrge bersiva wan da. Şer du roj dom kir. Li gor agahdariya perpirsîyarê Koma Neteweyan di şerde qasî 500 kesî hatine kuştin. Kurdan ji leşkerên Iraqê qasî 1000 kesî dîl girtine. Hêzên Koma Neteweyan ketin navcîtiyê û bersiveke pozîtîv girtin û niha şer rawestaye.

Berdevikê Wezîrê Ewlekariyê yê Amerîka daxuyanîyek da û derketine şer dîyar kir. Di daxuyaniya xwe de da dîyarkirin ku ; " *sedemê derketina şer Iraq be, em dikarin mudaxele bikin.*"

Mesûd Barzanî jî got ku " hinek hêz dixwazin provovakasyon çêbikin û guftûgoyên navbera me Iraqê dom dike bi ser nekeve."

Konsolosê Sovyetê yê li Ankarê gotarek da rojnameya Cumhuriyetê û di gotare xwe de li dij bicihkirina hêzên Çalak derket. Dibêjeke; " em naxwazin li nêzî sînorê me hêzên weha bicih bibin. Gelo armanca hêzên Çalak çi ye? Heger ji bo Kurdên Iraqê ye, baştirtirîn ew e, ku bila hêzên Koma Neteweyan vê wezîfeyî bigirin ser milê xwe."

Serokê Partiya Sosyalîsta Tirkiyê Doğu Perinçek jî daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de; " Rojava dixwaze li bakurê Iraqê dewleteke Kurd ya hevsarkêş ango bi Rojava ve girêdayî çêbike. Em bi tûndî li dij vê yekê ne..."

Li gor agahdariya walîyê Kolonîyalîst Hayri Kozakçıoğlu, leşkerên Tirk îro 14 gerîllayên Kurd kuştin.

**20'ê Tîrmehê**

Serokên Kurdan emîr dan pêşmêrge ku şer rawestînin. Li Bexdayê Mesûd Barzanî daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de got; "ku bi şaşî şer derketiye. Me şer da rawestandin. Hinek hêz hene ku naxwazin em û Iraqî li hevdu werin û ji ber wê yekê provakasyonan çêdikin."

Berpirsiyarê pêşmergê Kemal Kerkûkî got ku:

*-Li ser daxwaza Mesûd Barzanî şer niha rawestaye. Du roj di navbera me û Iraqê de şerek gelek dijwar derket. Me gelek dîl ji ordiya Iraqê girt. 6 tanq tahrîb kir û 12 tanq jî be dest da ser wan. Li ser rawestandina şer li Zaxo civînek çêbû.*



*Kurd ji nû ve xaniyê xwe lê dikin.*

Li gor agahdariya Koma Neteweyan roja pêncşemê şereke gelek dijwar di navbera pêşmêrge û ordiya İraqê de derketiye. Gelek mirov birîndar û gelek kuştî hene. Pêşmêrge ji ordiya İraqê 1200 kes dîl girtiye.

Berdevikê Wezîrê Ewlekariyê yê Amerîka got; *" belê şer derketiye, lê sebebên ku Amerîka mudaxele bike li navê tune ye."*

Berdevikê Wezîrê Derveyî yê Tirkiyê Kaya Toper îro got; *" dê Celal Talabanî di van rojan de were Tirkiyê."*

*Serokê Amerîka Bush îro ji Yewnanîstanê çû Tirkiyê. Piştî 32 salan cara yekem e, ku serokê Amerîka Tirkiyê zîyaret dike. Bush di axaftina xwe de got ku; " ji armanca hatina min yek jî, ew e, ku ji bo alîkariya şerê xalîcê, ji*

*Tirkiyê re spas bikim."*

Bush dê sibehê li stanbolê li Dolmebexceyê de axaftina xwe ya dîrokî û sîyasî bike.

**21'ê Tîrmehê**

Komîta Konseya Şoreşa Îraqê efûya sîyasî derxist. Derxistina efûyê rastê roja cejna Şîîyan a Aşûrê tê. Ji derê serleşkeran zabitan) ji hemû kesên sîyasî û leşker re efûyê elan kirin. Kesên sîyasiyên li der û hundirê welêt ên ji wan re efû heye. Girtiyên sîyasî jî divê bên berdan.

Li gor şirovevanên Rojava Saddam dixwaze di çavê raya giştiya cîhanê de demokratiya xwe şan bide û ku *"bêjin guhartin li Îraqê çêdibin. Li Îraqê prossesa demokrasiyê dest pê dike..."*

Li gor rojnama Swêdê DNê di şerê roja çarşem û pêncşemê de qasî 500 kesî hatin kuştin. Pêşmêrge 1200 ji ordiya Îraqê dîl girtiye û ji ber tirsa şer qasî 20.000 Kurd ji herêma bajarê Silêmaniyê koç kir û ber bi jor ve herêma ku di bin kontrola pêşmêrge de ye diçe.

Qomûtanê hêzên Hevkar li Dîyarbekirê bi waliyê kolonîyalîst Hayri Kozakçıoğlu re civînek çêkir. Qomûtanê hêzên Hevkar ji rojnamevanan re got ku; "îdarekirina hêzên Çalak dê qomûtanên Amerîkî û Tirk bimeşînin.

Bush îro li Stanbolê carekê din got ku heta Saddam li ser desthilatiyê be em pê re têkilî danayînin; divê ew here. "

Bush li ser pirsên Qibris û Kurdistana Îraqê bi serokê opozîsyona Tirkiyê Süleyman Demirel û Erdal İnönü re jî peyîvî. Bush pesnê Serokkomarê Tirkiyê Özal da û bi Tirkiyê re sozê 80 balafirên şerê F-16 da.

**22'ê Tîrmehê**

Koma Neteweyan li ser serîlêdana Îraqê ya ji bo firotina petrolê civîya. Wek ku tê zanîn Îraqê çendek berê ji bo firotina petrolê serî li Koma Neteweyan xistibû. Îro Koma Neteweyan li ser vê yekê civîya. Prens Saddredîn Xan dê li ser rewşa Îraqê agahdarî bide Koma Neteweyan û ji bo firotina petrolê pêşnîyariya xwe pêşkêş bike. Li gor ajansan dîplomat dixwazin ji bo carek riya firotinê bidin Îraqê. Lê bi vê yekê re dîplomat dixwazin ambargo li ser Îraqê dom bike. Ji ber ku Îraq li Kurd û Şîîyan hîn jî zilm û zordariyê dike.

Amerîka ji bo ku Îraq nahêle Xaça Sor alîkariyê bibi herêma Şîîyan rexneyên tûj li Îraqê digire.

Xaça Sor îro çû herêma Silêmaniyê û ew 1200 leşkerên Îraqê yên ku rojên çarşem û pêncşemê ji aliyê Kurdan ve dîl hatibûn girtin, wan zîyaret kir. Rewşa wan baş dît.

Li gor rojnameyên Tirkan Bush û Turgut Özal li ser bikaranîna hêzên Çalak bi hevdu nekirin. Bush dixwaze hêzên Çalak dema Îraq êrîşê Kurdên Kurdistana Îraqê bike bikarbînin. Ji derê wê heger pêwîst be, ji bo xistina Saddam jî bikaribin bikarbînin. Tirkiye dixwaze bi tenê dema Saddam êrîşê Kurdan bike û Kurd jî dîsa penaber bibin û ber bi tixûbên Tirkiyê ve bin bikarbînin. Îro Bush û Özal bi hevdu re daxuyanî dan. Bush behsa hêzên Çalak kir, lê Özal hîç behs nekir. Süleyman Demirel jî li ser hêzên Çalak rexne li Özal girt. Özal silbû (hêrs ket) û got:

- *Hêzên Çalak tixûbên Tirkiyê dê biparêzin.*

Li gor rojnameyên Tirkiyê, Celal Talabanî dê 25'ê vê mehê were Dîyarbekirê û waliyê kolonîyalîst Hayri Kozakçıoğlu bibîne û ji wir jî here Îngilistanê.

Wek tê zanîn û bîranîn li ser kuştina Wedat Aydin û bûyerên ku di merasima cenazeya wî de li Dîyarbekirê

çêbûbû, ji parlementerên Alman delegasyonek çûbûn Dîyarbekirê û di vî warî de heta niha lêkolîn çêdikirin. Serokê delegasyonê îro li Dîyarbekirê li ser lêkolîna xwe agahdariyeke kurt da rojnamevanan. Wî di agahdariya xwe got, ku "*... Li gor lêkolînên me, gel bê çek bûye û ew nebûne sedemên derketine bûyeran. Sawci jî teref digire û bizanabûn ceza dide kesên girtî. Em dê pirsê bibin mehkemeya navnetewî.*"

**23'ê Tîrmehê**

Îro Tirkiyê bi awayekî fermî armanc û berpirsîyariya hêzên Çalak dîyar kir. Tirkiyê li ser prensibên ku bi îzina Tirkiyê nebe, ne di erdê, ne di hewa û ne jî di deryayê de nikare hêzên Çalak bikarbîne. Ew çekên ku ji bo hêzên Çalak bên divê di bin kontrola Tirkiyê de be. Hêzên Çalak ji leşkerên Amerîka, Hollanda, Îtalya, Fransa, Belçîka û Tirkiyê pêk tê.

Komîsyona Ewlekariya Koma Neteweyan li ser îzindayîna firotina petrola Îraqê îro du roj in ku gotûbêj dike. Endamên Komîsyona Ewlekariyê dibêjin ku ambargoya aborî li ser Îraqê heger dom bike, dê xelkê sivîl û bi taybetî zarok ji birçînan bimirin. Ji endaman hinek dixwazin ku kanala petrola Îraqê ya ku tê bajarê Îskenderûnê, divê bin kontroka Koma Neteweyan de bêt vekirin û petrol bêt firotin.

**24'ê Tîrmehê**

Li gor ajansa Reuterê, Celal Talabanî sibehê diçe bajarê Dîyarbekirê û li Wir waliyê kolonîyalîst dê bibîne. Paşê di ser Tirkiyê here Fransayê. Ji Fransayê jî here Îngilistanê û li wir bi serokwezîrê Îngilistanê John Major re civînek çêbike. Ev civîna ha li ser daxwaza Serokwezîrê Îngilistanê John Major dê pêk bêt.

**25'ê Tîrmehê**

Li Bajarê Dîyarbekirê Celal Talabanî û Kozakçıoğu hevdu dîtin. Dîtina wan ji çapemeniyê re veşartî bû. Piştî hevdîtina wan Kozakçıoğlu bersiva pirsên rojnamevanan neda. Li ser pirsên rojnamevanan Calal Talabanî weha digot:

- Belê me wek rêxistinên Kurdistanê nedixwest Amerîka li herêmê bimîne, lê xelkê me mayîna wan dixwest. Niha rewşa me gelek paş e û ez bawer im, ku dê hîn jî baştir bibe.

Li ser pirsa rojnamevanan a di derheqê têkiliyên wan û PKK de jî Talabanî weha digot:

*- PKK rêxistineke bi serê xwe ye. Têkiliyên me bi wê re tune ne.*

Li gor ajansan binecihên bajarê Bexdayê ji tirsa ku Amerîka ji nû ve Bexdayê bombe bike, Bexdayê vala kirin.

*-Em dikarin li der jî êrîş bibin ser hêlînên wan.*

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal jî çû Dîyarbekirê û bi qeymeqan û hinek keyanên gundan re civînek çêkir. Di civînê Özal li ser terorîzmê axaft û got:

*- Teror li her welatî heye. Lê, bi ser nakeve. Em li plan û proje li dij terorê têdikoşin. Em gav bi gaf pêş dikevin. Hûn dê ji xwe re bibînin em dê koka wan bînin. Hinek li vir û hinek jî li ser hêlînên terorê hene. Em li vir li wan dixin, heger pêwîst be, em dikarin li der jî, ango li Beyrûtê û li Ewropa jî dikarin hêlînên wan hilweşînin. Berê jî min parlementerên Rojhilat (qesta wî Kurdistan e) re got. ' Pere ji Ankarê û Stanbûoê û mêwe jî ji Edana û Mersînê*

*tê Rojhilat. Dema Rojhilat ji Tirkiyê biçike, ew kesên ku li Rojhilat dijîn dê ji birçînan bimirin.'*

Serokê Giştiyê Komela Mafê Mirovan li Tirkiyê li ser bûyerên Dîyarbekirî presskonferansek çêkir û di presskonferansê de dîtinên xwe weha anî zimên:

*- Li Tirkiyê mafê mirovan nîne. Heger di welatekî de sewrokwezîr bibêje; " em dê koka wan bînin" û Serokkomar jî bibêje; " em dê li hundir û der hêlînên wan xirab bikin" li wî welatî behsa demokrasiyê nabe. Îro li Tirkiyê terora dewletê heye...*

**26'ê Tîrmehê**

Koma Neteweyan hîn jî li ser firotina petrola Iraqê gotûbêj dike û dixwaze bigehê encamek. Di gotûbêjan de ev encam derdikeve ku petrola ku bêt firotin divê di bin kontrola Koma Neteweyan de û herweha ew pêwîstiyên ku ji bo Iraqê jî bên stendin û belav kirin. Li ser vê yekê nûnerê Iraqê yê li Koma Neteweyan El Ambarî vê dîtina Koma Neteweyan protesto kir û got; *"ev raste rast mudaxeleyê karûbarên hundiriyê Iraqê ye..."*

Ji aliyê din de ew lîsteya ku Iraq, ji bo çekên nukleer dabû Koma Neteweyan, delegasyona Koma Neteweyan li ser lêdikole. Delegasyona Koma Neteweyan di navbera 4 çar mehan de li Iraqê cihên 10 tesîsên din yê atomî jî kontrol bike.

**27'ê Tîrmehê**

Celal Talabanî li bajarê Stenbolê , li nexweşxanê bi rojnamevanan re peyîvî. Celal Talabanî şeva dinê di nexweşxana bajarê Stenbolê de derbas kir.Turgut Özal bi

telefonê derbasbûyî li Celal Talabanî kir. Talabanî êvarê jî musteşar Kaya Toper dît.

Li ser pirsê rojnamevanan Talabanî weha di derheqê şerê Xalîcê û şêla Amerîka de weha digot:

- *Piştî şer Amerîka poşman bû ku Saddam ji desthilatiyê nexist. Lê, niha Hêzên Çalak gelek cîddî ye. Heger Saddam careke din êrîş bîne, hêzên Çalak dê bersiva hêzên Saddam bide.*

Talabanî dê sibehê bifire Londonê. ew dê bi serokwezîrê Îngilistanê John Major û serokwezîra berê Margareta Thachert bibîne.

Koma Neteweyan ji bo lêkolîna çekên atomî heyetek din şand Îraqê. Ev heyeta çaran ku ji aliyê Koma Netewan ve diçe Îraqê. Di vê heyeta nû de 18 kesên pispor hene. Heyet dê du hefte li Îraqê bimîne û li cihên ku şuphe dikin dê lêkolînan pêk bîne û rapora xwe pêşkêşî Koma Neteweyan bike.

**28'ê Tîrmehê**

Li gor nûçeya TV İnter a Tirkiyê, İraqê hemû kêmasiyê kanala petrolê ya ku tê Tirkiyê ji aliyê xwe ve amade kirîye. Beşa ku di nav axa Tirkiyê de ye, ji xwe ji mêj ve amadeye. Heger Koma Neteweyan biryara firotina wê bide û Tirkiye jî qebûl bike, İraq dikare dest bi pompakirina wê bike.

Komîta Parastina Mafê Kurdan a Mirovî li Swêdê, li ser kuştina Wedat Aydın û bûyerên Dîyarbekirê Civînek çêkir. Serokê komîtê C.H. Hermansson di axaftina xwe de got:

*- Tirkiye binpeymanên navnetewî îmze dike û li dij teror, êşkence û zilm û zordestiyê ye. Lê, ew li ser Kurdan zilm û zordariya xwe ya nedîtî didomînin. Bûyera Wedat Aydin terorî û barbariya Tirkiyê carekî din eşkera kir. Tirkiye nikare bi derewan bixapîne. Gotin û pratîka Tirkiyê hevdu nagirin.*

Komîtê, Birayê Wedat Aydın, Wehbî aydin ji Parîsê vexwendi bû civînê û Wehbî jî di civînê de axaftinek kir.

**29'ê Tîrmehê**

Serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz daxuyaniyekê da û got:

*- Heger Amerîka û hevalbendên xwe biryara lêdana cihên çekên atomiyên İraqê bidin, ew nikarin di vî kar û warî de hêzên Çalak bi kar bînin. Avakirina hêzên Çalak ne ji bo vê yekê ye.*

**30'ê Tîrmehê**

Cara yekem Tirkiyê Ambargoyê qul kir.

Rojnameyên Tirk dan dîyar kirin ku Tirkiyê çawan bi dizî ambargoya li İraqê qul kirîye. Li gor nûçeyên rojnameyên Tirk, ji Tirkiyê rojê de 110 kamyonên barkêş di dergehê Xabûrê de derbasê aliyê İraqê dibin û barên xwe dibine bajarên Mûsil û Kerkûkê. Ji wir ji dibin Bexdayê. Wek berê jî çend car dîyar bûbûn ku Tirk ji destpêka şerê Xalîcê ve heta niha bazirganiya bi kar û dizî dikin. Yek bi sedî difroşin. Heta bi awayekî vekirî ew alîkariya ku ji penaber û derbederên Kurd re ji welatên Ewropa dihatin leşker û polîsên Tirk bi peran difrotine penaber û derbederan. Ji ber eşkerakirina vê yekê demek navbera Îngilistan

û Tirkiyê xirab bûbû. Rojnamevanê İngilis ji ber eşkerakirina vê yekê li Tirkiyê hat girtin û paşê wî avêtin derê Tirkiyê. Heta niha ev bazirganî bi dizî bû, hukimeta Tirk sansor li ser rojnameyên Tirk datanî û nedihişt ku li ser vê yekê binivîsin. Lê, êdî ev bazirganî weha mezin bûye ku Tirkiye nikare wê bi dizî bigire. Li gor gotinan, di rojê de ne 110, ji 500 kamyonî bêtir di dergehê Xabûrê de derbasê Iraqê dibin. Ji ber vê yekê êdî rojnamevanê Tirk dikarin li ser qulkirina ambargoyê binivîsin.

**31'ê Tîrmehê**

Konseya Bazara Ewropê ji bo alîkariya Kurdan biryara 11 milyon dolarî da. Îro paketa alîkariya Kurdan dîyar bû: 11 milyon dolar. Ev alîkarî ji bo ew Kurdên dorhêla Silêmaniyê ku di vê êrîşa dawî de ji ber hêzên Iraqê koçbarê nêzî tixûbên Iran û herêma Ewlekar kiribûn bû. Ji vê alîkariyê dê hinek ji bo nexweşxane, rê, av û elektrîkê bê kirin û qasî 3.5 milyon jî ji bo xwarina wan bêye belavkirin.

Delegasyona Koma Neteweyan a ku ji bo kontrolkirina çekên atomî û dûrmenzîl çûbû Iraqê, vegeriya Amerîka. Delegasyonê rapora xwe ya dawî pêşkêşî Koma Netewe yan kir. Di raporê de 46.000 aletên atomî û dûrmenzîl û 300 ton malzemeyê wan çekan tespît kirine. Navendiya çekên giran li herêma Motana ne. Iraqê cara berê, di lîsteya xwe de 12.000 ji van çekan dabû diyarkirin.

Ji Koma Neteweyan dê delagasyoneke ji 70 kesî pêk bê û ew herin Iraqê û qasî şeş mehan li Iraqê bimînin. Ev delegasyon dê di navbera du salan de, wan çekên kîmyewî û malzemeyên wan tehrîb bikin.

Koma Neteweyan li ser formila firotina petrola Iraqê xebata xwe didomîne. Li gor formilekirina proja firotina dê Iraq di 3 caran de petrola xwe bifroşe. Li gor nûçeyên ku




niha dîyar bûne dê cara yekem di xeta boriya Tirkiyê de petrolê bifroşe der. Ew hatina petrolê di kontoya Koma Neteweyan de li ser navê Sekreterê Giştî be. Bi tenê sekreterê Giştî dikare pere bide xerc kirin. Dê her meh Îraq rapora derxistin û firotina petrola xwe bide Konseya Ewlekariyê. Dê di salê de, bi 400 milyon dolar petrol bê firotin. Ji vê hatina petrolê hinek ji bo xwarin û îlaç bên standin, hinek ji çêkirina Kuweytê û hinek jî ji bo çêkirina nexweşxane û riyên Îraqê re bên xerc kirin.

TV ya Fransê li herêma Bexdayê bi xelkê re hevpeyvînek çêkir û ji rewşa xelkê hinek wêne weşand. Zarok birçî ne. Xela heye û gelek zarok û kal û pîr ji birçîbûniyê dimrin û nexweşiyên wek kolerayê dest pê kirîye. Îlaç nîne. Berpirsiyarê Xaça Sor a Swêdê jî, li Kurdistanê vegeriya Swêdê. TV a Swêdê bi berpirsiyarê Xaça sor re hevpeyvînek çêkir. Wî di hevpeyvîna xwe de kurtasî weha digot:

*- Li Kurdistanê bajar û avahî nemane. Rê tunin. Birçîbûnî heye. Zarok nexweş û birçîne. Divê gelê cîhanê ji bo xwarin û îlaç ji Iraqê re alîkariyê bikin. An jî dê qetlîam çêbe.*

Iro du roj in, ku Serokê Amerîka Bush li Moskovayê ye. Bush û Gorbaçov civîna bilind çêkirin. Di rojeva civîna bilind de pirsa kêmkirina çekên balastîkî û atomî, alîkariya civakî û aborî û pirsa Rojhilata Navîn hene. Wek tê zanîn dîsan di pirsa Rojhilata Navîn de pirsa herî sereke pirsa Filistîniyan e. Israîl qebûl kir ku bi Filistîniyan re di eynî maseyê de rûne, lê, li ser dê kê Filîstîniyan temsîl bike, li hevdu nakin. Di dema şer û di piştî şerê Kendavê (Xalîcê) her kesî digot; " heger pirsa Rojhilata Navîn bêt rojevê, divê pirsa Kurdan jî di nav de cih bigire." Lê, niha baş diyar e, ku pirsa kurdan li alîyekî, yek navê Kurdan jî hilnade ser zimanê xwe. Filîstînî dema bi Saddam re bûn yek, Ewropîyan digot " Filîstîniyan pirsa xwe firotin dan Saddam. Wan bi vê yekê dostên xwe wenda kirin. Bi kêmasî pirsa wan 50 salî bi paş ve ket" û hwd.. Lê ne weha bû. Niha hemû dewletên Ereb li ser pirsa Filîstîniyan bi hevdu re ketine hemberiyê. Kê bêtir Filîstîniyan û mafên wan biparêze...

Sovyet û Amerîka wek ku Kurd li Rojhilata Navîn tune bin pirsa Rojhilata Navîn digirin destê xwe. Hêzên Kurdan jî ji bo vê yekê hîç hewldanek nadin. Kurdên Kurdistana Iraqê ji xwe hemû hêvî û baweriyên xwe bi guftûgoyên xwe û Iraqê ve girêdane. Delegasyona wan hîn jî li Bexdayê ye. Lê, dengek jê nîne. Kurdên perçeyên din jî ji xwe dîyar e, ku pirs û derdeke wan yê weha nîne.

Wek tê bîranîn û zanîn dema avakirina hêzên Çalak de konsolosê Sovyetê li Ankarê li dij avakirina hêzên çalak derketibûn û gotibûn ku; *" Em naxwazin li nêzî tixûbên me hêzêk weha bêt çêkirin."*

Îro Sovyet carek din daxuyanî da ku; " Hêzên Çalak ji bo wan hatiye avakirin."
Li ser vê daxuyaniyê berdevikê Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Tirkiyê Rıfat Ataman, bersiva Soviyet da û got:

*- Hêzên Çalak ne ji bo Soviyet hatiye avakirin. Soviyet ji bo vê yekê paxafan neke. Soviyet cîranê me yê herî baş e. Hêzên Çalak ji bo parastina tixûbên me û Îraqê hatiye avakirin. Heta bi îzna me nebe tu kes û hêz nedikare hêzên Çalak bi kar bîne.*

Gerîllayên PKK îro li Misriç (Kurtelan), Batman, Bedlîsê û gelek cihên din êrîş birin ser qereqol û cihên petrolê. Tren û çend kamyonên barkêş şewitandin. Di navbera wan û leşkerên Tirk de şer derket.

## Pirsa Kurd dinyayê îmtîhan dike!

Ji 8-mehan bêtir e, ku rojeva sîyaseta cîhanê bi bûyerên Rojhilata Navîn ve girêdayîne.Du babetên bingehîn ji nav pirsên heremê,bûne yên serekî, ku bala tevayiya cîhanê kişandine ser xwe. Ya yekem pirsa Kuweytê û ya duwem jî pirsa Kurd.
Pirsa Kuweytê bi mehan di nûçeyên danezanên ragihandinê de, aktuelîta xwe ya yekem parast heta çareserkirina wê. Di demên dawî de, tevayiya ajansên dinyayê, rojname, televîzyon û radyo nûçeyên xwe yên yekem li ser rewşa Kurdan pêşkêş dikin. Lê, gava mirov li siyaseta cîhanê,li ser van her du pirsan temaşe dike, ferqeke mezin jî di navbera wan de keşf dike. Gerek li her du pirsan, bi çavekî rastane û bê mêl, bê meyze kirin û lêgerandin. Gava di 2-ê Tebax a 1990-î de hêzên leşkerî yên Bexdayê,Kuweytê wergirtin, tevayiya cîhanê rabû ser piyan û bangkir:

*"Em neheqîke wusa qebul nakin!"*
Ev biryara xwe xistin pratîkê jî. Di navbera çend rojan de Yekîtiya Netewan biryar li pey biryar, li dij Iraqê wergirt. Pêwendiyên aborî yên rejîma Bexdayê bi welatên derve re birin. Ambargoya borî danîn ser tiştên ku Iraqê difrotin der. Dîroka reş a BAAS a faşîst û serokê wê yê xwînxwar Saddam kete devên dîplomatên dinyayê. Bush, Major, Shevardnadze, Teatcher û gelek serok û wezîrên derve yên navdar, perwerdebûna dîplomasî dane alîkî û bi xeberên herî dijwar Saddam bi nav kirin. Nêzîkî 30 dewletan leşkerên xwe bi rê kirin heremê ji bo rizgariya Kuweytê. Piştî şerekî ezmanî bi meh û nîvan û şerê erdê ya 100-saetan serxwebûna Kuweytê careke din pek anîn. Serokê DYA Bush, ji bo Rojhilata Navîn planeke nû anî zimên: "Sîstema nû." "Sîstema nû" dihate mana demokrasiyê, dihate mana mafê netewan, dihate mana mafê mirovan, dihate mana ...hêviyên bi milyon mirovan, ji bo dinyake wekhevî, di nav aştî û ewletiyê de... Wek peyv her tişt gelek xweş bû, xweş dihat guhan û xweş jî dihatin dîtin. Lê, pirsa netewê Kurd, bi serfirazî û trajediya xwe bi yekcarî ev hemû peyv û sozên Yekîtiya Netewan, Hêzên Hevkar û di serî de Amerîka, xiste îmtîxanê . Ev ji du mehan zêdetir e, ku tatêla bersivê xwediyê "Sîstema nu" ya dinyayê girtiye. Her kes niha li hêviyê ye, gelo sozên dewletên xwedî giranî wekî DYA, YKSS, Brîtanya, Fransa, Çîn û yên din tenê peyvên vala bûn, yan dê derbasê jîyana bibin. Hemû dinya ji îro ve dizane bê çareserkirina pirsa Kurd a ku di rojeva siyaseta cîhanê de girîngtirin pirsa netewî ye, dê "Sîstema nu" bi tenê wekî hîleyeke taktîkî bimîne...

## Serfiraziya netewê Kurd û berpirsîyariya cîhanê

Netewê Kurd, ji bo bidestxistina mafên xwe yên netewî li hember rejîmên Bexda yên faşîst ji 30-salan zêdetir e, şerekî mafdar ji bo jîyaneke aştî û serbixwe dide.Ev rastî ji aliyê tevayiya dinyayê ve tê naskirin. Lê, tû caran menfaatên dewletên super û xwedî giranî, bi daxwazên tevgera rizgarîxwaz a netewê Kurd re nebûne yek. Eger, carna pêwendî yên taktîkî jî hatibine danîn, di dawî de Kurd dîsa bi tenê mane. Cara yekem di dîroka tekoşîna Kurdistanê de, tevayiya cîhanê bi yekdengî, ji bo pirseke din pêşberê dewleteke degîrkera Kurdistanê rawesta. Heta, şer bi xwe jî, li dij bi kar anîn. Iraq a ku sîstemeke çekdarî ya giran pêk anî bû, xesareke mezin a leşkerî dît. Lê, bi rawestandina şer re, hat dîtin ku peyv û sozên hatibûn dan di dema şer de, tû giraniyan wan nemaye. Li gor axaftina Bush û gelek serokên din:

*"Divê Saddam berpirsiyariya xwe ya xwînrêjiyê û sedema derketina şer dabane, di dadgeheke navnetewî de cezayê xwe dîtibana".*

Wusa çênebû! Dîsa li gor gotinên Hêzên Hevkar:
*"Heta Saddam li ser hukim biman, tû îmkanên levhatin û pêwendiyan bi Bexdayê re çênedibûn".*
Wusa nebû!. Di 11'ê Nîsanê de Yekîtiya Netewan biryara şer rawestandinê qebûl kir.

Neteweyê Kurd û pêşmergeyên wî yên qehreman, hîn berê danîna çekan di navbera Hêzên Hevkar û Îraqê de tekoşîna xwe li dijê Bexdayê bihêz kirin. Bi taybetî piştî danîna çekan di şerê Xelîcê de, tevayiya netewê Kurd li başurê Kurdistanê rabû ser piyan. Her

roj, wan mizgîniyên rizgariya axa Kurd, gihan din, tevayiya hemwelatiyên xwe. Bi rastî jî, ferqek mezin di navbera serxwebûna Kuweyt û Kurdistanê de hebû. Ya yekem Kuweyt, ne tenê bi alîkarî, lê bi amadebûna hêzên leşkerî yên bi dehan dewletan hate rizgar kirin. Xwîn li Kuweytê, zêde nehate rejandin. Pêşberê Saddam dîsa Ereb hebûn û wî destên xwe bi celadî dirêjî xwîna Kuweytiyan nekir. Armanca Bexdayë petrol bû, hêzbûna aborî bû...Û dinyayê musaeda vî tiştî neda. Sîstemeke aborî di vê herema dewlemend de hatibû danîn û kesî nekarîbû, destên xwe dirêjî xerakirina vê sîstemê bike. Saddam dixwest destdirêjiyan bike... Ew dest hate jêkirin!..Lê,gava`Kurdistan hate rizgar kirin, tû leşkerên dewletek jî bi alîkariya gelê Kurd ve nehat. Yêkîtiya Netewan çavên xwe girtin.Tû dewletên xwedî giranî yan jar, piştgiriya xwe bi vê serfiraziyê re ne anî ziman. Hêzên Saddam ên xwînxwar dest pê kirin ,ku çekên giran li hemberê Kurdên siwîl jin, pîr û zarokan bi kar bînin...Deng ji tû dewletî nehat. Yekîtiya Netewan Bexdayê protesto nekir...Gava 11-raketên Scud, di şevekê de ber bi Kerkûkê ve hatin teqandin, sîstemên Amerîkî û Sovyetî, di ezmanan de ev êrîş tesbît "nekirin." Serokê leşkerî yê Hêzên Hevkar, Norman Sharzkopf, rejîma Bexdayê ji ber van êrîşan mehkum nekir û ne got "Hûn nikarin balafirên êrîşan, helîkopteran û çekên din ên giran, peşberê insanên Kurd ên siwîl bi kar bînin! Heta da diyar kirin ku "generalên Saddam, ew xapandin e"(!). Qesra Spî ya Waşîngtonê, tehdîdên xwe nîşanî Îraqê nekirin, wan gotin ku :*"Ev şerekî hundurî ye û em nikarin bi vê pirsê ve mijûl bibin û mudaxele bikin!"* Rewşa Brîtanya ji xwe diyar bû, hevalbendiya Amerîka dîsa xwe dida axaftin, tawrê wan bi yê

Amerîka re bû yek. Dîtina Sovyet li ser pirsê, bi naveroka xwe ve negatîv bû. Yên Çînê hîn zêdetir bû. Welatên ku problemên wan ên netewî hebûn, eciziya xwe ji Kurdan derdixistin(!)

**Kanî wijdanê dinyayê !**
**Kanî wijdanê YN !**
**Kanî wijdanê M-r Bush !**

Bi encamên van hemû tiştên jorîn û gelekên din wekî tawrê Ereban, li ser pirsa netewî Kurd lempa kesk ji Saddam re hat pêxistin. 4 milyon rûniştvanên başurê Kurdistanê yên ku bi dest û hêza xwe, axa welatê xwe girtibûn, bi tenê hatibûn hiştin. Serfiraziya wan, ji alî dinyayê ve bi bêdengiyeke şermî û bêprensîpiyek dihate taqîb kirin. Diyar bû axaftinên li ser wekheviya netewan, tenê li ser ziman dimînin... Ev rastî ji bal Saddam jî hate dîtin...û. ..wî jî...hemû giraniya xwe ya çekdarî, bi alîkariya amadebûna Filistîniyan, "Mucahidînê Xelk", Urdiniyan û hwd. re bire ser tevayiya rûniştvanên Başurê Kurdistanê. Li gor daxuyaniya Eniya Kurdistana Îraqê, tenê li cihekî 3000 - Kurd, dihatin gulebarankirin. Bi dehan malbat bi saxî dihatin şewitandin. Lê vê carê, ne tenê Kurdan behsa van qetlîaman dikirin. Bi sedên rojnamevanên biyanî yên ku ji bo rizgariya axa netewê Kurd bibînin li Kurdistan bûn, ev êrîş bi çavên xwe di dîtin.Yek ji wan rojnamevanekî BBC-wusa bûyerên pêkhatî di anî zimên:
*"Leşkerên Îraqê, gava êrîşên xwe anîn ser Kurdan, Weha diqîriyan:*
*" Van bikujin! Bikujin! Hemûyan bikujin!.."*
Û kuştine. Zarok kuştine, jin kuştine, pîr kuştine...Her tiştê Kurd be û girêdayiya Kurdistanê pê

hebe, dane ber fîşekan...Rojnamevanê BBC dipirse. "Kanî wijdanê Dinyayê, kanî wijdanê Yekîtiya Netewan, kanî wijdanê Mîstir Bush?"
Netewê Kurd ê ku di vê realîte û rastiyê de dijî û li ber her êrîşên ne insanî yên dagîrkerên Kurdistanê, bi hezar û deh hezaran zarokên xwe şehîd dide, carek dî dipirse: "Kanî wijdanê te,ey dinya?"

Cara yekem, di dîroka têkoşîna rizgariya Kurdistanê de, hemû danezanên ragihandinên cîhanî, bi awakî gelek fereh pirsa Kurd girtin destan. Li ser rûpelên rojnaman, di mîkrofonên radyoyan û di ekranên televizyonan de, rastiya Kurdan hate ber çavên dinyayê. Her kesî dît, ku di çi warî de, neteweyek dijî ,li ber xwe dide...û çi metod li hemberê wî tê bi ka ranîn. Di demeke kurt de, van tiştan tesîra xwe jî da nîşandan. Serokê DYA Bush ê ku di dema şerê Xelîc de pişgiriyek xurt ji gelê Amerîkî girtibû, ev populerîta xwe roj li pey roja ji bo rewş û pirsa Kurdan wendakir. Di statîstîkên, ku hatin çêkirin de, ji aliyê dezgehên cuda ve, derket ku ji % 74 xelkê DYA li gel siyasetek aktîvtir e ji bo pirsa Kurd. Li gelek welatên Ewropa, rêxistinên ji bo piştgiriya Kurdan hatin damezrandin. Bi sedhezaran Kurd ê ku li derveyî welat dijîn, bi yekdestî xwediyê bûyerên Başurê Kurdistan derketin û bi çalakiyên cur be cur tesîr li raya giştî, li welatên ku dimînin kirin. Tiştekî xerîb, ji bo Ewropayiyan, hema hema li hemû welatên Rojava, grevên birçîbûnê pêk hatin.

Bi kombûna van numuneyên jorîn, di rojeva siyasî de pirsa Kurdan, roj bi roj zêdetirin hat axaftin û muneqeşe kirin. Di destpêkê de, ji Fransa Wezîrê Mafê Mirovan Koucher çû herêma "penaberên" Kurd, ku di navbera sînorê başûr û Bakurê Kurdistan de (Îraq û Tirkiye) dimînin. Piştî ku wî dît bê rewş di

çi warî de ye, ji bal Fransa ve siyasetek aktîvtir dest pê kir. Di siya vê de Fransa li ser pirsa Kurd pêşnîyarî ji Yekîtiya Netewan, kir û biryara 688 a YN hate girtin. Cara pêşîn, eger piraniya naveroka wê li ser pirsa penaberî û protestoya êrîşan jî be, Komîta Ewletî ya YN biryarek li ser Kurdan digirt. Ji derveyê wê pirs weke pirsa Kurd dihat rojevê û rê ji bo girtina biryarên nû jî vekirî dihat hiştin.

Baker, wezîrê Derve yê DYA jî dihat ser sînorê başûr û bakurê Kurdistanê. Wî, tiştên dîtin wekî trajediya insanî binav kirin. Piştê vegera Bajker, ji sînor, wekî ku dîplomatên dinyayê dibêjin "Pira alîkariyê" hate çêkirin. Ji welatên Ewropa û ji DYA her roj qala birêkirina bi dehan balafirên xwarin, cil û dermanan tê kirin. Hatina nêzîkî 500.000 insanan ser sînor di navbera Tirkiye û Iraqê de,li gel xwe problemên nû jî anîn. Ankarê beyan da ku nikare xwedî hevqas xelk bibe û daxwaza çareserkirina pirsê ji YN û dezgehên din ên navnetewî kir. Rewşa İranê hîn jî tarîtir bû, zêdeyî 1,5 milyon insan ber bi sînorê İranê çûn .Çareyeke navnetewî Tehranê jî anî rojevê. Li aliyên din bi milyonan Kurdan digotin ku "bê garantiya nav-netewî û heta ku Saddam li ser hukim be, ew ê nevegerin mal û bajarên xwe." Di nav wan de, yên ku bi dehan zarokên xwe binax dikirin, ji rojnamevanên dinyayê re digotin:

*"Pêwîstiya me ne nan û av e, pêwîstiya me azadî ye"...*

**Pirsa Kurd pirsa man an nemana netewekî ye**

Her kes dizanê, ku axa Kurdistanê çi dewlemend e. Eger li ser axa xwe di nav aştî û ewletî de bijî, eger serbixwe be li ser erdên xwe Kurd dikarin, alîkariya aborî

ji bo welat û insanên xewce bikin. Pirsa Kurdan pirseke netewî ye û ji bo vê çendê bi xwe, Saddamê xwînxwar van êrîşên xwe bê xesab û kitab dibe ser wan. Zarok, jin û pîrên Kurd, ji bo vê çendê bi çekên kîmyewî têne jehrkirin. Na xwe eger pirs pirsa hundurî ya Îraqê bana, ne ev zulm dihate kirin, ne ax dihatin jehrkirin, ne jî ev trajedî derbasê jîyanê dibû. Ne bi sedan zarokên Qaladizê di bin bombên napalm de can didan, ne Helepçe bi 5000 insanan ve dihat şehîd kirin!...

Pirsa Kurd pirsa demokrasiyê, parastina mafên mirovan, mafê çarenûs ê netewan e... Wijdanê teva yiya dinyayê, anîye ser masê, ku bi berpir- sîyariya xwe rabin. Du rê di vê babetê de nînin. Pirs, pirsa man an nemana netewekî ye. Yan dinya dê bi berpirsîyariya xwe ya pêwîst rabe, yan jî dê bibe xwediyê rûyekî derewîn... Hilbejartin di destên wan de ye...

*Cemal Batun*

**1'ê Tebaxê**

Nûçegîhanê Rojnameya Tirk Milliyet Namik Durukan li Îranê bi berpirsîyarê PKK'ê herêmê ve hevpeyvînek çêkir. Li ser pirsên Namik Durukan berpirsîyarê PKK Cemîl Bayık bi kurtasî van tiştana digot:

*- Li nêzî tixûbên Tirkiye-Îran û Îraqê qasî 20 kampên me yên perwerdeyî yên seyar hene. Berê em li çol û çiyan bi xurt bûn. Piştî ku dewletê gundên nêzî tixûbên Tirkiye - Îraq û Tirkiyê Îranê rakir û xelkê wan deran bi darê zorê çûn bajaran, êdî bi şûn ve em li bajaran jî bi hêzbûn. Niha*

*em li gelek bajaran çalakiyên girsî û mezin pêktînin. Herweha ne li bajarên Kurdistanê, li bajarên Tirkiyê jî em dikarin çalakiyan pêk bînin.*

Li ser pirsa têkilîyên wan û rêxistinên Kurdistana Iraqê jî C. Bayik weha bersiv dida:

- *Partî û hêzên Kurdistana İraqê hevalbendên împeryalîstan in. Ji wan tiştekî dernakeve. Li wê derê jî partîyek nêzî me hatiyê avakirin, navê wê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) e. Heta ji destê me bê em dê alîkariya PAK'ê bikin. Ji aliyê din ve rizgirtina me ji bîrûbaweriya gelê me re heye. Heger gel nexwaze Amerîka û hêzên Hevkar ji Kurdistanê derbikevin, em dê dengê xwe dernexin. Û em naxwazin êrîş bibin ser hêzên Çalak jî.*

Li ser kirinên li Kurdistanê jî Cemil Bayik weha dîtinên xwe danîn zimên:

- *Li Kurdistanê gelek mirovên sivîl ji aliyê hêzên me ve hatin kuştin. Ev tiştekî nebaş bû. Ji vir şûn ve dê kiryarên û bûyerên weha nebin.*

İran li dij bi cîhkirina hêzên Çalak derket û got:

- *Em naxwazin li nêzî tixûbên me, li Tirkiyê hêzên Çalak pêk bê. Amerîka şeytanîyek din difikire.*

**2'ê Tebaxê**

Bush hîn jî li Moskovayê ye û di navbera wî û Gorbaçov de guftûgo dom dikin. Îro yeksaliya salvegera dagîrkirina Kuweytê bû, ku ji aliyê Saddam ve pêk hatibû.

Bush li ser vê salvegerê daxuyaniyeke da û got:

- *Hîn plana Amerîka ya Rojhilata Navîn negihêştîye armanca xwe. Divê Îraq ew çekên ku di destên wî de heye hemû teslîmê Koma Neteweyan bike. Li rojhilatê Behra Spî pirsa Qibrisê çareser bibe, pirsa Filîstin û Îsraîl jî bigehê encameke pozîtîv Dê di meha Cotmehê de ji bo vê yekê Konferansa Rojhilata Navîn pêk bê...*

Kuweytiyan dagîrkirina salvegeriya xwe bi çek protesto kirin. Bi otomobîlan di nav bajêr de, bi sloganên; " Xwedê mezin e û Saddam dijminê wî yê mezin e." qîriyan.
Komîta Ewlekariya Koma Neteweyan hîn jî li ser prensibên firotina petrola Îraqê gotûbêj û guftûgoyan didomîne. Li gor ew prensîbên ku li ser dipeyîvin; divê kontrola firotina petrolê di bin destê Koma Neteweyan de be, Îraq her meh rapor bide Komîta Ewlekar, ew tiştên ku bi wan pereyên petrolê tên kirîn divê dîsa di bin kontrola Komîta Ewlekar de be. Koma Neteweyan bê vîze û îzin dikare bikeve Îraqê. Bi helîkopterên xwe ve dikare li Îraqê bigere û dikare cihên çekên kîmyewî atomî tahrîb bike...

**3'ê Tebaxê**
Ji bo konferansa Îslamî wezîrên derveyên dewletên Îslam hatin Stanbolê. Konferansa Îslamî sibehê dest pê dike. Lê îro wezîrên herçar dewletên dagîrkerên Kurdistanê di nav xwe de civînên taybetî yên çarqolî pêk anîn. Di hinek civînan de Misir û Suudî jî beşdar bûn. Armanca van civînên taybetî pirsa Kurd, parastina tixûban, pirsa çemên Firad û Dîcle û rakirina ambargo ya aborî ya ku li ser Îraqê heye...
Qasî ku çapemenî pê hesîya, Îraq di van civînan de dixwaze dewletên Îslam biryara rakirina ambargoyê bigirin.

SADDAMS FOLKMORD 23

# lyser i deras ögon



'ILL BARA SKRIKA.

Barn med förstörda ansikten. Barn som förlorat sina armar, ben, händer och fingrar.

Barn med krossade ryggar, barn med bombsplitter i magen. Blinda, napalmbrända barn.

Barn som bara har några timmar kvar att leva.

## En skakande rapport från Saddam Husseins krig mot kurderna

Welcome to Kurdistan,

Vi hör sporadisk artillerield.

İran li dij hêzên Çalak radiweste û dibêje; " divê ji der ve mudexeleyên İraqê neyê kirin û bila xelkê İraqê Saddam bixin..." Tirkiye jî bi pirsa Kurd re dixwaze pirsa Qibrîsê jî bîne rojeva konferansê û biryara piştgirtinê ji konferansê der bixe.

Sibehê dê Turgut Özal Konferansê vebike û konferans dê 4 roj dom bike.

Koma Neteweyan xebata xwe ya ji bo kontrol û tahrîbkirina çekên İraqê didomîne û çarçova qerar û prensîban tespît dike.

Li Tatwanê, li çîyayê Nemrûdê bi çek avêtin kampên turîstên Elman . Ji wan 10 rehîne girtin û 5 jî xwe bi lingên xwe xelas kirin. Dewleta Tirk vê bûyerê dike ser PKK. Dibêjin ku ; " Elmanya 104 mirovên PKK bi salan in ku girtîye û wan bi terorîzmê tawanbar dikin. Niha bi vê bûyera Tatwanê, PKK dixwaze wan turîstan re biguhêre.."

Tirkiyê li herê dest bi operasyonên mezin kir. Ji bo rizgarkirina turistên Elman Tirkiye û Elmanya bi hevdu re xebatekê dijwar dikin. Ji aliyê din ve ew Elmanên ku wek turîst ji xwe re cih veqetandibûn ku herin Tirkiyê semestirê, ji niha ve dest pê kirin û bilêtên xwe îptal dikin.

**4'ê Tebaxê**

Turgut Özal li Stenbolê konferansa İslamî vekir. Di axaftina xwe de pêşnîyara rêxistineke İslamî kir, ku wek ya Yekîya Pêşketin û Ewlekariya Ewropê ya pê ava kirin.

Çend parlementerên Partiya Yekîtî ya Sosyalîs li ser kuştina Wedat Aydin û bûyerên Dîyarbekirê çûn Dîyarbekirê. Piştre ew çûn ba waliyê Dîyarbekirê Hayri Kozakçıoğlu. Kozakçıoğlu jî zîyaret kirin. Kozakçıoğlu li ser pirsa Kurdan weha digot:

- *Ne bi tenê ziman divê dibistanên kurdî jî vebin. Heta partiyên Kurd divê bên avakirin.*

Li ser van dîtinan ji Kozakçıoğlu pirsîn:

- *Ma ji ber ku HEP pirsa Kurdan ve zêde mijûl dibe,*

*hûn dixwazin wê bigirin, Ev çawan dine gelo?*
*Kozakçıoğlu:*

*- HEP partiyeke tevlîhev e. Ba ji ku de bê, bi wê ve dere....*

PKK li Şemdînlî 9 leşker û 3 caş kuştin. Ordiya Tirk di herêmê de dest bi operasyonan kir. Îsmail Beşikçi ji bo pirtûka xwe hat girtin. Sedemên girtina Beşikçi teşvîkkirina terorîzmê tê şandin.

**5'ê Tebaxê**

Partiya ANAP li ser bûyerên li Şemdîniyê ku 9 leşker û 3 caş ji aliyê PKK ve hatibûn kuştin civiya. Ji aliyê din ve PKK çend roj berê gotibûn ku " em merkeza xwe ji Lubnanê tînin Kurdistana İraqê."

Piştî civînê, rojnamevanan ji serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz pirsîn:

- Gelo dê li derê tixûbên me operasyon dest pê bikin?

Serokwezîrê Tirk, bi yek hevokekê bersiva wan da:

- *Çi pêwîst be, dê bêkirin!*

**Ordiya Tirk dîsan ket Kurdistana İraqê**

Lê, danê êvarê radyoya Merhaba ku li Swêdê bi tirkî weşandike û tekst TV ya Swêdê, nûçeyê xwe de dibêjin ku *"ordiya Tirk 20 km ketiye nav axa Kurdistana İraqê û li wir dest bi operasyon kirîye."*

PKK da dîyar kir, ku têkiliyên wê bi turîstên Elman ve tune. *"Heger partî bi çewtî jî vê yekê bike, dê çewtiya xwe rast bikin. Ji ber ku em li dij gelê Elman nînin. Lê dibe ku grûbên din bin, an jî diz û kesên ne sîyasî bin."*

**6'ê Tebaxê**

Ordiya Tirk 20 km bêtir ketîye nav axa Kurdistana Îraqê. Berê bombe dibarînin û paşê jî bi erdê re leşkerên komando êrîş dibin cihên pêşmergeyên Kurd. Serokwezîrê Tirkiyê Mesud Yılmaz bi awayeke eşkere negot êrîş birine nav axa Kurdistana Îraqê an na. Lê, wî li ser pirsa rojnamevanan got ku:

- Pêwîst nîne ku em ji Îraqê musaade bigrin an na. Heger pêwîst me em dikarin bikevine nav axa Îraqê. Ma Amerîka û Îsraîl, dema pêwîst dibînin, diçin di nav dewletên din de operasyonan çêdikin û tên; lê çima em neçin? Ordiya Tirk serbest e. Her dema ku bixwaze dikare li derê tixûbên xwe operasyonan çêbike...

Gerîllayên PKK saet di 9'ê êvarê de êrîşeke mezin bir ser merkeza bajarê Hezexê (Îdilê). Bi roketa qerargayên leşkerî û polîsan gulebaran kirin. Şer di nav gerîlla û ordiya Tirk de 18.30 dom kir. Encama şer hîn ne dîyar e. Ordiya Tirk ji her alî ve derdor li bajêr digire. Elektrîka bajêr hatiye birîn û hatin û çûndin qut bûye.

Li ser revandina 10 turîstên Elman, berpirsiyarê ERNK Alî Sapan li li Elmanyayê preskonferansek pêk anî û dîyar kir ku:

- Ji grûbek gerîllayên wan turîstan girtine. Niha turîstên Elman li gel wan in û rewşa wan gelek baş e. Ji bo berdana wan daxwazeke wan ji dewleta Elman tune. Bila dewlet li herêmê operasyonan rawestîne, em dê turîstan berdin.

Bülent Ecevît prenskonferansek da ku:

*- Min berê jî gotibûn. Welatên Rojava dixwazin li bakurê Îraqê dewleteke hefsarkêş çêbikin. Divê Tirkiyê ne bi Kurda re têkilî deyne, tam ziddê wê divê bi Îraqê re têkiliyan geş û xurt bike. Îktîdarê weha nekir. Niha hêzên Rojava dixwazin ji PKK re alîkariyê bikin...*

Hê jî wezîrên Karûbarên derveyiyên dewletên Islamî li Stenbolê ne. Operasyona Tirkiyê ya li nav axa Kurdistana Iraqê bala wan jî dikşîne. Li gor rojnamevanan Iran operasyonê di cih de dibîne û Suriye li dij derdikeve. Hîn dîtinên wezîrên din ne dîyar e.

**7'ê Tebaxê**

Wezîrên Tirkiyê li ser operasyona nav axa Kurdistana Iraqê civiyan. Piştî civînê Serokwezîr Mesut Yılmaz bersiva rojnamevanan da.

*- Piştî şerê Kendavê (Xalîcê) valahiyeke sîyasî û leşkerî li bakurê Iraqê pêk hat. Terorîstan ji vê yekê fêde dîtin û di van rojên dawî de li derdora Hekariyê 9 leşker kuştin. Me emîr daye komutanê giştiyê Tirkiyê, dê di demeke gelek kurt de ordî dê pirsê çareser bike. Pêwîst e, ku ewlekarî û parastina Tirkiyê pêk bê.*

Li gor agahdariyên meqamên resmî, Tirkiye êdî ji wê herêma ketiye dernakeve. Di her 5km'yî de qereqolek çêdike. Ji vir şûn de dê ordiya Tirk li wir bimîne.
Komutanê giştiyê ordiya Tirk jî daxuyaniyek da ku:

*- Ji roja 4'ê Tebaxê ve ordiyê dest bi operasyonan kiriye. Li gor tespîtên me 5 kampên PKK yên cuda cuda li bakurê Iraqê hene û di wan kampan de qasî 600-700 gerîlla hene. Hedefa me paqijkirina wan e. Balafirê şerê ji bajarên Malatya, Batman û Dîyarbekirê radibin. Balafirên F-4, F-104 û helîkopterên modern gule dibarînin. heta niha 92 sefer kirine. Di operasyonê de 20.000 leşkerên komando û 1000 caş cih girtine.*

PKK bi roketan helîkopterek xistiyê û li Batmanê jî çend bomba ji balafiran ketine,. Hin yek nizane zerar û zîyan gelo çi ye.

Her kes meraq dike gelo hêzên Çalak ên ku li Batman û li Silopiyê ne, ew jî mudexeleyê operasyonan dikin an na? Rojava bê deng e. Lê, li gor nûçeyan hêzên welatên Rojava dibêjin ku; " *PKK û gelê Kurd ne yek in. Em ji bo parastina gelê Kurd hatine.*"

PDK-Î daxuyaniyek da ku ordiya Tirk di dema gulebaranê de kampên penaberan dane ber guleyan û 29 penaber hatine kuştin. Û ne razîbûna xwe dan dîyar kirin.

Celal Talabanî li Romayê, oprerasyona Tirkiyê bi zimanekî dîplomatîk protesto kir.

Alîkarê wezîrè Karûbarê Derveyî yê Îraqê Saîd, li Stenbolê got:

- *Leşkerê me li jorê paralela 36 hîç nîne. Bi tenê çend polîsên me hene. Niha ez ji vê yekê ne agahdar im.*

Li gor ajansan di şerê bajarê Hezexê de 70 gerîlla beşdar bûne. 5 leşker û 4 gerîlla hatine kuştin û 2 leşker jî birîndar bûne. Lê çûndin û hatina bajêr hîn jî qedexe ye. Lê, li gor PKK, ordiya Tirk gelek kesê sivîl qetil kirine û laşên wan ji raya giştî vedişêrin.

**8'ê Tebaxê**

Serokatiya leşkeriya Tirkiyê di derheqê operasyona de daxuyanî da ku şer dom dike û gerîllayên PKKê ber bi tixûbên Îranê ve direvin.

Berdevika wezaretên Tirkiyê, Îmran Aykut; " em herêmê ji PKKê paqij dikin."

Li ser pirsa rojnamevanan ku li herêmê bi tenê PKK tune xelkê sivîl jî heye?

Îmran Aykut:

- *Ew ew kesên ku li herêmê ji PKKê re alîkariyê dikin sivîl nayêne hesab kirin. Kî dibe bila bibe em wan jî bombe dikin.*

Li Stenbolê di konferansa İslamî de, li ser pirsa operas yonên ordiya Tirk gotûbêjan îro jî dom kir. Tirkiyê carek din got ku *" em naxwazin İraq perçe bibe."*
Wezîrê derveyî yê Tirkiyê û yê Suriyê li ser vê pirsê hevdîtinekî taybetî pêk anîn.
Li gor rojnameyên Tirkan hedefên kampên PKKê satalîtên Amerîkayê li herêmê tespît kirine. Fotografên wan kişandine û dane ordiya Tirk. Helîkopterên Amerîka yên keşîfê her tim di li ser herêmê difirin.
Li Ankarayê Celal Talabanî û li Zaxoyê jî berpirsîyarê PDK-İraqê daxuyanî dan ku *"eleqetên wan li gel PKK hîç nîne. Ew Kurdên İraqê ne û li herêma xwe dawa otonomiyê dikin. Ji ber vê yekê jî ew nahêlin tu terorîst bên û li nav axa wan bi cih bibin."*

**9'ê Tebaxê**

Elmanyayê noteyeke protestoyî da Tirkiyê ku ketiye nav axa Kurdistana İraqê û xelkê sivîl bombebaran dike. Di protestoya xwe got ku:

*- Tirkiye peymanê Helsînkiyê îhlal dike û dikeve nav axa dewleteke din û însanên sivîl qetil dike. Em dê vê rewşa êrîşkar a Tirkiyê bînin civîna Konseya Ewropayê jî.*

Swêd û Swîsrê jî bi zimanekî dîplomatîk êrîşa Tirkiyê protesto kirin. Swîsrê ambargoya çekfiroinê li ser Tirkiyê danî.
Turîstên Elman hatin bajarê Stutgardê. Yekê ji wan ji BBC re weha digot:

*- Gerîlla ji me re gelek baş bûn. Bi taybetî ji yên zarok re. Dema bi şev wan cihên xwe diguhart, zarokan dikirin pişta xwe û dibirin. Pirsa Kurdan gelek girîng e. Bi rastî*

*em nizanibûn li ser Kurdan hewqas zilm û zordarî heye. Ez bawer im ku Kurd dê bigihên mafê xwe...*

**10'ê Tebaxê**

Operasyona ordiya Tirk li Kurdistana Iraqê dom dike. Tirkiye di her 5 km'yî de dest bi çêkirna qereqoleke dikin. Li gor ajans û rojnameyan Tirkiyê êdî zû bi zû ji axa Kurdistana Iraqê dernakeve. Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Tirkiyê Sefa Giray dibêje ku:

*- Heta herêm ji terorîstan neyê paqijkirin em ordiya xwe ji wir ji paş ve nakşînin. Divê em pirsê di carekî de çareser bikin.*

**11'ê Tebaxê**

Ordiya Tirk li Kurdistana Iraqê operasyonan didomîne. Di derheqê operasyonan de agahdarî nade û sansur li ser çapenemiyê heye.

Balafirên Koma Neteweyan dê di ser Iraqê de bifirin û ji hewa de xebatên leşkerî û çekên Iraqê kontrol bikin. Balafirgeh li Suudî ne. Dê ji wir balafir rabin û li ser Iraqê bifirin û keşîf bikin. Di vî warî de çar helîkopterên Alman jî dê bi kar bînin.

**12'ê Tebaxê**

Operasyon dom dike. Wezîrê Ewlekariyê Tirkiyê Doğu Barlas di derheqê operasyonan de agahdarî da:

*-Heta niha leşkere û caşekê me hatine kuştin û ji PKKê jî 35 kes hatine kuştin. Heta ku dawiya "terorîstan" neyê dê operasyon dom bike.*

**13'ê Tebaxê**

Operasyona Tirkan hîn jî li Kurdistana Başûr dom dike. Ordiya Tirkiyê xwe bi ber tixûbê Îranê ve dimeşe. Şer di nav gerîllayên PKK û Ordiya Tirk de car caran germ dibe. Tê gotin ku PKK ji kampên xwe yên Îranê destek distîne.

3 rojnamevanên Tirk kampa PKK li li Kurdistana Îraqê zîyaret kirin. Ji wan yek jî nûçegîhanê rojnameya Hurriyetê, Farûk Balikçi bû. BBC bi Faruk Balikçi re bi telefonê hevpeyvînek çêkir. Farûk Balikçi:

*- Kampa PKK nêzî tixûbê Îranê di çiyayekî asê de bû. Berpirsîyarê kampê Osman Öcalan me qebûl kir. Di kampê de qasî 100 kesî gerîlla hebûn. Ew 7 leşkerên ku li Şemdînliyê dîl girtibûn bi me şan dan. Li gor gotinên wan di şer de heta niha 4 gerîlla hatine kuştin û 6 birîndar dane. Digotin ku şer de ordiya Tirk wenda kir û dê bike. Gelê Kurdistana Îraqê bi me re ye. Herêma tampon ordiya Tirk xilas nake.*

Li Qurtelanê ji bo pîrozkirina 15ê Tebaxê bi hezaran kes xwestin meş û mitîngek pêk bînin. Şer di nav xelkê û leşker û polîsên Tirk de derket û sivîlek hat kuştin.

Berpirsîyarê PDK-Îraqê li Dîyarbekirê daxuyaniyek da û got:

*- Em îzin nadin ku PKK li Kurdistana Îraqê bi cih bibe. Tirkiye divê ji me re alîkariyê bike û ji her alî ve welatê me ava bike.*

Koma Neteweyan biryar girt ku ew kesên ku di şerê Kendavê de zerar dîtine, dê Koma Neteweyan ji wan re qasî 250 dolarî alîkariyê bike. Ji vê yekê hemwelatiyên Îraqê dê fêde nabînin. Herweha dewletên ku zerar dîtine li derê vê biryarê dimînin, bi tenê dê ji şexsan re alîkarî bêkirin.

Koma Neteweyan rapor da ku İraqê gelek çek û malzemeyên şer veşartîye. Ji wan yek jî topên dûr menzîl in. 50 metre lûleyên wan dirêj û 35 cm jî dirêj in. Dê Koma Neteweyan di demeke kurt de wan topan bişkîne.

**14'ê Tebaxê**

Ordiya Tirk dema êrîşê Kurdistana İraqê kir, digot:

- *Me kampên PKK bi fotografan tespît kirîye û em li hedefa xwe dixin û xelkên sivîl hîç zerar nabîne. Lê li gor raporên Koma Neteweyan ordiya Tirk kamp û gundan bombebaran kirîye û heta niha 9 kesên sivîl hatine kuştin. Lê, li gor agahdariya çavkaniyên serbixwe hejmara sivîlên mirî ne 9 kes in, gelek in.*

Berpirsîyarê PDK İraqê Dîzaî îro li Dîyarbekirê daxuyani yekê da û got ku:

- *Li Kurdistana İraqê PKK tune. Heger hebin an jî werin li wir bi cih bibin, dê pêşmêrgeyê me li wan bidin û ji wir der bixin.*

Berpirsîyarê PKKê yê Ewropa li ser encama şer rawesta û got:

- *Heta niha 300 leşkerên Tirk hatine kuştin û ji me jî 4 gerîlla şehîd ketine.*

PKK ji bo salvegera 15'ê Tebaxê hazirîya çalakî û êrîşan dike. Dewlet jî tedbîrên mezin li hember êrîşan girtîye. Lê, dîsan şeva dinê PKK avêt ser Şemdînan û şer di nav wan û leşkerên Tirk de derket.

Walîyê kolonîyalîst Kozakçioğlu civîna xwe ya dawî li Dîyarbekirê kir. Ji ber ku tayîna Kozakçioğlu çendekê berê

derketibû û ew bû walîyê Stanbolê. Kozakçioğlu bilançoya 5 salan da:

*"Li ser navê daweya PKK heta niha 1353 kes hatin girtin. 471 leşker û polîs ji aliyê PKKê ve hatin kuştin.*

*Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê îro li dij operasyon û êrîşên ordiya Tirk meş û mitîngeke pêk anî. Li meydana Sergel qasî 300 kesî civîyan û ordiya Tirk a dagîrker protesto kirin. Serokê Federasyonê axaftinekê kir û di axaftina xwe de ordiya dagîrker protesto kir û ji Swêdê jî daxwaz kir û bi şêwekî tûj û xurt Tirkiyê protesto bike. Meşê dest pê kir û meşê heta ber konsolosxana Tirkiyê dom kir. Li wir nameya protestoyê hat xwendin û nameyê dan konsolosxana Tirk."*



**15'ê Tebaxê**

Li gor agahdariya berpirsîyarê Bereyê Kurdistanê Burhan Salîh, Îraqê 5 tuxay şand ser bajarê Hewlêr û Silêmaniyê helîkopterên Îraqê li nav paralela 36 -an de difirin. Îraq dixwaze tesîrê li ser Kurdan zêde dike û Kurd li Bexdayê dev ji hinek daxwazên xwe berdin. Salih dixwaze ku Koma Neteweyan û dewletên Rojava li ser Îraqê tesîr bikin û Kurdan biparêzin. Berpirsîyarê Bere dixwaze Welatên Rojava û Koma Neteweyan îzin nedin êrîşên Îraqê û pêş li koçebarên nû bigre.

Li gor nûçegîhanê rojnameya Milliyetê Rifat Balli, Partiya Azadiya Kurdistanê li bajarê Dihokê li dij êrîşa ordiya Tirkiyê meş û mitîngekê pêk anî. Di meş û mitîngê de qasî 3000 kesî beşdar bûn. Berpirsîyarê Partiya Demokrat birarzê Mesûd Barzanî xwest meş û mitîngê bide rawestandin lê nikaribû pêş lê bigire.

Li gor şirove û dîtina Rifat Balli, li Kurdistana Îraqê ji PKKê re sempatiyeke gelek mezin heye û PKKê prestîjeje mezin di nav gel de girt. Pêşmergeyên PDK -Îraqê Yekîtiya Nîştîman ji PKKê re alîkariyê dikin.

Li Kurdistana Tirkiyê ji bo avakirina 7 saliya Artêşa PKKê, li gelek cihan çalakî pêk hatin û bûyer derketin. Li ser banga PKK, dukandar dukanê xwe girtin. Li Batman, Silîvan, Îdil, Lîce, Hêne, Hezro, Bismil, Nisêbîn, Cizîre û gelek cihên din esnafan deriyê dukanên xwe girtin. Li gor ajansan li Nisêbîne riyên bajêr ji her aliyî ve hatine girtin û li bajêr teqînên çekan tê.

PKKê riya Bedlîs û Dîyarbekirê 5 saet girtin û alikariya ku ji leşkerên Tirk re hat ew ketin dafika PKKê. Serokleşkerek û 4 leşker hatin kuştin.

Serokê leşkeriyê giştiyê Tirkiyê rojnamevanan bir herêma operasyonên Kurdistana Îraqê û got:

- *Me zerareke mezin da PKKê. Kampên wan belav kir.*

Rojnamevanan xwe negirt û ji general birsîn:
- Generalên birêz, ka ne laş û ne jî cihên kampên wan li holê tune ne?
General weha digot:

- *Ya girîng ne hejmara kuştiyên PKK ye û nîşandana cihên kampên wêrankirî ye. Ya girîng ew e, ku belavkirina hêzên wan e. Me wan ji herêmê derxist. Em gehîştin armanca xwe.*

Îşev Koma Neteweyan dê biryar bigire, ku Îraq ji bo alîkariya mirovî petrola xwe bifroşe. Heger biryareke pozîtîv bê girtin dê xeta petrola Tirkiyê vebibe û di ser Tirkiyê de petrola Îraqê bê firotin.
Celal Talabanî methê doktorên Tirk da. Talabanî li Tirkiyê tedawiya dil bû û di derheqê doktor û tenduristiya Tirkiyê de ji rojnamevanan re got ku:
- *Doktorên Tirk gelek zîrek in. Wek hûn dizanin ez çendekê berê li Londonê bûm. Ez li wir jî çûm ser doktor. Wan xwest ez demeke li wir bimînim û tedawî bibim. Lê min nexwest û min doktorên Tirk tercîh kir. Bi rastî doktorên Tirk di warê tibî de ji yên Ewrop kêmtir nîn in...*

**16'ê Tebaxê**
Koma Neteweyan biryara firotina petrola Petrola Îraqê girt ku Îraq dikare 10 milyar kron petrol bifroşe. Ev firotin di bin kontrola Koma Neteweyan de û bi vî pereyî ji xelkê Îraqê re îhtîyaciyên xwarin û derman bên kirîn. Para ku ji ber bimîne jî, dê wek tazmînat bidin ew dewletên ku di şerê Xalîcê de zerar dîtibûn. Berpirsîyarê Îraqê yê li Koma Neteweyan , El Ambarî bi tûndî li dij vê biryargitina Koma Neteweyan derket û biryarê protesto kir.
Îraq bi hêzên xwe yên Komarî der û dor li bajarên

Kerkûk, Hewlêr û Silêmaniyê girtîye. Leşkerên Îraqê mêran digrin û dibin û kal û pîr û jin û zarokan jî ji bajêr dertînin der û surgunê bajarên din dikin. Ji xwe şeva çûyî berpirsîyarê çûyî dixwest ku hêzên Çalak mudexelea ordiya Îraqê bikin. Berdevikê Qesra Spî jî rastiya bûyerê qebûl kir û got ; " *ordiya Îraqê di hareketê de ye.*"

Li Bexdayê Mesûd Barzanî, Wezîrê Ewlekariyê Îraqê, Alî Hasan Mecît zîyaret kir. Wek tê zanîn Alî Hasan Mecît di nav Kurdan de, bi navê qesabê Helebçê tê nas kirin. Vê zîyareta han bala çapemeniya cîhanê kişand ku Îraq dixwaze li gor daxwaz û pêşnîyariyên xwe peymanê bi Barzanî û heyeta pê re bide îmza kirin.

Celal Talabanî, berî ku here Kurdistana Başûr, li Dîyarbekirê li ser pirsên rojnamevanan.

- *Bila ordiya Tirk ji bakurê Îraqê derkeve. Em dê bi pêşmêrgeyên xwe herêmê kontrol bikin. Wê demê em nahêlin PKK bê herêmê û li wir bi cih bibe. Heger bê em dê lê bidin. Bila herin li welatê xwe şer bikin.*

Tirkiyê, bi zimanekî tûj Swîsrê protesto kir ku wê biryara ambargoya danîna çek li ser Tirkiyê girtibû.

**17'ê Tebaxê**

Serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz, bi zimakekî tehdîtkar bala Celal Talabanî û Mesûd Barzanî kişand.

- *Celal Talabanî û Mesûd Barzanî dê li herêma ewlekariyê pêk bînin û nehêlin PKK li wir bi cih bibe. Heger ew nekin û nikaribin bila ji me jî loman nekin. Wê demê em dikarin û dizanin li wan deran çi dikin. Wê demê jî dê ew zerarê bibînin. Em naxwazin bikevin nav axa Îraqê û ji Îraqê ax bistînin. Em ji serî de yekîtiya axa Îraqê diparêzin.*

İngiliztanê ketina ordiya Tirk li İraqê ne di cih de dît. Daxuyaniyekê da ku ordiya Tirk ji Kurdistana İraqê derkeve. Wek tê bîranîn çend roj berê Elmanya, Swêd û Swîsrê jî derketina ordiya Tirk daxwaz kiribûn.

Apo presskonferansek çêkir û di presskonferansa xwe de got ku:

*- Divê ji îro şûn ve turist bê îzna me neçine Kurdistanê. Yên ku bixwazin herin Kurdistanê divê ji me îznê bigrin. An jî em berpirsîyariya wan nagirin ser xwe.*

Nûçegîhanê rojnama Hurriyetê Rıfat Ballı li Kurdistana İraqê kampa PKK zîyaret kir. Li gor R. Ballı kamp li Kurdistana İraqê ye û gelek nêzî sînorê Tirkiyê ye. R. Ballı, bi berpirsîyarê kampê Cemîl Bayık re hevpeyvînekê çêkir. C. Bayîk:

*- Me tixûbên navbera Kurdistanê êdî rakir. Kurdên Kurdistana İraqê êdî bi me re ne. Hêzên Kurdistana İraqê êdî nikarin xelkê li dij me bi kar bînin. Kampên me ji derê İraqê li Suriyê û li İranê jî hene. Lê, me van kampana li dij Tirkiyê bikar ne aniye.*

Rojnamevanê Tirk Rıfat Ballı, li gor dîtin û lêkolînên xwe dibêje ku " *di nav Kurdê İraqê de Prestîja Apo û PKK gelek zêde bûye.*"

**18'ê Tebaxê**

Li gor rojnameya İraqê ji bo îmzakirina peymanê du pêşname amade ne. Dê di van rojan de Hukimeta İraqê û heyeta Kurdan wan îmza bikin. Lê, serokê Kurdan ên ku li Bexdayê ne, di vî warî de bê deng in. Guman heye, ku Kurd û hukimeta Bexdayê li ser mercên peymanê li

hevdu nakin û Bexda dixwaze bi zorê mercên xwe bi wan bide îmza kirin.

Wezîrê Plan û Avayî yê Îraqê îro daxuyanîyek da çapemeniyê.

- *Piştî rawestanina şerê Kendavê heta îro Îraqê ji ber ambargoya aborî 17 milyar dolar zerar dîtîye. Welat wêran e. Proje pêk nehatin. Fabrîqe naxebitin. Gel birçî û perîşan e.*

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal bi zimanekî nerm çapemeniya Tirk tehdît kir, ku li ser PKKê carek din nenivîsin.

- *Hûn bi nivîsarên xwe propaganda PKKê dikin. Divê hûn weha bê ser û ber nenivîsin. Heger pêwîst be jî, wek nûçeyên biçûk li rûpelên dawî yên rojnameyan binivîsin.*

Wek me berê jî nivisîbû Waliyê Kolonîyalîst Hayri Kozakçıoğlu tayîna wî derketibû û bûbû waliyê bajarê Stenbolê û di şûna wî de waliyê bajarê Konyayê Çetinkaya hatibû tayîn kirin. Lê, Çetinkaya heta îro neçûbû Dîyarbekirê û dest bi wezîfê xwe nekiribû. Di rojnameyan de nûçeyek belav bû ku Çetînkaya naxwaze bibe waliyê Dîyarbekirê û ew dixwaze bibe berendamê parlementoyê. Li ser van nûçeyê îro Çetînkaya bi lez û bez firî û çû Dîyarbekirê û dest bi wezîfeyê xwe kir. Lê, dîsan li gor nûçe û şiroveyên rojname û rojnamevanan Çetînkaya dê di demeke kurt de ji walîtiyê îstîfa bike û bibe berendamê parlementoyê.

**19'ê Tebaxê**

**Li dij Gorbaçov darbeyek çêbû**

İşev li Sovyetê li dij Gorbaçov derbeyek çêbû. Gorbaçov li Krimê hat girtin. Alîkarê Gorbaçov bû serokê derbeyê û gotin ev qanûniye, ji ber ku Gorbaçov nexweş e û li gor qanûna bingehîna Sovyetê alîkarê wî dibe serokê Sovyetê. Derbevan 8 kes in.

Derbevan gelek nerm in. Dibêjin ku li welatê me otorîte û dîsîplîn nema ye. Em ji bo pêkanîna ser û ber hatine. Lê em polîtîka û riya glasnost û prestroykayê dimeşînin. Ew peymanên navnetewiyên ku di dema Gorbaçov de hatine îmza kirin, em hemûyan qebûl dikin...

Boris Yeltsin ne hatiye girtin û wî li dij cuntayê banga têkoşînê kir. Li Moskovayê bi hezaran kes derketin der û li her derê bajêr dest bi çêkirina barîqatan kirin. Li bajarê Lenîngradê û li komarên Baltîk xelkê dest bi protestoya kir û meclîs, xaniyên TV û radyoya bi laşên xwe diparêzin. Leşkerên cuntayê bi sedan tanq û top ve hem li Moskova û hem jî Baltik ber bi merkezên bajaran ve dimeşin.

Yeltsin li Moskovayê derket ser tanqeyek ji xelkê re hîtab kir ku têbikoşin. Ji aliyê din ve Yeltsin bi Serokê Amerîka Bush, Elmanya Kohl, İngilistan J. Major re bi telefonê peyîvî û ji wan alîkariyê xwest. Serokên van dewletên Ewropa hîn tam qerara xwe nedane û bi balkêşî li pêşveçûna bûyeran û polîtîka derbevanan dinêrin.

**20'ê Tebaxê**

Li Sovyetê rewşa tevlîhevî dom dike. Xelk bi Yeltsîn re bi şev bi roj li kolanan û di ber xwe didin. Êrîşên ser tanqan dikin. barîqatan xurt dikin. Cunta nikare bi pêş ve gav bavêje. her ku diçe hejmara yên li hember zêde dibe. Panîk di nav derbevanan de dîyar dike. Ji Gorbaçov agahdarî nîne. Dewletên Rojava li dij cuntayê tewrê xwe

diguhêrin. Bush û serokên din dibêjin ku divê Gorbaçov vegere ser wezîfeyê xwe û Yeltsin jî Bush zêde bi ser derbevanan ve here û bi telefonê bi Gorbaçov re bipeyîve. NATOyê acizbûna xwe dîyar kir û biryara civîneke awerte girt.

Saddam, ji serokên Rêxistina Filîstîniyan a herî Bilind Yasîr Abdurrebo, Kadafî û Sudanê re piştgiriya xwe dîyar kirin.

**21'ê Tebaxê**

TV Kanal-4 ya İngiliztanê li ser operasyonên ordiya Tirk programek çêkir û di programa xwe de di got ku " *Tirkiyê İraqê dagîr kir. Amerîka, Koma Neteweyan û welatên Ereb vê yekê nabînin an jî naxawazin bibînin...*"

Li ser operasyonên Tirkiyê,Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Misirê gazî maslahatguzarê Tirkiyê yê Kahîrê kir û bala wî kişand. Rojnameyên Misirê jî nivîsandin "*Çavên Tirkiyê û İsrail di axa Ereban de ye.*"

Derbevan û leşkerên wan nikarin tiştekî bikin û barîqatan bişkînin. Ji KGB û Ordiyê gelek serleşker û leşker diçin aliyê xelkê. Hem jî bi tanq û topan ve. Panîk di nav derbevanan de zêde dibe hinek ji wan îstîfa kirin. Xelk daveje ser tanqên wan û leşkeran bi destan ji nav tanqan dertînin der. Heta niha ji herdu aliyan 13 kes hatine kuştin. Bush û serokên rojava xwe li dij cuntayê gij û tûj dikin û cunta her ku dice bi paşve gav davêje.

## Muzîka xelkê û strana me !

*"Heger demokrasiya ku îro li Tirkiyê heye, li Iraqê hebûna, me qet têkoşîn ji bo otonomiyê ne didan.*
*Divê Kurdên Tirkiyê bi pêwendî, rê û metodên aştî pirsa xwe çareser bikin.*
*Me ne dixwest hêzên hevkar bikevin nav axa Iraqê; lê, gelê me xwest. Em rûmeta dîtina gelê xwe digirin."*

Ev peyvên jorîn, ne ji bal siyasetvanek Tirk an Ereb hatine gotin. Ew peyv ên siyasetvanek Kurd ê binav, ji başûrê Kurdistanê, serokê Yekîtiya Niştiman a Kurdistanê Celal Talabanî ne. Ez naxwazim bi kûrayî tû şirove li ser van peyvên jorîn çêkim. Her weha qet daxwaza min a ketina polemîkan tune ye. Bi taybetî di vê dema, ku Kurd divê bi yekdengî derkevin şanoya siyasî ya navnetewî. Lê realîte û rastiya Kurdistanê, di vê prosesa gelek girîng ji welatê me re, mixabin nikarin mirov bêdeng û bê ra bihêlin. Nîşandana prensîbên welatperwerî û berjewendiyên netewî, dîplomatî û xwedî rûmetbûn, xuya ye dibe barek li ser milên rojnamevaniya Kurd, a ku divê bi vê erka xwe rabe. Gotina rastiyê, çend tehl jî be, divê derkeve ronahiyê. Ev rexneya tê kirin, ji bo avakirinê, ji bo armanc û têkoşîna netewê Kurd di beşê Bakûr de, paşçav neyê girtin.

Gava C. Talabanî çû Bexdayê piştî trajediya Kurd li başûrê Kurdistanê û cih girtina pirsa Kurd di rojeva siyasî ya dinyayê de - maçên bi Saddam re ne tenê em Kurd, lê tevayi ya dinyayê şaş kirin. Ne me Kurdan, lê bîyaniyan dipirsî - tiştekî wusa çawa çêdibe ? Dilsariyek wusa gelo mumkun e. Piştî, bi

hezarên zarokên Kurd bi şehîdbûna xwe ji êrîşên Saddam, ji birçîbûnê, ji sermayê, ji hêzketinê, li ser çiyan canên xwe yên melûl wundakirin. Vê trajediyê raya giştî ya hemû cîhanê nêzî Kurdan kir. Çawa, serokek Kurd bi germî qatilê wan - Saddam, çend caran himêz û maç dikir ? Hişê biyaniyan ev tişt ne dikşand. Dipirsîn, lê Kurd jî nikarîbûn bersiva wan bidin.

Mixabin, şanoya bê mantiqî ku li Bexdayê hate leyistin, bi vê jî neqediya. Piştî çend saetan bi Saddam re hevdîtin û axaftin, C. Talabanî li ber roj - namevanên dinyayê digot : "Baweriya me bi hukimeta me ya navendî ( ya Bexdayê ) tê. Ew çi bibêja divê em gelek girîng bigrin. Ji ber ku daxwaza me jîyana bi hev re ye. Gava armanca me ev e, divê em guhdariya navendiyê bikin. Hemû hemwelatiyên me, yên dev ji mal û cihên xwe berdane dikarin vegerin malên xwe. Em ê Iraq a demokrat û yekgirtî bi hevdu re ava bikin. Heta çend rojan wê statûya Kurdistan a otonom jî dîyar bibe. Li ser her tiştî me li hev kiriye."

Roj derbas bûn, meh derbasbûn...Hîn jî ne statûya Kurdistanê hate diyarkirin, ne jî îmzayên otonomiyê hatine avêtin. Ev ji du - sê mehan zêdetir e, ku serokê Eniya Kurdistan û yê Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê Mesûd Barzanî li Bexda ye, lê pêwendiyan hîn jî encamên dawî na nîne.

Ev çend meh in, ku li Kurdistanê bûyerên mezin yên dîrokî pêk tên. Roj tune ye li welêt ji bakûr heta başûr serîhildan, berxwedan an xwepêşandan ên fereh neqewimin. Bi taybetî, piştî trajediya li başûrê Kurdistanê, li bakurê Kurdistanê têkoşîna mirovê Kurd gihişt merhelek bilind. Di vê demê bi xwe de hatina C. Talabanî ya Tirkiyê, li gel xwe şiroveyên

gelek cuda anîn xolê. Dîsa jî em dikarin bibêjin, ku daxuyaniyên wî nebane li vê bûyerê ji bal Kurdan ve normal bihatan dîtin. Xelkê digot, rewşa başûrê Kurdistan û hatina bi sedhezaran mirov nav "sînorên" Tirkiyê, ew mecbûr kirine da werê Ankarê. Tû kesî ne dixwest spekulasyonan li derdora ziyareta Talabanî li Enqerayê û hevdîtinên wî bi nûnerên dewleta Tirk re, bike. Lê, daxuyaniyên Mam Celal, Kurdên bakurê Kurdistanê şaş dikirin. Wî bi "şîretên dîplomatî " bala xwe dida zê deyî 15 - milyon Kurdên bakurê Kurdistanê.

*"Eger demokrasiya ku li Tirkiyê heyî, li Iraqê hebane me qet têkoşîn ji bo otonomiyê li Iraqê ne dida."*

Way li minê... Demokrasî û Tirkiye û rewşa 15 - milyon Kurd... Mirov nizane çawa, van peyvan di cumleyekê de li hev bîne. Lê Talabanî, wan bi rêzek wusa îdeal bireng dike, ku xelkê bêjê, bavo ma ev Kurdên Tirkiyê çi dixwazin (! ) Her wusa Talabanî, piştî hevdîtina xwe bi Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal re kir, nizanibû bi çi peyvên xweşiktir pesnê wî bide. Sed xwezî jê re, ku bîyaniyan bi xwe baweriya xwe bi peyvên "serokê " Kurdan ne danî. Rastî jî wusa bû. Ji ber rewşa bakûrê Kurdistanê li ber çavan bû. Xelkê digot: *"Eger demokrasiya"* li hemberê Kurdan a Tirkiyê numune be, way li halê dinyayê...

Piştî van gotinên Mam Celal çend roj derbas nebûn ku dewleta Tirk teroreke dijwar li bakurê Kurdistanê pêk anî. Gelek welatperwerên Kurd ji malên xwe hatin girtin. Piştî demekê li devereke dervî bajaran, kuştî hatin dîtin. Kovarên Kurdan

hatin bombekirin. *"Demokrasiya"* Tirkiyê, dest pê dikir dîsa rûyê xwe nîşan bide.

Hefteyek, du piştî hatina C. Talabanî ya yekem li Tirkiyê derbas nebû, vê carê li Istanbolê Konferansa Enternasyonaliya Sosyalîst çêbû. Navê Mam Celal dîsa di nav mêvanên, vê civînê de bû. Û ew carek din hat Tirkiyê. Lê ne êşkenceyên ku li şoreşgerên Kurd têne kirin, ne terora fereh a dewleta Tirk li bakûrê Kurdistanê, ne înkara hebûnê ku peşberê netewê Kurd li Tirkiyê tê kirin, û ne bi sedên din... pirsgirekên pirsa Kurd a bakûrê Kurdistanê hatin bîra Talabanî. Wî dîsa daxuyaniyên xwe yên *"dîplomatî "* da danezanên ragihandinê.

*" Divê Kurdên Tirkiyê bi rêyên aştiyê û pêwendiyan pirsên xwe çareser bikin."*

Çawa ? Li ser çi bingehî ? Li ser van tiştan tû tişt ne got Talabanî. Her wekî ku wî nizanîbû - sedema ne aştiyê li Kurdistanê, dewleta Tirk bi xwe ye. Her wekî wî nizanîbû, welatê Kurdan ji bal wê dewletê ve hatiye dagîrkirin. Her wekî wî nizanîbû, şoreşger û mirovê Kurd di nav "sînorên" vê dewletê de, gava dibêjin - em mafên xwe yên netewî dixwazin, tên girtin, tên talankirin, tên êşkence kirin, tên kuştin... Sed mixabin, ji cihê ev peyv, ji kesekî ne agahdar re li ser pirsa Kurd bên gotin, muhatabê wan dibê siyasetvanek Kurd ê binav. Yekî, ku gelekan ji me heta îro bi hêvî, bi hêviyek ku wê pêngavên wî, berjewendiyê ji netewê me re bêne, hatiye meyzandin...

Kirinên Celal Talabanî, bi van tiştên jorîn jî ne qediyan. Di 25 ê Tirmehê de, ew careke din derbasî Tirkiyê dibû. Vê carê dîtina wî bi waliyê idara orfî yê

Kurdistanê, Hayrî Kozakçioğlu re bû. Ez bawer im, ne pêwîst e, ku em H. Kozakçioğlu li vir bidin nasandinê. Her Kurdekî ji bakûrê Kurdistanê, kirinên wî li welatên xwe baş dizane. Ne tenê jî Kurd. Her wusa bîyanî yên ku bi pirsa Kurd ve mijûl dibin, vî kesî baş nas dikin. Di çûna xwe ya Tirkiyê de, parlamenterek a Swedî ya ku bi Kozakçioğlu re hevdu dîtibû, ne xwestibû destê wî ji bo silavê bigre. Gava ew parlamenter vegeriyabû Swêdê, bersivên wê di rojnama " *Kurdistan Press* " de cî girtin. Wê, li ser dîtina xwe, bi waliyê idara orfî yê Kurdistanê re weha digot :

" *Gava wî destê xwe ji bo slavê da min, min destê wî negirt. Min nikarîbû silavê bidim van destên bi xwîn.* "

Celal Talabanî piştî hevdîtina xwe bi H. Kozakçioğlu re tû daxuyanî ne dan danezanên ragihandinê, gelo ew li ser çi pirsan bi hevdu re qisa kirine. Bi " tesadufek " mezin di wê rojê de serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal jî çûbû Diyarbekirê. Di civîna xwe ya bi qeymeqam û muhtarên heremê re, Turgut Özal ev peyv bikar tanîn.

" *Divê kes bawer neke, wê ev welat ( qezda wî Tirkiye ye ) bê parçe kirin. Eger baweriya hinekan wusa hebe, divê vê baweriyê ji serên xwe bavêjin. Em ê tehamula wan nekin. Yan wê wekî pewiste runin, an di her cihî de, li vir, li nav welat ( Tirkiye ) an li derve jî bin em ê serên wan bipelixînin.* "

Wek tê zanîn di wan rojan de, welatperwer û şoreşgerê binav, nûnerê Partiya Ked a Gelerî yê Diy-

arbekirê Wedat Aydin bi xwînxwarî, bi destên dezge hên tarî yên dewleta Tirk ve hatibû şehîd kirin. Di xwepêşandana gorkirin a Wedat de, bi hezarên beşdaran hatibûn gulebarandin. Bi dehan kes şehîd ketin û bi sedan kes birîndarbûn. Diyarbekir dîsa bû bû navendiya berxwedanê...Ji ber vê serokkomarê Tirkan dixwest çavên Kurdan bitirsîne. Di vê demê de jî, C. Talabanî dihat Tirkiyê. Lê, wî gava bi sedhezarên Kurd li beşê herî mezin ê welatê wî rabûbûn ser piyan. Ji bo rûmetê, ji bo mafên xwe, ji bo şehîdên xwe, li ser " axa " Tirkiyê, peyvek li ser têkoşîna Kird ne danî zimên. Dîplomasî ne ev e - Mam Celal. Dîplomasî berî her tiştî bala xwe dan ji bo berjewendiyên netewa mirov bi xwe ye. Heta îro kes bi pesindana dijminê xwe dîplomasî ne kiriye. Ji ber ku ew ne dîplomasî ye. Her wusa pêwist e, tu carî neye jibîrkirin. Rûmet dan a têkoşîn û dîroka xwe, rûmeta mirov bi xwe li ba dost û dijminan bilind dike. Pesindana dijmin, mirov dixe. Ne dijmin baweriyê bi vê pesindanê dike û ne netewê mirov ji yekî dilxweş dibe.

Bakurê Kurdistanê li ser pirsa parastina berjewendiyên netewî gelek hesas e. Rêxistinên Kurd bi xwe li ser vê babetê, bi awakî girêdayî bi gelê xwe re li bakûrê Kurdistanê pirsa sexwebûna netewî ji xwe re kirine armanc. Mîna serokê rêxistinek mezin Mam Celal, tu vî tiştî pir baş dizanî. Eger li ser vê pirsê kes ji wan hewceyê şîretê bana, berî her tiştî wî bi teva yiya netewê Kurd re bikevin pêwendiyê ji bo guherandina armanca xwe. Ne bi şîretên, ku tu ji bo demokrasiyê li Tirkiyê, riyên pêwendiyê û aştiyê didî, dê xwe biguherînin. Bi rastî jî, rê ne riya ku tu li ser qisa dikî û nîşan didî ye. Bawerî ji gelê xwe girtin û li ser navê wî axaftin, berpirsîyariyek mezin e. Mirov

gava bi vê berpirsîyariya xwe, li gora daxwaz û armancên netewê xwe birêve neçe, rê ji hev vediqetin.

Her wusa miorv nabe her roj li ser babetekê tiştên cuda bibêje. Xwedî prensîpbûn, siyasetvanan bilind dike. Prensîpê herî mezin jî wekî çend caran hate nivîsandin, li gel daxwaz, armanc û berjewendiyên netewî cih girtine. Di vê rê de xebat, di vê rê de siyaset û di vê rê de dîplomasî ye...

*Cemal Batun*

**22'ê Tebaxê**

Derbevanên Sovyetê bi ser neketin û revîn. Gorbaçov hate Moskovayê. Presskonferansek çêkir û di presskonferansa xwe de derbevanan protesto kir û Boris Yeltsin û Rusan re spas kir.

Ji ber ku derbevanên Sovyetê bi serneketin û Gorbaçov bi paş ve hat, NATO civîna xwe ya awerte îptal kir.

**23'ê Tebax**

Boris Yeltsin bi qeraranameyek li tevayiya Rusyayê xebatên partiya komunîst qedexe kir. Kilît li deriyên partiyê xistin û dest dan ser xanî û malê partiyê. Li seranserê Rusyayê rojnameya Pravda jî qedexe kir. Hevalê Yeltsin bû serokê KGB. Gelek kesan ji partiya komunîst îstifa kir. Li komarên din yên Sovyetê jî gelek serok û berpirsiyarên partiyên komunîst ji partiyên xwe îstîfa kirin. Li peytextê Letonyayê, li bajarê Talînê bi xwepşandaneke bi sed hezaran peykera Lenîn ji meydanê daxistin û kirin nav

tabûtekê. Li seranserê Sovyetê jîyana komunîstan kete tehlîkeyê. Gorbaçov hukimeteke nû ava kir û mirovên Yeltsin kir wezîr.

**25'ê Tebaxê**

Celal Talabanî daxuyaniyek da ajansa Reuter ku guftûgoyên di navbera Bere û rejîma Îraqê de heye baş naçe. Îraq dixwaze bajarê Kerkûkê derî herêma otonomiyê bihêle û garantiya Ewropî û Koma Neteweyan qebûl nake. Heger ji bo Kerkûkê Kurd dest bi şer bikin divê hêzên Çalak alîkarî û piştgiriya Kurdan bikin.

Ji aliyê din ve Mesûd Barzanî dixwaze mercên Îraqê qebûl bike û peymanê îmza bike, lê Talabanî ji vê yekê re ne terefdar e. Kurd di nav xwe de li ser vê pirsê gotûbêj dikin û dixwazin bigehên yek biryarek.

**28'ê Tebaxê**

Celal Talabanî daxuyaniyek da ajansa Reuter ku PKKê bi dizî bi rejîma Bexdayê re têkilî daniye û ji Îraqê alîkariya leşkerî, çek û herwekî din digre. Û piştre Celal Talabî dom kir:

- *Rêxistinên me tû carê derbasî aliyê sînorê din nebûne bû li wir çalakiyan pêk neanîne. Lê PKK mudaxeleyê aliyê me jî dike.*

Li gor nûçeyên BBC şeva dinê gerîllayên PKK avêtin ser merkeza bajarê Sêrtê û lojmanên dewletê dan ber roketan. Li Erûx û Mîdyatê jî avêtin ser qereqol û lojmanên memûran.

Berpirsîyarê ERNK yê Ewropa presskonferensek çêkir û di presskonferansa xwe de got ku:

*- Encama operasyonên dewleta Tirk fîyasko ye. Me ji wê rojê heta niha, li serhevdu 68 çalakî yên cuda pêk anîne. Çalakiyên me dom dikin.*

**29'ê Tebaxê**

Kurdan carek din daxwazên Iraqê qebûl nekir. Li gor radyoya Wasîngtonê beşê erebî, Mesûd Barzanî çendek berê ji Bexdayê vegeriya bû bajarê Şaqlawayê û li wir li ser guftûgoyên navbera delegasyona Kurd û rejîma Bexdayê de agahdarî dabû serokên Kurd. Kurd careke in li ser pêşnîyarî û daxwazên Bexdayê li Şaqlawayê ni nav xwe de civîyan. Di dawiya civînê de bi tevayî gehîştin encamek ku mercên rejîma Iraqê nayên qebûl kirin. Bi taybetî li ser bajarê Kerkûkê Kurd û Ereb bi hevdu nakin. Kurd dibêjin Kerkûk bajarê Kurdan e û Iraq jî dibêje "na yê Ereban e." herweha ew guftûgoyên ku di navbera delegasyona Kurd û rejîma Iraqê de bi mehan e dom dike, negihêşt encameke. Kurd niha xwe ji êrîşên Iraqê re amade dikin.

Di girava Kendava Faris a bi navê Bûbiyan de ku girêdayiyê Kuweytê ye, di nav leşkerên Kuweytê û Iraqê de şer derket. Qasî 80 leşkerên Iraqê bi şev bi dizî çûn giravê. Di dema şer de Iraqê çekên xwe li wir binerd kiriye û leşkerên Iraqê dixwazin bi dizî wan cekên veşartî ji wir derxin û birevînin Iraqê. Lê, leşkerên Kuweytê bi wan hesîyan û şer di nav wan de derket. Di dawî de Kuweytiyan wan dîl girtin. Li ser vê şerê han Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan bala Amerîka kişand ser êrîşên Iraqê.

Wek tê zanîn do Celal Talabanî PKKê bi rejîma Saddam re têkilîdanînê sucdar kiribû. Îro berpirsîyarê PKKê yê Ewropa bersiva Celal Talabanî da:

*- Celal Talabanî xewn û xeyala dibîne. Ev daxuyaniya Celal Talabanî derew e. Tû têkiliyên me li gel Saddam û*

*rejîma wî tune. Celal bi devê Tirkiyê dipeyîve.*

Li bajarê Lahiyê qasî 50 Kurd bi turîstan re ketin xaniyê Konseya Aştî yê ya Navnetewî û li dij operasyonên Tirkiyê ku li Kurdistana Başûr pêktîna û hin jî dom dom dike dest bi çalakiyên rûniştinê kir. Di nav wan de zarok jî hene. Qasî çend saetan paşê dev ji tevgera rûniştinê berdan û ji Xaniyê Konseya Aştiyê ya Navnetewî derketin.

Ew kesên ku di bûyerên cenezaya Wedat Aydin de li dîyarbekirê ji aliyê polîs ve hatibûn girtin, îro wan derxistin hember mehkemê. Yên ku wan derxistin hember mehkemê 370 kes bûn. Girtiyan daxwaz kirin ku polîs ji salona mehkemê derkevin der. Li ser israra girtiyan mehkemê polîsan ji salonê derxist der û mehkemê dest bi xebata xwe kir.

Mehkemê dixwaze bi doza bi şer û bûyer derxistinê girtiyan sûcdar bike. Girtiyên Kurd sûc qebûl nekirin û sedemên kuştin û bûyer derxistinê polîs nîşan dan. Mehkeme dom dike.

**1'ê Cotmehê**

Li nêzî bajarê Cebexcûrê PKK 5 turîst revand. Di nav wan turîstan de Amerîkî, Awisturî û Îngilîz hebûn. Dewleta Tirk li herêmê dest bi operasyonan kir. Di operasyonan de 3000 leşker gelek polîs hene. Bi helîkopteran herêmê kontrol dikin. Lê, encam tune.

**2'ê Cotmehê**

Ji bo dîtina turîstan operasyon dom dike, lê bi ser tû rêçeke ve jî nebûne.

**3'ê Cotmehê**

Ji bo dîtina turîstan operasyon her berdewam e. İngilistanê henekên xwe bi opeerasyona Tirkan kir û got;

" Tirk wek di şikeftan de li derziyê bigerin. Ji xwe re li bin keviran digerin ku rastî turîst û PKK bên" Ji aliyê din ve PKK li navbera Darahênê û Mûşê riya trênê girt. Polîsek hat kuştin û trênê jî şewitandin. Ordî û hêzên taybetî hatin herêmê. Di nav PKK û wan de şer derket û polîsek din jî li wir hat kuştin.

Bush dîyar kir, ku Amerîka, hersê dewletên Baltik wek dewletên serbixwe dinase. Ji bo ku konsolosxaneyên xwe li wan hersê dewletên Baltik veke talîmat da wezîrê xwe yê Karûbarê Derveyî. Wek tê zanîn û bîranîn hîn çendek berê Bush çûbûn Sovyetê û li wir dîyar kiribû, ku " *daxwazên serxwebûniyê nasyonalîzme û nasyonalîzma teng jî tehlîke ye. Divê Komarên û gelên Sovyetê bi hevdu re bijîn..*" Lê, niha Bush serxwebûna wan dewletan dixwaze.

**4'ê Cotmehê**

Tirkiyê ji bo dîtina turîstan hejmara leşker û polîs li herêma Cebexçûrê derxist 5000'î. Heta niha qet rastî rêça wan nehatine. Qomûtanekî Tirk dibêje ku *"di herêmê de bi gerîllayên PKKê re serîderketin gelek zor e. Wan grûbên biçûk pêk anîne û li cihê xwe nasekinin, her tim bi hereket in. Em hew dibînin ku ji bin erdê derketin û şer kirin û dîsa wenda bûn."*

Nûnerê Fransa û İngiliztanê yên li Koma Neteweyan ji bo endametiya hersê dewletên Baltik arzûhalek dan Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan.

**5'ê Cotmehê**

Iraqê dîyar kir ku qanûneke bingehî ya nû deranî. Li gor daxuyaniya İraqê, İraq bi vê qanûnê re dikeve prosesekî demokratîk. Ji derî BAAS partiyên din jî dikarin bên da-

mezrandin. Lê, ji aliyê din ve, di vê qanûna bingehî ya nû de dinivîse ku kîjan partî polîtîka herêmî, parvekarî an jî ya dînî bike, ew partî tê qedexekirin. Heger ew partiyên ji derê BAAS bi welateke derve re an jî bi hin partî û hêzên derî Îraqê re têkilî dênin, ew dîsan qedexe dibin û tên girtin.

Gotinên *"herêmî"* û *"parvekarî"* ji bo partiyên Kurdan û ya "dînî" ji bo Şîîyan e. Yanî Partiyên Kurd û Şîîyan qedexe ye.

Celal Talabanî li Silêmaniyê daxuyaniyek da çapemeniyê û got ku:

- *Bi Saddam bawerî nabe. Dikare her tiştî bike. Ew naxwaze petrolê par bike. Demokrasiyê bîne. Em dê dest bi şer bikin. Li pişt me jî hêzên Çalak heye.*

Koma Neteweyan dest bi îzna firotina petrola Îraqê da. Dê di 6 mehan de 2 milyar û 400 milyon dolar petrol bê firotin. Ev dê ji xeta Tirkiyê de bê firotin û para Tirkiyê jî jê bê girtin.

Turîstên ku li herêma Cebexçûrê ji aliyê PKKê ve hatibûn girtin hîn jî agahdarî ji wan tune. Operasyona Tirkan jî li herêmê dom dike. Encam nîne.

# Çi dîtin û çi bihîstin

Gelek Kurd ji Swêdê diçin Kurdistana Başûr û bi paş ve tên. Di van rojên dawî de Nasir Razazî, Kovan (li ser navê Bere beşdar bû), Cemşîd Heyderî û Sîrvan jî çûbûn Kurdistanê û hema hema li seranserê Kurdistana Başûr geriya bûn. Ji wan çend kes li gelek bajar û cihan konser, semîner û civîn çêkiribûn. Wan bi gel re sohbet kiribûn keser, êş, daxwaz û hêviyên wan guhdarî kiribûn. Ji rewşa welat foto û fîlim girtibûn û anîbûn Swêdê. Redeksîyona Berbangê xwest ku bi wan hevalan re, li ser rewşa Kurdistana Başûr kombûnekê sohbetî pêk bîne. Ji Berbangê jî Cemal Batun û Amed Tîgrîs beşdarbûn. Cemal Batun kombûna sohbetetî îdare kir. Em bi kurtasî vê sohbeta ha li jêr pêşkêş dikin.

**Berbang**: Wek em hemû pê dizanin, ji meha adarê ve heta niha hukimeta Iraqê li Kurdistana Başûr kontrola îdarekirinê winda kirîye. Gelo Bere (Cephe) an hêzên Kurd di şûna vê valabûnê de çi îdare danîne an ava kirine? Organên îdarekirina herêmê çi ne?

**Nasir Razazî:** Bi dîtina min divê mirov berê behsa şêweyê raperînê (serhildanê) bike. Raperîn xwe bi xwe dest pê kir û paşê hêzên pêşmêrge ketin navê û girtin bin kontrola xwe. Raperîn bi tenê ne li Kurdistanê bû; herweha li başûrê Iraqê şîîyan jî desthilda. Niha jî di navbera hêzên çep û yên netewî û demokratîk de dîtinên cuda cuda hene. Yên netewî yanî wek yên ku di nav Bereyê Kurdistanê de dixwazin diberxwe bidin û bi aliyê din de jî bi rejîma Bexdayê re guftûgoyan pêkbînin. Lê , yên çep dixwazin xelkê Iraqê komê

serhevdu bikin û rejîma Îraqê bixin. Yanî ew naxwazin bi Saddam re guftûgoyan çêbikin.

**Kovan:** Li Kurdistanê kontrol roj bi roj tê guhartin. Barê bingehî û giştî yên jîyana gel e. Li navê qanûn tunin. Qanûna dewleta Îraqê niha nayên bi karanîn, lê qanûnên Kurdan jî tunin berî demekî Bere gelek lawaz (qels, zeyîf) bû, lê ji mehek şûn ve gelek ber bi başiyê ve diçe.

**Cemşîd Heyderî:** Nasir got di serî de li Kurdistanê hêz tune bûn, lê mirov divê hoyan bide ber çavan. Belê her çiqas hêz bi awayekî vekirî nexwuyabûn û qels bûn jî, lê dîsan bi dizî li gund û bajaran rêxistinên wan hebûn.

**Sîrwan:** Ez taze ji Kurdistanê têm, hê hefteya min tije nebû. Bere dest bi organîzekirina gel kirîye. Belediye hene û dixebitin. Dibistan herweha. Bere polîsê parastin, nasname (kîmlik) û paspaport kontrolkirinê jî avakirîye. Dixwazin leşkerên îdarî çêbikin. Dest bi çekirin û tamîrkirina çekna kirine û di vî warî de qursên hînkirin û perwerdeyî vekirine û carnan wan qursan di TV de jî şan didin.

**Cemşîd Heyderî:** Dezgeh (muesese) û îdareyên ku hene hîn jî yên kevin in û bi aliyê aborî ve jî bi dewletê ve girêdayî ne. Niha dewlet nikare wan kontrol bike. Ew di bin kontrola Bere de ne. Dixwestin li Dihok û Zaxo qeymeqam hilbibjêrin, lê ez nizanim çi bû.

**Kovan:** Di bingehê xwe de tixûbên kontrolê ne bi paralela 36-an ve girêdayî ye. Hinek cih hene ku di nav paralela 36-an de ne lê kontrol di destê Îraqê de ye û hinek cih jî hene ku li derê paralela 36-an de ye, lê, kontrol di destê pêşmêrgeyê Bere de ye. Wek Xaniqîn, Kerkûk... Lê mirov dikare

bêje ji %70-80 axa Kurdistanê di bin kontrola hêzên Bere de ye.

**Cemşîd Heyderî:** Belê otorîte di destê hêzên pêşmêrge de ye

**Berbang:** Gelo hêviya xelkê çi ye, li gel guftûgoyên Bexdayê ye an na?

**Sîrwan:** Li Kurdistanê ji her pîşe (meslek) û çînî li gel raya Bere re ye. Wek mînak Hakimê bajarê Silêmaniyê bi xwe, li ser navê Bere, di nav delegasyona guftûgoyan de çûbû Bexdayê.

**Nasir Razazî:** Xelk ne li dij guftûgoyan e,lê Bere û hêzên Kurdistana Îraqê xelkê ji guftûgo û bûyeran agahdar nakin, bi dizî digrin. Xelk ji vê yekê eciz e. Pêşmêrge bi xwe tiştek nizane.

**Kovan:** Di destê me SIFO an jî statîstîk tunin, ku mirov bizanibe ji sedî çiqas li gel û ji sedî çiqas jî li dij guftûyoyan in. Ra û hêviya xelkê bi ya pêşmêrge ve li gel guftûgoyan in. Lê dibe ku hinek li gel Bexdayê guftûgoyan nexwazin. Bere xelkê di derheqê guftûgoyan de bi radyo û belavokan agahdar dike. Heta bi telefonê me yên Ewropayê jî di demê de agahdar dikin.Belê bi şewekî aktîv guftûgo hatine rawestanin, lê bi şêweyê name û nivîskî her berdewam e.

**Nasir Rezazî:** Ez ji kek Kovan dipirsim kengê û çawan xelkê ji guftûyoyan agahdar kirin?

**Sîrwan:** Ez dixwazim bersiva te bidim, ji ber ku ez niha ji Kurdistanê têm. Niha hem Partî û hem jî Yekîtî Nîştîman di cîh de hem endamên xwe û hem jî xelkê agahdar dikin.

**Nasir Razazî:** Piştî ku guftûgo têkçûn weha bû çavên min. Berê tiştekî weha tunebû.

**Cemşîd Heyderî:** Heta Konferansa Şaqlaweyê agahdarî digihêşt xelkê. Di kombûnê de Bere

biryar girtibû, ku li Bexdayê delegasyon û hukimeta Iraqê dema li ser kîjan xal bi hevdu bikin, dê wê ji raya gel re eşkere bikin. Lê, di dema guftûgoyan de Bexdayê vê biryarê qebûl nekir û got ku " heta ku em li ser hemû xalan li hevdu nekin, dîyarkirina xal bi xal nabe." Rojnameyên Iraqê yên rojane her roj dihatin Kurdistanê. Wan li gor xwe dinivîsand. Lê Bere tiştek ne digot û ne dinivîsand. Divê xelk ji Bere fêr biban, ne ji Iraqê û dezgehên din. Piştî civîna Mam Celal a Hewlêrê ya Tebaxê êdî her kes behs dike.

Niha bîr û raya Celal Talabanî û ya Mesûd Barzanî di vî warî de ne yek e. Celal Talabanî dibêje, "xelk guftûgoyan naxwaze" û Mesûd Barzanî jî dibêje, " na gel guftûgoyan dixwaze." Lê, ya herî dilxweş ew e, ku herdu hêzên sereke çi dibe bila bibe, bi yek alî bi rejîma Iraqê re rûnanin. Divê bi hevdu re biryar bigrin û bi hevdu re hereket bikin. Ya herî baş jî ev e.

**Berbang:** Baş e, dê daxwaza gel çawa bê zanîn? Gelo dê referandûm çêbe?

**Kovan:** Meseleya referandûmê hîn baş ne dîyar e, lê bi telefonê ji me re gotin, hewldaneke weha heye. Mesûd Barzanî dibêje ku, heger me vê meseleya berdewambûna û ne berdewambûna gutfûgoyan di nav xwe de bi hevdu kir, wê demê em serî li referandûmê naxin, lê heger me bi hevdû nekir, wê demê divê em herine referandûmê.

**Berbang:** Wek em pê dizanin zivistan hat. Kurdistan wêran e û avayî û xanî nînin. Xelk tazî, birçî û li der e. Gelo hêzên Hevkar (Mutefîk) an

jî Bere ji bo penaber û derbederan xanî çêkirine an jî xelk bi xwe di vî warî de di nav çi xebat û lebatê de ye?

**Nasir Razazî**: Heta 2 meh berê jî li navçeyên azadkirî tû xanî an avayî ne hatibû çêkirin. Lê belê, xelkê li hinek cihan bi teneke û textikan ji xwe re wek holikan tişt çêkiribû. Di gotin û hêvî dikirin ku, dê Ewropî ji me re xaniyan çêbikin.

**Sîrwan**: Na, niha FN (Koma Neteweyan) li hinek herêman dest pê kirîye, li gor hejmara malbatan, texte, çînko û malzemeyên xanîlêkirinê li xelkê belav dikin. Yên ku dikarin bi xwe yên ku nikarin jî, bi alîkariya FN an jî bi alîkariya pêşmêrgeyan ji wan re xanî ava dikin. An jî tamîr dikin. Heger weha dom bike, ez bawer im dê heta 2-3 mehan bikarin ji bo derbasbûna zivistanê tedbîr bigrin.

**Berbang**: Heger ev rewşa sîyasî li Kurdistana Başûr û Iraqê çend salan weha dom bike û bi guftûgoyan negîhêne encamek, gelo Bere û hêzên Kurd dê ji bo çareserkirina pirsa Kurd, polîtîkayekê çawa bidine pêş xwe?

**Kovan**: Polîtîka Bere ne şer û ne jî aştî ye. Ji ber ku herdu jî ne bi me ve girêdayî ne. Ax di di bin destê me daye, lê dunya bi me re alîkariya sîyasî nake. Sê milyon Kurd niha perîşan in. Projeya Bereyê Kurdistanê ew e , ku xelkê Kurd, xwe bi xwe, xwedî û îdare bike. Ji ber ku tecrûbeyê me hene Ji sala 1981'ê û heta 1987'an deverên berfirehên azadkirî îdare kiriye. Niha rewş komplek-

stir e. Dirgayê rewşa, Tirkiye, Suriye, İran û heta girêdayê rewşa cîhanê ye. Divê Kurd yek bin û nehêlin ku hukim û îdare bikeve destê hezên din. Wek em pê dizanin gelek plan li ser İraqê hene. Dixwazin wê bikin wek Lubnanê.

**Nasir Razazî:** Bi aştî pirsa Kurd çareser nabe. Heta ku mafê çarenûs neyê girtin, pirsa Kurd çareser nabe. Divê em raya giştiya cîhanê bistînin. Bi otonomiyê ev yek çareser nabe....

**Cemşîd Heyderî:** Dema bi riya aştiyê pirs çareser nebe, paşî dîsa, mirov dikeve nav bela û probleman. Ji bo avakirina Kurdistanê jî aştî pêwîst e. Hukimeta İraqê dibêje ku tevayiya İraqê wêran bûye. Kurdistan jî herêmek jê ye. Yanî ji bo Kurdistanê xalekê taybetî yê avabûnê nîne. Heger guftûgo bi serbiketa hukimatê ji bo Kurdistanê musaeda alîkarî ya taybetî bikira. Programa Bere otonom e. Divê mirov li gor programa Bere gotûbêj bike.

**Berbang:** Piraniya ew kesên ku diçin Kurdistanê û tên dibêjin ku " li Kurdistanê dizî, talan û werankirinekê bê ser û ber heye." Gelo ev rast e?

**Cemşîd Heyderî:** Belê pêşî li nav bajêr gelek bûn, lê niha rê lê girtine. Li Kurdistanê bi tenê hêzên pêşmêrge çekdar nînin. Lê niha pêşmêrge kontrol dikin. Kak Mesûd bi xwe li Silêmaniyê di axaftina xwe de dibêje " "Divê em di vî warî tedbîr bigrin û hûn ji me re alîkariyê bikin ku dizî û talan nebe."

**Kovan:** Rast e, di destpêkê de talanên mezin bûn. Bere pêş lê girt. Di destê hêzên Kurd de qanûn tune bû. Bi urf û edetan herêma Kurdis-

tanê îdare dikir. Lê niha pêş lê girtine û bi awayekê pozîtîv dimeşe. Divê qanûn bên sazkirin.

**Sîrwan**: Komîteyên şoreşê hene otomobîl û kamyonên ku di sînoran de derbas dibin kontrol dikin. Bi taybetî sînorê Tirkiye û Îranê. Li nav bajaran jî kaxezên otomobilan kontrol dikin. Mesela yê ku otomobîlek bidize 10 sal ceza didinê. Bi taybetî di van hefteyên dawî de qet bûyerên weha çênebû.

**Cemşîd Heyderî:** Ew projeya ku Kak Amed behs kir projeyekê nîv eskerî bû, ne ya enerjî. Heger hukimeta Îraqê wê 400 metre bilind bikira, demê dê navçeyekê gelekê mezin binav bûbûya. Di wê projê de gelek kamyon, buldozer û aletên din hebûn. Di projê de çêkirina 200 xaniyên modern hebûn. Tê gotin ku ev firotine axayek û axa jî firotiye Îranê. Lê çiqas rast e yek nizane. Îspat tune, lê xelk dibêje firotine...

**Berbang:** Belê, di nav rewş û hoyên hewqas dijwar de, gelo rewşa çapemenî û hunermendiyê çawa ne?

**Cemşîd Heyderî:** Heta meha 8-an rewşa çapemeniyê li Kurdistanê gelek ne baş bû. Mirov dikare bêje hîç tiştek derneçûbû. Li Hewlêr çapxenekê gelek mezin hebû, hêzên Kurd dikaribûn li wir tiştên xwe çap bikin, lê mixabin nekirin. Lê, piştî meha 8-an kovar û weşanên Kurd dest bi weşanên xwe kirin. Wek ku wê rojê min dît rojnama Xebat, Rêbazî Nîvê, Şerare, Rêgahî Azadî, Alayê Azadî, Rêgahê Kurdistan, Berê Kurdistan derketine... Li Dihok, Hewlêr, Şeqlewa,

Silêmaniyê Yekîtiya Nivîskar, Yekîtiya Jinan, Yekîtiya Xwendekar û Hunermendan hene.

**Berbang:** Bi dîtina we, ev dirêjbûn û têkçûna guftûgoyan, ji bo Kurdan baş bû an ne baş?

**Cemşîd Heyderî:** Dirêjbûn di xizmeta Kurd de nîne.

**Kovan:** Bi raya min ev diçe, lê carnan pingar dibe. Berdewambûn erênî ye. Pozîtîv e. Her çiqas guftûgo dîrekt hatibin birîn jî, lê bi awayekî din dimeşe. Wek name û tiştên nivîskî...

*A.Tîgrîs û Cemal Batun*

## Artêşa Tirk dîsa Êrîşê başûrê Kurdistanê Kir

Artêşa (ordiya) Tirk a dagîrker, di nav vê mehê de, du car li pey hev êrîşê başûrê Kurdistanê kir. Ew çalakiyên PKK yên nêzî tixûbên Kurdistana başûr û Bakur dibin sedem şan dide. Wek tê zanîn çend roj berî êrîşê, PKK li nêzê tixûb di çalakiyekî de 17 leşkerên Tirk kuştibû. Di vê êrîşa dawî de, Bülent Ecevît bi awayekî vekirî armanca dewleta Tirk da xuya kirin:

- *Divê Artêşa Tirk ji bakurê Iraqê dernekeve. Wê herêmê ji xwe re bike herêmekî rizgarkirî. Di çend mehan de carek operasyon encameke negatîv ji Tirkiyê re neayîne.*

Êrîşkirina Başûrê Kurdistanê ji artêşa Tirk re bûye riya kaniyê. Dewleta Tirk, her ku dikeve tengasiyê bi balafir, top û tanqên xwe ve berê xwe dide başûrê Kurdistanê.

Wek her carî, dîsa ji 20'ê meha cotmehê ve, li başûrê Kurdistanê cihwarê sivîl bombebaran dike û gelek kesên sivîl hatin kuşt. Encama êrîşê, wek yên berê fîyasko bû.

Li ser vê êrîşa dawî Mesûd Barzanî daxuyaniyek da û bi zimanekî tûj êrîşa Tirkan protesto kir. Mesûd Barzanî di daxuyaniya xwe de got ku:

- *Artêşa Tirk cihên sivîl gulebaran dike. Yek jê jî ew e, ku gundê ku ez li wir ji dayîkbûme gulebaran kirîye û gelek kesên sivîl hatine kuştin. Em bûyerê protesto dikin û têkiliyên xwe ji Tirkiyê qut dikin...*

Celal Talabanî jî çû Ankarê û bi serokwezîrê Tirkiyê Mesut Yılmaz re peyîvî. Ew, bi pişt re jî Süleyman Demirel dît. Celal Talabanî jî êrîşa artêşê protesto kir. Talabanî di daxuyaniya xwe de got:

"E*v êrîşa artêşa Tirk têkiliyên navbera bereyê Kurdistanê û Tirkiyê xerab kir. Peymana ku di nav me de hatibûn îmzakirin Tirkiyê bi vê êrîşê, bi yek alî xerab kir. Em dê buroya xwe ya li Ankareyê bigrin û mirovên xwe yên berpirsîyar jî bi paş ve bikşînin.*"

Piştî hevdîtina Celal Talabanî û Süleyman Demirel, Süleyman Demirel daxuyaniyek da:

"*Divê mirov Kurdên mêrkuj û yê hemwelatî ji hevdu cuda bike.*"

Li başûrê Kurdistanê bûyer hêdî hêdî kêm bûn. Herweha pirsa Kurd wek berê ji rojeve cîhanê derket. Di dawiya havîna 1991'ê de, Saddam ji Kurdistanê hêz û karmendên xwe kişand. Ambargoya aborî danî ser Kurdistanê. Ambaroya Saddam li seranserê Kurdistana Başûr tesîra xwe

nîşanda. Bi taybetî ji aliyê petrolê ve jîyan li Kurdistanê hema hema rawesta. Bereyê Kurdistanê li dij ambargoyê daxuyaniyên protestoyî dan. Carek Samî Abdurrahman û carek jî Mesûd Barzanî li ser navê xwe çûn Bexdayê. Lê encameke pozîtîv ji çûnên wan derneket û rewş nehate guhartin.

Piştî bi paş ve kişandina karmendên Saddam, li Kurdistanê valahiya îdariya sivîlî jî derkete holê. Li ser vê rewşa nû, Bereyê Kurdistanê di nav xwe civiya û ji bo valayiya îdarekirina herêmê ya sivîlî biryar girt. Bere civandina parlementoya Kurdistanî girt. Ji bo hilbijartina endamên parlementoya Kurdistanê Komîta Amadekirina Hilbijartina Giştî hat damezrandin. Komîtê dest bi kar û barê xwe kir. Dê di 3'ê Nîsana 1992-an de hilbijartina giştî li Kurdistana Başûr pêk bê. Endamên parlementoya Kurd bên hilbijartin. Di meha 2'ê 1992-an de Mesûd Barzanî li ser daweta Tirkiyê bi helîkoptera hêzên Hevkar hat Kurdistana bakûr û ji wir jî bi balafirê hat Ankarê. Mesûd Barzanî, Serokwezîr Süleyman Demirel, Wezîrê Karûbarên Derveyî Hîkmet Çetin, Serokkomar Turgut Özal û gelek kesên dît û bi wan re qise kir. Mesûd Barzanî li Ankarê di roja 23. 2. 1992-an de bi rojnamevanan re presskonferansek çêkir. Mesûd Barzanî di presskonferansê de bi kurtasî van tiştan got:


- *Em li Kurdistana Îraqê dewleteke serbixwe naxwazin. Em di nav Îraqê de otonomiyeke rasteqîn dixwazin. Em naxwazin ji Îraqê biqetin. Hilbijartina parlementoya me ya meha Nîsanê, ne alternatîvê parlementoya Îraqê ye. Îraqê niha ji herêma me hemû karmendên (memûrên) xwe bi paş ve kişandîye. Valayiyeke îdarî çêbûye. Em dixwazin parlementoya ku pêk bê vê valayiya îdarî tije bike. Îdara sivîliya herêmê bigirê ser milê xwe û bi hukimeta Îraqê ya navendî re pêwendiyan bimeşîne.*

Rojnamevanan li ser têkiliyên wan û PKK pirsekê ji M. Barzanî kirin. Bersiva Mesûd Barzanî weha bû:


- Em nikarin tixûbên Tirkiyê biparêzin. Em li dij metodên PKKê ne. Em, wek Bere li dij terorîzmê ne. Heger PKK dev ji şerê çekdarî berde û bixwaze bibe rêxistineke polîtîk, wê demê em dikarin li herêma xwe cîh bidine wan.

Di dezgehên ragihiştandin û çapemeniya cîhanê û Kurdan de pirsa Kurd ket nav bêdengiyeke mezin. Ji ber vê yekê, me jî dawî da notên xwe yên rojane. Me xwest, ku em li vir xalek dayînin.








ALLDRIG
MER










220000 Refugees
Do Want to Go Home
Expand lat. 36 to 34.
Where Are
Graves
182000 Kurd
Children and Women?

Saddam êrîşê Kuweytê kir û wê dagîr kir.

Koma Neteweyan dagîrkirina Kuweytê protesto kir. Ambargoya aborî û leşkerî li ser Iraqê danî. Dîsa jî Iraqê leşkerê xwe ji Kuweytê nekişand. Amerîka û hêzên Hevkar di hewa de, bi çekên nûjen Iraqê bomba kirin. Di dawî de, bi operasyona erdê re hêzên leşkerî yên Iraqê, ji Kuweytê hatin derxistin. " Kuweyt rizgar bû." Iraq têkçû. Hat wêran kirin.

Ji başûrê ve Şiî û ji bakur ve jî Kurdan dest avêtin çek. Di navbera hefteyekê de Kurdan ji % 90'ê başûrê Kurdistanê rizgar kir.

Hêzên Hevkar û Amerîka ji serîhildana Kurd û Şiîyan tirsîyan. Çav li Iraqê şikandin. Iraqê bi balafir, helîkopter û scutan Kurdistanê xopan kirin. Qasî 2 milyon Kurd ber bi tixûbên Iran û Tirkiyê ve reviyan. Trajediyeke mezin dest pê kir. Bi hezaran zarok, kal û pîr li ser çiyayên Kurdistanê, di nav berf û sermayê de mirin.

Dinyayê temaşa mirina Kurdan kir. Vê carê hêzên Hevkar û Amerîka bi balafîran ji Kurdan re nan û xwarin avêtin. Xwestin xwe humanîst nîşan bidin.



Mirov dikare roj bi roj, bi awayekî vekirî û objektîvî wan lîstik û trajediyan di vê pirtûka han de bibîne. Dîsa mirov dikare di vê pirtûkê de, li hember vê barbarî, trajedî û lîstikên han, li welêt û li derê welêt Kurd û serokên wan çi gotin û çi kirin, bibîne.

Ev dîroka çend mehan e, lê dikare dîrok û polîtîka çend sedsalan bide dîyar û zelal kirin.

**APEC**